

KOVARA LÊGERÎN Û LÊKOLÎNÊ

BÎR

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ



Navdarên Kurd-4

HEJMAR-SAYI:10 ZIVISTAN 2009

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

B Î R

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

B Î R

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

BÎR

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

Ji Sê Mehan Carekê Tête Weşandin
Ûç Ayda Bir Yayimlanir

20ê Çileyê Navîn 2009

Bûha: 10 YTL

BÎR Reklamcılık -Yayıncılık

Sahibi ve Sorumlu Yazışleri
Müdürü:
Mehmet KONUK

Redaktor:

Seîd VEROJ

Tîprêzî-Mîzanpaj: BÎR

e-mail: kovarabir@yahoo.com
kovarabir@hotmail.com

Şertên abonetîyê

Bo nêva welat salek 30 YTL
Bo derveyê welat salek 80 \$

Çapxane/Matbaa:
Barış Matbaa Mücellit
Ali LAÇIN
Davutpaşa cad. Güven Sanayi Sitesi
C. Blok No: 291
Topkapı/İSTANBUL
TEL : (0212) 674 85 28
FAX : (0212) 674 85 29

Cîyê Rêvebirinê/Yönetim Yeri:
İnönü caddesi Magül İş Merkezi
No: 49
Dağkapı /DİYARBAKIR

Tel: (0412) 2287828

*Berpirsyariya her nivîsê yê nivîskar bi xwe ye.
Mesuliyetiya her nûsteyî ê nuştokî bi xo ya*

NAVEROK - İÇİNDEKİLER

Seîd VEROJ

Nûredîn ZAZA: Sîyasetmedar, Çîroknivîs, Werger û Roşinbîrekî
Kurd (Sibata 1919-7/10/1988)..... 9

Ziya AVCI

Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)..... 31

Osman Sebrî

Kurtîyek Ji Destpêka Jîyana Min(5ê Kanûna 1905-11/01/1993)55

Mehmet YÜREK

ALÎŞÊR EFENDÎ 69

Tahsin SEVER

Kürt Halkının Sözcüsü, Diplomatu ve Savaşçısı: Yusuf ZÎYA
(1882-14 Nisan 1925) 81

Mehmet KONUK

II. Şeyh Abdusselam BARZANÎ: 100 Yıllık Özgürlük Mücadelesinin
Temel Mimarı 87

Kemal Y

Mazlumların Çirkin Kralı: YILMAZ GÜNEY.....99

Doç. Dr. Mamsote Qedrî

Xelîl XEYALÎ 114

Wahdet ATEŞ

Birhoyê Heskê Têlî û Berxwedana Agirîyê 119

Mehmud M. E. XERZÎ

Mustafa Remzî BUCAK: Ger ji 60 Hezar Tirkên Kibrisê re FEDERASYON
Bibe, Çima Ji 8 Mîlyon Kurdên Turkiyeyê re Nabe?125

Şakir EPOZDEMİR

Şehîdê Tetwanê: Parêzer Şewket Epozdemîr..... 141

Nezîrê CIBO

Havêrkan Aşîret Konfederasyonu-VI154

Pîrê KAL

Gotinên Bijare183

Ronî WAR

Xadim197

Pêşgotin

Xwendevanên hêja, ev hejmara kovara **BÎRê**, dibe hejmara çaran a rêzeya dosya "*Danasîan 100 Navdarên Kurd*". Di vê hejmarê de jî hunê navê gelek rewşenbîr, sîyasetmedar û kurdperwerên hêja bibînin. Ger ku hinek ji wan hêjayan, ji aliyê me ve hatibin jibîrkin jî, ji ber ku navê wan di dîroka miletê kurd de hatiye kolandin, her yek ji wan di neqebekî de derdikevin pêşiya me, bivê nevê di rêyekî de em liqayê hev dibin. Lê mimkune ku ev dem û rê carina dirêj be, lêbelê bêguman em dê li dem û derekî de rûbirûyê hev bin. Ku ew dem û der hinek bi derengî keve jî, divê ew gorbihûştan me bibexşînin.

Çawa ku me berê jî gotibû, her çiqas kovara me weşaneke şiroveyî ya rojane nebe jî, bi bîrxistina bûyerên di rojevê de û kurteşiroveyên me yên derbarê van bûyeran, yek ji mijarên pêşgotina kovara me ye. Di vê çarçovê de em dixwazin behsa destpêkirina têlevîzyona setelayta kurdî ya **TRT-6 (TRT-Şeş)**ê bikin.

Rojgara ku Împeratorîya Osmanî belav bû û xebata damezirandina Komara Tirkîyê destpêkir û vir ve, di çarçova îdeolojîyeke nijadperest de hebûna miletên li ser cografya mayî ya Împeratorîyê de hate înkarkirin û tune kirin. Kurd jî, yek ji wan miletên nişteciyê kevnare yên vê cografyayê bûn, van deran ji xwe re kiribûn war û ev warê wan di dema desthilatîya Osmanîyan de jî bi navê **Kurdistanê** dihate bi navkirin. Piştî damezirandina Komara Tirkîyê hebûna miletê kurd, cografya û ziman û kultura wan hate înkarkirin û asîmlekirin. Kurdan li hemberî vî sîyaseta înkarker û nijadperest, îradeya hebûna miletê kurd bi reaksiyonên dijwar nîşan dan; Tevgera Qoçgiri(1919), Tevgera Komîteya Îstiqlal a Kurdistanê(1925an), Tevgera Agirîyê(1927) û Tevgera Dêrsimê (1937) reaksiyonên herî girîng û girseyî bûn. Em dikarin bêjin ku tehcîrkirin û tevkujîya ermenan ne tê de, dîroka sed salî ya tevgera Îtîhat Terakî û Komara Tirkîyê, dîroka hewldanên têkbirina tevgera netewî ya kurd e. Ji aliyê damezrêner û rêvebirên Komarê ve, ji bo asîmlekirin, entegrekirin û înkarkirina kurdan gelek hewldan û xebat hatin kirin, gelek xwîn hate rêtin. Mamosteyên unîversîteyan, nivîskar û rewşenbîrên Komarê bi sedan meqale û pirtûk belav kirin ji bo înkarkirin û tirkkirina kurdan. Ev sîyaseta înkarker û asîmlasyonîst a Komarê bi ser neket.

Ev sîyaseta sed salî ya asîmlasyonîst-înkarker û dagirker, digel berxwedana sedsalîya miletê kurd û şertên îro yê dinya medenî û pêşkevîna teknolojîya sînornenas, êdî têgehîştin ku bi vê awayî nikarin bigihin encamekî. Weşana kurdî ya **TRT-6ê**, di encama vê pêvajoyê de derketîye holê û têkçûna sîyaseta înkarkir û asîmlasyonîst e.

Bi tevî hemû bûyerên nexweş ên vê pêvajoyê, ji aliyê dewletê ve destpêkirina weşanê televîzyoneke bi zimanê kurdî, li xelatiyên xwe mikurhatin e, pêngaveke erênî ye, lê nebes e. Ji alîkî ve sazkirina qenaleke televîzyona bi zimanê kurdî û ji aliyê din ve jî, ji ber qanûna Partiyên Siyasî, qedexebûna propagandaya bi zimanê kurdî îronîyek e.

Mesela kurd, meseleyeke netewî ye, mesela diyarkirina çarenûsiya miletê kurd e. Eger ev pêngava televîzyona kurdî ya **TRT-6ê**, bibe wesîleya pêngavên din ên ji bo çareserkirina mesela kurd, dê ji bo miletê kurd manîdar be, nexwe ji bo çavgirtin û xapandinê be, nemimkun e ku dê bigehe armanca xwe. Lewra ji nûha ve panzdeh(15) qenalên setelaytên kurdî hene, du sal şûnde ew dê bibin bîstûpênc û pênc sal şûnde jî dê bibin pêncî. Di rewşekî wisa de, bi tenê weşana qenalekî televîzyonê jî pirr manîdar nabe û miletê kurd jî bi wî nayê xapandin.

Bêguman destpêkirina weşanê TRT-6ê, bi tenê encama têkçûna siyaseta înkâr û asîmlasyonîst nîne, rewşa siyasî ya navnetewî û herêmî jî di avêtina vê pêngavê de tesîreke girîng kirîye. Êdî di konseptê siyaseta navnetewî de, parastina azadî û mafên kulturî, prensîbeke hevpar û bingehîn e. Ji ber vê yekê, di pêngava weşana TRT-6ê de, hem tesîra Amerîka û hem jî ya YA heye. Digel vê, rewşa nû ya herêmî jî, tesîreke girîng li vê pêngavê kirîye. Li herêmê statuko û sîstema dagirkerî ya navdewletî şikestiye, li başûrê Kurdistanê Dewleteke Federe ya Kurd çêbûye. Bi tevî hemû astengî û hewldanên pûçkirina statuya başûrê Kurdistanê, dewletên herêmî di aramancê xwe de bi ser neketine û her weha nekarîne têkilîyên kurdan û hêzên navnetewî jî xera bikin. Di encamê de, tenê rêya diyalogê maye. Rêya diyalogê jî ancax bi rêzgirtin, qebûlkirina meşrutiyeta îradeya siyasî û berjewendîya dualî(dulayî) mimkun dibe. Di vê çarçovê de, naskirina îradeya siyasî ya başûrê Kurdistanê û têkilîya bi wan re, bê naskirina mafên rewa yê bîst mîlyon kurdên bakûr nemimkune. Ji ber vê yekê, ku dewleta Tirkîyê bixwaze têkilîyên xwe bi başûrê Kurdistanê re baş bike, divê berîya her tiştî têkilîyên xwe bi kurdên bakûr re nerm û baş bike.

Di rastîyê de derêca bandor û tesîra navxweyî û derveyî çî dibe bila bibe, destpêkirina weşanê TRT-6ê, ji aliyê beşekî zêde yê rewşenbîr û pirranîya gelê kurd ve bi erênî(pozîtîf) têtê dîtin û ji aliyê hinekan ve jî bi neyînî têtê dîtin. Lênerîna xelkê nesîyasî û yên ku xwe aidê alîyekî nabînin, çêbûna vê televîzyonê erênî û wek tişteki pêdivî dibînin. Belkî jî ev pirranîya bêdeng, bêtir bi aqlêselîm difikrin. Yê neyînî difikrin jî, bi pirranî û taybetî jî derûdorê PKKê ye. Ji alîkî ve parastina siyaseta "Komara Demokratîk" û "Tirkîyeyîbûnê" û ji aliyê din ve jî dijberîyeka reqûrût a li hemberê hewldanên darvayê xwe. Ev yek tam li gorî qerekerê siyaseta PKKê ye.

Derûdorên PKKê, dijberîya xwe ya di derbarê **TRT-6ê** de îlan kirin û qîma xwe bi vê yekê jî neanîn, her kurdekî temaşevan û bi vê têlevîzyonê re elaqed-er jî "çahş" îlan kirin. Dema ku em helwesta wan a dijberê **Kurd-1ê** jî bînin ber çavan, heman tiştî jî xwedî û xebatkarên **Kurd-1ê** re jî dibêjin. Wê demê aşkere dibe ku PKK, her hewldaneke dervayê xwe, wekî komployeke dijî xwe qebûl dike. Wateya vê têgehîştin û helwestê ev e: ew xwe dixin şûna miletê kurd û xwe di navenda her bûyerekî bi miletê kurd ve girêdayî de dibînin. Bi gotinekî din, kurdayetîyê ji xwe re kirine mûlkîyet û naxwazin hîseyên vê mûlkîyetê bi hinekên din re parve bikin. Dîtirsîn ku pêngavên wekî **Kurd-1** û **TRT-6ê**, argûmanên di destê wan de bigrin. Li gor têgehîştina wan, tiştên ew bikin baş e, yê ku ji dervayê wan bête kirin şaş e. Wateya vê lênêrîn û têgehîştinê ev e: berjewendîya grub û rêxistina me, li ser berjewendîya miletê kurd de ye. Li gor vê yekê, ku weşana TRT-6, di bin kontrola wan de bibûya, dê wek pêngaveke gelek baş û destkevîyên têkoşîna xwe pêşkêşê raya giştî ya kurd bikira.

Wisa diyare ku weşana têlevîzyona **Kurd-1** û TRT-6ê, ji bo berjewendîyên grubî û rêxistinî yên PKKê, wekî xeterîyek pirr girîng tête qebûlkin. Lewra dê naverok û seha weşana ev têlevîzyonan bêtir fire be, dê bêtir bi xelkê re di nav têkilîyên rasterast de bin. Ev zîhniyet, van têkilîyan ji bo berjewendîyên xwe yên grubî û rêxistinî xeternak dibîne. Lewra ew xwe wekî xwedî, miletê kurd jî wekî mûlkîyeta xwe dibînin.

Gengeşîyeke din jî, weşana têlevîzyona TRT-6 bi destê dewletê hate kirin baş bû yan bi destê şirîkeyên taybet bihata kirin baş bû? Lo gor dîtina me, di destpêkê de ji aliyê dewletê ve weşandîna têlevîzyona bi zimanê kurdî rasttir e, lê divê ev yek tenê bi weşana fermî ya dewletê ve neye sînorkirin. Ku hun bêjin ji bo çi di destpêkê de bi destê dewletê weşana kurdî rasttir e? Em dê bêjin, heta nûha şirîkeyekî taybet hebûna miletê kurd înkâr nedikir, dewletê hebûna ziman û kultura vî miletê înkâr dikir, ji ber vê yekê bi destê dewletê çêbûna vê qenalê ji ya şirîkeyên taybetî rasttir e. Lêbelê divê weşana bi zimanê kurdî, di çarçoveyekî hiquqî û qanûnî de bête bicîkirin.

Di encamê de, çawa ku me li jorê anî ziman, ku ev pêngav û avêtin hinek pêngavên din, bibin wesîleya xweşkirina rêya çareserîya mesela kurd gelek erênî ye û pêdivîye di derbarê mafê ziman û kulturî de peyderpey pêngavên li jêr diyarkirî jî bêne avêtin:

* Damezirandina beşê Zîman û Edeba kurdî li unîversîteyên di Kurdistanê de.

* Bi awakî fermî û qanûnî qebûlkirina navê cografya dîrokî ya kurdan bi navê **Kurdistanê**. Û her weha ji bo temsîla miletê kurd û cografya

Kurdistanê qebûlkirina ala Kurdistanê, çawa ku li Amerîkayê jî her eyaletekî bi ala xwe tête temsîlkirin.

* Perwerdeyî bi zimanê kurdî, ji seretayî ta bi unîversîteyê.

* Vegerandina navê kurdî yê gund, bajar, cî û waran.

* Divê zimanê kurdî wek zimanê fermî yê duyemîn bête qebûlkirin û li Kurdistanê bibe zimanê yekemîn ê perwerdeyî û sazîyên fermî.

Bi hêvîya hevdîtina hejmareka nû ya kovara BÎRê, di nav xêr û xweşîyê de bimînin.

BÎR

Nûredîn ZAZA:

Sîyasetmedar, Çîroknivîs, Werger û Roşinbîrekî Kurd
(Sibata 1919-7/10/1988)

Seîd VEROJ

Pêvajoya Şerê Cîhan ê Yekem

Rewşa miletek û ferdên wê, bi rewşa wê ya komelî (civakî), dîrokî û sîyasî ve girêdayî ye. Wek ferdekî civata kurd, jîyana Nûrdîn Zaza jî, ji rewşa civakî û sîyasî ya miletê kurd cûda nîne. Ji lewma, dema ku em behsa jîyan û serborîyên Zaza bikin, bi kurtî be jî, divê em behsa rewşa giştî ya wê demê û civaka kurd jî bikin.

Rayedarên Dewleta Osmanî û siyaseta desthelat a Îtîhat û Terakî, destpêkirina Şerê Cîhan ê Yekem, weke fersendekî nû(nûh) dîtin ji bo bidestxistina erdê wendakirî yê Împeratorîyetê. Ji bo vê armancê, Dewleta Osmanî di sala 1914 de wek terefdarê Elmanya bi tevî Şerê Cîhan ê Yekem bû. Şerê Yekem, çar sal berdewam kir. Di encama Şerê Yekem de, li Rojhelata Navîn û Efrîkayê jî erdên ku pirranî



Nûredîn ZAZA

yan jî giştî nifûsa wan misilman bûn ji dest çûn. Jixwe berîya ku Şerê Yekem dest pê bike, hemû miletên Balkanî ji wan veqetyabûn û gelek giravên Behra Sipî û Egê ji dest wan çûbûn. Ji aliyê Rojhelatê ve jî rus hetanî bajarê Ezirgan, Dêrsim û Bedlîsê hatibûn. Di Rojhelata Navîn de jî, şerê di bereyên Besra, Bexda, Musil, Filistin, Şam û Helebê de wenda kiribûn. Ev erdan yan jî cografya miletên misilman, di navbera Brîtanya, Fransa û Îtalya de ku serkevtiyên şer bûn, hate parvekirin.

Ji nû ve parçekirina cografya Kurdistanê ya bin destê Dewleta Osmanî jî, yek ji encama Şerê Yekem bû. Bûyerên herî girîng ên pêvajoya Şerê Yekem, tevkûjîya ermenan û di sala 1917an de li Rusyayê pêkhatina Şoreşa Bolşewîk bû. Piştî pêkhatina Şoreşê, hêzên leşkerî yên Rusyayê ji bajarên wekî Wan, Bedlîs, Mûş, Ezirgan û Dêrsimê hilkişyan û digel vê jî bi Îtihatçî yan jî Kemalîstan re têkilî danîn û peyman çêkirin. Ev têkilî û peymana Bolşewîkan û Îtihatçîyan (Kemalîstan), li ser zemîneke dijî berjewendiyên miletê kurd û ermenan pêk hatibû. Ev peyman, li hemberî tevgera kurd û ermenan, ji Kemalîstan re bû piştgirî û serkevtineke sîyasî-dîplomatîk a girîng. Peymana bi Bolşewîkan re, seha menawrayên Kemalîstan firehtir kir û rêya êrişkirina li ser tevgera kurd jî xwestir û hêsanîr kir.

Di pêvajoya berdewamkirina Şerê Cihan ê Yekem û piştî wê de, di navbera Brîtanya, Fransa, Rusya û Îtalyayê de peymanên veşartî hatibûn çêkirin. Li gorî Peymana Sykes-Picotê, ji xeynî cografya Sûryeyê dê ji axa

Dewleta Osmanî, hemû Başûrê Antolîyê (beşekî mezin ê bakurê Kurdistanê) biketa bin destê Fransayê. Lê ji ber ku di derbarê mesela Rojhelatê de, berjewendiyên Fransa û dewletên din ne lihev bûn, Fransayê qîma xwe bi vê peymana giştî neanî. Piştî vê peymanê, di navbera Fransa û Brîtanyayê de jî, di 15yê Îlona sala 1919 de peymaneke dualî çêbû.

Li gorî vê peymanê, Iraq û Filistin dê biketa bin mandateriya Brîtanyayê, Sûrye û Lûbnan jî dê biketa bin mandateriya Fransayê. Di vê navberê de sê meh di berîya îmzekirina Peymana Sevrê (10ê Tebaxa 1920) de, di nav hikûmeta Fransa û Kemal de mûtarekeyek hatibû kirin. Ev, yekemîn têkilî bû, di navbera dewleteke rojavayî û hikûmeta nû ya Anqerê de. Paşê di 20ê Çiriya Pêşîn a 1921ê de, di navbera hikûmeta Anqerê û Fransayê de Peyman Anqerê hate îmzekirin. Bi vê Peymanê, dewleta nû ya Anqerê ji aliyê Fransayê ve bi fermî tete naskirin û sînorê wê yên başûr jî tene dîyar- kirin. Piştî vê peymanê, êdî têkiliyên ev herdu dewletan kê-m-zêde di vê çarçoveyê de dom dikin. Sûriye di sala 1921ê de bi biryara Cemîyeta Miletan kete bin mandateriya Fransayê. Sînorên wê demê yê Sûrye û Iraqê jî, li gorî berjewendiyên ew hêzên mezin ên wekî Brîtanya û Fransayê hatin dîyarkirin. Herweha sînorên sîyasî yên Sûrye û Tirkîyeyê jî, di sala 1929an de şiklê xwe yê îroyîn girt.

Bi kurtayî be jî behskirina derbarê vê pêvajoyê, ji bo dîyarkirin û bi bîrxistina têkilî û peymananên hêzên emperyal û Îtihatçîyan (Kemalîstan) e.

Ji ber vê, divê helwesta Brîtanya û Fransa ya li hemberê Tevgera 1925an û tevgera Başûr û kurdên rojhelatê başûrê Kurdistanê, di vê çarçovê de bête dîtin.

Berîya damezirandina hikumeta Anqerê, Mistefa Kemal ji bo ku piştgirîya şêx û serekeşîr û axa û mîrên kurdan bigire, li gelek bajar û bajarokên Kurdistanê geryabû, soz û bextê nasîn û dayina mafê kurdan dabû wan. Lêbelê gelek ronakbîr û neteweparêzên kurdan bawerî bi van gotinên Kemal nedikir, lewra jî helwesta xwe ya li hemberê gotin û hewldanên Kemal bi rêxistinkirina Komela Tealî ya Kurdistanê û damezirandina Komîteya Îstîqlal a Kurdistanê dîyar kirin. Piştî damezirandina hikumeta Anqerê, ew hêvîyên ku hinek kurdan dikirin pêk nehatin û berevajiyê wê, mudaxele û zulma li ser wan zêdetir dibû. Bi taybetî jî dûr-xistin û kûjyarî û zulma herî dijwar jî di dema desthelatdarîya Şefê Gewre Mistefa Kemal de çêdibe. Her çiqas Ocalan dixwaze bi xwezîyên xwe yên fantastîk û xwîna kurdan, vê pêvajoya desthelatdarîya Kemal paqij bike jî, mixabin roj bi bêjîngê nayê veşartin. Dema desthilatdarîya Kemal bi gelek mînakên ku gotinên Ocalan bêxude (vala) nîşan dide tije ye. Mînak: Dema ku Nûredîn Paşa û Topal Osman ji ber kirinên xwe yên tûndrew û hovane yên di Tevgera Qoçgîrîyê de li Meclîsa Anqerê tene darezandin, li hemberî şikayet û daxwaza cezakirana wan, M. Kemal parastin û piştgirîya Nûredîn Paşa û Topal Osmanê xwînrij dike. Berevajî cezakirinê, pileyê wan bilind dike û

wan xelat dike. Wekî dî jî em di- karain van mînakên gelek zêde bikin, lê mijara vê nivîsê ne ew e. Ji ber vê, em ê vegerin ser mijara xwe ya esasî.

Xebata sîyasî-netewî ya kurdan di dawîya Şerê Yekem de bêtir geş bû. Komela Tealî ya Kurdistanê yek ji van rêxistinan bû ku di sala 1918 de hatibû damezirandin, ji herêm û bajarên cûda yên Kurdistanê gelek kurdperwer û roşinbîr endamê vê rêxistinê bûn. Kurdan pêşiyê li Qoçgîrîyê, di sala 1919 de çalakî û dengê bidestxistina mafên xwe yê neteweyî bilind kirin û li hemberê damezirandina hikumeta Anqerê, biryara damezirandina hikumeta kurd ragehandin. Rêberên Tevgera Qoçgîrîyê, endamên Komela Tealî ya Kurdistanê bûn. Kemalistan li hemberî ev hewldan û xebatên kurdan reaksiyoneke dijwar nîşan dan. Piştî tevkujîya ermenan, ji bo mîletê kurd jî êdî pêvajoya tehcîr (dûrxistin), tenkîl û îslehkirinê dest pê kiribû.

Di wê rewş û pêvajoyê de têgehîştin û armanca kirinên tirkên (Îtîhatçîyan), li ser bingeheka nijadperestî, tunekirina *yên din* bû. Hemû kirin û tevkujîyên wê demê, bi gotinên wekî tehcîr, tenkîl, mûbadele û îslehat hatin îzahkirin. Naveroka van gotinan wê demê jî û îro jî, îstîsna ne tê de, ji aliyê roşinbîr û sîyasetmedarên tirkên ve erênî hate nîşandan, kirinên (pratîka) di encama vê têgehîştinê de jî meşrû hatin qebûlkirin. Di rastiyê de jî, van gotinan ji aliyê roşinbîr û sîyasetmedarên tirk ve wek qod û rêbazeke netewebûna etnîsîteya tirk hatine têgehîştin û qebûlkirin. Encama vê têgehîştinê, meşrûkirina tevkûjî (qirkirin) û

asîmilasyona grubên netewî û etnîkî yên din bû.

Belê, di encama Şerê Cîhan ê Yekem de, ji alîkî ve ew rewşa sîyasî ya ku bi kurtayî me li jorê behs kir pêk hatibû, ji aliyê din ve jî barê maddî û manewî yê Şerê Yekem li ser civaka kurd de tesîrekî gelek giran kiribû. Di ser vê re jî xizanî, nezanî û bêtifaqîya kurdan hebû.

Rewşa miletek û ferdên wê, bi rewşa wê ya komelî (civakî), dîrokî û sîyasî ve girêdayî ye. Nûrdîn Zaza yê ku dê paşê bibe sîyasîmedar û roşinbîrekî navdar ê kurd, di rewşekî wisa de çavên xwe li vê dinyayê vedike.

Malabata Zaza

Li Paxir Madenê Cîwar Dibe

Li gorî gotina Nûredîn Zaza, malbata wî bi eslê xwe ji eşîra Şadîyan in û kalê kalikê wî Îbrahîm Efendî di salên 1780an de hatine li Madenê cîwar bûne û bi xwe jî bûye hakimê Madenê. Maden, li ser rêya di navbera bajarên Diyarbekir û Elezîzê (Xarpetê) de, dikeve bakûrê qeza Arxenîyê. Maden bi rastî jî wekî navê xwe, cî û warê cewherê(maddenê) paxir(sifir) e, ku di kîmyayê de bi sembola "Cu" yê tete nîşandan. Li vê heremê jî xeynî vê maddenên wekî krom (Cr), Erciş (Pb), Zêr (Au) jî tene derxistin.

“Îbrahîm Efendî, peyakî zana û dinyadîtî bûye. Hingî nifûsê Madenê tenê 3000 kes bûye û wek hemû rûniştvanên piraniya bajarokên Kurdistanê, bi tacirî û esnafiyê mijûl bûne. Ew radibe jî Trabzonê(bajarekî li ser qeraxê

Derya Reş ku ji demên kevin de bi maden û endustrîya xwe naskirî ye, piraniya rûniştvanên wî Rum ango Yonan bûn) qasî 500 malên Rum tîne û wan li Madenê bi cî dike, da ku ew kanên madenî yên wir bi kar bînin... Bi saya vê xebatê, di sala 1792 de sifir(paxir) hate deranîn û bû kanîyeka girîng a dewlemendiya vî bajarî. Îbrahîm Efendî bi firotina madenê paxir, di nav demeke kurt de bajarê Madenê ji nû ve geş dike; rê, pîr, medrese û xaniyên nû dide avakirin. Xelkê bajêr roj bi roj dewlemendtir dibe û jiyanêke xweştir dijî. Ji ber vê, bêtir ji hakimê xwe hez dike. Lêbelê Dewleta Osmanî nedixwest ku hakimek, xan, beg an mîrek xurt bibe û rojek jê re bibe talûke. Lewra di sala 1830 de dişîne pey Îbrahîm Efendî ku biçê Stenbolê, lê ew naxwaze terka Madenê bike, biçê Stenbolê. Li ser vê yekê, Sultan Mehmed 10.000 leşkerê xwe dişîne ser wî. Ji bo bajarê ku ewî bi keda xebata çil salan pêş ve biribû, ava kiribû di şer de neye wêrankirin, Îbrahîm Efendî şevêkî cilê derwêşekî li xwe dike û bi dizî, bédeng, bajêrê xwe û welatê xwe diterkîne diçe Yemenê û li wê derê wefat dike.”¹

Dewleta Osmanî dest dide ser mal û milkê wî, malbatê tehdîd dike û keda çil salan têk dibe.

Dema ku Îbrahîm Efendî terka welatê xwe dike, “jina wî û kurê wî Mistefa li Madenê mabûn. Ew dixebite û berebere milkê bavê xwe yê

¹ *Kurmançî* (weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), hejmar: 4, Zivistana 1989

ku dewletê dest danîbû ser yek bi yek dikirre.”² Mistefa bi rêberî, zîrekî û mêraniya xwe jî şûna bavê xwe dadigire. Jê re kurekî dibe û navê bavê xwe, yanî Îbrahîm lê dike. Mistefa pirr qîmet dide perwerdeyiya kurê xwe yê Îbrahîm. Îbrahîm ê bavkalê Nûredîn dibe walîyê Madenê.

Îbrahîm Efendî bi minewerî, zan-yarî û edaleta xwe di navbera civata kurd û ermen û ruman de ahengeke pirr xweş pêk tîne, refah û dostaniya wan gelek pêş ve dibe. "Lê ev aheng û dostaniya wan pirr nadomîne. Di sala 1915an de hikûmeta osmanî fermana Fillan(ermenan) radike, dest bi kûştin û qirkirina wan dike. Hin serekeşîrên kurd jî arîkarîya hêzên dewletê dikin. Gelek kurdên din jî li cîran û kirîvên xwe yên fille xwedî derdikevin, wan ji mirinê difilitînin. Dê û bavê Zaza keçikek fille bi navê Caco li mala xwe vedîşêrin û xwedî dikin."³ Her çiqas Caco û yên wekî wê, di malên kurdan de bi xweşî û dilgermî bêne qebûlîkirin jî, qirkirina malbat û mileta wan di ruhê wan de birînen kûr vedikin. Qirkirina ermenan ji beriya Şerê Yekem dest pê kiribû, lê geremola dema Şerî, ji bo temamkirina vê tesawirê fersendekî pirr girîng bû ji bo rêvebirên Îtihat û Terakîyê.

Ji Dayikbûna û Zarotîya Nûredîn

Nûredîn di vê rewşa hanê de, Sibata sala 1919, li welatê jorî, di bajaroka Madenê de ji dayik bûye. Pênc zarokên Wisif Efendî hebûn:

Reşo, Nafîz, Gulçîn, Îffet û Nûredîn. Ew cî û warê ku Nûredîn paşê wek bihûşt(ceneta) li ser rûyê zemînê tarîf dike, mecbur dimîne ku di deh salîya xwe de terka wê bike. Dema ku Nûredîn behsa vê bihûştê dike dibêje:

“Bexçeyên me, wek bihûşt rûyê zemînê, bi darên fêkî yên cûr bi cûr tije bûn; gelek cûreyên tirî, tûyên reş û sipî û şîrîn û tirş, gelek cûreyên gûzan û fendeq û hêjîran, behîvên qaliknêrm hebûn. Cîyê her cûreyek dara fêkiyê cûda bû. Dema ku ez di nav wan darên cûr bi cûr de digeryam û bazdidam, min bîhna wan dikişand nav xwe û bi tama devê xwe ji wan her yekî dixwar.

Ku heywanên me tune bûna, belkî ev bihûşt rûzemînê ev qas xweşik nedibû. Nêzîkê pêncî serî mangeyên me, çil serî bizin û karikên me, hesp û hêstir û ker kûçik û pisikên me hebûn.”⁴

Tevgera 1925an û Trajediya Piştî Wê

Dema ku Tevgera 1925an dest pê dike, jîya(emrê) Nûredîn nêzîkê pênc salî ye. Tevgera 1925an, di nav çend mehan de têk diçe, li her derê Kurdistanê kûştin û zulm û zordestîyeke dijwar û hovana dest pê dike. Hesên Hîşyar ê Serdê di bîranîn xwe de dibêje: "Di dema Tevgera 1925an de wisa zulmeke nedîtî hate kirin, ku kesê mirî jî hatin darvekirin. Zilfîqar Axayê deşta Gewran, ku wê demê di

² Heman jêder.

³ Heman jêder.

⁴ Zaza, Dr. Nûredîn, *Bir Kurd Olarak Yaşamým (Jîyana Min a Kurdî)*, r. 25, , Nisana 2000- Stenbol, Weşanên Pêrî

hepîsxaneyê Elazîzê de girtîyekî kal û nexweş bû, ji bo wî ceza darvekirinê hatibû birrîn. Beriya înfazkirina ceza darvekirinê ew çû ser heqîya xwe. Edaleta Komara Tirkîyê ew mîrxasê mirî jî darvekir.⁵

"Wê demê li Madenê jî qasê 30 kurdên bijarte têne girtin; di nav wan de: bavê Nûredîn, birayê wî yê mezin, apê wî û pîsmamê wî Osman Efendî jî hene. Gava ku cendîrme van girtiyan dibin, xelk li dora wan dicivin û Osman Efendî bi dengekî bilind diqîre: "bijî Şêx Seîd!". Cendîrme, ji bo ku wî ceza bikin, wî tazî dikin û bi darekî ve girê didin, avê lê dikin û şevêkî li derva dihêlin. Ew di vê şeva sar de, li ber sermayekî xurt(-35°) dice- mide û şehîd dikeve."⁶ Bavê Nûredîn û birayê wî yê Nafîz jî, hijdeh meh di zîndanên de dimînin û ancax bi rûşweteke pirr zêde têne berdanê.

Di sala 1927an de, wê hîlbijartinên herêmî û şaredarî yên Komara Tirkîyê çê bibin. Li ser daxwaza hinek endamên malbatê û xelkê, Dr. Nafîz ê kekê Nûredîn wek berendamê şaredariya Madenê tete nîşandan. Dr. Nafîz, wê demê li bajarê Diyarbekirê wezîfe dikir û ev hewldan jî ne bi dilê wî bû. Ji ber vê, tevî xebata propaganda hîlbijartinan nebû û bi xwe jî nehat Madenê. Bi tevî vê sistî û dîlsariya wî, dema ku di 16yê meha Sermawezê de encamên hîlbijartinan hatin ragehandin, Dr. Nafîz wek serokê şaredariya Madenê hate hîlbijartin. Ji ber vê yekê

mecbur ma ku terka Diyarbekirê bike. Serokê nû yê şaredarîya Madenê çawa ku dest bi wezîfa xwe kir, wek doktorekî, pêşiyê ji karûbarê saxlemîyê dest pê kir. Wî dixwest ku digel êşa zordestî û feqîriyê, pêşiyê ji problemên nexweşîya xelkê Madenê re çareserî bibîne. Pê re jî, ji bo çareserîya problemên di yên bajêr hewl bide û bixebite. Ji bo vê jî, di serê xwe de hinek projeyên xweşik çekiribûn. Li ser ev hemû xiyal û hewldanên Dr. Nafîz, tenê çend meh derbas bûbûn ku Hikumeta Anqerê di bihara sala 1928an de hîlbijartina şaredariyên bajarên Kurdistanê betal kirin. Dr. Nafîz jî bêçare vedigere Diyarbekirê.

Ev bûyer gelek tesîr li ser malbata wî dike û bêtir jî dayika wî diêşîne. Piştî vegera Dr. Nafîz, nexweşîya dayika wî bi derbasbûna her rojekî re bêtir giran dibe. Axirî di gava dawî ya jîyana xwe de bi keserek kûr û dengekî zîz dibêje "Nafîz, Nafîz. Nafîz!" û hilmê wê diçike. Wê demê Nûredîn zarokekî neh salî bû û li ber balîfa dayika xwe ya delalî hêstiran dibarand.

Terka Bajarê Madenê û Serbihûriyên Diyarbekirê

Dema ku dayika Nûredîn çû rehmêtê, ew, piçûkê xuşk û birayan bû. Bêguman mirina dayika wî, berîyaberî tesîra herî giran li ser wî kir û pişt re jî li bavê wî Wisîf Efendî yê kal kir. Salekî li pey mirina dayika wî re, ew xwendina xwe ya seretayî xilas dike. Gava ku ew dibistana seretayî ya Madenê xelas dike deh salî ye û ji bo xwendina dibistana navîn, di dawîya

⁵ Hîşyar, *Hesen-Görüş ve Anılarım*(Bîranînên û Lînêrîn Min)- r. 294- 1994-Stenbol-weşanên Med

⁶ *Kurmançî* (weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîse), hejmar: 4, Zivîstana 1989

Îlona 1929an de berê xwe dide bajarê Diyarbekirê û diçe nik(cem) kekê xwe Dr. Nafîz. Nûredîn wê dema cûdabûna ji Madenê bi van pejnên xwe tîne ziman: "Ez mecbur mam ku bi girînê ji bav û bira û xuşkên xwe, ji Caco û Cemal û hevalên xwe, ji ker û hespê xwe, ji gir û newalên Madenê veqetim."⁷

Dema ku Nûredîn diçe Diyarbekirê, li vî bajarî hukma bêdengîya têkçûna Tevera 1925an û darvekirina şehîdên wî, hîn jî ji rû û rengê kevirên reş ên bedena Diyarbekirê xuya dibû. Hîn jî bîna barûd û kelaxan, ji zikakên wê yên teng û fetilok xalî nebûbû, ewrên reş û tarî yên Komara Kemalîst asîmanên wê terk nekiribûn û bandora xwe ya li ser bajêr bi her awayê nîşan dida. Wê demê dibistana navendî ya ku Nûredîn qeyda xwe lê çêkiribû, li dervayê bedenên Diyarbekirê, li ser pozê zinarekê pirr bilind ê bel û reş ê di qeraxa çemê Dîjlê de hatibû avakirin. Bi gotina Nûredîn, di dibistanê de wezîyet qet nebaş bû. Gizgizeke dijwar di navbera xwendevanên kurd û tirk de hebû. Piraniya karmend û mamostayên dibistanê tirk bûn. Axaftina zimanê kurdî qedexa bû. Rojekî xwendevanek bi navê Behrî, ji ber ku bi kurdî peyivîbû, mudirê dibistanê bangê wî dike û ji wî re dibêje: "min ji we reegotibû ku li Tirkîyê tenê bi zimanê tirkî tete axaftin, ji xeynî wî hemû zimanên din qedexa ne." Lawikê xwendevan dibêje: "belê te gotibû, lê mixabin ku kurdî zimanê min ê zikmakî ye, tu qewetekî nikare ji

axifîna min a kurdî re bibe asteng. Ez dizanim ku axifîna kurdî hatiye qedexekirin, lê ji bo neaxifînê tiştê ku ez karibim bikim nîne." Li ser vê bersiva Behrî, mudiryeta dibistanê bi lezûbez têkiliyên wî ji dibistanê qut dikin û wî ji dibistanê dûr dixin.

Li Diyarbekir jîyana xwendevaniya Nûredîn salek dewam kir. Lewra, di sala 1930 de bi serokatîya rêxistina Xoybûnê, çirûskên tevgerê nû li çiyayê Agirî vêketibûn. Agirê vê tevgera nû, li ser xwelî û dûyê Tevera 1925an geş bûbû. Vê pêla nû ya serhildana gelê kurd, xof dida hikumeta Anqerê. Ji ber vê yekê, qîma xwe bi sirgûn û dûrxistinên 1925an neanî, heçî kes ên ku bîna kurdî û kurdperweriyê ji wan dihat, dixwest hemûyan ji Kurdistanê dûr bixin. Dr. Nafîz jî yek ji wan kesan bû ku fermana dûrxistina wî derketibû. Ji bo ku gavekî zûtir ji Diyarbekirê bête dûrxistin, rayedarên Komara Tirkîyê, her gav wî û yên mîna wî aciz dikirin û gef lê dixwarin.

"Ji bo perçiqandina Tevera Agirî, Anqerê ji alîkî ve hêzên mezin ên leşkerî seferber kiribû û ji milê din ve jî xwenda, karmend û eşrafên kurd dişand navçeyên Anatolê. Diyarbekir bûbû navenda(merkeza) îdarî, sîyasî û eskerî ya vê sîyaseta fetisandin û bêsêrkirina tevgera welatparêz a kurdan. Mistefa Kemalî berpirsariya giştî ya vê sîyaseta dabû hevalekî xwe, Îbrahîm Talî. Û her weha payeyê Mufettişê Umûmî jî dabû wî. Îbrahîm Talî bi eslê xwe çerkez bû, lê wek gelek kesên asimlebûyî ji şahbêtir şahperest bû, tirkçiyek har bû. Her xwendayê kurd ê ku piçek têkilî sîyaseta bibûna, an bi kurdî

⁷ Zaza, Dr. Nûredîn - *Bir Kurd Olarak Yaşamım (Jîyana Min a Kurdî)*- r. 62, Nisana 2000/Stenbol-Weşanên Pêrî

Terka Dîyarbekîrê û Çûyina Binê Xetê

bipeyiviya an nexwesta bibûna endamê Turk Ocaxî, ji bo wî dijmînê tirkên bû û diviyabû rojekî zûtir bê "paqijkirin". Heke ronakbîrekî kurd nexwesta bibûna aletê îdeolojîya dijî-kurd a Anqerê, bi serê xwe li mala xwe rûnişt, Talî ji bo çavtirsandina wî hemû îmkanan bi kar dianî. Kesên ku teslîm nebûna, an jî xwe nedana ber çûyina sirgûnê, wan diavêt zîndanê an jî dida kuştinê. Ewî çend car "şîret"an li Dr. Nafîz jî kiribû ku rojek zûtir Dîyarbekîrê biterkîne, here li bajar- ekî Rojava bi cî bibe. Doktor lê vergerandibû, ku li Dîyarbekîrê hejmarê hekîman gelek kême, ku xelkê vê derê jî hewceyê doktoriya wî ye, lewra ji bo "xizmeta ahali" mayîna xwe çetir dibîne. Li ser vê bersivê, Îbrahîm Talî bi şev û roj polîsan danîbû ber derê Dr. Nafîz, da ku ew yek bi yek îfadeya kesên ku tên û diçin bistînin, çavên wan bitirsînin. Rewş ev bû, bi vê awayê domkirin ne mimkun bû. Dema dayîna biryara girîng hatibû. Dr. Nafîz, bi çend hevalên xwe yên nêzîk re dişewire û digihê wê baweriyê ku ji bilî terkkirina welêt, tu rêyekî nemaye jê re. Biryar dide ku biçe binê xetê, li nav kurdên Sûryeyê bi cî bibe. Ji vê bûnê, gava ku Îbrahîm Talî cardin dişîne pey wî û jê dixwaze ku biçe li bajarê Îzmîrê cîwar bibe, Dr. Nafîz herê dike. Ew û xêzana xwe û bi tevî birayê piçûk Nûredîn, rojê gerrî a Îlona 1930, bi ceweta çûyina Îzmîrê ji Dîyarbekîrê bi rê dikevin. Bi rê de şopa xwe didin wendakirin û bi qaçaxî derbasî Binê Xetê dibin."⁸

Dema ku derbazê Binê Xetê (Sûryeyê) dibin, jîya Nûredîn 10,5 bû û wî wisa dizanî ku dê biçin Stenbolê. Dema ku digîjin Helebê, ne bi dilê wî be jî, mecbur dimîne ku êdî rewşa heyî qebûl bike. Li ba dilê Nûredîn, bêguman Maden ji Helebê xwestir bû.

Dema ku ew derbasê Binê Xetê dibin, ba dilê wan dewleteke demokrat a wekî Fransayê; dê li hemberî mexduriyetîya wan xweşbîn be, hêsanî nîşanê karûbarê cîwarbûna wan bide û her cûre alîkarî bi wan re bike. Dema ew serdana ji bo hemwelatîyê dîkin, daxwaza wanji aliyê Komîserê Fransayê ve tête redkirin û di ser de jî dibêjin, li gor peymana di navbera me de divê emê we teslîmê Dewleta Tirk bikin. Ev tehdît û tîrsa fransîzan çend meh dom dike. Pişt re hinek giragîrên kurdên li Sûryê û dostên wan ên ermen dikevin navberê û bi vê awayê dikarin destûra rûniştin û hemwelatîyê werbigrin.

Piştî xelasbûna karûbarê cîwarbûnê, diviya ji bo bihûrandina jîyanê, kar û xebatek bihata kirin. Ji ber ku Nafîz li Tirkîyê doktorî dikir, dixwaze li wê derê jî mesleka xwe berdewam bike û pêre jî bi kirina vî meslekê jî alîkariya gelê kurd bike. Ji bo vê yekê, serdana Wezareta Tendûristî dike ku karibe muanexanekî ji xwe re veke. Bi tevî ku wî di dema Osmanîyan de li Stenbol û Şamê xwendibû jî, dîploma wî nayête erêkirin. Dibêjin, ji bo qebûlkirina vê dîplomayê, divê tu têkevi îmtihanê. Nafîz, di encama vê

⁸ Kurmancî (weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîse), hejmar: 4, Zivîstana 1989

îmtihanê de mafê doktoriye werdigre û li Helebê muanexanekî xusûsî saz-dike. Nûredîn jî di dibista Terre Saînte ya keşîşên fransîzî de dest bi xwendinê dike. Nûredîn her çî qas jî rewşa dibistanê nerazî be jî, bi mecburî xwendina xwe berdewam dike.

Dema ku ew li Helebê bûn, rewşa aborî ya Dr. Nafîz nebaş bû. Ji ber vê yekê, dostên wan û kurdên li Şamê îsrar dikin ku Dr. Nafîz muanexaneya xwe bibe Şamê. Ew di Kanûna 1930 de berê xwe didin bajarê şamê û wê şevê dibin mêvanê Elî Axayê Zilfo. Dema ew dikevin eywana malê, dibînin ku digel eşrafên wê taxê, eywan bi kurdên sirgûnkirî yên nas û mecburî îskan ve tije ye. Ekrem û Qedîrî Cemîl Paşa, Haco Axa û kurên wî: Hesen, Cemîl û Çaçan, Celadet Bedîrxan, Hemzeye Miksî û wd. hinek jî endamên wê civatê bûn.

“Em di jûra mêvanan de diman. Gelek caran em jî bîst kesan zêdetir li ser sifreyê berhev dibûn. Hema hema her êvarê Elî Axayê Zilfo û eşrafên mehelê (taxê) di jûra mêvanan de tevî civata me dibûn. Ji alîkî ve qehwa ereban û çay di hate vexwar, şekirê Şamê û fêkî di hate xwarin; jî aliyê din ve jî behsa ziman, sîyaset, felsefe û helwesta fransîzan di hate kirin. Belê, ez di şevên dirêj ên van civatan de hişyar bûm, gehîştim bîrewerîya neteweyî û li hemberê neheqîyên li ser mileta xwe serî rakir.”⁹

9 Zaza, Dr. Nûredîn-Bir *Kurd Olarak Yaşamım (Jiyana Min a Kurdî)*- r. 79, Nîsana 2000/ Stenbol - Weşanên Pêrî.

Nûredîn di rewşekî wisa de xwendina xwe ya Lîseyaya Fransîzî ya Şamê berdewam dike.

Piştî têkçûna Tевгера 1925an, gelek kadroyên тевгера rizgariya kurd mecbur mabûn ku derbasê Binê Xetê bibin. Di sala 1927an de bi beşdarbûna pirranîya kurdên sirgûn ên Binê Xetê, bi navê Xoybûnê rêxistineke nû hatibû avakirin. Xoybûnê gelek roşnîbîr, serokeşîr û eşrafên civata kurd anîbûn cem hev. “Baregaya komîteya navendî ya Xoybûnê li Beyrûdê bû, li bajarên wekî Şam û Heleb û Heskîyê, li welatê wekî Tirkîye û Iraq û Londra û Detroîtê jî şubeyên wê hebûn.”¹⁰ Xoybûn, di çarçova herêmî de, jî alîkî ve, jî bo bîdestxistina mafên kulturî yê kurdên Sûryê dixebitî û bi giştî jî giranîya xwe dabû li ser rêxistinkirina kurdên bakurê Kurdistanê. Dewleta Fransîz, jî sal 1921an ta sala 1946an, hêza mandater a Sûryê bû. Ne berdewamî be jî, li hemberê faalîyetên kulturî yên kurdan xwedî helwesteke nermtir û xweşbîn bû. Bi tevî vê xusûsiyeta wê, di sal “1928an de bi tesîra Xoybûnê, pênc parlamenterên di parlamentoya Sûryê de serî li mesulên fransîz didin, jî bo ku zimanê kurdî wek zîmaneke fermî bête qebûlkirin û li herêma kurdan bibe zîmanê perwerdeyîyê. Ev daxwaza wan wek prensîb neye redkirin jî, jî ber hinek sedemên teknîkî pêkhatina vê daxwazê mimkun nehate dîtin.”¹¹ Ji aliyê din ve jî, jî bo rêxistinkirina gelê kurd, ala şoreşê li çiyayê Agirî hatibû hilkirin. Îhsan Nûrî Paşa serokê leşkerî yê

¹⁰ Kovara *BÎR*, hej: 1, r. 49

¹¹ Kovara *BÎR*, hej: 1, r. 55

vê serhildanê bû û li Agirîyê pêşengîya şoreşê dikir. Li gor rêbaza stratejîk a ku hatibû diyarkirin, divîya li aliyê başûr ve jî cepheyekî şer bihatana vekirin û ji bo vê jî Celadet Bedirxan, ji mala Cemîlpaşa Ekrem û Qedîrî, Şêx Evdîrehmanê Garisî û wd. hatibûn wezîfedarkirin. Lê mixabin hewldanên wan bi ser neketin.

“Mîr Celadet Bedirxan, Qedîrî, Ekrem û Mihemed Cemîlpaşa, Haco Axa bi zaroyên xwe ve û Hemzeyê Miksî Ev hemû endamên civata Xweybûnê(Xoybûnê- S. V) bûn. Berî hatina me ya Sûriyê bi çend mehan, gava Îhsan Nûrî Paşa li Agirî şerê tirkên dikir, evan jî hilgirtibûn ser xwe ku ji aliyê Sûriyê êrîşê Tirkîyê bikin û bavêjne ser bajarên Mêrdîn, Mîdyad, Dîyarbekir, Urfa û hinê din. Lê ji ber kêma haziriyê, nedikarin karê xwe bibine serî û bi şûn de vegehiya bûn. Fransîzan jî, ji bo xatirê tirkên, ew girtibûn, ji sînor bi dûr xistibûn û ew anîbûn Şamê. Herwekî armanca wan bi cî nehatibû û rê li ber tevgera wan a siyasî hatibû girtin. Peyva van camêran, hîngê, ji her tiştî bêtir, li ser pirsên çandî û nemaze li ser xwendin û nivîsandina zimanê kurmançî bû. Her êvar gava mesela rûniştinê dihate dagirtin, min bi kêfxweşiyeke mezin guhdarî, danûstendin û temaşa pevcûnên wan dikir. Celadet Bedirxan elfabeke kurdî ya bi tipê latînî pêk tanî û dil dikir ku bi wan kovarekê derêxe. Ekrem Cemîlpaşa, Hemzeyê Miksî û hinekên din tede pir kêmasî diditin û bi hişkî lê radibûn. Lê, her wekî rehmetî Celadet bi gelek zimana dizanî, pir li Ewropa mabû, bi ser de

jî zor zîrek, bi hiş û huner bû, bala xwe dida rexne û gotinên xelkê û dixebitî ku şaşiyên xwe binase. Elfabeya xwe li gor dengên zimên pêk bîne û ji şîve û zaravayên têvel rêz û duzenên bîngêhî derêxe. Ew ji zû de li vî tiştî hûr dibû. Lê, li Şamê ev karê ha bûbû mijûlayîya wî ya hergavî. Di sala 1932an de, piştî ku elfabeya xwe danî û rêzimanek jî dirust kir, rabû destûra derxistina kovara "*Hawar*"ê wergirt.”¹²

Di sala 1932 de derçûna *Hawarê*, ji aliyê pêşxistina ziman û kultura kurdî ve pêngaveke pir girîng bû, lê zêde dewam nekir. Dewra yekemîn a *Hawarê*, bi derçûna hejmara 26an, di 18yê Tebaxa 1935an de bi dawî hat. Gelek sedemên rawestandina weşandin û belavkirina *Hawarê* hebin jî, yê herî girîng problema aborî bû.

Ji bo ku careke din *Hawar* bête belavkirin, diviya problema aborî bihata çareserkirin. Destpêkirina Şerê Cîhan ê Duyem, bû sedemê peydabûna piştgiyêkî nû yê *Hawarê*.

“Di sala 1941an de îngiliz ketibûn Sûrîyê û dixwestin hîngê kurd bi aliyê xwe de bîkşînin, ji bo tirsandina tirkên nav- bera xwe bi wan re xweş bikin. Ji lewre rê dan ku li Bêrûd û Ammanê kurmançî û soranî bêne weşandin û *Hawar* jî ji nû ve bête derêxistin.”¹³

¹² Zaza, Dr. Nûredîn-Pêşgotina *Hawarê*(çapa ku li Ewropa ji aliyê Hemreş Reşo ve hatiye kirin)-Lozan/1975

¹³ Heman jêder.

Nûredîn Zaza di Nav Rêza Nivîskarên Hawarê de ye

Nûredîn Zaza, di dewra duyemîn a derçûna Hawarê de, êdî bi çîrokên xwe yên tamxweş navêş, yek ji nivîskarên Hawarê ye.

“Hîngê, herwekî ez gihabûm, min xwe xweş hînî kurmancî kiribû, min jî tede dest bi nivîsandinê kir. Kêfa rehmetî pir ji çîrokên min re dihat. Ew sê, çar caran dixwendin. Gava ez diçûm mala wî û ku mêvan li wê pir biwana, dixwest ku ez bi xwe wan (çîrokan- S. V) ji wan re bixwînim. Hîngê radibû, ênîya min maçî dikir û digot: 'Tu Çekofê mey î, kirîvo Çekof!...' Rehmetî kirîvê min bû. Min çîrokên xwe hîngê bi navê Nûredîn Êsif dinivîsandin...”¹⁴

Dewra duyemîn a *Hawarê*, du sal dewam kir û weşana wê di sala 1943ê de hate rawestandî.

Dr. Nafîz ji sala 1933yan heta 1935an li Eyn Dîwar û Qamişloyê xizmeta gelê kurd kir. Dema ku Nûredîn di lîseyê Fransîz de dixwend, bûyerên derheqê kurdan de û bi taybetî jî qewimandinên Tevgera Dêrsimê li ser wî gelek tesîr dike. Ew, wê demê bi giştî li ser kurdan û bi taybetî jî derheqê bûyerên Dêrsimê û siyaseta tirkî de nivîsekî dinivîsîne. Digel hevalên xwe yên lîseyê û çend xwendevanên unîversîteyê grubekî pêk tînin ji bo belavkirina vê nivîsê. Pêşîyê nivîsê pêşkêşê muxtarê mehelê dikin û paşê jî dibine balyozxaneyên



Ji milê rastê ve: Nûredîn Zaza, Mistefa Mihemed Reşad. Yê Piçûk: Danîş Arîf Abbas

dewletên biyanî yên di Şamê de. Nûredîn Zaza, refleksen derbarê vê nivîsê de wisa tîne ziman: “Balyozan me bi kêfxweşî pêşwazî kirin û guhdar kirin, soz dan me ku dê gilî û gazindên me bigehînin hikumetên xwe. Lê mixabin her kesî li hember dramaya kurd xwe kerr kiribûn.”¹⁵

Zaza dibêje, ew gruba ku me ji bo belavkirina nameyê pêk anîbû, di sala 1937an de bû dendika damezrênerên Komela Hêvîyê. Komela Hêvî, ji bo Neteweyên Yekgirtî û Balyozxaneyên dewletên biyanî gelek nameyan dişînin û ancax dikare salûnîvek hebû

¹⁴ Heman jêder.

¹⁵ Zaza, Dr. Nûredîn-Bir *Kurd Olarak Yaşamım (Jiyana Min a Kurdî)*- r. 98-Nisana 2000/Stenbol, Weşanên Pêrî.

na xwe bidomîne. Piştî ev tecrube û hewldanan, mesela pêdivîya rêxistinbûnê êdî bîraveriya wî meşxul dike.

Sîyaset û kirinên hovane yên Dewleta Tirk li Dêrsimê û bûyerên destpêkirina Şerê Cihan ê Yekem, Nûredîn Zaza ber bi sîyaseta aktif ve dibin. Zaza dibêje:

“Serhatiyên miletê kurd û destpêkirina Şerê Cihan ê Yekem, gelek tesîr li ser min kir. Min dixwest di nav miletê kurd de bijîm, wan hişyar bikim û ji bo ku di rojên dahatû de karibin rewşa Rojhelata Navîn biguherin, diviya bihatana rêxistinkirin. Ev yek diyar bû ku nexşeya Rojhelata Navîn piştî Şerê Cihanî yê Yekem hatibû çêkirin û ji bo miletê kurd bûbû sedemê bûyerên felaket. Kurd, ji bo berjewendiyên dewletên gewre û gelên herêmê hatibûn qurbanî kirin. Ji bo ku vê carê em ji xafila neyin girtin û karibin mafê xwe yê rewa bidine qebûlkirin, xebata rêxistinê pirr girîng e.”¹⁶

Dema ku Nûredîn ev fikrê xwe ji Dr. Nafîz re dibêje, ew berîya her tiştî dixwaze birayê wî perwerdeyîya xwe berdewam bike. Bi tevî hemû şîret û pêşniyarên Dr. Nafîz, Nûredîn îqna nabe û ji ya xwe nayê xwarê. Piştî ku Dr. Nafîz dibîne Nûredîn di fikra xwe ya sîyasetê de biryardar e, vê carê dixwaze derbarê sîyasetê de hinek şîretan lê bike. Ji bo vê, Nûredîn Şamê terk dike û diçe Qamîşloyê li cem kekê xwe Dr. Nafîz. Wê demê Cegerxwîn jî li Qamîşloyê dimîn û li derûdora wî grubek kurdperwer

çêbûne. Nûredîn jî tevî vê grubê dibe û dest bi xebata rewşenbîrî ya nava xelkê dike. Di vê pêvajoyê de Nûredîn geh li Şamê, geh li Helebê. Geh li Beyrûdê û Qamîşloyê digere ji bo hişyakirin û rêxistinkirin kurdan. Di Nîsana sala 1942 de bûyereke balkêş û xeternak tete serê wî: dema ku ew ji bo şixulekî ji Şamê tete Qamîşloyê, li wir rastê nasekî xwe tê û ew nasê wî dixwaze ku ew jî digel wî bi trêne biçê. Piştî dudilîyekî, biryar dide ku digel wî hevalê xwe yê ticar bi trêne rêwîtiyê bikin. Nûredîn li ser îxbarekî, di rê de ji aliyê tirkan ve tete girtin, lê bi fîsetek xwe ji pencera trêne davêja û direve, ji destê wan difilite. Ev rev, bi mehan li gundên wê herêmê tete axaftin.

Nûredîn Zaza, ji alîkî ve digel hevalên xwe xebata rewşenbîrî û çandî berdewam dike, ji aliyê din ve jî bala wî li ser tevgera sîyasî ya çar aliyên Kurdistanê ye. Ew hemû pêkhatinên sîyasî yên di Kurdistanê de dişopîne. Di sala 1934an de Şêx Ehmed, Mele Mistefa û beşekî mezin ê Barzanîyan hatibûn dîrxistin ji bo Besrayê. Piştî dîrxistineka heşt salan, Barzanîyan ji Besrayê hatibûn vegehandin û li Silêmanîyê tabihê îskana mecburî kiribûn. Di vê navberê de, li başûr Kurdistanê di sala 1942 de bi navê Hîwa rêxistinek hatibû damezirandin û di nav demeke kurt de li gelek cîyan belav bûbû. Mistefa Barzanî û hinek hevalên wî disal 1943ê de bi alîkarîya Hîwayê ji Silêmanîyê direvin û tene herêma Barzan dest bi xebata çekdarî dike. Di nav demeke kurt de bi alîkarîya Hîwayê jî hêzên pêşmergeyên kurd orduya (artêşa) Iraqê dixin

¹⁶ Heman jêder.

tengasîyê û Nûrî Seîd mecbur dimîne ku daxwazên kurdan qebûl bike û Barzanî vexwîne Bexdayê. Di van hevdiînan de, mafê çandî û xwerêvebirina kurdan têtê qebûlkirin. Di encma vê pêşkevtinê de, nav û dengê Mistefa Barzanî li her derê belav dibe.

Nûredîn Zaza Ji bo Hevdiîna Digel Barzanî û Hîwayê, Berê Xwe Dide Başûrê Kurdistanê

Nûredîn Zaza dema ku li Beyrûdê bû, endamekî Hîwayê nas kiribû bi navê Amedî. Piştî ev pêşkevtinan, ew dixwaze bi rêvebirên Hîwa û Barzanî re hevdiînekê bike. Ji bo pêkanîna vê hevdiîtinê, daxwaza xwe ji Amedî re dibêje. Piştî demeke dirêj ev daxwaza wî têtê qebûlkirin û Zaza di Temmûza 1944an de berê xwe dide başûrê Kurdistanê. Şans ew şans e, roja dinê çawa ku derbasê alîyê Iraqê dibin, ji teref şurteyên(polîsên) Iraqê ve têne girtin. Pêşîyê wan dibin Zaxoyê û ji wê der jî dişînin Musilê. Li Musilê piştî îfadekirina wan, bi gumana casusîya almanan têne hepiskirin. Zaza, çend caran ji bo dadgehîkirinê serlêdana mudirê hepisxaneyê dike, lêbelê nikare ti bersîveke erênî ji wan bigre. Ji ber vê, 15 roj piştî girtina xwe dest bi manggirtina(rojîya) birçibûnê dike. Ev çalakiya wî deh roj dewam dike û dawîyê ji ber ku wan dişînin Bexdayê, dev ji çalakiya xwe berdide.

Dema ku ew li Musilê girtî bûn, grubek kurdên li Musilê gelek bi girtina wan re eleqeder dibin lê nikarin tiştêkî bidest bixin. Ehmedê Botî yê hevalê Zaza jî, yek ji van kesan bû.



Şam: ji milê rastê ve:
Nûredîn Zaza û Mistefa Paşe

Roja 2yê Tebaxê, bi trêne ji Musilê berê wan didin Bexdayê. Li Bexdayê, wan di hepisxaneyê merkezî ya herî gewre de bicî dikin.

Piştî ku ew têne Bexdayê, Elî Hemdî yê endamê Hîwa û mesulê Bexdayê roja hevdiîtinê serdana wan dike, ji bo wan gelek tiştên xwerin û lixwekirinê digel xwe tîne. Êdî şertên jîyana wan a hepisxaneyê li gorî berîya wê ber bi başî ve diçû û hewldanên ji bo berdana wan jî dewam dikir. Mistefa Barzanî bi xwe ji bo berdana wan, bi rêvebirên îngiliz û ereb re ketibû nav têkilîyê. Ji ber ku wê demê navbera wan û Barzanî nexweş bû, vê hewldanê li ser serbest berdana wan

pirr tesîr nekir, lê hewldanên wisa jî berdewam dikir. Piştî ku çar meh jî li Hepisxaneyê Merkezî ya Bexdayê de dimînin, berê wan didin kampa Amarayê, ku dikete başûrê Bexdayê.

Ev kampa ku dê biçûna, li wê derê şoreşgerê navdar ê kurd Mîr Hac û çend hevalên wî yên din jî girtî bûn. Çawa ku Mîr Hac Nûredîn û Amedî li wê derê dibîne, bi dilîniyek pirr germ wan hembêz dike û xêrhatina wan dike. Li vê derê xebera xêrê ji wî re tê û dibêjin di nav deh rojan de dê te berdin ji bo vegerandina Sûriyê.

Berîya ku Nûredîn derbasê Sûryê bikin, kekê wî Dr. Nafîz bi mudirê asayîşa Sûryê re têkilî danîbû, ku wî hetanî pêvajoya mehkemê hepis nekin. Nûredîn dibêje, piştî vegeerê, dema ku min li derîyê kekê xwe da, nîvê şevê bû. Çawa kekê min ez dîtîm, gelek kêfxweş bû, kelogirî bû û got 'dawîyê cardin çavê me te dît birayê min!'. Piştî vegeerê, heval û nas û nenas gelek însan têne serdana wî, zîyareta mêvanan bi hefteyan dewam dike.

Piştî van bûyeran, Nûredîn, biryar dide ku bi gotina kekê xwe bike û xwendina xwe berdewam bike. Ji bo vê armancê, ji Şamê diçe Beyrûdê. Qeyda xwe li Unîversîteya Fransîz a Beyrûdê, di beşa Zanistîya Sîyasî û Aborî de çê dike. Dema ew li vir dixweyne, digel xwendina xwe ya unîversîteyê, faalîyetên xwe yên sîyasî û kulturî jî berdewam dike. Di sala 1948an de bi tevî gelek xortên parçeyên di yên Kurdistanê li Beyrûdê Komeleya Xwendevanên Kurd dadimezrînin. Piştî ku xwendina xwe ya lîsansê li vê derê xilas dike, ji bo

xwendina doktorayê berê xwe dide Swîsrê.

Li vê derê jî Zaza, faalîyet û xebata xwe ya ji bo kurd û Kurdistanê didomîne. Di dawîya sala 1948an de li Parîsê civînek Neteweyên Yekbûyî çêdibe. Ew berîya çêbûna civînê, digel hinek hevalên xwe delegasyonêkî pêk tînin ku muxtirayek derbarê kurdan de pêşkêşê vê civînê bikin. Ji bo vê, dest bi hewldanan dikin, dixwazin yek û yek bi endamên civînê re hevdiîtinan bikin. Di van hevdiîtinan de yê ku bi germayî pêşwazîya wan dike, nûnerê Yugoslawî ye. Di dema ev hewldan û têkilîyan de, mesulê arşîvên Neteweyên Yekbûyî bangê wî dike, dibêje:

“Hun dizanin, li gor rêznameya Neteweyên Yekbûyî, divê mudaxaleyê karê navxweyî yê welatên endam neyête kirin. Ji ber vê, em nikarin mudaxeleyê karê navxweyî yê Turkîye, Iraq, Îran û Sûriyeyê bikin. Hun bi awakî fermî hemwelatîyên Turkîye, Iraq, Îran û Sûriyeyê ne, dema ku van dewletan we dikûjin û qira we tînin dibêjin, 'ev mesela me ya navxweyî ye, we eleqeder nake.' Ji ber vê yekê, Neteweyên Yekbûyî nikare tiştek jî bike.”¹⁷

Di Kanûna sala 1949an de, ew û şeş hevalên xwe Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa dadimezrînin û di kongreya yekemîn de serokê komelê têtê hîlbijartin. Ev Komele, bi navê

¹⁷ Zaza, Dr. Nûredîn-Bir Kurd Olarak Yaşamım (Jîyana Min a Kurdî), r. 144, Weşanên Pêrî, Nîsana 2000- Stenbol

Dengê Kurdistan kovarekî bi îngilizî, fransizî û kurdî diweşîne. Dema ku li Swîsrê weşandina kovarê tête qedexekirin, vê carê li Parîsê dest bi weşandinê dike û di nav demeke kurt de li gelek cîyan di nav xwendevanan de belav dibe. Bi gotina Zaza:

“Rojnameya me di nav demeke kurt de, ji alîyê xortên xwendevan û çape-menîya demokrat ve bi balkêşî û hezkirinê hate pêşwazîkirin. Pêşkevîna me, nerazîbûna partiyên komînîst ên dagirkerên Kurdistanê derxist holê. Ev partiyên dogmatîk ên Stalînîst, hebûna komeleya me diji yekîtî û berjewendîyên çîna karker qebûl dikirin û dixwestin ku ev komele ji holê rabe.”¹⁸

Heman demî, gava ku ji bo beşdarbûna Kongreya Ciwanên Demokrat ên Dinyayê, li Budapeşteyê têne vexwendin, li vê derê jî partiyên komînîst ên Rojhelata Navîn êrîş dibin ser wî û hevalên wî, di navbera wan de gengeşîyn dijar çê dibin, neheqî li wan tête kirin. Li vira jî, ancax bi piştgirîya partiyên çepgir ên Amerîka Başûr dikarin beşdarê kongirê bibin. Zaza dibêje: "ez mecbur mam ku di vê kongreyê de bi navê 'kurdan' bipeyvim, ku ez bi navê 'Kurdistanê' bipeyivama, dê hikumetên welatên Rojhelata Navîn bi dijarî partiyên xwe yê çepgir şermezar bikira." ¹⁹

Dema ku wî li Swîsrê dixwend, ji ber faalîyetên wî yê siyasî, sefareta tirk gelek aciz dibe û ji rayedarên Swîsrê re dibêjin ku ew li vir bimîne

em dê hemû xwendevanên tirk ji Unîversîteya Lozanê vekîşînin. Ji ber vê gefxwarina tirkan, polisê federal ji Zaza ra dibêje divê tu di nav panzdeh rojan de Swîsrê terk bikî û hatina te ya jo bo Swîsrê jî du sal qedexe ye. Hinek nasên wî yê ji wê derê, mudaxele dikin û ji wî re dibin kefil, ta ku xwendina xwe xelas bike, destûra mayîna wî dirêj dikin. Wî li Zanîngeha Lozanê xwendina xwe ya lîsansê temam kir û di mijara pedagojîyê de têza doktoraya xwe pêkêşe heman Umîversîteyê kir. Doktoraya wî li ser "*Herikana personalîst di ramana filozofê fransîz Emanuel Monnier*" bû.

Piştî ku Zaza li Swîsrê têza xwe ya doktorayê xelas dike, di dawîya Hezîran sala 1956an de, bi armanca xebat û xizmeta ji bo miletê kurd berê xwe dide Sûrîyeyê. Dema ku Dr. Nûredîn Zaza li Beyrûdê ji keştîyê peya dibe, dibîne ku kekê wî Dr. Nafîz û gelek dost û hevalên wan hatine pêşwazîya wî. Dr. N. Zaza dibêje gava ez ji keştîyê peya bûm, bi min re qenetekî wisa peyda bû, ku kurdên Sûrîyeyê ji min gelek hêvîdar in.

Lêbelê, li gor berîya çûyîna wî û vê gavê, li Sûrîyê jî gelek guherîn çêbû bûn. "Ev welat ketibû destê Cemal Evdîlnasir û peyayên wî yê Baasî û qewmîyên qirêj û xwînşwar de. Bi navê El Qewmîye El Erebîye û Wahda-el Erebîye (Yekîtiya Erebî) dixwestin hukmekî xwînê bajon, dengê azadîxwazan bidin birrîn, miletên ne ereb, nemaze kurdan, belawela, perîşan û şerpeze bikin û destê xwe dirêjî welatên ereban yê din bikin û wan bixin bin lepên xwe." ²⁰

¹⁸ Heman jêder- r. 144

¹⁹ Heman jêder- r. 146

²⁰ Zaza, Dr. Nûredîn- *Bîranîn*- r. 15, çapa yekem-2008/ Stenbol- weşanên Avesta.

Nûredîn Zaza: Serokê Partîya Demokrat a Kurd Li Sûryê

Di vê dema pêşkevîna Baasîzm û nijadperestîya ereban de, Dr. Nûredîn Zaza, di Unîversîteya Şamê de dibe mamoste û dikeve dersên sosyolojî û pedagojîyê. Wê demê li Sûryeyê, tu rêxistinekî tunebû ku hebûn û mafê kurdan biparêze. Dr. Nûredîn dibêje: "min wisa tesawir dikir, ku di nav çarçova dewleta Sûryê de, parastina nasnameya neteweyî ya kurd, ji bo rizgarîya neteweyî pir girîn e. Di vê çarçovê de rêxistinbûn ferz e."²¹ Ji bo vê armancê, bi tevî hevalên xwe yên din, xebat û hewlê berdewam dikin. Di dawîya sala 1957an de, xewna Dr. Nûredîn û hevalên wî pêk tête; Partîya Demokrat a Kurd Li Sûryê tête damezirandin. Dr. Nûredîn di 38 salîya xwe de wek serokê partî tête hîlbijartin û dest bi xebata xwe ya rêxistinî dikin.

"Partî, bi erebî û kurdî pirtûkan dertîne, kurdên welatparêz dicivîne û dixwaze bi hêzên demokrat û pêşverû yên ereb re peywendîyan deyne. Ew li dijî yekîtiya Sûrye û Misrê derdikeve. Çalakîyên wê bala polîsên siyasî, Mabahas, dikşînin. Roja 5ê Tebaxa 1960, qasî 15 serokên partîyê li Helebê tên girtin. 8ê Tebaxê Zaza jî dikeve dest. Di nav çend rojan de dora 5000 kurd, hin ji wan zarokên 12-15 salî, hatibûn girtin. Piştî çend rojên lêdan û çêkirina fişên polîsî piranîya wan hate berdan..."²²

Dr. Nûredîn Zaza, di hepisxaneyê eskerî ya Mezzeyê de tête hepsîkirin, ev zîndana reş bi navê Bastille ya Sûryeyê tête nasîn. Li vê derê gelek îşkenceyên giran li wî tene kirin. Ji wî dixwazin ku di derbarê PDKS; endamên wê, faalîyet û têkilîyên partîyê de agadarî bide wan. Bi tevî hemû îşkenceyên giran, Zaza ji wan re dibêje: "Ezê tenê ji we re bahsa partîyê û sebebê damezirandina wê bikim. Di derbarê endam û têkilîyê wê de qet agadarîya min nîne."

Dr. Nûredîn Zaza di derheq armanca damezirandina PDKS de weha dibêje:

"Di salên 1949an de li pey hev darbeyên eskerî li Sûryeyê çêbûn, di encam de tenê demokrasî tîk neçû, gav bi gav hemû mafên kurdan jî ji destê wan hatin girtin. Ji sala 1955an vir ve jî, herêmen ku di bin bandora şovenîzma Bassîyan de bûn, li wan deran di qahwexanê û aşxaneyan de guhdarîkirina mûzîka kurdî hate qedexekirin, xwendin û belavkirina pirtûkên kurdî hate qedexekirin. Yekîtiya siyasî ya Sûrye û Misrê pêşî li vê qirkirina kulturî negirt, bervajê wê siyasetekî dijiwartir, bêtir faşîst û nijadperest hate tetbîqkirin. Memurên kurd ên di derca bilind de, yên di nav artêş û polîs de, mamosteyên kurd hemû ji wezîfe hatin dûrxistin. Êdî em ne wêrin bi zimanê kurdî jî biaxivin. Dahatûya me tarî û nedîyar bûye. Ev me mecburê yekgirtinê dike. PDKS, ji ber vê hate damezirandin..

Ji xeynî ev gotin û agadarîyan, ez ne gotinek zêde dikim û ne jî kêmdikim."²³

²¹ Zaza, Dr. Nûredîn -*Bir Kurd Olarak Yaşamım (Jiyana Min a Kurdî)*, r. 152- Nisana 2000/ Stenbol Weşanên Pêrî.

²² *Kurmançî* (weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîse), hejmar: 4, Zivistana 1989

²³ Zaza, Dr. Nûredîn - *Bir Kurd Olarak Yaşamım (Jiyana Min a Kurdî)*, r. 160-Nisana 2000/ Stenbol Weşanên Pêrî,

Di pêvajoya mehkemekirinê de ji Zaza, Osman Sebrî û Reşîd Hemo re cezayên îdamê dihat xwestin. Di vê navberê de hem li hundir û hem jî li derve, hewldanên ji bo berdana Zaza û hevalên wî berdewam dikir. "Li Ewropa, heval û nasên Zaza ji ronakbîrên naskirî îmza berhev dikin û ji Nasir berdana girtiyên kurd dixwazin. Kurdên Ewropa, Iraq û Libnanê beşdarê vê kampanyayê dibin. Di dawiyê de mehkeme 1.5 sal ceza dide wan. Zaza û hevalên wî roja 8ê tebaxa 1961 têne berdan."²⁴

Dema ku Nûredîn Zaza li zîndanê bû, di navbera wî û hevalên wî yên derve de li ser siyaset û rêgezên partiyê nakokî peyda dibe. Ew prensîbên ku partiyê ji xwe re kiribûn bingeş, wekî: "Yekbûn û rizgariya Kurdistanê"²⁵ ji bo kurdên Sûryeyê giran didît. "Wî digot: ev slogan ne şaş e û ne jî neheq e, lê gelo kurdên Sûryê dikarin vî barî hilgirin?" Ev cûdahîya lênêrînî dibe sebebê dubendîya di nav Partiya wî de. "Gava doktor ji Zindanê derket, piranîya endamên partiyê xwe li dora wî dane hev û gotine em bi te re ne li dijî hevalên din. Lêbelê ji bo ku nebe sebebê veqetandinê û dubiriyê di partiyê de, ew ber bi tu lebat û gavan nehat. Û wî dît ku ev tiştekî gelek xerab e, menfeta gelê kurd jê nîne, belê dijmin jê fêde dike... Lewra ew dûrî xebata rêxistinî bû."²⁶

Di 28ê Îlona sala 1961an de bi serokatîya mîralay Nahlawî darbeyeke eskerî li Sûryeyê çê dibe û yekîtîya

Sûrye û Mîsrê tête fesihkirin. Ji bo damezirandina hikumeta nû, profesorê Unîversîteya Şamê Memun Kuzberî tête wezîfedarkirin û ji bo hîlbijartina nû, 11ê Kanûnê tête dîyarkirin. Li gor dîtina Zaza, serokê hikumeta nû, ji qata burjuvazîyê yekî lîberal û entellektuel e, ji bo bicîkirina azadîyên demokratîk gelek dilxwaz e, bi tevî vê, îqtidara esasî jî di destê orduyê de ye. Di rewşekî wisa de, endamên PDKS û alîgirên wî pirr dixwazin ku Zaza tevî hîlbijartinan bibe. Lê ew bi xwe dudil e. Bi mudaxelekirina kekê wî Dr. Nafîz jî, Zaza diçe Qamişloyê û 20ê Sermaweza 1961ê de, berendamtiya xwe ya ji bo hîlbijartinan radigehîne. Zaza û hevalên xwe digel grubên etnikî yên di, listeyek hevbeş derdixin û dest bi xebat û propagandayê dikin. Derketin û serkevtina listeya wan îhtîmaleke pirr mezin bû. Nijadperestên ereban qet tehamula vê yekê nedikirin. Rojekî berîya hîlbijartinê, bi hênceta ku Zaza di dema qedexekirî de propaganda kiriye, tête girtin. Bi tevî girtina Zaza, hevalên wî xebata hîlbijartinê berdewam dikin û heta piştî nîvroyê jî listeya wî di pêşîyê de ye. Bêtehamuliya hikumetê diteq; gelek wezîfedar û hevalên wî yên li ser sandoqan têne girtin, têne tehdîtandin û li wan didin. Di encam de bi zordarî û dijarî, sandoqên hîlbijartinê bi rayên alîgirên hikumetê têne dagirtin û listeya Zaza hîlbijartinê wenda dike.

Dr. Nûredîn Zaza ji bo îtirazkirina ji encamên hîlbijartinê re berê xwe dide Şamê. Dixwaze di derbarê vê neheqîyê de lêpîrsîn bête kirin. Ereba tehamula vê yekê nakin û ew vedigerin Zaza suçdar

²⁴ *Kurmançî* (weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîse), hejmar: 4, Zivîstana 1989

²⁵ Haco, Mecîd- *Kurdistan Press*, hej. 76, r. 12- 28ê Çirîya Pêşîn 1989

²⁶ Heman jêder.

dikin. Dibêjin: alîgirên te yên ciwan li Amudê, li ser dîwaran nivisîne "ereb, welatê me Kurdistanê biterkînin! Bijî Barzanî û delegeyê wî Nredîn Zaza!" Di encam de cardin Zaza tête destgîrkirin.

Bi tevî destgîrkirina wî, li ser daxwaznameyê lêpîrsîn jî dest pê dike. Hîn komiteya lêpîrsînê dest bi xebatê nekîrbû, darbeyeke eskerî nû hate kirin. Êdî darbe li pey darbeyan tê û li Sûryeyê bêistiqrarîya siyasî dest pê dike. Di 8ê Adara sala 1963 de, partîya Baas bi darbeyek eskerî tê ser hukmê û dest bi girtina welatparêzên kurd dike. Pêre firarîya Zaza jî dest pê dike. Li Şamê taxa kurdan, bibû cîyê sirgûn û firarîyên kurdên neteweperwer. Di rewşekî wisa de ew mecbur dimîne ku terka Sûryeyê bike.

**Reva Ji Zordestîya Baasîyên
Sûryeyê û Hewldanên Ji Bo
Agadarîya Çapemenî û Dîplomasîya
Rojnamegerî**

Dr.Nûredîn Zaza dema ku ji Sûryeyê derdikeve, bi rêwîtiyeke gelek zehmet û xeternak digîje Libnanê. Di rewşekî wisa de, tiştê ku dilê Zaza rehet dikir, geşbûna tevgera rizgarî ya başûrê Kurdistanê bû. Wê demê li başûrê Kurdistanê şerê di navbera kurd û Hikumeta Iraqê de, bi serokatîya Mistefa Barzanî her ku diçû bêtir germ dibû û Hikumeta Bexdayê xisti- bû tengasiyê. Baasîyên Sûryeyê çûbûn hawara Baasîyên Iraqê. Lê mixabin piştgirîya Baasîyên Sûryeyê têrî nekir. Hikumeta Bexdayê, ji bo dijberîya tevgera kurd, ji Turkîye û Îranê piştgirî xwest. Her çiqas ev herdu dewlet jî li

benda rojekî wisa bûn ku bi hev re Tevgera Rizgarîxwaz a Kurd têk bibin, bi berxwedana gelê kurd û mudaxaleya Rusyayê, ev hewldana wan ser negirt. Lêbelê di çapemenîya dinya û ereban de pîrr kêr dengûbasê Tevgera Barzanî dihate kirin. Zaza vê kêmasiyê dibîne û ji bo dagirtina vê valayîyê dest bi hinek hewldanan dike.

Di rewşekî wisa de geşbûna Tevgera Barzanî, morala Zaza xweş dikir û hêvîya wî xurttir dikir. Ji bo vê, wî dixwest dengê Tevgera Barzanî bigehîne raya giştî ya dinyayê û derewên dagirkeran derxîne holê. Ji bo pêkanîna vê armancê, dest bi hewldanên çapemenî û dîplomasîya rojnamevanî dike. Li Libnanê bi gelek rojnamevanên herêmî û Ewropî re têkilîya wî hebû û derbarê doza kurd û bûyerên Şoreşê Îlonê de agadarî dida wan: Dana Schmîdt (Emerîkî), Rîcard Andereg (Swîsrî), Jorî Bîterê (berpîrsyarê Civata Rojnamevanên Bîyanî Li Libnanê), Hottîngerê (Swîsrî), Mîrkoyê (Yoxoslawî), Brady Willam Carter, Joe Morris, Hygleceyê (Emrîkî), Kurt Gebauer, Raînazîz, Harald Voeke, Rudolph Chemellî (Elmanî) Bardaud (Fransîz.) û wd. Her weha bi gelek rojname, Tv. û radyoyên Libnanî û bîyanî re têkilîya wî hebû. Bi alîkariya nûnerê Barzanî, hinek rewşenbîrên kurd û rojnamevanan, derewên Baasîyên nijadperest û hikumeta Bexdayê derdixîne holê. Deng û rewşa rastîn a Tevgera Rizgarîxwaz a Kurdistanê Başûr digehîne raya giştî ya dinyayê.

Ji ber belavbûna ev dengûbasên Tevgera Barzanî, Baasîyên nijadperest û Hikumeta Bexdayê gelek aciz dibin.

Lewma, Hikumeta Bexdayê ji bo ku çapemenîya Libnanê bêdeng bike, ji alîkî ve hewl dida ku hinek rojname û rojnamevanan bikirre yan jî bi ruşwetê bêdeng bike. Ji alîyê din ve jî lê digeriya ku çavkaniya van agadarî û hewldanan bizane. Piştî ku Nûredîn Zaza wek çavkaniyeke girîng ê van agadarî û dengûbasan hate tespîtîkirin, ji bo girtina wî hewldanên sefareta Iraqê ya di Libnanê de dest pê dikin û di encam de Nûredîn Zaza ji alîyê asayîşa Libnanê ve di 15yê Sibata 1966an de tête destgîrîkirin. Ji bo berdana wî gelek hewldan têne kirin, lê encameke erînî nadin. Wî di 21ê Nîsanê de ji nav sînorên Libnanê derdixin û berê wî didin Ammana Urdinê. Rayedarên Urdinê wek penaber wî qebûl nakin û paşve vedigerînin Libnanê. Polîsên Libnanî, di 23yê Nîsanê de berê Zaza didine Sûryeyê.

Wê demê Sûrye û Iraq, welatên darbeyên eskerî bûn. Li van herdu welatan darbe li ser darbeyan çêdibû. Li Sûryeyê, darbeya herî dawî di 23yê Sibata 1966an de çê bûbû. Yanî roja ku Nûredîn Zaza vedigerînin Sûryeyê, wê rojê darbe çê bibû. Dema ku ev darbe çêbû, serokê Partîya Baasî ya Sûryeyê Salah Cedîd bû. Di wê hengameyê de cardin tirs û xofa Girtîxaneyê Mezzeyê tête ser dilê Zaza. Vê carê her çiqas Zaza nebin Girtîxaneyê Mezzeyê jî, di wê rewşê de şertên hemû girtîxane û zîndanên Sûryeyê, kêm-zêde wekî hev in. Girtina vê carê jê re gelek giran tê û ji bo ku ji vê ezabê (zulmê) xilas bibe dixwaze xwe bikuje, lê bi ser nakeve. Mesulên girtîxaneyê ji hewldana wî ya

xwekuştinê agadar dibin û ciyê wî diguherînin. Nûredîn Zaza, bi alîkar û teselîya kurdek girtî yê di zîndanê de, dev ji fikra xwekuştinê berdide.

Vê carê jî Zaza, nêzikê heft mehan di Girtîxaneyê Şêx Hesên de dimîne. Piştî ku ji Şêx Hesên xelas dibe, wî dişînin Cebel Dûrziyê (çiyayê Dûrziyan) û li wê derê bi nîv azadî di bin çavdêriyê de jiyana xwe didomîne. Dema ku Sûrye di bin mandatêrîya Fransayê de bû, rayedarên Fransîz erebên neteweparêz sirgûnê vê derê dikirin. Vê carê jî rayedarên ereb, kurdperweran sirgûnê vê derê dikira. Nûredîn jî wê zivistanê jiyana xwe li Cebel Dûrziyê derbas dike. Di Nîsan 1967an de, wî ji Cebel Dûrziyê dişînin Şamê. Li vî bajarî jî jiyana xwe di bin çavdêriya Mebahesên Baasîyan de derbas dike.

Nûredîn Zaza Piştî 38 Salan Carekî Dî Li Diyarbekirê ye

Di havîna 1967an de, germahîya îqlîma Rojhelata navîn bi pevçûna dewleta Îsrail û erban hîn germtir dibû. Pêre jî her rojekî derbas dibû, zîlm û zordariya ereban, Dr. Nûredîn bînteng dikir. Ji alîyê din ve jî, merivên wî dixebitîn ku wî îqna bikin û bînin ser axa bav û kalan, bakurê Kurdistanê. Dr. Nûredîn vê fikrê jî heval û dostên xwe re jî aşkera dike û dibêje, ku ez li vir bimînin, dewleta Sûryeyê ji min re tenê jiyanê nîvmirî û zîndanên tarî rewa dibîne, ya rasttir ew e ku ji vir derkevim.

Piştî dayîna biryara derkevtinê, 8ê Tebaxê bi alîkariya qaçaqxîyan ji Binê Xetê derbasê Serê Xetê dibe. Ew şev,

digel xwarzîyê xwe li gundê Girêşora Nisêbînê derbas dikin û roja dî di şefe-qa sibê de bi rê dikevin, berê xwe didine Dîyarbekirê. Piştî 38 salan, Dr. Nûredîn Zaza ji derîyê Mêrdînê de dikeve bajêr û rewşa wê gavê ya bajêr wisa tarîf dike: "Ji xeynî caddeyê ku ber û berê bedenên hatibû çêkirin, rewşa xaniyên ku ji bazaldê reş hatibûn çêkirin tiştêkî nehatibû guhartin. Zikakên wî pirr qelabalix bûn, tije însan bûn. Ji sala 1930 vir ve nifûsa Dîyarbekirê pênc kat zêdetir bibû; ji 40.000an gihîştibû 200.000an."²⁷ Wê rojê heta nîvro li Dîyarbekir dimînin û piştî nîvro berê xwe didine ber bi Arxenîyê. Di êvara wê rojê de jî diçin Elezîzê li mala birayê xwe.

"Birayê min ê Reşo ji sala 1950î vir ve li Elazîzê dima û min wî nedîtibû. Ew ji listeya Partîya Demokrat du car ji bo parlementerî hatibû hilbijartin, ji kurdan û her cûre çalekiyên derbarê kurdan dûr ketibû. Piştî demekî biguman, êdî tirkan bawerî bi wî kiribû. Ji ber vê, li wê derê bûyina min, ji bo têkilîyên wî û tirkan tehlûkeyek bû. Bi tevî vê yekê, wî û zarokên xwe, bi hesret û kêfxweşîyê pêşwazîya min kirin. Min li wê derê gelek rojên xweş bihûrandin."²⁸

Piştî demekî, polis û îstixbarata Tirkîyê pê dihesin ku Dr. Nûredîn Zaza li Elazîzê dimîne. Ji ber vê, Zaza mecbur dimîne ku Elazîzê jî biterkîne û berê xwe dide Stenbolê. Ew û mesulên hikumeta Tirkî du sal hev

dibin û tînin, ji bo wergirtina destûra rûniştinê. Birayê wî, vê meselê digehîne heta Demîrel û wezîrê navxweyî yê wê demê, cardin nikarin vê meselê çareser bikin. Dr. Nûredîn Zaza heta sala 1970ê niv-veşartî li Tirkîyê dimîne û dibêje "Gava hiku- meta Tirkî bi min hesiya, min ji tabîyetîya tirkî derxistin û xwest min bigrin û vegeyînin Sûryê, min lez da xwe û ji Tirkîyê derketim. Hatim Elmanya û ji wê jî çûm Swîsrê."

Zaza, li sala 1972, di 53 salîya xwe de bi rojnamevaneka Swîsrî re dize-wice, ku ew li ser mesela kurd şareza bû û li Kurdistan Bakur jî geryabû. Piştî salek, kurekî ji wan re çê dibe û navê wî Şengo Valéry lê dikin.

Dr. Nûredîn Zaza xebata xwe ya sîyasî û kulturî li Swîsrê û welatên din ên Ewropî berdewam dike. Armanç û xeyala wî, pêşxistina doza kurd û pêkanîna yekîtiyeke neteweyî bû. Ew sedemên sernekevîna tekoşîna rizgarî ya miletê kurd weha tîne ziman: "Mejîyê eşîrtîyê di nav kurdan de, parçebûna Kurdistanê, pîrbûna neyarên miletê kurd, kêma an jî nebûna dostên wan bûne sedem ku şoreşên kurd neçin serî."³⁰

"Nûredîn Zaza di sala 1978an de, bi belavokek vekirî ji hemû rêxistinên Kurdistanî damezirandina enîyeke niştimanî û pêkanîna kongreyeke Kurdistanî xwest.

Her weha di sala 1979an de ji bo hevkarî û tevkarîya rêxistinên Kurdistanî, di damezirandina Partîya Yekbûnê de beşdar bû û ta dawîyê di

²⁷ Zaza, Dr. Nûredîn - *Bir Kurd Olarak Yaşamım (Jîyana Min a Kurdî)*, r. 160- Nisana 2000/ Stenbol Weşanên Pêrî.

²⁸ Heman jêder- r. 248

²⁹ Zaza, Dr. Nûredîn - *Biranîn*- r. 143- çapa yekem 2008/Stenbol-weşanên Avesta.

³⁰ *Kurdistan Press*, hej. r. 51, 8-9, 8ê Kanûna 1988, 15 Tîrmeh 1979

serkirdayetîya wê de xebitî.”³¹

Ew, di sala 1983 de, ji bo pêşxistina xebatên li ser ziman û kultura kurdî dibe yek ji hîmdarên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê. Wî digot:

"Gelî Kurdan!, Heke hun naxwazin ji hev tarûmar bibin û wenda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Lê heke dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin; bi havaltî û dostaniya miletên din re pêş ve herin; û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.”³²

Dr. Nûredîn Zaza, merivekî dilsoz ê dozê bû û wî tekoşîneke bi rûmeta a neteweyî û jiyanêke tijî diwarî derbas kir û di roja 7/10/1988an de ji ber nexweşîya penceşêr(kanser)ê li nexweşxaneyê Lozanê wefat kir û li goristana wî bajarî hate veşartin.

Pirtûk û Nivîsên Nûredîn Zaza

Nûredîn Zaza merivekî piralî bû, ew siyasetmedar, çîroknivîs, zimanzan û roşnbîrekî kurd bû. Ji ber vê, gelek nivîsên wî yê cûr bi cûr hene. Wî pêşîyê di kovara Hawarê de, bi çîrokan dest bi nivîsandinê kirîye. Di kovara Hawarê de bi navê Nûredîn Ûsif çîrokan dinivîsîne. "Celadet Bedirxan gelek kêfa xwe ji çîrokan wî re dianî û ji wî re digot: "Tu Çekofê me yî kirîvo, Çekof!..."³³ Digel Hawarê, wî di gelek

rojname û kovara de nivîsandîye. Roja Nû, Dengê Kurdistan û Hêvî çendek ji kovarên kurdî ne, ku nivîsên wî têde hatine weşandin. Ew berhem û nivîsên wî yên ku em jê agadaram:

* Berhevoka ku ji nivîsandinên roj-nameyên ereban pêk hatibû bi navê *Gotinên Ereban Li ser Pîrsa Kurd* (Beyrûd)

* *Şerê Azadî*- Helbest/Beyrûd (Li ser Şoreşa Kurdistanê Başûr)

* Bi navê *Bîranînek*, nivîsa ji bo Komcivîna Afro-Asiyawî li Qahîre (1963)

* Wergerandina *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî li ser zimanê Fransîzî

* Memê Alan

* Nivîsên di rojname û kovarên Fransîzî de

* Nivîsandina gelek meqaleyan bi zimanê fransîzî û erebî di rojname û kovarên Libnanî de

* Wergerandina *Şivanê Kurd* li ser zimanê fransîzî

* Wergerandina pirtûka Bazîl Nikîtîn a bi navê "*Kurdan*"

* Bi zimanê firansîzî Ma vîe de kurde (*Jîyana Min a Kurdî*) 1982- Swîsrê

* *Bir Kürt Olarak Yaşamım*- Birinci Baskı- Nisan 2000/İstanbul-Peri Yayınları- İSBN: 975-8245-32-5




* *Bîranîn*- Çapa Yekem-2008/ Stenbol, Weşanên Avesta- İSBN: 978-9944-382-44-1

* *Gulê* (Berhevoka Çîrokên Wî)- Çapa Yekem-Gulana 2007/ Dîyarbekir - İSBN: 978-975-6179-30-7

³¹ Hemreş Reşo, *Kurdistan Press*, hej. r. 51, 8-9, 8ê Kanûna 1988

³² *Kurdistan Press*, hej. 44, r. 1, 20ê Çirîya Pêşîn 1988

³³ Zaza, Nûredîn-*pêşgotina Hawarê* (çapa nû ya ku ji aliyê Hemreş Reşo ve hatiye kirin)



Mele Mehmûdê Bazîdî

(1799-1867)

Ziya AVCI

Mele Mehmûdê Bazîdî, di sala 1799an de (di hinek çavkanîyan de 1797 e) li Bazîdê hatiye dinê. Li eynî ciyê dest bi xwendina medreseyê kiriye. Piştî temamkirina xwendina xwe, çûye Tewrîzê û hînê farisiyê bûye. Pişt re hatiye Bazîdê û li wir dest bi seydatiyê kiriye. Lê dema ku dawîn mîrê kurd ê Bazîdê Behlûl Paşa dişkê û birayê wî di şerekî di navbera Dewleta Osmanî û Rûsyayê de tê kuştin û rewşa malbata wan a ticarî xerab dibe, ew biryar dide ku ji bajarê xwe dûr bikeve. Li ser vê, ew derbasê bajarê Erziromê dibe û li wir di hucreyan de dest bi meletî û seydatiyê dike. Di nav civata kurd ya wê demê de, xwediyê cihekî bilind û bi paye bûye. Her çend di derheqê malbata wî de gelek kêma agahdarî di destê me de hebin jî, lê em ji gelek bûyerên qewimîne û ew rêz û siyaneta

ji Mele Mehmûdê Bazîdî re hatiye kirin, derdixin ku ew ji malbateke payebî- lind e. Hem bi xwe jî bi îlm û perwerdeya dîtiye, di nav civatê de bûye xwediyê cihekî ku cihê rêz û hurmetê be. Pişt re jî ku em ê di rêzên bên de li ser bisekinin, nasîna wî bi konsolosê Rûsyayê yê Erziromê rojhatnas Alexandere Jaba (1803-1894) re çêdi- be û herdu bi hev re xebateke pîralî, têrberhem û hêja dikin.

Berîya em derbasê behsa dîroka jiyana Mele Mehmûdê Bazîdî û xebatên wî yên serbixwe û yên bi A. Jaba re çêbûne bikin, ez hewce dibînim bi çend gotinan jî be, A. Jaba jî bidim naskirin. Ji ber ku A. Jaba li ser perspektîv û metoda xebata ji aliyê Mele Mehmûd ve hatine kirin, roleke mezin leyîstiyê.

Alexandere (Auguste) Jaba (1803-

1894), di sala 1804an de li Polonyayê hatiye dinê û bavê wî kesekî gundî yê xwedî milkekî zêde bûye û eslê xwe cuhî ne. Di sala 1824an de di wezaretê derve de dibe werger. Di sala 1828an de xwendina xwe ya bilind xelas dike. Di sala 1830an de, di beşa zimanên rojhilatê de, dibe wergerê zimanê tirkî. Di sala 1832an de bi wezîfe diçe Stenbolê û di sala 1835an de jî cardin ji aliyê wezaretê derve ve li Îzmîrê tê wezîfedar kirin. Di sala 1843an de, li ser biryara serokatîya meclîsa împaratoriye, dibe sekreterê dîwana serokatîye û di sala 1848an de jî dibe konsolê Erziromê. Ev wezîfeya wî heta sala 1869an dewam dike. Li wir li ber destê Mele Mehmûdê Bazîdî kurdî jî hîn dibe.

Ew yek ji wan kesan e ku di sedsala 19an de, damezrênerê destpêkî yê lêkolîna edebiyata kurdî bê hesêb kirin. Ev wezîfeya han ji aliyê Akademiya Zanistî ya Bilind a Petersburgê ve jê re tê dayîn. Ew jî birrek mele û zanayên kurd li dora xwe berhev dike û bi alîkariya wan dest bi berhevkirin, lêkolîn, werger û nivîsandina destnîvîsên kevin ên kurdî dike. Mele Mehmûdê Bazîdî, di nav wan meleyan de ê herî zîrek û zana bûye. Pişt re jî bi A. Jaba re wekî sekreter û mamosteyê wî kar dike.

Belê, ji ber vê nêzîkatîya Mele Mehmûdê Bazîdî bi A. Jaba re, em dixwazin bi çend gotinan jî be ji devê A. Jaba bi xwe nas bikin: "...wî ziman û edebiyata farisî, erebî û tirkî jî xwendîye û van zimanan baş dizane... Ew di nava hevalên xwe de ji hemîyan zanatir bû... Di nava rewşenbîrên welat de jî

gelek bi nav û deng û bi qedir bû... Piştî sala 1856an Mela Efendî bû seydayê min û di derbarê dîrok, ziman û kultura milletê kurd de alîkariya min kir. Ew karê ji min re hatibû sipartin, yanî hînbûna zimanê kurdî û berhevkirina materyalên bi zimanê kurdî, min di saya rewşenbîrê kurd, Mele Mehmûdê Bazîdî de ew dan hev. Pişt re min ew destnîvîs ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şandin..."

Em ji wan nivîsên gelek kêr ên li ser Mele Mehmûdê Bazîdî hatine nivîsandin hîn dibin, ku beriya ku ew A. Jaba nas bike, li ser dîrok û kultura kurd xebatên wî hebûne. Lê dixuyê ku A. Jaba hem di berhevkirina van destnîvîsan de û hem jî di kitêbên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin de, hander bûye û ji bo metodolojiya bi van awayê xebatan, gelek tişt pêşniyarê wî kirine û jê re bûye rênîşander. Yanî em dikarin bêjin, ev herdu zanayên hêja hevûdu temam kirine. Her çend A. Jaba ew bi seydayê xwe bi nav kiribe jî, em dikarin bêjin, herdukan jî ji hevûdu ra seydatîyê kirine.

Belê me got beriya Mele Mehmûdê Bazîdî A. Jaba nas bike, bi kultur û dîroka kurd re mijûl bûye. Ne tenê di herêma xwe de, heta li seranserê Kurdistanê, kesekî gelek bi siyanet û qedirbilind bûye. Bêguman ev jî ji ber alimî û zanetîya wî bûye. Îspata van gotinên me jî ev e, ku di dema serhildana Mîr Bedirxan Beg (1847) de, ji aliyê sultanê Osmanî Ebdulmecîd ve wezîfeya îknakirina Mîr Bedirxan Beg ji bo nekirina şerekî bi Osmaniyan re ji Mele Mehmûdê Bazîdî re tê dayîn û ew

jî diçe Cizîrê li ba Mîr. Ji aliyê çavkaniyên cihê cihê ve ev bûyer bi vî awayî tên neqilkirin:

Sultan Ebdulmecîd, Mele Mehmûdê Bazîdî ji bo ragirtina şer û serhildana li dijî dewleta Osmanî, dişîne Cizîrê li ba Mîr Bedirxan Beg. Dixuyê ku nasiya Mîr Bedirxan Beg û Mele Mehmûdê Bazîdî beriya vê bûyerê bi hev re hebûye. Wî wextê serleşkerê Osmanî Osman Paşa ye û beriya Mele Mehmûdê Bazîdî biçe Cizîrê li ba Bedirxan Beg, wî ji vê çûna xwe û wezîfeya jê re hatiye sipartin agahdar dike û jê re dibêje, heta ez cewabekê ji Bedirxan Beg nestînim, gereke hereketê eskerî çênebe. Lê dixuyê, Osman Paşa kesekî terefdarê şer e û li hêviya cewaba Mele Mehmûd nasekine û diçe ser Cizîrê. Lê dema ew digihîje li wir, dibîne ku amadekariya Bedirxan Beg ji bo şerekî gelek bi rêk ê pêk in. Li ser vê, ew ji vê rêkûpêkiyê Mele Mehmûdê Bazîdî tawanbar dike û jê re dibêje, ku wî Bedirxan Beg hişyar kiriye û sirrên wan gihandiye Bedirxan Beg. Ji ber vê, Osman Paşa, Mele Mehmûd dide girtin û ew qeyd û lele dike û dişîne Stenbolê. Lê qasek şûn de ew ji aliyê sultan ve tê efûkirin û wî dişînin Wanê.

Dema ku ew li Wanê bûye, şerê di navbera Xan Mehmûd û Osmaniyan de berdewam e. Cardin dewlet ew bi handana vî şerî û têkiliyên wî bi serokê serhildanê Xan Mehmûd re tawanbar dike. Li ser vê, wî digrin û panzdeh roj li Wanê di zindanê de dimîne. Lê pişt re wî berdidin, ew tehdîd dikin û tim di bin çav de didin girtin. Bêguman di demeke wiha de berdana wî ji ber tirs

rewşa Mele Mehmûd a civakî ya di nav kurdan de û melhezeya firehnekirina cebheyek li dijî Osmaniyan bûye.

Mele Mehmûdê Bazîdî, yek ji wan zana û rewşenbîrê kurd ê sedsala 19an ê herî têrberhem e. Lê sed mixabin, qasî vê têrberhemî, zanatî û bi xebatên xwe yên li ser mijarên cihê cihê yên di derbarê dîrok, ûrf û adet, çîrok, wer-ger û gelek milên din ên neteweyê xwe de jî, bi taybetî di nav me kurdên bakur de, gelek kêman hatiye naskirin. Heta ev kêmnasî gihîşte seviyek wisan ku ev sala em tê de (2008), antolojiya sedûdeh mezinên kurd derket, lê mixabin me navê Mele Mehmûdê Bazîdî tê de nedît.

Ew yekem rewşenbîr û zanayê kurd e ku di sedsala 19an de, di hemî danûsitandin û xebatên xwe de tenê zimanê kurdî bikar aniye. Her wekî em dizanin, bi taybetî di sedsala 19an de, farisî û erebî di nav zana û rewşenbîrên kurd de gelek di rewacê de bûne. Hema bêje nêzikî temamê zana û rewşenbîrên kurd di karên xwe yên nivîsandinê de, ev herdu ziman bikar anîne. Lê em dinêrin Mele Mehmûdê Bazîdî bi eksê vê hereket kiriye. Di hemî kar û barên xwe de û ew kitêbên ji aliyê wî ve hatine nivîsandin, bi kurdî ne.

Berhemên Mele Mehmûdê Bazîdî

Şerefname:

Mele Mehmûdê Bazîdî, yekem kes e ku cara ewil cilda yekê ya *Şerefnameya* Mîr Şeref Xanê Bedlîsî ji orjî-nala wê ya farisî û li ber ew nusxeya ji

aliyê Zêrnov ve hatiye amadekirin, werge- randiye li ser zimanê kurdî. Wî ev xebat di sala 1858an de temam kiriye. Piştî sedûpênceh salan jî, dema ku mirov îro ew dixwîne, kurmanciya wê ya wê demê zewq dide mirov û mirov jê têr nabe. Lê mixabin, Mele Mehmûdê Bazîdî bi ser hinek mijaran re gav daye û ew wernegerandine. Mesela: temamê Mîrektiya Eyyûbiyan û Ýmadiyeyê qismek ji Mîrektiya Hekariyê wernegerandiye û sefheya çaran a li ser Mîrektiya Bedlîsê jî wekî kurtebirî wergerandiye.

Di sala 1986an de, ji vê wergerê re, ji aliyê Kanadê Kurdo û J. C. Musaelyan ve pêşgotineke hêja hatiye nivîsandin û ew wekî destxet bi xwe hatiye çapkirin. Di sala 2007an de jî, ew destxet ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatiye transkirîpte kirin û ji aliyê Weşanxaneyê Spîrêz a li Duhokê ve hatiye çapkirin.

Kitaba *Tewarîxê Cedîdê Kurdistan*:

Ev kitêb ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatiye nivîsandin. Lê mixabin ew wenda ye. Hete niha gelek hewil hatiye dayîn, lê ew bêyî netîce mane. Li gor ew agahdariyên ji aliyê A. Jaba ve hatine dayîn, ew pêşgotina ku ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêbê re hatiye nivîsandin û A. Jaba ew wergerandiye fransîzî û heta niha hatiye parastin û gelek kesên din ku di derbarê vê kitêbê de nivîsandine, em bi hindikayî jî be di saya van de, di derbarê vê berhemê de dibin xwediyê zan-yariyekê.

Mele Mehmûdê Bazîdî, di sala

1857an de dest bi nivîsandina vê kitêbê kiriye. Ew yek nusxe tenê hatiye nivîsandin û hecma wê nêzîkî hezar rûpelan bûye. A. Jaba ew bi pêşgotina pênçeh rûpelan pêkhatî (A4) ya ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêbê re hatiye nivîsandin, wergerandiye fransî û ew di 30yê adara sala 1867an de ji bo zana û rojhilatnasên rûsî di vî warî de nêrînên xwe bêjin û vê xebatê binirxînin, ji Akademiya Zanistî ya Peterborgê re şandiye.

Wekî me got, ji bo ku kitêb bi xwe wenda ye û heta niha gelek kes hewil dane ku ew bidest bixin, lê ev hewildan bê netîce mane. Ji ber vê, ez pêwîst dibînim ku li vir hinek dirêj li ser vê berhema hêja bisekinim. Ji bilî vê, em ê ew pêşgotina Mele Mehmûdê Bazîdî ya ji vê berhemê re niîsandiye û ji aliyê A. Jaba ve wergera wê ya fransîzî hatiye kirin, Y. Y. Vasilîva jî di lêkolîna xwe ya li ser "*Kitêba Wenda Ya Dîroka Kurdistanê*" de behs kiriye û wê pêşgotinê jî weşandiye, dê em ê jî kurtiya wê di dawiya vê maqalayê de biweşînin.

Mirov hem ji ew pêşgotina ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ku ji kêtibê re hatiye nivîsandin û hem jî ew naveroka (fîhrîst) jê re hatiye amadekirin, bi awakî baş di derbarê kitêbê de agahdar dibe. Ji bilî vê, cardin mirov ji vê naveroka jê re hatiye amadekirin û ji vê pêşgotinê fêhm dike ku Mele Mehmûdê Bazîdî xwestiye berhemeke wekî ya *Şerefnameya Şeref Xanê Bedlîsî* biafirîne. Ji ber vê jî wî û kitêba wî *Şerefnameyê* wekî mînak ji xwe re hîlbijartiyê. Cardin em ji naveroka wan herdu nivîsên di derbarê kitêbê de

hîn dibin, ku ew li ser bûyerên di navbera salên 1785-1857an ên di beşeke zêde ya Kurdistanê de qewimîne sekiniye. Wekî min li jorê got, em ê pêşgotinê bi serê xwe biweşînin, lê ew naveroka jê re hatiye amadekirin, em ê li vir pêşkêşê xwendevanan bikin:

Fîhrîst (Naverok)

Beşê yekê: Bûyerên ji sala 1785an heta sala 1857an yên li wilayeta Erziromê qewimîne.

Beşê duduyan: Bûyerên li êrdêma Rojkî, ku bajarên wê yên serekî Bedlîs û Mûş in.

Beşê sisyan: Bûyerên êrdêma Mehmûdî, ku jê re Mehemedan dibêjin û bajarê wê yê sereke Xosêb e. Beşê çaran: Bi kurtî bûyerên li wilayeta Wanê qewimîne.

Beşê pêncan: Bi kurtî bûyerên li Hekarê qewimîne.

Beşê şeşan: Bûyerên li Rewandizê qewimîne.

Beşê heftan: Bûyerên Behdînan, ku bajarê wê yê sereke Amêdê ye.

Beşê heştan: Bûyerên li Botan qewimîne, ku bajarê wê yê sereke Cizîr e.

Beşê nehan: Bûyerên êrdêma Silîvan, ku bajarê wê yê sereke Bazîd e.

Beşê dehan: Bûyerên Qersê û dagîrkirina wê bi destê rûsan.

Beşê yanzdehan: Bûyerên Azerbeycanê û her wiha yên Xoyê, Tebrîzê, Yêrîvanê, Ûrmê, Meraxê û Makûyê qewimîne.

Belê, em dibînin kitêb ji yanzdeh beşan pêk hatiye û her beş li ser mîrek-tiyek kurdan e. Em ê cardin li vir

dubare bikin û bêjin, bi hêviya ku rojek ji rojan ev berhema hêja bi dest bikeve.

***Adet û Rusumatnameyê
Tewayîfê Ekradiye:***

Ev kitêb ji alêyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatiye nivîsandin. Ji aliyê A. Jaba ve wergera wê ya fransîzî hatiye kirin. Pişt re di sala 1963an de, ji aliyê Rodenko ve li Moskovayê wergera wê ya rûsî hatiye kirin û li Moskovayê hatiye weşandin. Wergerên wê yên bi zimanên din jî hene. Transkirîpsiyona wê ya kurmancî jî hatiye kirin. Lê mixabin gelek şaşî tê de hene. Ez hêvîdar im ku careke din ji nû ve bê transkirîpte kirin. Ev kitêb yekem lêkolîna civaknasî, etnolojî û etnografî ya li ser kurdan e ku bi kurdî hatiye nivîsandin.

***Ferhenga Kurdî-Fransîzî
(Dictionnaire Kurde Francais):***

Mele Mehmûdê Bazîdî di nivîsîn û amadekirina vê ferhenga kurdî-fransîzî de alîkariyeke gelek mezin daye A. Jaba. Ev ferheng hatiye çapkirin û ew yek ji wan xebatên herî hêja yên bi hev re ya A. Jaba û Mele Mehmûdê Bazîdî ye. Di piyaseyê de gelek kêma û kurdiya wê bi alfabeya erebî ye. Ez hêvîdar im ku rojek zûtir bê transkirîpte kirin û bi awakî firehtir bikeve bin xizmeta kesên ku di vî warî de xebatê dikin.

***Ferhenga Kurdî ya Diyalektê
Hekarî-Rewendî:***

Ferhat Pîrbal, di kitêba xwe ya

"Mele Mehmûdê Bayezîdî" de, li ser vê xebatê wiha dibêje: "Wî bi kurdî di pêşgotina vê kitêbê de gotiye: 'Ev e risaleyek e di behsa hinek ferq û cudayê di nêv lûxatêt ekradan, hindê beyanê be'zê qewaîdê umumî yêd lazim e'. Li ser rûpela yekê ya fransîziya wê wiha hatiye nivîsandin: *Vocabulaire kurde des dialectes de Hekari et Revendi*, par A. JABA, Consul de Russie Erzeroum, Erzeroum le 15 Mars 1858 (*Gotinên kurdî yên bi diyalektê Hekarî û Rewendî*, ji aliyê: A. JABA konsolosê rûsî yê Erziromê, Erzirom 15yê adara 1858an). Ev kitêb, bi destxetê yekê navê wî Şehnezer û di sala 1858an de hatiye nivîsandin. 49 rûpel e, hecma wê 22x34 santêmetr e û di her rûpelê de 13 rêz hatine nivîsandin... Wekî me got, ji aliyê Mele Mehmûdê Beyazîdî ve pêşgotinek jê re hatiye nivîsandin û dibêje: bi diyalektê kurmancî, behsa hinek taybetmendiyên zimanê kurdî dike. Vêca kurtiyek rêziman di derbarê du diyalektan û cihêtiyên wan de tê de hene... Ev destnivîs hatiye bi rêkûpêk kirin û di sala 1984an de ji aliyê Prof. Maruf Xezenedar ve hatiye çapkirin".

Ferhenga Kurdî-Rûsî-Fransîzî û Rûsî-Fransîzî-Kurdî:

Mele Mehmûdê Bazîdî, di amadekirina vê ferhenga han a ji 15 hezar bêjeyan pêk hatiye, alîkariya A. Jaba kiriye. Ev kitêb heta niha nehatiye çapkirin û ew di Akademiya Zanistî ya Petersborgê de hatiye parastin.

Rêzimanê Erebi Bi Zimanê Kurdî:

Ev kitêb di eslê xwe de ya Elî Teremaxî ye. Lê Mele Mehmûdê Bazîdî ew ji nû ve bi rêkûpêk kiriye û nivîsandiye û pêşgotinek jî jê re amade kiriye. Navê kitêbê yê orîjînal ev e: "*Serf û Be'dê Usûl Lazimeyê Te'lîme Bi Zimanê Kurmancî*".

Dixuyê ku Elî Teremaxî ev kitêb di destpêka sedsala 17an de nivîsandiye. Çunkî Minorsky di *Ansiklopediya Îslamê* de dibêje: "Elî Teremaxî di sala 1591an de hatiye dinê".

Ferhad Pîrpal di kitêba xwe ya navê wê derbas bûyî de, di vî warî de agahdarî dide û wiha dibêje: "A. Jaba di du nameyên xwe yên tarîxa wan 17.06.1858an û 02.04.1859an de, ku ji rojhatnasê elmanî Lerinhardt Dorin re dişîne wiha dibêje: Ev destnivîsa hêja beriya sala 1857an li ba melakî xelkê Hekariyê bû, min jê daxwaz kir ku bide min an bifroşe min, lê wî nefiroşt... Navnîşana destnivîsê ya fransîzî ev e: *Gramaire kurde par Ali Teremakhi offert a l'Academie Ymperial des Sciences a St-Petersbourg*, par A. JABA". Lê pişt re em ji maqalekê ku di berhema Mele Mehmûdê Bazîdî ya bi navê "*Cami'iyê Risaleyan û Hikayetan*" ku ji çil çîrok û sê maqaleyên ji aliyê wî bi ve xwe ve hatine nivîsandin pêk tê -yek ji wan maqaleyan a ku em behs dikin- û ji aliyê A. Jaba ve wergera wan a fransîzî hatiye kirin û li Petersborgê bi pêşgotinekê re ji aliyê P. Lerch ve kurdî û fransîziya wê hatiye weşandin, hîn dibin; Mele Mehmûdê Bazîdî diçe li ba wî melayê xelkê Hekariyê û ew kitêba Elî

Teremaxî jê werdigire. Pişt re jî ew bi xwe vê destnivîsê ji nû ve divejîne û ew bi pêşgotineka di warê jiyana dînî û rewşenbîrî ya di nav mizgeftên wî wextê yên Kurdistanê de, awayê xwendina dersê û bi kurtiyek di warê jiyana Elî Teremaxî de teslîmê A. Jaba dike.

Belê, em dibînin ku cara ewil e ku Mele Mehmûdê Bazîdî ev berhema Elî Teremaxî ya hêja û yekemîn car bi kurdî nivîsandina rêzimanêkê, peyda dike û pişt re jî ew ji nû ve divejîne û dixê li ber destê xwendevanên kurd. Heta niha çend kesan di derbarê vê kitêbê de hinek agahdarî dane. Yek ji wan edebiyatnasê hêja Marûf Xeznedar e. Ez hêvdîdar im ku di vî warî de hê lêkolînên firehtir bînin kirin.

Cami'iyê Risaleyan û Hikayetan:

Ev berhema hêja ya Mele Mehmûdê Bazîdî, ji sê maqale û çil çîrokan pêk hatiye. Ew di bin sernivîsa jorê de, wekî kitêb bi hev re hatine çapkirin. Naveroka ku ji kitêbê re hatiye amade kirin bi vî awayî xwarê ye û ez bêtir destlêdan wê li vir dinivîsim.

Fêhrist:

Cami'iyê Risaleyan û Hikayetan

- Risale Di Behsa Be'dê 'Eşayîr e Qebayîl û Tayîfeyên Di Kurdistanê Beyan Dike. Sefhe (rûpel): 1

- Ýsim û Navê Kurmanciyan Ku Temam û Bê Kêmasî Dibêjin Beyan Dibe. Sefhe: 9

- Ýsim û Navê Di Jinên Di Kurmanciyan Ku Bi Temam û Kêmasî Dibêjin Beyan Dibe. Sefhe:

11.

- Risaleyeke Di Behsa Şair Mezinên Di Kurdistanê Ku Bi Zimanê Kurmancî ye Cih û Kitêb û Şiir û Hikayet û Qiseyê Di Wan Beyan Dike. Sefhe: 13.

- Muqeddema Elî Serf û Be'zê Usûl Lazimeyê Te'limîye Bi Zimanê Kurmancî. Sefhe: 17.

- Cami'î El-Hikayet. Sefhe: 30.

Belê wekî em ew naveroka ji kitêbê re hatiye amadekirin dibînin, ew di derbarê kitêbê de agahdariyeke baş dide me. Wekî me got, sê maqale û komek çîrok ên ji çil liban pêkhatî di kitêbê de hene. Ew ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatine berhevkirin û nivîsandin.

Maqaleya yekê, di derbarê hinek eşîretên Kurdistanê û agahdariyên di warê jiyana wan de û ji lîsteke navê jin û mêran pêk hatiye.

Maqaleya duduyan, bi kurtî behsa jiyana heşt şairên kurd ên kevin dike. Ew şair jî ev in: Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî. Şairê şeşan, Îsmail ê eslê xwe ji Bazîdê û şagirdê Ehmedê Xanî ye. Di sala 1065ê hicrî de hatiye dinê û di 1121ê hicrî de wefat kiriye. Şairê heftan, Şerefxan ê eslê xwe ji mîrên Hekariyê ye û di 1101ê hicrî de li Hekariyê koçê dawiyê kiriye. Şairê heştan jî Muradxan e û li Bazîdê di sala 1150yê hicrî de hatiye dinê û di sala 1199ê de koçê dawiyê kiriye.

Maqaleya sisiyan jî nasandina destnivîsa Elî Teremaxî ya bi kurdî û di derbarê rêzimanê erebî de ye. Me li jorê behsa vê gotarê kir.*

Qismê vê berhemê yê din, ku em ji naveroka jê re hatiye amadekirin, dibînin, ji çil çîrokan pêk hatiye. Ev çil çîrokên han ên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, xwediyê hinek taybetmendiyên in û wekî ew çîrokên ku em dizanin nîn in. Ew hemî ji bûyerên rasteqînî yên di nav xelkê Kurdistanê de qewimî ne pêk hatine. Mele Mehmûdê Bazîdî ew bi wersiyona di nav xelkê de tê gotin nivîsandine û ew kirine çîrok û bi awakî xweşik û hêja pêşkêş kirine. Ew navên kesan, gundan, ciyan û heta tarîxên tê de hatine bikaranîn, hemî yên rasteqînî ne. Ji ber vê, wekî min got, ew ji çîrokên ku em dizanin cihê ne. Her yek ji wan li ser serpêhatî û bûyerekê ye. Naveroka çend ji wan çîrokan ev in: çîroka yekê, di derbarê tamahiya melayan a ji bo malê dinê û menfeetperestî û ezûezîtiya wan de ye. Çîroka çaran di derbarê rêbiriya di Kurdistanê de û encamên wê yên di civatê de ne. Çîroka pênc û şeşan, rola pere û tamatiyê ya di mejî û hindurê insanê de nîşan didin.

Çîroka nehan, li ser meseleya Şêxî Begê mîrê Miksê û jina Mîr Şeref, Adîle Xanima (di kitêba Sînan Hakan a bi navê Xan Mehmûd de Seadet Xanim e) seroka Kela Şaxê de ye. Ev bûyer bi awakî belge di kitêba lêkolînî ya Sînan Hakan a bi navê "*Xan Mehmûd*" (hezar car destê birayê

Sînan xweş be û em hêvîdar in ku ev awa lêkolînên wî berdeham bin) derbas dibe. Kesê bixwazin dikarin vê bûyerê bi awakî firehtir ji vê kitêbê hîn bibin.

Çîroka duwanzdehan di derbarê bûyera Hesên (Hesem) Axa û Lalîxana Goveyî de ne. Em dizanin ev serpêhatiya evîna van herdu kesên navên wan derbas dibin, li seranserê Kurdistanê belav e û tê zanîn. Bi taybetî li herêmên Serhedê ew wekî payîzok tê gotin. Malîkek ji wê ku di bîra min de ye, bi van rêzan dest pê dike:

Deştika Hopê xunav e wa xunav e
Jê diderkevin cotek qazên sitûzirav e
Yekê wî Hesem Axayê min e
Ya dinê Lalîxana bejînzirav e.

Çîroka bîstûduduyan, di derbarê zulm û zordestiya kurdan a li ser file û êzîdiyan e. Çîroka sîûheştan, di derbarê esîrgirtina gerokekî kurdnas ê fransî yê di sala 1219ê koçî (1804ê zayînî) de di qesra mîrê Bazîdî de neqil dike. Di hinek çîrokan de jî ew astengên jinên kurd tê de ne, radixe ber çavan.

Tê de çîrokên li ser eşîretên wekî Rojkan, Sîpkan...Birûkiyan hene.

Belê, em li vir nikarin yek û yek li ser hemî çîrokan bisekinin. Çunkî sekîndina li ser hemîyan, hem bi hecim û hem jî bi şirovekirînen di derbarê wan de, ji çarçoveya maqalekê derdikeve. Eger ecel muhlet bide em ê van çil çîrokan wekî eslê wan û bi halê wan ê transkriptekirî û bi ferhengokekê ve têxin ber destê xwendevanan.

* Ev maqaleya Bazîdî ya ku berêz Avçî jê behs dike, di hejmara yekemîn a kovara *BÎR* de bi wergeraandina Mamoste Qedîrî ji nû ve hatiye çapkirin. Bn. Kovara *BÎR*, hej: 1, Bihara 2005an, Amed(S. Veroj)

Kilam, Bêrîte, Gotinên Pêşîyan....:

Yek ji wan xebatên hêja ku ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatiye kirin, berhevkirina kilam, bêrîte, go-tinên pêşîyan û gelek tiştên wekî van ên edebî û folklorî ne.

Wî hem kilamên mêrxwasî û hem jî yên evîniyê ku di nav kurdan de tên gotin berhev kirine û teslîmê A. Jaba kirine û wî jî hemî van berheman ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şandine.

**Mem û Zîn, Yusif û Zuleyxa,
Şêxê Sen'an, Leyl û Mecnûn....:**

Mele Mehmûdê Bazîdî, berhema hêja û giranbiha a Ehmedê Xanî *Mem û Zînê*, ya Selîmê Silêman *Yusif û Zuleyxayê*, ya Harisê Bedlîsî *Leyl û Mecnûnê*, ya Feqeyê Teyran *Şêxê Sen'an, Bersîsê Abid û Qewlê Hespê Reş* wekî çîrokî nivîsandîye. Pişt re A. Jaba ew derbasê li ser alfabeya latînî kirine û wergerandine fransîzî û pêşgotinekê jî ji wan re nivîsandîye û ew ji Akademiya zanistî ya Petersburgê re şandine.

Ji bilî van, Mele Mehmûdê Bazîdî gelek berhemên din ên ji aliyê şairên kurd ve hatine nivîsandin, ên wekî Zembîl Firoş û gelekên din ku navên hemiyan ji aliyê me ve nayên zanîn, bi awayê çîrokî ew amade kirine û hemî jî ji aliyê A. Jaba wergera wan a fransîzî hatine kirin û pişt re jî ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re hatine şandin.

Hemî berhemên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, ji aliyê A. Jaba ve wergera wan a fransîzî

hatine çêkirin. Gelek caran, Mele Mehmûdê Bazîdî jî ji bo danefehimkirina kurdiya wan, di vî warî de alîkariya wî kiriye.

Ji derveyî van hemî xebatên hêja yên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine amade kirin, gelek berhem ji zimanê tirkî, erebî û farisî jî wergerandine li ser zimanê kurdî. Wekî *Gulistana* Se'diyê Şîrazî. Qasê tê gotin, wî heştêûçar çîrokên bi zimanê farisî wergerandine kurdî.

Xebata wî di warê amadekirina rêziman û hinek pirsên ziman û alfabeya kurdî de jî çêbûye û cardin wî kitêbek bi navnîşana *Kitêba Mewlûda Şerîf* jî nivîsandîye.

Mele Mehmûdê Bazîdî, di van xebatên xwe de nexwestîye navê xwe yê rastî bikar bîne. Tê gotin ku ev ji ber sebebê xweparastina gotegoteyê di nav xelkê de bûye. Yanî nexwestîye xelk li dîwanxaneyan û li kolanan, bêjin ku Mele Mehmûd bi kesekî nemisilman re di nav teşwîkê mesayiyê de ye û ji ber vê di wan xebatên xwe de navê wekî, "Mela Efendî, Hacî Mehmûd Efendî" bikar anîye. Gelek caran jî, wekî A. Jaba bi xwe jî dibêje, qet nav bikar neaniye.

Belê, em gelek baş û bi awakî ronî dibînin ka vî zana, rewşenbîr û alimê mezin çiqas xebat kirine û di navbera wan çend salan de çiqas berhem afirandine. Berhemên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine amade kirin, hemî ji aliyê A. Jaba ve wergera wan a fransîzî hatine çêkirin û ji piraniya wan re bi fransîzî pêşgotin jî nivîsandine û wekî me got, ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şandine. Gelek ji

van berheman di çarçoveke teng de jî be hatine çapkirin û belav kirin. Lê gelek jê jî hene hê kesekî dest lê nedaye.

Lêkolîn û danenasîna Mele Mehmûdê Bazîdî û ew berhemên ji aliyê wî ve hatine berhev kirin, nivîsandin û wergerandin, di çarçoveya maqalekê de ne mimkun e. Beriya ez dawî li vê kurtenivîsê bînim, ez dixwazim li ser navê "Bazîdê" jî li vir çend gotinan bêjim. Di gelek ciyan de ew wek "Bayezîd" tê nivîsandin. Ev şaş e. Heta niha jî xelkê cih jê re dibêjin "Bazîd" ne "Bayezîd". Mele Mehmûdê Bazîdî jî di berhemên xwe de "Bazîd" bikar anîye. Lê mixabin kesên ew transkirîpte kirine, cardin "Bayezîd" nivîsandine. Gerek e ev bê rastkirin.

Xala duduyan, ez hêvîdar im ku ew hemî berhemên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine berhev kirin, nivîsandin û wergerandin, ku niha di Kitêbxaneyê Akademiyê Zanistî ya Petersburgê de ne û hinek jî li Fransayê ne û ew ji aliyê A. Jaba ve hatine wergerandin, bîn berhev kirin û ew bi kurdiya îro û bi herfên latînî bîn amade kirin û bi navê "*Berhemên Mele Mehmûdê Bazîdî*" bîn weşandin.

Daxwazek din jî ev e ku bi zûtirîn wext navê vî zanayê hêja li koçek an kolaneke Bazîdê bê dayîn, ku ew ji aliyê nîfşên nû ve bê naskirin û bibe minnetdariyek ji bo ew xebatên ji aliyê wî ve hatine kirin. Ez di dawiyê de dibêjim, hezar rehmet li te be, cihê te bihûşt be û em te bi van çend rêzan, bi rêz û minnet bibîr tînin.

* * *

Ev nivîsa xwarê kurtiya pêşgotina ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêba xwe ya bi navê *Kitêba Tewarîxê Cedîdê Kurdistanê* re hatiye nivîsandin, ew e. Ev pêşgotin, Vasilîva bi kurdeka li Yekîtiya Sovyetê ya berê daye wergerandin û ew di xebata xwe ya bi navê "*Kitêba Wenda Ya Dîroka Kurdistanê*" de weşandiye. Ev kurtiya wê pêşgotina Mele Mehmûdê Bazîdî bi Kurmancî û alfabeya erebî bi destê min ket û min jî bêyî ez dest bi tişteki bidim ew transkirîpte kir. Ji bo di derbarê ew kitêba wenda de dikare agahdariyek bide me, min baş dît ku wê jî bi van çend rêz nivîsên di derbarê Mele Mehmûdê Bazîdî de ku me nivîsandin, bê weşandin.

KITÊBA WENDA YA DÎROKA KURDISTANÊ

(KITÊBA TEWARÎXÊ CEDÎDÊ KURDISTAN)

Beşê yekê: Bûyerên Ji sala 1785-1786 (1200ê koçî) heta sala 1857-1858 (1274ê koçî) li wilayeta Erziromê qewimîne.

Beşa duduyan: Bûyerên li êrdêma Rojkî, ku bajarên wê yên serekî Bedlîs û Mûş in.

Beşa sisîyan: Bûyerên êrdêma Mehmûdî, ku jê re Mehemedan dibêjin û bajarê wê yê sereke Xošeb e.

Beşa çaran: Bi kurtî bûyerên li wilayeta Wanê qewimîne.

Beşa pîncan: Bi kurtî bûyerên li Hekarê qewimîne.

Beşa şeşan: Bûyerên li Rewandîzê

qewimîne.

Beşa heftan: Bûyerên Behdînan, ku bajarê wê yê sereke Amêdê ye.

Beşa heştan: Bûyerên li Botan qewimîne, ku bajarê wê yê sereke Cizîr e.

Beşa nehan: Bûyerên êrdêma Silîvan, ku bajarê wê yê sereke Bazîd e.

Beşa dehan: Bûyerên Qersê û dagîrkirina wê bi destê rûsan.

Beşa yanzdehan: Bûyerên Azerbeycanê û her wiha yên Xoyê, Tebrîzê, Yêrîvanê, Ûrmê, Meraxê û Makûyê qewimîne.

Wekî ev fêhrîsta navûnîşanan xwanî dike, xironîka Mele Mehmûd, wilayetên bingehîn ên bakur û nava Kurdistanê û degere sedsalê ji dîroka wan, ji sala 1785-1786ê (1200ê koçî) heta sala 1857-1858 (1274ê koçî) dane ber xwe. Bi şehadetîya A. D. Jaba, nivîskar gelek caran di dîrokê de kûr çûye, gihaye demên dûr û dirêj, mîna dema Şeref Xanê Bedlîsî⁽¹⁾. Bêguman, heger destnivîsa xebata Mela Mehmûdê Bayezîdî bête dîtin, baza serkanîya dîroka kurdî, bi dokumenteke, ji dereca yekemîn tê dagirtin. Belê ji ber ku ev nivîsar heta nuha nehatîye dîtin, çapkirina wê tercumê, ku afiranerê van xêzan ji pêlên destnivîsa A. D. Jaba pêk anîye, wê gelekî rind be. Îro her ev di destê me de ye. Nuha em gotinê êdî didin Mele Mehmûdê Bayezîdî, nivîskarê pirtûka *Dîroka Kurdistanê ya Nûjen*.

* * *

Dîroka her miletê heye û cem her miletê çîrok hene, tê de behsa eslê wî û bûyerên giran, ku hatine serê wî û şehadetîya hebûna wî di nav miletên mayî de didin. Şeref Xanê Bedlîsî bi vê tiştî bawer bû, loma xwest dîroka miletê xwe, dîroka kurdan binivîsîne. Bi rastî ji dîroka Kurdistanê minetarê qelema wî mirovê dengdar, zana û rûmetbilind e. Şeref Xan bi eslê xwe kurd bû, ji malbatek mezin yê Bedlîsê bû. Malbata wî ji zû de li wira hukum kiribû û geh dikete bin destê farisan, geh ji ber sultanên Împaratoriya Osmanî ve dihat girêdan. Wî derheq dîroka Kurdistanê, eslê kurdan, zimanê wan, hemû mîrên ku li vî welatî hukum kirine dinvîsand. Sala 1596-97 (1005) nivîsar temam bûye û navnîşana wê "*Şerefname*" ye. Şeref Xan bo nutq û beyana xwe li Kurdistanê gelekî dengdar bû. Hukmê Bedlîsê û êla Rojka, hîna berî Dewleta Osmanî ava bibe destê bav û kalên wî de bû. Wan neseba (genologîya) xwe digehandîn Anosêrwanê dadmend û hukmê Bedlîsê, Axlatê (Xelatê) û qelayên êla Rojka, ji dema qeralên ermenan de, di destên wan de bû.

Ji nav hemû hakimên kurdan tenê sê reh (regez) herî kevnar in: reha hakimên Bedlîsê, reha hakimên Botan, ku eslê xwe digihînin Xalid û dawî reha hakimên Hekarê.

Mîrên Kurdistanê yên mayîn, rehên wan pir kûr naçin, belê her yek ji wan begê êla xwe ye.

Derheq eslê kurdan sê bawerî hene, kevnarîya eslê wan (kurdan) îsbat

(1) Arşîva p.2. AZ a YKSS, f776, op.4, N-10, p.p.

dikin. Raya yekê: dibêjin dema padşah Dehaq-Zehaq jî weko nas e-derdek pê ketibû her rojê ferman dida xortekî û qîzekê bikûjin, jin û mêr ji ber zulma wî revîyan ser çîyan û nav daristanan. Li wêra xort û keç ser kêfa xwe gerîyane çawa Xwedê lê anîye, li hev civîyane. Lê ji ber mayîna li van çolan, bûnê mîna teban...

Piştî mirina Dehaq daketine deştê, cihekî bi sî û asê bijartine û lê hewrîne. Kêfa wan ji bajar û ji gundan re nedihat, çol bi wan xweştir bûn. Lê bi demê re, bi her alê ve belabûne û êlên (...) kurdan ji wan çêbûne. Êlên Heyderî, Zilî, Hesenî û gelek êlên mayî jî, ku ji wan çêbûne, bi vî rengî bûn. Zaro û nevîyên Heyder bûn Heyderî, zaro û nevîyên Zîlo û Hesen, Zilî û Hesenî, yanê ew ji malbatên Zîlo û Hesen in.

Bi kurtî, heta dema îro nevîyên wan, ku li her derê belav bûne û cî girtine, navê bav û kalan li komeleyên xwe kirin û her çend nifş ji malbatekê bûne taifek.

Li ser qada Dewleta Osmanî ji 700 heya 800 tayîfeyê, tevî eşîr û qebîlan hene. Raya duda: li gorê *Şerefname* nivîsiye, çaxa pêxember Muhemmed (silav û aferînên Xwedê lê bin) kurdan qasîdek şandine cem wî. Qasîdê wan gellekî bi sar û heybet bûye: kibkibeyeke serçav bi pirç bû, şiklê wî nayab bû, mirov jê ditir- sîyan. Ne pêxember, ne jî sehabîyên (hevrêyên) wî tu carî ecêbek wa nedibûn (...). Dîyar e Muhemmed gelekî li vî qasîdî zendegirtî maye, ji wê çaxê de (...) ji nevîyên vî qasîdî re gotine kurd. Ew dûrî bajar û gun-

dan diçin, li çol û çîyan dijîn. Jimara wan bi demê re pirr bûye û bûne mîna îro hûn dibînin.

Raya sisiya: li gora vê çîroka pirrî nêzikî rastîyê, dema Nuh, yek ji kurên Yafit piştî tufanê li cîhanê digeriya, keçek sêhîrbaz dîtîye û ew mehr kirîye, zarokên wan ne mîna zarokên mayî bûne. Li çolekê xwe xewle kirine û bi tena xwe jîyane, nizanîbûne xaniyan ava bikin, di konan de dijîyan û kesê ji wan pêve zimanê wan fêm nedikir. Jimara wan pirr bûye û bi her alê ve bela bûne. Hinkan jîyana koçerî li Îranê, Turanê û Şamê cî girtin. Li wan deran jimara wan pirr û ji malbatên wan tayîfe û eşîrên ku em îro dibînin peyda bûn.

Pêşîya kurd hatine hêla Dîyarbekrê û li parêzgeha Meyafarqînê bi cî bûne. Eynî ji vê derê ew bi her alê de belav bûne, mebesta gotina kurd, miletekî kevnar e. Dîroka hebûna kurdan hê pêş dîroka zayînî ye. Samedên ku hiştine kurd ser dirêjîya sînorên Îranê, Turkîyê û li derdûra Bexdê rûnên, ev in: hemî êlên kurdan ji şeran hez dikin û ji dil û can dikevinê. Di navbera wan xwe bi xwe de jî timî dijminatî heye (...). Di van sedsalên derbasbûyî de, ser sînorên Îran û Turkîyê, Besrê û Îraqê, di navbera sultanên Selçuqîyan, Cengîzîyan, Sefewîyan, Ebbasî û qeralên Ermenîstanê de timî şer li dar bûn (...), gelekî ji kurdan berê xwe didan wan sînoran û diketin xizmeta wan sultan, ew ji alîkî ve mêrxasên navdar bûn, ji alê din ve jî bi hindikî razî dibûn.

Ew gîhan rûmet û merteba herî

bilind, gava sultanê Împaratorîya Osmanî Silêmanê Mezin ku ajot ser Îran û Bexdê û bi navê Qanûndar tê naskirin, hemû beg û axayên êlên kurdan, yên mêrxasîya xwe deng dabûn, anîn tevî xizmeta xwe. Leqebên milkdarên xanedan û ocaxa xelîk xelatê wan kirin, yên mayî jî li gorî rûmeta her yekê qezak, kelak, bajarek, wîlayetek ya jî gundek, ji Gurcistanê heya Bexdê, Besrê û Misrê wan li ser navê wan tapu û qoçan kirin.

Pîştî kurd ser dirêjîya sînorê Turkîyê û Îranê bi cî kirin, wan zûka asêgeh û kela li wan ciyan ava kirin ji bo parastina sînor û axa Osmanî ji êrişên fars û gurcîyan. Gava Silêmanê Qanûndar vegeyîyaye Sitenbolê, li gor gotinan, dîya wî jê re gotiye: "ha, kurê min, va tu vegerîya, lê gelo gurec û qizilbaş, wê êrişan bernedin ser wîlayetên te û zîyanê negehînnê?". Sultên lê vegerandiye: "ha dayê, min dîwarekî xurt di navbera Împaratorîya Osmanî û Dewleta Gurec û îranîyan de ava kir, dijmin nema kare tu zîyanê bike". "Çawa te karîbû dîwarekî ewqas dirêj ava biki?". Sultên vegerandiye: "Dayê, min ew li goşt û xwînê ava kir. Min hukmê wan herêman da destê êlên kurdan, min ew ji Gurcistanê heta Bexdê, Besrê û Şarezorê di rêzekî de mîna asêgehekê, danîn. Dijmin nema kare ji wan derbas be, têkeve dewleta Îslamê".

Bi rastî jî, ev rewşa han demek dirêj mîna xwe ma, lê paşê hat guhertin. Belê nuha jî, hem kurd bîhna êriş û şeran li derekê hilînin nikarin xwe

bigrin (...).

Zimanê kurdan. Zimanê li Kurdistanê pê dixwînin û dinivîsînin yek e, forma wî a gotinan yek e û alîfbêya wî heye. Lê di zimanê devkî de çar zaravên tên dîtin. Zaravê pêşîn, zaravê Rawendî yê kurdên Çeldêranê, Qersê, Bayezîdê, Mûşê, Bedlîsê û Wanê ye. Zimanê re'ayiyên kurdan yên li Xarputê, Dîyarbêkrê, Mêrdînê û Hawîrdora wê heta Erziromê dijîn, ser vê zaravê tê hesab kirin. Êlên koçeran yên giran li van herêman me gotî, mîna: Zîlan, Heyderan, Cîmadînan, Keskan, Savîdanan, Meman, Celalîyan, Cûnakanan, Hesenan, Cibran, Sîpkan, Eltoran, Birokan, Şikakan, Şawîyan, Şikeftalû, Erbanan, Baravîyan, Şillan û êlên kurdan yên mayî, mezin û biçûk, koçer û bajarî (mederî), li dora Qersê, Çeldîranê, Yêrîvanê, Wanê, Mûşê, Dîyarbêkrê, Xarpûtê, ew jî hemû bi zaravê rawendî dipeyîvin.

Zaravê dudan: zaravê li wîlayetên Hekarî, Mehmûdî, Şêrwanî, Botanî, Hêzanî, Muksî, Sipayêrtî, Şinoyî, Somayî, Biradostî, Şemdînanî û Bikartî. Êlên Mizûrî, Zêbarî û Herkî jî bi zaravayê Hekarî dipeyîvin. Hemû pirtûk û şîirên kurdî bi vî zimanî rivîsandîne, belê ferqa vî zaravî bi xwe ji zaravê Rawendî hindik e.

Zaravê sisiya yê Sulêmanî ye. Ev zimanê êlên Baban, Bilbas, Zerzan û Şukrîyan e, ku li nêzikî Silêmanî û Şarezorê rûdinin. Ew jî ji zaravên mayî bi derecek wekhev ferq dike.

Zaravê çara zaravê Zaza ye, ew jî zimanekî Kurdî ye. Ji êla Ducik re

dibêjin Êla Zaza. Ew li êrdimên, ji qeza Tercanê (bi Erziromê ve girêdayî ye) û heya Dêrsimê û Çiyayê Acî rûdinin. Zaravê wê êlê gelekî dûr bûye ji yên mayîn. Tu eşîrên dinê (...) wesa li tevaya Kurdistanê nîn in. Kurd wan gundî (şûnmayî) hesab dikin. Ew bi zaravê Hekarî dinivîsînin lê bi zaravê xwe dipeyivin, belê gotina ji zaravên kurdî yên mayî tevê dikin. Çiqas ev zarav cuda be jî, ji zimanê kurdî cuda nabe.

Çendî ku ev çar zarav ji hev cuda ne jî, nûnerên tayîfên cuda karin her yek bi zaravê xwe bipeyive û ji hev fêm bikin, çimkî bingeha van zaravan yek e, nan, av, herin, werin, patin, sitandin û gelek gotinên wanî mayî jî weko hev in û ji rehekê ne. Loma ferqa van çar zaravan ji hev tenê di ferqa nav peyvên de xwanê dibe. Lê belê zimanê êla Baban gelekî ji zimanê Zazan dûr e. Zaravên mayî mîna zaravê Hekarî, gelekî nêzikî Rawendî ne. Bi zorê ferqa wan xwanê dike: ji ser gotinî yek ya du gotin ne mîna hev tên dîtin.

Mîr, paşa û axayên kurdan hebûn, bi eslê xwe her yek ji êla xwe bû. Paşalikên wan tunebûn, jimara senceqên wan tenê çar-pêncek bûn: Diyarbekir, Wan, Mûş, Behdînan, Şarezor û Bayezîd bûn. Hemû qeza û êrdimên mayîn, beylik bûn.

Di nava koçeran de beg tunebûn, axayê wan hebûn. Belê Têmurê Milî ji êla Êla Milan a koçer, giha paşatîyê û demek dirêj hukmê hawirdora Urfayê (Ruhayê) bi temamî di destê wî de bû, leqeba wî jî îsyanbaşî bû. Ji wê çaxê de ew

heya îro ji wî pêve paşakî kurdên koçer tunebûye. Kurdên Azerbêcanê yên koçer, li gorî Şerefnamê, ji Kurdistanê hatine, her hesa ji wilayeta Loristanê ne, ku navê Lorî Bûzûrk (Lorê Mezin) û Lorî Kûçûk (Lorê Biçûk) lê dikin. Di wê nivîsara me gotê de, bi firehî behsa vî tiştî dibe. Çend eşîrên kurdan yên Goran li Îranê, Erebaştanê, hawirdorên Sîwasê, Mêrdînê û Agînayê hene. Yên herî giran jê ev eşîr in: Reşwan, Milan, Adrîk û Afşar. Her êlek ji wan nêzikî 15 hezar male. Ji wan pêve, tayîfene biçûk hene mîna mirdêşyan, Axçî-Kaşlo, Sîçarîka, Hêrozî, Şadlî û gelek din.

Xeyset û adetên hemû êlên kurdan ne mîna hev in, nexasim kurdên Dêrsimê, ku bi mezhebê xwe Qizilbaş û Elewî ne, cuda ne. Kurdên li herêmên nêzikî sînor, ji Qersê û Çaldiranê heya Diyarbekrê, Mûsilê, Şarezorê û Bexdayê dimînin -bajarî jî, koçer jî- hemû li ser mezhebê Şafiî ne û tu mezhebên din cara nas nekirine. Ev kurdan hemû ji yek tayîfe kevîr çêbûne, ev tayîfe li gor pirtûka Rewzet Essefa û hin xironîkên mayî jî, piştî tufanê peyda bûne. Dest- pêkê hindik bûne, lê bi demê re jimara wê gelekî pirr bûye. Ji mêj ve kurd tevê xizmeta pirr hakimî bûne û di şerên dijî ermen û guran de, erdên wan distendin, ew erdana nuha (...) bûne perçene ji erdê Kurdistanê. Ji çaxê Melîkan de⁽²⁾, gelek ji kurdan xwestine ser-

(2) Di nerîna A. D. Jaba de, mebesta afirîner hakimî musulmanan e.

bixwe bin, ne di bin hukmê tu kesî de bin û ferz dikirin xutba îne bi navê wan were xwendin. Di şerên turk û farsan de kurdan, weko di *Şerefnameyê* de hatiye xwanîkirin, serbestîyek tam pêşan dane û her dem xwe dane alîyê zordaran.

Şeref Xan mirovekî gelekî dengdar û rûmetbilind bûye, demekê xizmeta şahên farisan ji malbata Sefewî kiriye û mala xwe anîye Îranê⁽³⁾. Demekê li Qezwîn û li Xorasanê jî ya ye. Merdîya huku- meta Osmanî jê re hiştîye ew ji nû ve vegere bajarê xwe yê eslî, Bedlîsê. Weko di *Şerefnameyê* de hatiye, rûmeta Şeref Xan li nik hakimên turkan jî, farisan jî, gelekî bilind bû. Ew di nav kurdan gelekî dengdar e, xebata wî ya dîrokê *Şerefname* li cem kurdan li temamiya cîhanê jî gelekî giranbûha ye. Ew pirtûk nadir e, wî zemanî 1500 qirûş tê didan tev wa jî peyda kirina wê zor bû, çimkî nivîsarên dîrokê yê afiranerên tirk, ereb û farisan pirr in, lê dîrokeke kurdan yê din tune. Loma jî *Şerefname* ewqas nadir û giranbûha ye.

Kurdên gundî, her wesa hemû eşîr û qebîlên li herêmên Mûş û Bedlîsê rûdinin, navê Rojka hîlanîne, ji eşîrên Mehmûdkî re dibêjin Şikaka, ji bajarîyên êrdima Cizîrê re, Botan û ji koçerên wê re Rawendî dibêjin. Ji kurdên Hekarê hemîyan re dibêjin koçer û ji eşîr û bajarîyên

wilayatên Amêdî û Akreyê re dibêjin Behdînan.

Navê Bayezîdê pêşîyê wekî din bû. Pêşîya pêş ev bajar mîna Alaşgêra kevnar bibîr anîne. Wekî di *Şerefnameyê* de hatiye gotin, êla Pazûkî li wira dijîya û geh diket bin hukmê Tirkîyê, geh bin hukmê Îranê. Derengtîr, çaxa Osmanîyan, Sultan Murad Xan dema sitandina Yerîvanê, ji bajarê Bayezîdê ajotîye ser farsan. Mirovekî bi navê Evdî Beg bi eslê xwe ji Merwanîyên Meyafarqînê bûye, ji Diyarbekirê, digel çend malbatên Silîvanî hatiye tevî xizmeta Sultan Murad bûye. Di şerê nêzikî Yerîvanê de mêranîya nîşan daye û celalet Sultan Murad bajarên Bayezîdê, Alaşgirê, Mîlwe û hawirdorên wan bi yurtlik û ocaxlik xelatê Evdî Beg û Êla Silîvan kirîye. Wan li wir kela û gund ava kirine, li wira mane û navê Bayezîd û qezayên wê bûye Silîvanî, ser navê êlê.

Di *Şerefname* de behsa Bayezîdê û hakimên wê êla Silîvan nebûye. Ev bûyerên demê derengtîrîn û ew di vê "Dîroka Dema Nûjen" de hatine nivîsandin, gava behsa wan wilayetên me gotî dibe û behsa parvebûna êlên kurdan ên mezin û peyda bûna qebîlên biçûk, ku navê hina ji wan di *Şerefnameyê* de hatine.

Lêkolîna dîroka her qebîlekê helbet zor e, ewê nivîsara me bêhawe mezin bike, lê belê, min navnîşana (lîsta) êl û qebîlan danîye. Em karin êlên kurdan ên li ser axa Osmanî dijîn, bi sê tayîfan ve girê bidin: Mîlî, Zilî û Sîpkî, hemû eşîr û qebîlên mayîn ji wan derketine. Di

(3) Mele Mehmûd, di vir de bîyografîya Şeref Xanê Bedlîsî, ku li Îranê bûye û mala xwe, piştî demek kurt ji xizmeta Sefewîyan û hukumdariya Naxçîvanê -ji Îranê- dibe Tirkîyê, ne dirust dide. Tema pêşgotina *Şerefname* C.I, r. 28-29 bike.

her tayîfekê de bi sedan qebîle hene, navên wan di tayîfê de nas in, çawa di qebîlê de jî nas e, bê ew ji kîjan tayîfê ne. Gava şer di nav du tayîfan de vêdikeve, qebîlên biçûk mecbur in tevde bibin yek, alê tayîfa xwe bikin û tevê wê di şera kevin.

Êlên koçer ku li ser axa Îranê dijîn, Goranî ne. Qebîlên wan pîrr in, mîna: Kurasînî, Seravî, Xelîlî, Afşarî, Beyatî, Heyderî, Alacînî, Çobankarî û hindekên din. Piraniya wan bi tirkî dipeyîvin, weko li nav kurdên Îranê bûye adet.

Piraniya wan bûne eşîr û xeyset, û adetên kurdan diparêzin. Hin ji wan xwedan zevî û gundî ne, yên mayî jî koçeriyê dikin.

Li Hekarî sê êlên giran hene, ji bajarî û koçeran pêk tên. Her êlek nêzikî 15 hezar malê ye. Navê van êlan: Hertûşî, Xanî û Pinyanişî ne. Bilî ji wan hê çend qebîlê din li vê herêmê dijîn.

Li herêma Botanê pênc eşîrên giran hene: Dîrşahî, Hecî 'Elî, Şîrî, Alakî, Dudêrî, piraniya wan xeymenişin in (koçer in). Gelek qebîlên ne mezin jî li wê derê rûdinin.

Li Amêdîyê sê eşîrên giran hene: Zêbarî, Mizûrî, Herkî û di her eşîrê de degera 12 hezar malî hene, her wesa gelek qebîlên biçûk jî.

Li Diyarbekirê sê eşîrên giran hene: Milî, Qereçûrî, Silivî, di her eşîrê de bêtirî 15 hezar malî hene. Êlên biçûk li wê derê, heya tu bibêjî, pîrr in.

Li Wanê du eşîrên giran: Şikakî û Şikaftî û gelek qebîlên biçûk, hene.

Li Mûşê û Bedlîsê du eşîrên giran: Hesenan, Cibran⁽⁴⁾ û gelek qebîlên mezin, hene.

Li Bayezîdê çar eşîrên mezin: Zilan, Celalîyan, Heyderan, Sîpkan û bêtirê 300 qebîlên mezin rûdinin.

Li Erziromê eşîr caran tunebûne. Heger li gundên wê derê çend malbatên kurdan hebin jî, wê mehkûm bin, ji êlekê revyabin wê derê û mabin.

Kurdên êla Ducikî sê eşîrên giran in: Qureysî, Belebani, Cihanbegî. Gelek qebîlên biçûk ser wan tên hesêb.

Li Qersê timî eşîra Hesenan tenê jîyaye, ev eşîr degera 400 malî ye.

Li herêma Soran ev çar eşîrên giran hene: Zirkî, Şukrî, Baban û Bilbas. Rûmeta wan di nav êlên mayî de bilind e û bi mîrxasîyê hatine nasîn. Her êlek ji wan heya 20 hezar malî ye, xwedîtîyê dikin li hespên esîl (reha) turkmanî. Şêrên wan bejin bilind in, zirzan li xwe dikin, gelekî mîrxas in û durifên wan bi kurdên van êrdiman nakeve. Li gorê gotinên mezinan, ev êlana neviyên wan pêlwanên mîrxasên kevnar in, bi rastî jî gelekî di durifê wan de ne (...) heya nuha ew çekên mîna berê bi fitîl hiltînin tu çekên teqandinê yên mayî cem wan tune ne. Hemû bi rim û şûr in û hemû riyên xwe berdidin (...).

Şarezor li ser sînorê wilayetên Tebrîz û Kermanshahê ye. Ev wilayetana û çend kela û qezayên din, ku berê bi Hekarê ve girêdayî bûn, ketin bin destên farisan. Wan ev herêm ji tirkên pozlijor (qurre) sitandin, ji bo sînorên xwe serrast bikin. Cîyên dinê weko: Sine, Seqiz, Şino, Saxbûlag (Sawûcbulag), Şemdînan, Bane, Balak, Serdeşt, Çalê, Somayî, Biradost û dîrok heya

(4) Di serena ser wergêrê de A. D. Jaba înfarmasiy-oneke balkêş ser elaqeta êlan bi hukimeta Tirkîyê re, sala 1865, dibêje.

nûha xirecir (hucet) ser wan çêdibe. Zaravê van deran Hekarî ye, ev zaravan li gelek qeza û cîyên bi Bexdê ve girêdayî jî bikar tê, mîna qeza Kerkûkê, Erbil, Altun-koprî, Zohab, Xoşnav (Oşnû) û Rewandizê. Xelkê van herêman kurd in, bi zaravê Hekarî dipeyivin, lê di zimanê wan de ferqek mezên heye.

Li Kurdistanê degera 70 hezar malên re'ayên ermen, 15 hezar malên nestûrîyan (asûrîyan) û 200 malên cihûyan hene.

Re'ayên⁽⁵⁾ Kurdistanê bi kurmancî depeyivin. Ew mêrxas û çekdar in. Ew mêrê şeran in, karin li ber kurdan rabin û bisekinin jî.

Di nav kurdan de êzîdî hene. Şeytên diparêzin, ew rojîyê zanin, ne nimêjê, vexwarina areqîyê cem wan ne heram e, loma çi gava lê tê vedixwin. Lê sunet kirin cem wan heye, bi mêrxasîya xwe li pêş kurdên mayî ne. Zimanê wan kurdî ye, tu ferqa wî tuneye. Êzîdî tenê bi ola xwe ferq dikin. Cem êzîdîyan qewal û pîr û şêx hene, lê kesê jî wan nizane bixwîne, ne binivîsîne. Ne cara pirtûkên wan hebûne û ne jî nivîsandina wan hebûye, wesîteya wan a dan û sitanadinê tenê zimanê devkî ye. Dibêjin êzîdî jî reha Yezîd Îbn Merwan in, ewê ku nifira mal

bata Muhemmed -aştiya Xwedê lê be- ji ber kuştina Huseyn, lê ketiye. Kuştina mirovê êzîdî cem kurdan ne guneh e û her carê gava rê dikevê kurdên musulman, êzîdîyan dikujin û jinên wan ji xwe re dikin carî. Ew ji dikanên qesabî yên êzîdîyan goşt nakirin, çimkî êzîdîyan murted dihesibînin.

Jimara tayîfeya êzîdîyan gelekî pîr e. Eşîrên wanî li wilayeta Bayezîdê ev in: Husênî, Şasakî, Çux-reşî, Kelsorî, Kele-reşî, Huwêdî, Şixayilî, Kilêrî, Remûşî, Kazanî û Dehsinî. Li wilayetên Wanê û Mehmûdî ev êlên êzîdîyan dijîn: Baravî, Reşî, Şendakî, Başemî, Şenda-sorî, Kurtakî, Darkazînî, Botekî û Hûrî. Li Mûşê û Bedlîsê ev tayîfên êzîdîyan dijîn: Çakoyî, Avokî, Akûsinî, û Bellî.

Ji bil van tayîfên êzîdîyan ê me gotin, êlên Êzdîxan jî hene, nêzikî 15 hezar malî ne. Navbera Mûsil û Cizîrê, di Çiyayê Şengalê de dijîn, bêtirî 300 şênî û gundên wan li wira hene. Wana demek dirêj serê xwe danexistin lê dawî (...) teslîm bûn. Pîr, şêx û qewalên êzîdîyan û her wesa hakimên wan jî hebû bi eslê xwe ji çiyayê Şengalê ne.

Di *Şerefnameyê* de, navê van wilayet û bajarên mezin hatine: Gurcistan, Azerbêcan, Xorasan, Loristan, Şarezor, Baban, Şino, Behdînan, Botan, Iraqa Erebîstan, Baxda, Diyarbekir, Bişêrî, Hekar, Muksê, Şêrwan, Xerza, Hêzan, Kufra, Yspayêrd (Sipayêrd), Bedlîs, Mûş, Wan, Silîvan yan Bayezîd, Erzirom, Qers û Çeldêran. Afiranerê *Şerefnameyê* diroka hemû eşîr û qebîlên wan wilayetan dinivîsîne, bê

(5) Li gorê A. D. Jaba di serenca xwe de dibêje, mebesta Mele Mehmûd jî terma "re'a" (ji re'yet) file ne. Tê fêm kirin, ku Mele Mehmûd jî mîna Şeref Xanê Bedlîsî, Xusro Ybn Muhemmed Benî Erdîlan, Mah Şeref Xanim û diroknivîsên kurdên mayî, manake firehtir dike vê termê û bi mana bajarîyên xwedî bikar tîne. Belê carna di têksta pêşgotina kitêba *Dîroka Kurdistanê ya Nûjen* de, bi mana Jaba gotiye bikar tê.

kokên wan digihên ku, nevîyên wan kî ne, hakim û axayên wan rêz dike û xwanê dike, bê hukmê her yekê çawa bû û heya çi derecê bû, paşê digihê heya behsa hakimên Palo, Egîna û Mêrdînê jî dike. Di pirtûkê de behsa hakimên din jî bûye, mîna: Cengêzî, Selçuqî, Tîmûr Gurgan, Sefewî, Ak-koyunlû, Qere-koyunlû, qeralên Ermenistanê, Ebbasî, Eyyûbî, sultanên turkman û Ozbêka, Şah Tohmasb û dînastîya Osmanî. Şerefhan, behsa hin bûyerên di gundên van hakimên de qewmîne û şer û cengên wan dike.

Afiranerê *Şerefnameyê* jî rehek pak û şerîf e (merd e). Mezel û gora Şeref Xan li bajarê Bedlîsê ye. Piranîya mal ê xwe, Şeref Xan li xelat û comerdiyan da, mizgeftê mezîna û medreseke ava kirin. Nûha jî nevîyên vê malbatê li wira dijîn, lê tu hukim di destê wan de nîne, ew ser nefeqa hindika jî tîmarê dîghê wan, dijîn.

Rojekê jî rojan rûmeta vê malbata hêja (comerde), li ba sultanên tirkên û şahên farisan jî mezîna bû. Şeref Xan bi xwe demekê di xizmeta Sahib-Qiran⁽⁶⁾ de maye, bi malê ve demekê li bajarê paytextê Qezwînê û li Xorasanê jî ya ye. Di dawîya pirtûka xwe de bi serbilindî û kêfxweşî mikur tê, ku bi zarokên şahên re xwendîye.

Bi vî rengî, afiranerê *Şerefname* berî giş dixwest dîroka kurdan, kokê (eslê) wan binivîse, behsa hin

êlên cuda jî bi fireh bike. Nûçeyên din jî hene behsa sultan û qeralên berê û sultanên osmanî jî tev wan, di nav peyvê de, carna dibê. Naveroka (têma) nivîsarê a rastî, dîroka tayîfên kurdî ne. Tevî ku di nava kurdan de zanyarên dengdar, şêxên xwedî rûmet û şairên mezin jî hene, ku mîna nivîsarên ereb û fars, nivîsarên pexşan û afirandinên ilmî (zanistî) şîiran danîne, şîir û diwanên⁽⁷⁾ rengareng rastîne, belê heta îro li Kurdistanê pirtûkek din mîna Şerefname nehatîye nivîsan- din. Derheqa bûyerên dîrokê tenê sitran û çîrok çêbûne û kurd bi dengê bilind wan dibêjin.

Bi rastî, ev nivîsara dîrokê ya yekî ye ku cîyê sereke tê de ji kurdan re terxan bûye. Ew bi farsî hatîye nivîsandin û dûre yekî jî xelkê Bedlîsê wergerandîye zimanê tirkî. Wergera tirkî jî xironîka Şeref Xan re bi zimanekî tekûz pêkhatîye, ew bi xwe kitêbek dîrokî ye, hêja ye. Ev kitêb gelekî degme ye (nadir e), tenê du-sê êksimparê wê hene.

Ji sîsîya yek jî wan mîr û malmezîna û axîyên tayîfe û eşîr û qebilên kurdan ê li jorê hatine rêzkirin, hakimê koçeran bû (xeymennişînan) û yên mayîn ser bajarîyan, xwedîyên kela, qeza û gundên bi tapo û qoçanên deryîyê bilind ser navê wan muhur bûne, hukim dikirin. Evana maldarên edîb in, mirovên dilsoz û hêja ne. Kêman caran diqewime, ku tayîfên bajarî- yan (...) li talanan xîn, pîrrê caran koçer van karên nebaş dikin.

(6) Tîpane "xwedîyê bextê spî" leqeba, ku mîr Tîmûr pê deng da. Di vê halê de xwanîye, mebesta afiraner şahê Sefewî Tehmasbê yekem e (1524-1575)

(7) Diwan, ji farsî "koma helbestan" e.

Kurdên musulman, yên bajêrî, musulmanên baş in. Li nav wan ulema (zanyar), zana û mêrxwas hene.

Weko di Şerefnamê de jî hatîye, êlên kurdan gelekî qedrê serokên xwe digrin û parvekirina ser qat û çinan diparêzin. Ew heta dawî di bin emrê wî de ne (serokê xwe), jê re guhdar in, tişteki bê wî nakin û gotina wî li erdê nadin. Kurd bi xurtî adetên mêvandariyê diparêz- in. Tevî ku, ew bi xwe carna ser xêra ermenan dijîn û fêydê ji wan dibînin jî, lê borcê mêvandariyê ji dil û can bici tînin û kêfxweşiya xwe dîyar dikin. Ew (kurd) ji zimanê xweşî û cirra nerm hez dikin, mîna metelok dibêjin: ji bo azyetê deh tas av vedixwin, ji bo bişirandinekê hezar xizmetan dikin.

Tayîfên kurdan bi çavnebar li hev dinêrin û kurdên Îranê çavnebariya kurdên Osmanî dikin. Belê hema dijminekî biyanî xwanê dibe, hemû dijî wî dibin yek. Lê gava ew xwe bi xwe pev diçin, dawîya tifaq û yekîtiyê ye. Herkes li aliyê tayîfa xwe disekine û helbet mecbûr dibin xayîntiyê bikin, camêrî û mêvandariyê jibîr bikin.

Heger fermanek ji jor de bê yekî wan (kurd be) bi eslê xwe nizim, bike serokê êla wan, ew (kurd) wî qebûl nakin û bi her hawî wê berdin wî lê eger hakimê wan bibe mirovekî biyanî, ewê gorra wî bikin û li ber wî ranabin, bere çiqas kêmbê û bêrûmet be jî -weko ermenan- ne xem e.

Hevalbendên kurdan hene dibêjine wan şûrkêş. Navên wan ji navên eşîrên wanî, ku ew jê derketine, tên.

Heger şer di navbera wan û eşîrek din de vêkeve, hemû eşîrên tayîfa wan radibin, piştî wan digrin, ya dijmîn vedigerênin ya jî herdu alîyan li hev tînin û dijmînatiyê disekinînin. Binêrin bê timî çawa dibe. Aliyê gunehkar gava pêş davêje. Gunehkar diçe mala aliyê din, ya mala nabênçî û bi nermî û zimanê xweş recê dike û piştî lihevhatinê dijmînati namîne. Erdên çandî û gundiye Kurdistanê, ku heta îro di destê kurdan de ne, heqê milk û xwedîtîya wan weko mîratê bavê, ji bav digihîje kur. Ne hukûmet ne jî hakim, nikarin doza wan bikin. Hemîyan serbest genimên xwe diçandin, dextlê xwe diçînin, kesî bac nedida.

Tenê mirovê ne musulman, bacek bi navê "zekatê" didan xizanan. Ev bac ji bexçan jî dibirin. Ji ber ku bav û kalên van tayîfan bi zora çekan di şeran de, ev ax û milk ji ermen û guncan sitandine, ew (êlên kurdan)⁽⁸⁾ bacê distînin, li gor peyvên wan ev qaçor dewsa xwîna bav û kalên wan e.

Berê hukmê Sultan Mehmûd, li Kurdistanê ne yek pere jî qaçor nedidan sultanên Osmanîyan. Li hin derna ji neçarî qaçor didan, çunkê, beg û axên wan biçûk bûn. Dergehê Bilind (Babê 'Alî) tu carê qaçor û salyan ji wilayetên Kurdistanê nesitandine. Heta roja îro li Kurdistanê 'oşran (dehekan) û salyanê nadin

(8) Di kevanên girover de, şirovekirina A. D. Jaba ji wergerê re ye.

û suxrê nakin. Pereyên ji walîyîk û biyêylikan dihatin, diketin xezna dewletê. Sultan beraata hukmê qezê (senceqê) didan yekê ji nevîyên milkdarên kevnar yên wê senceqê.

Dema hukimetê xar dibirin ser gawiran, beg û mîr û xelkê Kurdistanê bi temamê -bê ku tu meaş û tu erzaqê bixwazin- beşdarî êrîşa sultan dibûn. Bi bîna fereh zehmetîyên şer dikişandin û ji dil û can bi siwarî nobetê li cîyên herî zehmet dikirin, ev wezîfe tenê kar û barê kurdan bû. Gava şer disekinî û esker vedgerîya, sultan bi xwe ya sereskerê wî desteyên mîr û began rêz dikirin û lê dinêrî. Bi her hawî razîbûna xwe xwanî dikir, kincên giran li gorî rûmet û merteba her yekê, xelatê wan dikirin û perwayîyên payedar dida wan mîna rezamendîya berza melekî.

Sitendina xelat û dîyarîyan ji mîrên kurdan qedexe ye. Hatinên fermî li Kurdistanê, heta vê dema dawî ji serok, beg û axayên wan (yên kurdan) û xwedîyên milkan re bû. Her salê reyîyê du parê 'oşrê û sed pere didan axayê xwe. Mehkûmê ji Îranê yan ji Turkiyê direvîyan û xwe li Kurdistanê vedişartin, li wîra ji xwe re pişt didît. Kurdan pere bêş dikirin û bi her hawî dixwestin wî fik bikin. Ew kurdên ser sînor dijîyan, caran fêda xwe ji hevkarîya bi farisan re didîtin û diçûn alîyê wan. Sultanên Osmanîyan paşê gunehê van mehkuman jibîr dikirin li wan dibûhirîn. Carna êlek kurd bi temamî direvîya Îranê, demekê di xizmeta şahana de, di nava merdî û

qencîyên wan de dima û paşê vedgerîya welêt. Di *Şerefname* de jî behsa bûyerên wesa hatiye kirin.

Pirr cara kurdên Turkiyê qîzê kurdên Îranê ji xwe re dixwazin û qîzên xwe dewsa wan didin. Mehrên ji vî rengî, di nav mîran û qîzên malmezinan de, tên birîn. Ne pirr zû de Mîrza 'Ebbas xûşka Yehya Begê, ji malbata Çarî Beg a dengdar, li Hekarê, xwest û ji xwe re anî. Xûşka wî a duda bû jina kurê Mîrza 'Ebas, Mihemed Mîrzayê, ku paşê bû Şahê Îranê. Vê mervantîya zewacê hişt Yehya Beg têkeve bin hukmê farisan, Kela Çaro û temamiya wilayeta xwe sipart eskerê wan. Leqeba Xan xelatê wî kirin û navê wî bû Yehya Xan. Wî li Îranê gelekî deng da û rûmeta wî cem hemîyan bilind bû.

Ji nêrîna pêşî, kurt sert û nezan xwanî dikin. Belê tevê wa ew di kar û barên dinê de jêhatî ne û zanin çawa întirêşên xwe biparêzên. Di danûsitandina xêrê de, kurd bi farsan gelekî nerm in û dema gerek be bi ewropî û nûnerên milletên mayî re jî, karin xweş derbaz kin. Ew kurd ne wa şûnmayî ne weko Osmanîyan. Li gorê demê û rewşê dikevin bin kumê hinekan, bi wan re li hev dikin û heger di xizmeta hakimekî biyanî xurt de bin, erka xwe bi serûber dikin.

Çaxên berê, gava di navbera Osmanîyan û farisan de şer vêdîket, herdu alîyan ji bo çavênîya asêgehên dijmin pêşîn, kurd bikar tanîn. Ew (kurd) hunerê şeran zanin, ji xarên şevê re jêhatî ye, çimkî di

navbera wan xwe bi xwe de dijminatî ebedî ye. Şev û roj di şeran de ne, xwînî ne û timî li xerîbîyan digerîn. Ew hosta ne di hilanîna çekan û siwarîyê de. Ne jê têr dibin û ne diwestin, mîna mîletên mayî. Rê ne dinê jîyanê, ku ji kurdan re hem kar bin û hem jî listik û şahî bin, nîn in. Gava demekê ji neçarî bêkar rûdinên, wê saetê jî çend hevalan ji xwe re dibînin(...). Jêhatîbûna wan di hunerê şer û hostaya hilanîn û bikaranîna çekan de, ji rewşa jîyana wan tê. Mewhîya tek û serbilindîya tek ji kurdan re, şer û êşîr in.

Ji alîyê jinan ve, adetên kurdan mîna yên ewropîya ne. Ew jin û keçên xwe venaşêrin. Jinên kurdan serbest derdikevin her derê û ji ber kesê narevin. Mêr kude herin, jin didin pê wan û di şeran de alîkarîya peyên xwe dikin, çekan hiltînin tevê şer dibin.

Du kêmasî di nav kurdan de tu carî bela nebûye: serxweşî û bênamûsî. Belê danûsitandina rojane bi turkan re hiştîye ev herdu kêmasî li hin wilayetan bela bibin. Piranîya kurdan ji van qebhetan dûr direvin, tevê ku ji curmên mayî re, mîna (...) talan kirin û çetefîyê, hazirin. Ev curm cem wan rojane ne. Lê hema mehkûmek xwe dexîlê kurdekî bike, ew ê malê xwe giştî ji bo alîkarîya dexîlê xwe bike qurban û heta jê bê alîkarîyê dike.

Afiranerê *Şerefnameyê* ev xeysetên kurdanî bilind hemû nivîsîne. Xwendinek bi lez ji vê kitêbê re, mirov bi sincên (exlaqên) kurdanî

bilind. Bi firehbûna welatê wan, bi hukim û dîroka hevraza wan mîrên, ku rojekê ji rojan gelekî bi hêz bûn, tevî kurd nûha qels û bêfam in, dide naskirin. Belê hîna jî gelek êlên kurdan dewletekê ava bikin, hemû wilayet û malbatên mezin û mîletê wan deran di çerçeva wê de bin.

Gelek zanyar û hozan bawerîn: heger kurd, mîna mîletên mayî, yekbûna û serê xwe ji hev re daxistana, wê karibana dewlet ava kiribana û serxwebûna xwe eşkere bikirana. Belê evî, ku eslê van êlan yeke timî jî bê tifaqin. Ji ber vê bêtifaqîyê kurd li Turkyê û Îranê û wilayetên mayî bela-wela bûne, xizmeta hakimên wan deran dikin û serê xwe ji wan re dadixin. Evî wesa jî, heger hemû êl dest bidin hev -ev bi xwe gavek ne biçûk e- bêguman, wê têra dewletekê xelk û hemwelatî hebin.

Ji çaxa melikan⁽⁹⁾ de, gelek ji kurdan bi serê xwe hukim dikirin, mîna Melek Tahir û Bedreddîn Qere Yûsif, ku navên wan di *Şerefnameyê* de hatine. Hakimên Kurdistanê ferman didan, xutbe bi navê wan were xwendin û heya van demên dawî xwe hakimên serbixwe hesab dikirin. Wan bi serê xwe hukim dikirin û fermanên xwe bê muhra turkan bela dikirin, mîna paşayên Erziromê, Wanê û Qersê.

(9) Di nêrîna A. D. Jaba de, afiraner behsa dînastiya kurdên Eyyûbî û Selaheddîn dike.

Beg ya axayê li ciyekî, li qezayên senceqekê ji senceqan dima, salê carekê hespek du hesp xelatê walîyê wê senceqê dikirin. Walî jî ji alê xwe, xelatek giran li gorê rûmeta wî begî ya axayî xelat, bi zabitekî xwe re dişand. Berî hatina wî zabîfî, beg eşîra xwe giş, siwarî navmalê, dicivandin û bi hele-hopek mezin diçû pêrgî wî, da xelata giran wergire û bi serbilindî li xwe ke. Zabîf çend rojan mêvanê ezîz dima, paşê ew bi rûmetek mezin bi rê dixistin û hespekî baş dîyarî wî dikirin û perene ji bo xercîya rê didan wî.

Gava şerek vêdîket, walîyê senceqê name ji begê herêma xwe re dinivîsand, çekdar jê dixwestin. Beg jî li gorî dîtina xwe, ya ew tevî peyên xwe diçû şer, ya jî baş-begek tevî şervanan dişand xizmeta walî. Lê gava beg nexwesta tew guh nedida fermana walî û peyakî xwe jî nedişand. Xweserî û bêmîriya mîr û begên Kurdistanê gihan dereceke wisan, ku hinek êrîş ber didan hinekên mayî ji herêma xwe, welat talan dikirin û hev dikuştin. Paşayên senceqan qet li pêş wan ne disekinîn û îşê xwe ji tişteki nedianî. Pîrr caran hakimên kurd yên Erziromê, Wanê, Mûşê, Bayezîdê, Hekarê û qezayên Kurdistanê yên mayî, li ber hukmê paşê radibûn, serê xwe hildidan, bi dijminatî êrîşê hev dikirin dibû şer. Paşê begek ji cîranan diket nav wan, ew hêmin dikirin û li hev dianîn.

Em li ser şer û gelacîyên wesa di vê pirtûka xwe ya nû ya dîroka Kurdistanê de, ya nûjen, bi firehî sekînin. Li vira di pêşgotinê de, em bi kurtî peyivîne, ji bo xwendevan fikrekê hilînin. Tayîfên kurdan heta

dawîya hukmê sultan Mehmûd bi serê xwe bûne. Celalet Sultan êlên kurdan kirin bin emrê xwe û ew mecbûr kirin qaçoran bidin xeznê. Tenê kurdên Dêrsimê û Êla Ducîkî serî danexistin. Ew geh paşde diçûn li ber hêza esker û geh radibûn ji nû ve serê xwe hil didan. Bi xwe ji kurdan re adet e, li ber zorê serî dadixin û gava ji wan re fersendek baş tê, ji nû ve serê xwe radikin.

Kurd berevajî mîletên mayî, hesabê dawîya pîrsan nakin, ji bo armanca xwe bicî bînin her tiştî dikin. Timî karê wan ev e, eynî zanibin dawî xerab e jî. Nizanim gelo ev ji eşîmî ye, gelo mêranî ye, ya ji ber ku natirsin. Mîrov bi tebîeta xwe ji mirinê ditirsin, lê kurd di şeran de tu hesabê jê re nakin. Ew hez dikin di meydana şer de bîn kuştin, ne ku mirina xwedê bimrin. Kurd ser mirovê di şer de tê kuştin nagirîn, di nerîna wan de mirina wî mirinek hêja ye.

Gava xortek di şer de tê kuştin, yan mirina Xwedê dimre, qîzên kurdan mîna hawê ereban, bi zimanê kurmancî distirên (davêjin ser wî). Cem kurdan adeta dayîna nanekî heye. Mîna cem ewropîyan. Ew cilan davêjin ser pišta hespê xortê kuştî û seleha wî jî datînin ser pišta hesp û li pişt darbesta wî dajon. Bi hele-hopek mezin mirîyê xwe didin gorê, xwedî û mirov ji serîyan heta lingan reş li wan e, nişana şînê ye. Hin xanimên meriv, xûşk û dotmamên mirî, qîz û bûkên ciwan, gulîyên xwe dibirin û datînin ser gora wî.

Kurd bê hesab zalim bûn. Heger karwanek yan kerîyek ji qezak biçûya qezake din, begê wî ciyê mirovek

dişand, da risûmatên rê û derbaz-bûnê bistîne û bi navê bac û gumrikê çî bixwesta distandin. Ji bilî wê, axayên kurdên koçer jî, ku li wê navçeyê diman, xelkê xwe dişandin ser wî karwanê ya kerîyê û gumrikek din ji wan distandin.

Êlên koçeran zorê li re'îyê û li xelkê wilayetên Kurdistanê dikin, gelek ziyanê digihînin wan. Mirov kare bêje, axayê kurd di qeza xwe de mîna walî ye. Berê hakimê wilayetê nikarîbûn vê zulm û zorê ji ser xelkê rake. Lê nuha hêza kurdan nemaye û nema zîyanê dikin. Caran kurdan tiştê nedidan walî û ne tu qaçor didan Xezînê. Lê nuha eşîr giş ne di wê hêza berê de ne, loma peyên wan diçin eskerîyê, qaçoran bi temamî didin dewletê, qanûn û nîzame jî xirab nakin.

Re'îye û ermen li Kurdistanê di her tiştî de mîna kurdan e, tu ferq di neqeba wan de nîn e. Piranîya wan bi kurdî dipeyîvin. Jin û zarok tenê bi kurdî dipeyîvin û tu zimanekî din nizanin. Adet û sincên wan mîna yên kurdan e. Berevajî welatên musulmanan yên mayî, jin ji civatên mêran narevin. Di cejn û dawetan de jinên re'yî yên musulmanan bi hev re destên mêran digrin û tev de govendê digerin. Kurd û ermen dibin kirfêvên hev. Ew bi hev re baş dijîn û zorê li hev nakin, mîna li hin êrdimên din diqewime.

Ji rîsipîyan pê ve kesek jî kurd û ermen rîya xwe bernade. Belê şêx, pîr û qewalên êzîdîyan rîyên xwe ber-didin tu carî guzanan bikar naynin.

Hêjayî gotinê ye, ku re'ayên Kurdistanê jî vexwarina araqê, qumarê û qehbetîyê nizanin. Re'ye

çekdar in û gava diqewime bi musulmanan re şer dikin. Wan bi mêrxwasîya xwe gelekî deng dane. Nestorî bi mêrxwasîya xwe li pêş kurdan e jî. Zimanê pê dipeyivin, zimanekî cuda ye, serbixwe ye. Belê bi erebî dixwînin û dinivîsînin û alifbeya erebî bikar tînin.

Kurdên li Erziromê, Wanê, Bayezîdê, li Îranê û Rûsyayê gelekî aqilmend in, di nav wan de aqildarên zorzan hene. Li van kurdên Hekarî, Botan, Behdînanê, Silêmanîyê û êlên Bilbas, Zerzan û Mukrîyan, mirovên xwenda, edîb û zana -tenha- beg û zariyên began û kurdên malmezînan e, ku geryane û li odan û civatan rûniştine (...).

Ji ber dijminatîya herdemî, ew ji kuştin û îşyanê re hazir in, timî hevûdu dikujin (...). Ji kê re lê were, wê dijminê xwe bikuje. Kurdên herî zalim êlên Bilbasan, Zerzan, Baban û Mukrîyan e (...). Ji berê de, gava li nav wan kuştî diket, ne walîyê herêmê û ne hakim, îşê xwe jê neta-nîn. Qazîyan jî îşê xwe ji safîkirina xîrecirên nav wan netanîn, kurdan wan bi xwe hevdu ceza dikirin, lihev dihatin û bûhayê xwînê digotin.

Di nava êzîdî û melayên musulmana de şerekî oldarî digere û her yek ji wan li fersendekê digere yê din bikuje. Tevê ku êzîdî hemû ji tayîfekê ne, gelek birrên wan hene. Ew tev de Şeytên -di şiklê rokê de- diparêzin û jê re dibêjin Melek Şems. Îbadeta wan ji vê keykebê re ji rohilatê ve destpê dike. Dibêjin gava pîrên wan ne hazir bin, êzîdî mehra xwe, bi destên melayên musulmanan dibirin. Ser eslê kurdan, adet û sincên wan, wilayet û êlên wan di Şerefnamê de bi firehî hatîye nivîsîn. Bûyerên vê

dawîyê, ku di wê de nehatine
nivîsandin û nûçeyên mîletê vî welatî
û şerên li vîra gerîyan e, naveroka vê
pirtûka *Dîroka Kurdistanê a Nûjen* e.

ÇAVKANÎ:

- Dr. Ferhad Pîrbal, *Mele Mehmûdê Bayezîdî*
1799-1867, weşanxaneya Aras, Hewlêr- 2000
- *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî*, Tercumeya
Mele Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd
Dêreşî, Weşanxaneya Spîrêz, Duhok 2007.

Kurtîyek Ji Destpêka Jîyana Min*

(5ê Kanûna 1905-11/01/1993)

Osman Sebrî

Di 5 ê meha yekê sala 1905an da li gundê Narincê ez hatime dinê. Narince gundeke ji eşîra Mirdês girêdayîye bi qaza Kextê û wîlayeta Adiyemanê. Bavê min Sebrî serekê eşîra Mirdês bû. Ez heşt salî bûm gava bavê min mir û li şûna wî apê min Şukrî bû serekê eşîrê. Ez jî di ber destê wî da gîham û wî bi dilovanîya xwe rêya jînê li pêş min rast kir. Di biçûkîya xwe da ez ji bo jîneke eşîrê hatibûm pêkanîn. Wek siwarî, şerrevanî û eşîr parastinê. Bawer im kû di van waran da pirrtirî zarokên serekeşîrên mayî bi pêş ketibûm.

Ji ber ku malê min pirr û birayên min tinebûn, zûka ez ji dibistanê derxistim û zewicandim. Heya ji min ra kurr bibin, da gava bimirim ew mal bê xwedî nemîne. Ji alîyê din ji bo tevgera eşîrê ji apê xwe ra bibim alîkar. Tevî ku



Osman Sebrî

bira û birazîyên ji min mezintir di rex apê min da hebûn. Pirrtirî hemîyan ji min hezdir û dixwest min li pişt xwe

* KURDISTAN PRESS, hejmar: 74, 27 Hezîrana 1989

bibîne. Ji ber ku apê min ra gelekî baş bû min jî ne dixwest dûrî wî bimînim. Bawer im qencîya ku wî ji min ra kirî, apêkî din nikare ji bona biraziyê xwe bike. Tevî ku ez ji dibistanê bi dûrketim jî min dev ji xwendina kitêban berne-da û her dixwend. Di xwendinê da min pirrtirî her tiştî ji dîrok û hel- bestan hez dikir. Lê mixabin ku ji Dîwana Melayê Cezerî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî pê ve nivîsan û helbest -ên kurdî neketibûn destê min. Ew jî pirrî min xwendibûn jiber kiribûn.

Ez gihabûm vî warê jînê ku di pêşîya sala 1925an şoreşa Şêx Seîd dest pê kir. Rojekî ji rojên meha Avdarê sala 1925an nameyek ji apê min Şukrî hat, ji min dixwest ku digel pismamê xwe Necmeddîn biçim gundê wî Arxê. Her car gava bixwesta civînek malbatî çêbe dişande pê me û em diçûn gundê wî dicivîn, li ser rewş û tevgera eşîretiyê dipeyivîn. Me dîsa tiştêkî holê bawer dikir. Gava civînê dest pê kir apê min got:

-Ev e Şêx Seîd bi şoreşê rabûye, em nizanin çiqas der ji bi şoreşek holê xwe pêk anîye. Lê gava şoreş serdest nebe Mistefa Kemal dê tovê axan di Kurdistanê da hilînê. Ev e dê ji Şêx Seîd ra nameyekî bişînim. Çi gava leşkerê şoreşê bajarê Sêwerekê bistînin, em dê rabin bajarên Adiyaman, Meraş û Entabê ji destê turkan bi derxin, holê roavayê Kurdistanê aza dibe.

Bi vê gotina kurt civîna me qedîya. Katibê wî nameyek ji Şêx Seîd ra nivîsî. Name dane destê mele Evdirezaq şandin Diyarbekirê. Hingê ev bajar ji alî leşkerên Şêx Seîd ve dor-girtî bû.

Pir neçû ji ber bêbextîya hin serekeşîran şoreş ji hev ket û Şêx Seîd kete nav lepên tirkên û bi darve bû. Hînga hikûmeta tirkên hemî serek-eşîrên ku mêldariya Şêx Seîd kiribûn girtin dan mehkema Îstîqlalê. Wê çaxê hikûmetê herdu apên min Şukrî û Nûrî, ez û du xalên min, ji eşîrê jî 280 kes xwestin mehkema Îstîqlalê. Ji ber ku em erdê xwe da xurt bûn, tenê ji kesên hatibûn xwestin apê min Şukrî û xalê min Hacî Derwêş çûn mehkemê, ên mayî neçûn. Di pêşiyê da hikûmetê qîma xwe bi çûna wan herduyan anî û çavên xwe li ser neçûna me yên mayî girt. Hîngê Mehkema Îstîqlalê li Xarpêtê diman. Li zindana Xarpêtê apê min digel Hesên Xeyrî Beg ê Dêrsimî rûbarî hev bûbûn û li ser rewşa welêt dûr û dirêj bi hev ra peyivîbûn. Dawî li ser ramanekê gotina wan bûbû yek: Ji îro bi şûnda ne mikûn e kurd di bin ser-siya turkan da bimînin. Kî ji wan ji mirinê bifilite divê bireve, vegere Kurdistanê û di cihê xwe da bi şoreşê rabe.

Hesên Xeyrî digel hevalên xwe yên Dêrsimî bi darve bûn. Apê min Şukrî digel bireyên xwe Nûrî ku neçûbû zindanê her yek 15 salan hikim bûn û yên mayî beraet kirin.

Xalê min Hacî Derwêş dema ji zindanê vegeirî gote min:

- Apê te Şukrî di zindana Xarpêtê da digel Hesên Xeyrî Begê peyman dabûn hev, kî ji wan ji darvekirinê bifilite dê bi şoreşê rabe. Hesên Xeyrî digel hevalên xwe bi darve bûn. Apê te 15 salan mehkûm bû ku wî hukmî di zindana bajarê Muxleyê da biqedîne. Ew nizane ka dê wî li ser rêya Melatîyê

an Rihayê bişînin. Çi dema ji te ra telxirafê bişîne û bêje ji min ra peran bîne kîjan bajarî ji van, divê tu çend siwarên xwe bigirî herî wî bajarî û apê xwe ji destên turkan bi derxî û bîne welêt da ku bi şoreşê rabe.

Pîştî wê bi deh rojan telxiraf hat ku jê ra peran bibim Rihayê. Min şeş siwar digel xwe birin û çûm Rihayê. Gava ew gihaste Rihayê nebirin zindanê, digel zabî û eskerên tevî wî li otelê nivistin. Wê şevê me ew ji otelê derxist û vegeirî welêt.

Gava em gihan welêt divyabû bê rawestî em şoreşê rabin. Lê mixabin ku apê min nexwest bê tevkarîya axayên dost bi serê xwe rabe. Hemî axayên dost peyman danê ku digel wî bi şoreşê rabin û ji bona xwe pêkanîne çend roj xwe ragirtin xwestin. Ez ne bawer bûm ku axa bi peymana xwe rabin û min ya dilê xwe gotibû apê xwe, lê mixabin ew bi gotina wan bawer bû.

Di wê navê da bîst roj borî dema leşkerê turk hate ser me, hin ji axayên dost xwe dane paş û hinek ji bûn hevalê hukûmetê. Nema me dikarî bi şoreşê rabe, xwe ragirtina me tirseke kambax gihande dilê gundî û eşîran. Holê em du-sê mehan li çîyan man, xelkê welêt li rabûna şoreşê bê hêvî bûn, dawî em ketin nav lepên turkan. Wê çaxê mehkema Îstîqlalê çûbû Diyarbekirê, herdu apên min bi darve bûn, ez digel şanzdeh hevalan mehkûm bûm û ez şandim zîndana Denizlîyê.

Sala 1928an em tevî hemî mehkûmên siyasî hatin berdan. Di serê sala 1929an da careke din ez bi tevî 26 kes ji axayên doralî me hatin girtin.

Gunehê ku avêtibûn ser me tevdîra sazkirina şoreşê bû, ji ber ku mehkema Îstîqlalê nema bû em dan mehkema leşkerî. Vê carê xuya bû ku hikûmet dixwaze ji me xelas be û me bide kuştin. Lê ji bextêçak zabîte ku bi tehqîqatê rabû, serhengê kurd bû. Piştî heft meh tehqîqat em ji kuştinê xelas kirin û gote min:

-Vê carê min karî we xilas kim, careke din nizamî çî bi serê we tê. Ger tu ji welêt dernekevi, te dikuji.

Mafir em xwedî raman bûn divyabû ji welêt derkevin. Holê dawîya sala 1929an ji welêt derketim hatim Sûrîyê. Berî vê hatina min bi du salan partîya Xoybûn saz bûbû, ez hatibûm Sûrîyê ku di wê partîyê da xebata welatî bikim. Gava derbazê Sûrîyê bûm, ez destvala nehatibûm. Ji axayên ku dabûn rex turkan û tevdîra şoreşa ku me dixwest pê rabin gîhandibû Mehkema Îstîqlalê û bûbû sedema kuştina du apê min, paşê di serê sala 1929 an da ez û bîst û şeş kes dane girtin, min Bedir Axayê lawê Osman Paşa kuşt û paşê hatim Sûrîyê.

Piştî hatim Sûrîyê, li kanîya ereban bi cih bûm. Ji bo kuştina Bedir Axa hikûmeta turk bi hişkî vegeandina min a Turkiyê ji Fransîzan xwestibû. Lê Fransîzan dizanî ji bo çî min Bedir Axa kuşt, ji ber vê yekê hîn pirtir digel min bendewar bûbûn û rûmeta min girtibûn û dixwestin min têxin rêza dostên xwe. Piştî hatina min heftekî ,serekê îstixbarata Fransîzan şande pê min holê gote min:

-Em dixwazin hûn kurd bigehên mafê xwe, lê hûn xebata siyasî nizanin. Heke tu peyman bidî me ku bê haya me

tişteki nekî, em dizanin bavê te serekê eşîrê bû, em dê meaşê serek- eşîran ê bilindtir (150) zêrên zer û ji milkên dewletê şeş gundan bidin te.

Hingê min ev comerdiya wan qebûl nekiribû û ev bersiv dabû wan:

-Di hatina xwe da min gelek mal û milk li pişt xwe hişt û hatim. Ez hatime vir ku her wekî dixwazim û bawer dibim ji bo milletê xwe bixebitim. Naxwazim ku bi gotin û peymanan bême girêdan.

Piştî hatina Suriyê bi sê-çar haftan Celadet Bedirxan hatibû Kaniya Ereban. Piştî em rûbarî hev bûn, li ser destê wî ez bûm endamekî partîya Xoybûn.

Bihara 1930 li ser daxwaza Xoybûn ez derbazê nava welêt bûm ku bi navê Xoybûn digel hin serekeşîran bipeyivim û herim Dêrsim û Seyîd Riza bibînim. Piştî min nameyên Xoybûn dane çend serekan, ji ber pîsiya Silo Beg lawê Xan Begê Cûce serekê eşîra Îzolê bendê nameya ku min ji bo Seyîd Riza biribû hate şewitandin. Holê, bê ku xwe bigehînim Dêrsim û rûbarî Seyîd Riza bibim vegêrîm Sûriyê.

Çûyina min a Turkiyê û vegera min nêzîka du meha dom kiribû. Ji berk û min gelek belavok digel xwe biribûn û li nava eşîran belav dikirin, hikumeta Turk haydarî çûyina min bûbû, ji bo girtina min pir xwe westand. Ji alîyê din giliyê min bi Fransîzan kiribû, dema vegerîm Suriyê ne ma hiştin ez li kaniya Ereban bimînim û ez surgûnî Reqayê kirim û bi xurtî ez xistim ber çavan.

Piştî ez mehekê Reqayê mam,



**Osman Sebrî di zindanên Şamê da:
7/3/1972**

rojekî Bozan Beg lawê Şahîn Begê hat gote min:

-Partiya Xoybûn biryar girtiye di pênc cihan da dirêjî Turkiya bike û derbazê nava welêt bibe. Celadet Bedirxan di tala Cizîra Botan ra, Haco di tala eşîra xwe Hevêrkan ra, Qedrî û Ekrem Cemil Paşa tala Dêrika Çiyayê Mazî ra, Mala Îbrahîm Paşa di tala Wêranşehrê ra û tu jî digel me di tala Rihayê ra divê em derbazî nava Welêt bibin. Piştî em Rihayê bistînin divê tu berê xwe bidî



Rêza pêşînjî alîyê çep ve: Osman Sebrî, Omar Dizayî, Qedrî Cemîlpaşa. Yên li ser lingan ji çepê ve: Îzed Mela, Elî Dizeyî, Ebdurehman Zebîhî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza, Î. Ş. Wanlî

welatê xwe hêla Melatîyê, da em turkan ji nav Kurdistanê bi derxin.

Min nedizanîn ka Xoybûnê çiqas der ji kireke holê mezin ra xwe pêk anîye. Lê mafir ez yek ji endamên Xoybûnê bûm, divîyabû, bi biryara wê va bê me girêdan. Roja yekê Tîrmehê divyabû ev her pênc enîyên han di nava Kurdistanê da şerrê turkan bikin. Berî rabûnê bi du rojan ez ji Reqayê reviyam û çûm Kanîya Ereban. Digel Mistefa Şahîn û Bozan Şahîn civiyam û li ser tevdîra çûyîna nava welêt peyivîm. Wan gotine min:

-Roja yekê Tîrmehê digel bîst peyan li sînora raperî û du qereqolên ser sînora bîstînî. Roja dûtirî em herdu digel çarsed peya bigehên te û berî bidin bajarê Rihayê.

Hîngê di nava hemî wîlayetên Kurdistanê da leşker nemabû, hemî

şandibûn ser Araratê. Ji hêzên hikûmetê tenê jendirme mabûn ku ne dikarî li pêş şerevanên kurd rawestin. Şeva yekê Tîrmehê digel bîst peyan ji sînora raperî û me qereqolek girt û cendirmeyên tê da hemî kuştin. Şeva din me qeraqola din girt, me ew ji çek kirin û berdan. Lê Mistefa Beg û Bozan Beg nehatin. Wê rojê me bihîst ku Fransîzan her du Beg girtine û şandine Helebê. Gava peyayên digel min girtina began bihîstin terka min kirin û vegeriyan Suriyê. Ez bi tena xwe mam di nava turkan da. Piştî ku li Reqayê revîm nema min dikarî vegeim erdê Suriyê. Min berê xwe da bakur di nava welêt da çûm.

Piştî du mehan gava leşkerê turk li ji Araratê vegeirî careke din ez daketim Suriyê, lê rûbarî Fransîzan nebûm û çûm nava erebên koçer. Piştî ez veg-

erîm Suriyê, min zanî ku herçar enîyên din çi xwelî bi serên xwe da anîne. Celadet Bedirxan, Haco û mala Cemîl Paşa sê-çar rojan di nava welêt da mabûn û bê ku tîfîngê biteqînî veg-erîbûn Suriyê û Fransîzan hemî surgûnî Şamê kiribûn. Herçî mala Îbrahîm Paşa neçûbûn ser xetê, biryara Xoybûnê bi tevî belavokan ji walîyê Mêrdînê ra şandibûn ⁽¹⁾.

Heya vir min tişteki serpelkî ji ser-pêhatiya xwe got. Piştî vê ez bûme şahidê gelek gunehkarîyan ku nivîsan-dîna wan bûyeran ji bo me kurdan dibe rûreşîyeke mezin. Divê xwendevan qenc bizanin ku min çavên xwe li ser gunehê gunehkaran negirtîye û bi hişkî şerrê wan kesan kirîye. Berpîrs- yarîya berpîrsyaran jî hîngê raveyî gel kirîye. Di wê rê da gelekî westîyame, surgûn bûme û ketime zindanan. Lê îro nivîsana wan bûyeran da qencyekê ji bo me kurdan nabînim. Jê pêva berpîrsyarên wan bûyeran hemî mirin çûn. Ji bo min ne ji rûmetê ye ku zimanê xwe dirêjî mirîyan bikim. Paşê rewşa têkoşerên îro ji rewşa kurdên çûyî ne pirr çaktir e. Heke em bikarin ji rewşa gelparêzên îro hûrbîn ji şaşî çepeliyên wan destkewtî bibin têra me dike.

Çîroka bendewariya min digel ziman dîsa rengekî sîyasî digire ku naxwazim çêla wê bikim. Tenê dikarim bêjim ku serekî dirêj xebata min digel Celadet, piştî mirîna Celadet xebata min nêzîka du salan li ser bêjeyên ku wî hiştibûn ji min ra bûbû alîkar.

¹ Xelîl lawê Îbrahîm Paşa ev kira xwe bi devê xwe ji min ra got.

Çar Leheng*

Leheng 1: Ferzende Beg

Di sala 1929an da şerê Agirî hêdî hêdî berve xurtbûnê diçû. Şervanên kurd li her alî welêt berê xwe didan Agirî û li dora serdarê şoreşê Îhsan Nûrî xwe didan hev. Hîngê ji bo parastina sînorê çiyê û gaziyan bi lez siwarî divyabûn û di çiyê da hesp hindik mabûn. Serdar Îhsan Nûrî, Ferzende digel şêst siwarî şande nav eşîrên serhedan ku sedak hesp peyda bike; serê her gundê dewlemend hespek an dudu jê dixwestin. Civandîna hespan ne kireke ku ji hikûmetê biha

* Çend gotin: Heya demekî pirr nîzik xwendayên me kurdan wek bay û kalên xwe digel ziman û dîroka gelê xwe bendewar nedibûn. Lê di van çend salên paşin da hin xortên bi rûmet çavdane xwendin û nivîsandîna zimanê xwe. Bawer im ku ev tevger destpêka hişyarbûnê ye, ku kireke holê dilê her kurdekî bîrbir û gelparêz geş dike.

Ew herçar bûyerên ku di duvrê pirtûkekê da didim çapê, berê hejde salan min ji kovara Çiya ra şandibû û tê da hatibûn belavkirin. Îro jî dixwazim van bûyerên ku berî çil-pencî salî hin birayên me ên kurd pê rabûne û li pêş neyaran bi çi mêranîyê şer kirine û bi xurtîya dilên xwe çawa çavên dijmin şikandîne û serê gelê xwe bilind kirine, ji nûva bidim ber çavên xortên kurd, da bizanin rûmet, mêranî û gelparêzî çawa bûye û me îro çi divê bikin.

Divê em ji bîra nekin ku birayên me yên zindanan Turk, Iraq, Îranê da bê serî danîn doza gelê xwe bi xurtî ji neyaren sitemkar dîkin, ew jî celebek lehengî ye. Lê dil dixwast ku mêrxasên me kurdan bê hêsanî gewrîya xwe nedana destên neyaran. Çêtirî di zindanan da bi bêbavî bêne kuştin, bil ali serê çîyan, din av laz û zinarên welêt da neyaren xwe bikujin û bêne kujtin.

Qencê gel û qencxwazê niştîman ew in ku di rêya serxwebûn û parastina mafê gel da bi comerdî dimirin. Sed xwezî bi dilên wan şêran.

ta veşartin. Zûka haya hikûmetê jê bû. Serdarîya leşkerên Turk yê rojhlat du alayî siwarî şandin pêşîya Ferzende. Herdu alayî ne dûrî hev berî dabûn êrdima ku tê da hesp dihatin civandin.

Li pêş Gelîyê Zîlan alayîyek ji wan rastê Ferzende hat, lê nexwest bi tena xwe şerê wî bike, ji ber kûdizanin Ferzende kî ye. Ji lewra dûredûr li pê çû heya alayîya din jî xwe digehîne ser. Lê Ferzende bîra vê yekê dibir û nedixwest herdu alayîyan ser xwe bigehîne hev. Bê dudilî hespên ku civandibûn sipartin deh siwaran, bi pêncî siwarî dirêjî alayîya Turk kir. Şer bi awakî birûskîn dest pêkir. Şervanên kurd bê ku tîfingê biteqîn li pê bavê Efrasiyab ajotin ser nîveka alayîya dijmin. Devê tîfingên wan bêminet dighan qefsînga neyar, wek colek gurên dev bi xwîn bikeve nav keriyek pez. Turkan ev celeb şer nedîtibûn, nedikarîn sînga xwe ji devê tîfingên şehsiwarên kurd biparêzin. Kurdan tîfing dest bi dest berra pêşîra neyar didan. Leşkerên turk wek pelkên daran di ser piştê hespan da dihatin xarê. Bîstek neborî nayar dest ji ber hev berdan û her yek bi alîkî da revîn.

Holê kêysa dijmin ketibû Ferzende û digel siwarên xwe yên mîrxas da ser piştê wan. Hespê Turkan ne ewçend beza bûn. Kurd bi hêsanî dighanê û ew di ser piştê hespan da tanîn xar. Saetek neborî qada şer ji cendekên Turkan hate dagirtin, gelek hesp û tîfing bê xwedî mabûn.

Gava alayîya duduyan gîha qada şer ji Ferzende û siwarên wî pê va kes nedîtîn. Berî ku leşker li ber xwe binêrin, Ferzende ajoste ser wan, wek

bazên ku dikevin nav refê qulîngan her ew di ser piştê hespan da tanîn xar. Her wekî destên turkan girêdayî be bes deng ji tîfingên kurdan dihatin. Ji lewra şer dom nekir, alayîya duduyan jî revî û piştê xwe da kurdan.

Ji ber ku hespên kurdan westîya bûn û ji hal ketibûn gelekî li pê dijmin neçûn û li qada şer vegerîn. Pirtirî dused û pêncî kuştî ji leşkerê turkan hebû, ji kurdan tenê sê kes birîndar bûbûn û birîna wan sivik bû. Heke gotin û nivîsandina bûyereke holê hêsan be jî bawer kirina wê hinekî dijwar e, lê ev bû, ya ku wê rojê qewimî. Piştî şer qedîya, Ferzende hesp û tîfingên kuştîyan civandin û berê xwe da Agirî. Piştî vî şerî bi çar pênc rojan her du alayîyên turk nedikarîn siwarên xwe yên pij û belavbûyî bigehînin ser hev. Piştî hatina ser hev û xisara xwe nasîne fedîkirin ku Ferzende bi pêncî siwarî ew holê şerpeze kirine, qumandanê herdu alayîyan raporek derewîn şandin ji serdarîya leşkerî ra, ku eşîrên Gelîyê Zîlan tev da alîkariya Ferzende kirine, ji lewra hinde leşker hatin kuştin. Li ser vê raporê bû ku hikumeta turk heştê gund li Gelîyê Zîlan, tevî kal û pîran, jin û zarokan dan şewitandina, heştê gundê kurdan.

Mêranîya Ferzende ne tenê ew bûye di gelek şeran da mêranîyên holê kirine, lê zanîna me di vî warî da gelekî teng e. Yek jê di şerekî Agirî yê mezin (1930) da turkan şepêra wî li ser tehtekî nasîn. Nêzîka dused guleyên topan berdanê, çeper bi serhevda hil- weşî. Ferzende di ranê xwe da birîn bû. Hevalên wî xwestin hinekî ji çepera hilweşî bi dûrxin, heya hinekî vehêse,

lê bavê Efrasiyab qîma xwe bi lavayî û daxwaza wan neanî û got:

- Gava rom bizane ku torinekî Hesenî du gavan ji çepera xwe ra serdestî bizanin. Ez qîma xwe bi mirinê tînim, lê ne bi vê yeka han.

Di cihê xwe da ma heya êvar bû û şer sekinî. Rehma xwedê lê bit, ew ji pêşengên lehengên Kurdistanê bû ku dirêjîya umrê xwe rev nenasî.

Leheng II: Seyîdxan

Dawîya meha gulanê sala 1926an ez gihabûm zindana Amedê. Hingê ew zindana ji şêxan, began, axan û mêrxasan dagirtî bû. Her roj girtî birr bi birr dibirin mehkema îstiqlalê. Mehkema tu kesî pirtirî du rojan dom nedikir. Girtiyê biçûna mehkemê an bi darve dibûn, an jî hikim didanê, kêman caran bêguneh berdidan. Dema girtî ji mehkema vedigerin, xelkê zindanê diçûn hemberê dergêh da biza- nin kî bi darve dibe û kê hikim danê. Wê rojê ez jî tevî kesên ku li hember dergêhê zindanê çavênîya hetina xelkên mehkemê dikirin rawestî bûm. Di pêşîya kesên ku ji mehkemê vegeirî da xortekî dirêj û rûgş derbazê hundur bû, yekî ji çavdaran jê pirsî:

-Seyîdxan! Çend sal hikim dane te? Wî bi tinaz lê vegeirand û got:

-Gorra bavê wan, min yanzde ji wan kuştin, wan deh sal dane min. Peyayekî wan belaş çû.

Holê min Seyîdxan dît, careke din keys neket dest min ku bibînim. Kesên hikim didane zûka dişandin zindanên turkan, heya ji bo girtiyên nûh cih di zindanên Turkan da man û bi

qanûna efwê vegeirî welatê xwe. Çawan berê Seyîdxan ketîye tekoşînê nizanîm. Lê gava berê xwe da Sûrîyê ez hingê li Hesîçe bûm. Pirtirî her kes digel hevalên wî bendewar bûm û bûyerên wî şerî baş nasîn. Wê gavê çawa ji min ra hatîye gotin, welê dinivîsim. Divê ev leheng herwekî hêja bû di dîroka tekoşîna gelê kurd da xwedî cih be.

Agâh Özgüç, *Bütün Filmleriyle Yılmaz Güney* adlı kitabının giriş bölümünde bu konuyu daha ayrıntılı ve genişçe irdeler. Oradan küçük bir alıntıyla "Yılmaz Güney'in sinema yaşamını, sırasıyla 'senaryosunu yazdığı', 'oyunculuğunu yaptığı', 'senaryosunu

yazıp oynadığı' ve 'senaryosunu, oyunculuğunu, yönetmenliğini tümüyle üstlendiği' filmler olmak üzere dört bölümde toplayabiliriz. Bu genel dökümden, ne fazla ne eksik, tam 111 Yılmaz Güney filmi çıkar ortaya"⁴ dediğinde, gerisini bu başlıklar altında filmlerinin kategorik dökümünü sıralamayla getirir.

Yılmaz Güney'in sinemada kendine yer yapmaya çalıştığı yıllar Ayhan Işık'lı, Göksel Arsoy'lu, Ediz Hun'lu yıllardır. "Yakışıklı, salon erkeği tipine doymuş toplum, onu, mazlumun yanında olan fedakâr tavrından da etkilenerek kendine yakın bulur. Ezilen, itilen ancak gerektiğinde başkaldırır; isyanına karşı gerektiğinde acı çekmesini bilen, sahip olduklarını feda edebilecek bu 'çirkin' adamı çok sever. O zamanlar kolayından unvan dağıtmayan halk, ona "Çirkin Kral"ı uygun görerek", sinemada yeni bir dönemin başladığının işaretlerini verir. 1964'de 10, 1965'te 21, 1966'da 13 filmde oynamak gibi, her bir filminin 6-8 milyon seyirci tarafından izlenmesi gibi rekor sayılabilecek rakamlara ulaşır.

Yılmaz Güney, 1966'da çekilen 'Hudutların Kanunu'na kadar yukarıda sıralanan içeriklere uygun, en yakışan tabirle "vurdulu-kırdılı" filmlere imza atar. Milyonların sevgisini kazanır, onların gönüllerinde taht kurarken, Türkiye'nin toplumsal, siyasal gelişmelerini de

⁴ Agâh Özgüç, *Bütün Filmleriyle Yılmaz Güney*, Agora Kitaplığı, sayfa 1.



Yılmaz Güney, eşi Fatoş Güney ve oğlu Yılmaz

yakından takip eder. Bir yandan edebiyat çevreleriyle Onat Kutlar, Yaşar Kemal, Tuncel Kurtiz'le ilişkileri devam ederken, bir yandan da Türk ve Kürt siyasal çevrelerle yakın ilişkiler kurma ve geliştirme gayreti içindedir.

1960'lı 70'li yıllar Yılmaz Güney kültürünün tartışmasız oluştuğu, bütün Türk ve Kürd coğrafyasını sardığı yıllardır. Onunla tanışan ya da filmlerini izleyen her insanın, belki de en çok Kürtlerin bir şekliyle kendisiyle anısı ya da anıları oluşmuştur. Bu bazen filmlerinden kendisine yakıştırdığı bir tip, bir replik ya da bir görüntü, bazen de bir imajdır. "O, artık bütün 'çirkinliğiyle' odalarımızın duvarlarında, kasaba otobüslerinin camlarında, dükkanların vitrinlerinde, yanı başımızdaki vefalı bir dostumuz, kartpostalları-

la yazışmalarımızın muhalif dilidir. Canımız her acıtıldığında isyanımıza ortak edeceğimiz en yakın arkadaşımız... Kasaba sinemalarının afiş panolarına boynu büküklerin kendi yazgılarına Yılmaz'ı ortak edip saatlerce boyunlarını bükerek başlarını Yılmaz'ın başına yasladıklarını biliriz. Saçların onunki gibi kesildiği berberler... Filmlerini izlerken "Dikkatli ol, arkandalar!" diyen sevenleri, onu arkadan kollayanların nefesini kendileri de daha uzun yıllar hisseder..."

Bu yıllara siyasal bir bakış:

Cumhuriyet tarihi Kürtlerin asimilasyonu, yok sayılması ve inkârı tarihi olarak da okunabilir. Kürtlerin Türk sayılması, Kürtçe konuşma yasağı, Kürd gelenek, görenek, kültürünün bir

şekilde Türk gelenek, görenek ve kültürü sayılması, Kürd masallarının, şarkılarının Türkçeleştirilerek içlerinin boşaltılması Cumhuriyet tarihi boyunca olagelen bir olgu oldu. Bir halk için kendisi olamama ağır bir eza-yken, kendisine ait olanların sahiplenilmesi bu ezayı daha da katmerleştirdi. Kuzey Kürtleri bugüne kadar böyle bir ezanın içinde yaşadı. Kürd edebiyatı ve sinemasını doğallığıyla oluşturmadıkları gibi, Türk edebiyatına, sinemasına da "kendileri" olarak yansıyamadılar. Kürtler adab-ı muaşeretten bihaber kaba-saba, bozuk Türkçe konuşan, ilkel, şehirlerde artık işleri yapan kapıcı, hamal, inşaat işçisi ya da eşkıya tarzı zorba kişiler ve tipler olarak yansıtıldılar. Kürtlerin güzel, makul yanları ise çoktan Türkçenin içine hapsedilip sahiplenilmişti bile.

Böyle ağır bir tablonun içinde Türk edebiyatının sinemasının içinde Kürtlere ait öğeleri bulup çıkarmak, iki şekliyle önemliydi. Bir kere bunlara bakarak tahribatın ne kadar büyük olduğu, Kürtlerin kültürünün ve değerlerinin ne kadar büyük bir asi-milasyon ve imha ile karşı karşıya kaldığı görülebilir; ikincisi Türk edebiyat ve sinemasına yansıyan Kürd öğelerin bu yapıtlar içinden cımbızla çekip alınmasıyla Kürt sanatının kendisini nasıl koruduğu ve inşa ederken mücadelesinin zorluğu ve büyüklüğü anlaşılabilir.

Türkiye'deki siyasal mücadeleyle paralel, edebiyata ve sinemaya toplumsal gerçekçiliğin yansımalarıyla birlikte Kürtler de ilkel, görgüsüz tipler

olmaktan bir nebze çıkarak hiç değilse belli oranlarda kendileri olarak yansımaya başladılar. Rohat Alakom'un *Türk Edebiyatında Kürtler*'i ile Müslüm Yücel'in *Türk Sinemasında Kürtler*'i çalışmalarını bir-iki paragraftır yazmaya çalıştığım kapsamda, Cumhuriyet'in Kürtlere bakışı ve Kürtlerin kendilerini var etme mücadelesi kapsamında okumak önemli.

Yılmaz Güney Sineması'nda Kürtler:

Kürtler, Yılmaz Güney Sinemasına ilk olarak 'Koçero' (Dağların Taçsız Kralı-1964) filmiyle girdiler. Mehmet İhsan Kilit veya namlı adıyla Koçero, Siirt bölgesinde yaşayan Türkçe bilmez "zenginden alıp fakire veren" halkın sevdiği bir eşkıyadır. Konusunu gerçek olaylardan uyarlayarak alan filmde, Koçero, ağanın adamları tarafından oyuna getirilerek bir soygun sırasında jandarmalara vurdurulur. Konu ve son, tipik bir Yılmaz Güney klasiğidir.

'Koçero'(1964), 'Davudo'(1965) ile başlayan Kürd temalı, Kürd coğrafyalı filmler 'Hudutların Kanunu'(1966), 'Kızıl Irmak Kara Koyun'(1967), 'Seyit Han' (Toprağın Gelini-1968) gibi filmlerle sürerken Yılmaz Güney Sinemasının yeni bir dönemine işaret olabilecek bir sürecin başladığını da gösterir. 'Kızıl Irmak Kara Koyun' filmindeki Karakoyun bölümünde anlatılan öykü "*Cembeliye Kurê Mirê Hekarî*" adlı strandan alınır. Bu son filmleriyle Yılmaz Güney, gelecekteki sinemasının ipuçlarını da vermeye

başlar. 'Seyit Han'da Yılmaz Güney'in sevgilisinin adı Kejê'dir. Burada o dönemin sansür anlayışı ve içinde Kürd öğeler bulunan filmlerin zorluklarını anlatabilmek için Müslüm Yücel'e başvurmakta yarar var:

“Seyit Han'da Güney başka bir Kürt öyküsüne uzanır. Filmin bir yanında kan davası, diğer yanında büyük bir aşk vardır. Film sansür kurulu tarafından 'Kürtçe adlar kullanıldığından dolayı' engellenmiştir. Güney, film sırasında askerliğini yapmaktadır. Filmle ilgili gelişmeleri prodüktörü Abdurrahman Keskiner sürdürmektedir. Sansür kurulu Kejê ismini sakıncalı bulmuştur. Gerekçe olarak da Türkçede böyle bir ismin olmaması gösterilmiştir. Film 15 Haziran 1968'de Locarno, 15 Eylül'de Mannheim Film Şenliği'ne davetlidir. Bunun üzerine Keskiner, Kejê'nin adını ve sansür kurulunun tepki gösterdiği sakıncalı bölümü çıkartıp, tekrar sansüre gönderilmiştir. Bu sefer kurul filmde oynayan kişilerin kılık kıyafetini sorun etmiştir. Keskiner bu sefer de Danıştay'a başvurmuş, Kejê adının "Güneydoğu köylerinde yaygın" olduğunu ifade etmiştir.”⁵

'Umut'a gelmeden önce yine Kürd motiflerle bezenmiş, bir eşkıyalık filmi olan 'Aç Kurtlar'(1969) filmini bu kez askerdayken çeker. 'Umut' (1970) ise Türkiye Sineması için bir başyapıt, Dünya Sineması'nın bir dip

notu olarak tarihe geçer. Sinemada gerçekçilik bir tokat gibi seyircinin suratında patlar. Çukurova'ya göçmüş yoksul Kürtlerin umudun peşindeki umutsuzlukları o kadar hakiki ve sinematografik işlenir ki, 'Umut' çekildiği günden bu güne tüm zamanların en iyi filmleri arasında en ön sırada her zaman yerini almaya devam eder. 'Umut'un bütün bu başarısına karşın sansür kurulu tarafından O yıl Cannes'da yarışmasına engel olunur. Bir sonraki yıl yarışma dışı gösterilir ve oldukça büyük ilgi görür.

'Ağıt'(1971), saçlarının kesimi, beyaz donları ve şemsiyeleri ile jandarmadan kaçan Çobanoğlu ve dört Zaza Kürdün hüznü hikâyelerini beyaz perdeye yansıtan bir film olarak Yılmaz Güney filmografisindeki yerini alırken, bu günlerde Türkiye zorlu bir dönemce daha girer. 12 Mart Askeri Darbesi'nin olduğu yıllardır. Bir süre sonra Yılmaz Güney de tutuklanır. Ve Yılmaz için 1981'e kadar (1974 Genel Aftan sonraki dört ay hariç) sürecek olan uzun hapislik yılları da başlar.

Burada bir parantez açmakta yarar var: Yılmaz Güney'in hayat hikâyesi, yazdıkları, filmleri bizlere başka türlü bir okuma imkânı daha verir. O cezaevlerini, ceza çekilen bir yer olmaktan çıkarıp, bir imkâna, bir okula, aklını temize çektiği bir mekâna ve sürece çevirir. Cezaevlerinde geçirdiği on iki yılda okuyamadığı kitapları okur, romanlar, senaryolar yazar, dergi çıkarır, içeriden filmler yönetir. Hapiste geçirilen 12 yıl onun için kayıp yıllar değil, bir üretim sürecidir. Böyle

⁵ Müslüm Yücel, *Türk Sinemasında Kürtler*, Agora Kitaplığı, sayfa 150.

olduğunun izlerine yazdıklarında, filmlerinde, mektuplarında, röportajlarında rastlamak da mümkündür. Üstelik "istesem kaçabilirim" kabilinden cümleleri her fırsatta söylediğinde samimi olduğunu da biliriz.

Deyip, parantezi kapattıktan sonra, 1974'te Genel Af'la birlikte Yılmaz Güney de dışarıdadır. Çıkar çıkmaz Çukurova'ya çalışmak için gelen Kürt tarım işçileri etrafında bir kan davasını konu alan 'Endişe'(1974) filminin hazırlıklarına başlar. Daha filmin çekimlerinin başındayken malum Yumurtalık olayı meydana gelir ve cinayet nedeniyle yeniden cezaevine girer.

İçeride kendisinin başyapıtları olan 'Sürü'(1978) ve 'Yol'(1981) filmlerini çeker. 'Sürü' ve 'Yol' Yılmaz Güney'in Kürtleri en belirgin işlediği iki filmidir. Muşlu dayılarının yaşamışlıklarının da karıştığı 'Sürü'de tarımda traktörün kullanılmasıyla çözülmeye başlayan aşiret ilişkileri ve bu çözülüşün aşiret ilişkilerine yansımaları anlatılır.

'Yol'da ise cezaevinden izinli olarak çıkan 6 mahkûmun nezdinde Bir Türkiye manzarası sunar. Bu öykülerde daha çok Yılmaz Güney'in en iyi bildiği karakterler, Kürtler anlatılır: Seyit Ali, Mehmet Salih, Ömer, Mevlüt, Süleyman ve Yusuf... Bu mahkûmlar içerdedirler ama izin için çıktıkları dışarıda başka bir cezaevine dönmüştür.

Yılmaz Güney, 1981 yılında kendisi de 'Yol'daki gibi çıktığı bir izinden bir daha cezaevine dönmek üzere

fırar edip Fransa'ya kaçır. Cinayetle aldığı ceza ile beraber, cezaevinde devam ettiği siyasi faaliyetlerinden ve yazılardan ötürü hakkında 100 yılı aşan cezalar istenir. O yıllar, Türkiye'nin, en çok da Kürtlerin 12 Eylül gibi bir buldozerin altında ezim ezim ezildiği, tıpkı filmde olduğu gibi bütün bir coğrafyanın cezaevine döndüğü işkence, kayıpların, cezaevlerinin, sürgünlerin, ölümlerin devlet için meşru bir görev olduğu yıllardır.

Yılmaz Güney Fransa'ya kaçışında sonra 'Yol' filminin montajını yeniden yapar. Filmde Kürtçe ezgiler kullanır. Karakterlerinden Ömer köyüne gitmek için Birecik Köprüsü'ne geldiğinde perdeye yansıyan 'Kürdistan' ibaresi, sinema ve siyaset çevrelerinde büyük tartışmalara da neden olur. Önemli miktarda Türk sinemacısı ve siyasetçisi durumdan memnuniyet-sizliğini dile getirir, devlet, bunu da dâhil ederek Yılmaz'ı vatandaşlıktan çıkarmanın argümanlarını çoktan oluşturmuştur. Kürt cenahta, aksine, Yılmaz Güney'in sinemasında kendilerini yine kendileri olarak görünür kılmaları, sorunlarını beyaz perdeye yansıtması büyük memnuniyet yaratır. Yılmaz Güney'in özgünlüğü de burada yatar. Bütün bir sinemasını eşyaya adını koymak üzere inşa etmek istemiş, Türkiye'deki yasak ve sansürcü zihniyet buna izin vermemiş, her zaman önünde bir 'duvar' gibi durmuştur.

1982'te Cannes'da 'Yol', Costa Gavras'ın 'The Missing' filmi ile beraber Altın Palmiye'yi aldığı sanati-

nın büyüklüğünün dünyaca altı çizilir-ken kendisini 'Bir Kürt rejisör ve sanatçısıyım' diye tanıtmayı ve bundan onur duyması asıl bunun için değerlidir.

Yılmaz Güney'in sinemasına dair:

Mehmet Aktaş,

"Yılmaz Güney gerçekçi olduğu kadar, şiirsel bir sinema diline de sahipti. Güney, en önemli filmlerinde Kürtlerin yaşamını, geleneklerini, ezilmişliğini, çaresizliğini anlatır. Sınır, kaçakçılık, mayınlı topraklar, acımasız doğa ile mücadele, yoksulluk imgelerini filmlerinde sıkça işledi. O filmleriyle Kürt halkının durumunu dünyaya adeta rapor ediyordu."⁶

diyerek, adeta sinemasının kodlarına işaret etmek ister gibidir.

Neden Kürtçe film yapmadığı sorulduğunda, Yılmaz Güney'in "Çünkü Kürt dili Türkiye'de yasak. Eğer, yasak olmasaydı 'Sürü' ve 'Yol'u Kürtçe çekerdim" diye cevaplaması ise manidardır. Yine, hayatının sonlarına doğru Kürtleri anlatan birçok film projesinin yanı sıra öldürülen, Irak Kürdistan Demokrat Partisi Genel Sekreteri Abdurrahman Kasımlı ile üzerinde çalıştıkları ve mesafe aldıkları Kürdistan dağlarında çekilecek tarihsel destansı Kürt filmi projesinin varlığı da... Yine, birçok sinemacının

olduğu gibi, sinemaya meraklı değişik parçalardaki Kürt gençlerinin kendilerine Yılmaz Güney'i örnek almaları da...

Burada Yılmaz Güney'in sinemasında iki noktanın daha altını çizerek ilerlemekte yarar var:

Birincisi, Yılmaz Güney'in filmlerinde Kürtleri bu kadar iyi anlatmasının veya filmlerinden en çok Kürtlerin kendine pay çıkarmasının nedenlerine ilişkin olandır. Bir insan veya bir sanatçı en iyi neyi anlatabilir ki!... Yılmaz Güney filmlerinde en iyi bildiği şeyi, bildiği coğrafyayı ve bu coğrafyanın insanlarını, onların dramlarını anlatma yolunu seçti. Kürtler, onların yaşayışı, gelenekleri, acıları, ağıtları, yoksulluk ve yoksunlukları Yılmaz'ın anasından babasından bildiği gerçeklerdi. Filmlerinde bu gerçekleri samimiyet ve sıcaklıkla anlatmayı başardı.

İkincisi, Yılmaz Güney Sinemasında vücut bulan "yeni politik sinema" söylemiydi. Bu konuda Ulus Baker'in çok önemli iki makalesi "*Yılmaz Güney Sinemasının Bir Özelliği Üstüne*", "*Şok ve Beyin: Yılmaz Güney Sineması Üzerine*" bize ufuk sunacaktır:

Baker'in bu yazılarından birinden birazcık uzun bir alıntıyla;

"Güney, Rocha ile birlikte yeni bir "dalın" kurucusuydu: buna modern politik sinema veya daha keskin bir terminolojiyle "ajitasyon sineması" adını verebiliriz. Ama bu, daha derinden bakıldığında, Üçüncü Dünya insanının daha kolay görebile-

⁶ *Esmer Popüler Kültür Dergisi, Sinema Özel Sayısı, Yıl 2007, Sayı 31, Mehmet Aktaş, Kürt Sineması: Artık Bir Gerçek.*



Mahmud BAKSİ ve Yılmaz GÜNEY

ceği evrensel bir politik gerçekliğin kendini ortaya koymasısıdır: günlük yaşamın her görünümünün, ailevi hayattan dış- lanmışlığa, otobüs garında bilet alırken... jandarma tarafından üstü- nüz aranırken olduğu kadar sürünü- zü şehre doğru giderken --Kurban bayramına kadar... her şeyin, ama her şeyin tam tamına "politik" olduğuna dair bir bilinçtir bu... Batı toplumlarının aydınları politikanın böyle bir şey olduğunu pek ender olarak ayırd edebilmişlerdir: modern edebiyatta Kafka size aile makinasının hiç de "özel yaşamın" küçük, kirli, ufak tefek romanslardan ibaret olmaya-bileceğini, devletin ve bürokrasinin o yüksek katını ta baştan bir düzen

olarak benimsemiş olduğunu, öte yandan her bürokratik makinanın aileye, babaya ve onun sembollerine sürekli olarak bağlı bulunduğunu gösterecektir --"bir babanın oğluna verdiği her buyrukta binlerce ölüm hükmü saklıdır..." Batı düşüncesi, Marksizmin belli bir yorumu da dahil olmak üzere, özel hayat ile kamusal, politik hayat arasındaki ayrımı ayakta tutar, birinden ötekine geçişler yaşatır... Oysa biliyoruz ki orada bile, politik aygıtlarda temsil edilmeyen bir yığın mikropolitik unsur iş başındadır --özel hayat ve dayanışma, bir mafya ailesi... ama sonuçta her şey politiktir. Politika "Devlet" ve temsil işlerinden çok farklı bir alanda cereyan eder... Bunun Üçüncü Dünyada veya Gilles Deleuze'ün de-yişiyle "azınlık edebiy-

atında" daha kolay görülebilir olması doğaldır."⁷

alıntılayıp, Yılmaz Güney'in sinemasının önemine ışık tuttuğumuz gibi, Baker'in bakışıyla Brezilyalı yönetmen Rocha'yla birlikte "yeni politik sinemanın" kurucuları arasında olduğunu da görürüz.

Bir siyasetçi olarak Yılmaz Güney:

Yılmaz Güney'in liseli yıllardan itibaren sosyalist fikirlerden etkilendiği ve bu yüzden hapis yattığı, sürgünde yaşadığı bilinir. Siyasetle ilişkisinin zaman içinde sezgisel olmaktan çıkıp bilinçli bir tercihe dönüştüğü de. Yılmaz Güney, edebiyatçı, sinemacı kimliğinin yanı sıra politik mücadelenin içinde, aktif politika yapan, **GÜNEY** dergisi gibi, politik görüşleri ve politik sorunların çözümü için önerileri olan önemli bir figür haline gelir.

Bu dergide ve çeşitli platformlarda sosyalist fikirlerinin yanı sıra Kürt sorunu ile ilgili görüşlerini de belirtir. "Kürdistan'ın Sömürge, kendisinin ezilen ulusa mensup biri olduğu, Türkiye ve Kürdistanlı devrimcilerin, demokrat ve yurtseverlerin dış mücadele ile iç mücadeleyi birleştirebilirlerse başarılı olabilecekleri" yollu net fikirlere sahiptir.

"Benim düşündüğüm Kürdistan, Birleşik, Bağımsız, Demokratik Kürdistan'dır" nok-

tası Güney'in mazlumun yanında yer almışlığından kaynaklı, adım adım biriktirdiklerinin bir sonucudur. Ne- dir biriktirdikleri dendiğinde:

Daha 1968'de,

"Çukurova'da 'Seyit Han' filmini çekimlerini yapmak üzere geldiği bir dönemde olsa gerek, baba memleketi Siverek'e de uğrar. Silahlı, içkili, filmlerinden kalma görüntülerle dolu bir günün ardından Siverekli Kürt aydınların eleştiri, öneri karışımı serzenişleri ile de karşılaşır. Kürt aydınlar, kendisinden siyasal bilince paralel neden Kürtlerin sorunlarını yansıtan filmler yapmadığını, Kürt aydın çevrelerle ilişkiye geçmediklerini sorarlar. Yılmaz, aslında bu serzenişleri haklı bulduğunu kendisinin tam da filmlerinde bu sorunları anlatmak istediğini, Kürt aydınlarla yakınlaşmak istediğini söyler, İstanbul'da okuyan gençlerin kendisine uğramalarını, ilişkilerinin devam etmesi gerektiğini anlatır. Bu Kürt gençlerden bir-ikisi İstanbul'da Yılmaz'a uğrarlar. Yılmaz evde yoktur, settledir ama annesi gençleri Kürtçe ve güler yüzle karşılar. Daha sonraki dönemde Yılmaz Güney, İstanbul'da Siverek Derneği'nin başkanlığına getirilir. Siverek Derneği, o dönemde yurtsever Kürd gençlerinin kurduğu, Kürdî bir dernektir."⁸

diyen o dönemde İstanbul Hukuk Fakültesi'nde öğrenci olan Ali İhsan Parlak ağabeyimizin anlatım ve tanıklığı;

⁷ Ulus Baker, *Şok ve Beyin: Yılmaz Güney Sineması Üzerine*, www.korotonomedia.net

⁸ Ali İhsan Parlak anlatımı.

"Yılmaz Güney, hayatının her döneminde Kürd aydınlarına ve Kürd hareketlerinden insanlara hep yakın oldu. Bunlardan birisi de Necmettin Büyükkaya idi. Büyükkaya ile tanışık- lığı İstanbul DDKO'ya kadar uzar. Burada DDKO'ya parasal yardım-larda bulunduğu bilinir. Yine Necmettin'in kendisi ile ilişkilerinin sonraki yıllarda, Necmettin Büyükkaya'nın Türkiye'de arandığı 1980'li yıllara gelinceye kadar da devam ettiği"⁹ ne dair Mahmut Baksî'nin *Kürt Gözüyle Yılmaz Güney* adlı kitabında bu ve buna benzer Yılmaz Güney'in Kürt kimliği ve bunu sahiplenmesi ile ilgili alınabilecek onlarca anekdot;

Avukat Hikmet Bozçalı'nın anlatımı;

"DDKO'nun yönetim kurulu başkanıyken derneğimizin üyelerinden Celal Karahan vasıtasıyla Yılmaz Güney ile tanıştık. Yılmaz Güney'in İstanbul DDKO'ya büyük katkıları oldu. Özellikle çevresindeki iş adamlarından ve kabadayı kesiminden DDKO'ya parasal yardımlar yapılmasını sağladı. Yılmaz Güney vasıtasıyla kabadayılardan Dünder Kılıç, Kürt Idris ve Barut Mehmet ile tanıştık. Yılmaz Güney'in çevirmiş olduğu Umut filmi yasaklanmıştı. İstanbul Kumkapı'da bulunan Kadirga Yurdu'nda Umut filmi gösterildi, gösterimin geliri İstanbul DDKO'ya bırakıldı. Filmin sonunda Yılmaz Güney ve iki tane Italian artist seyircilerin önüne çıktılar. Filmi izleyenler Yılmaz Güney'e



İmralı Cezaevi: Sağdan N. Büyükkaya, Yılmaz Güney, Turan Alişeroğlu

"filmin eleştirisini içeren sorular sordular. Bir saat kadar sorulara Yılmaz Güney cevap verdi. Bu sırada Yılmaz Güney'e Siverekli bir arkadaş "senin aslın ne" diye sordu. Yılmaz Güney ise "Babam Siverekli Zaza, annem ise Muşlu Kurmancır" diye cevapladı. Bu cevabı duyan Siverekli arkadaşlar Güney'e tezahürat ve sevinç gösterilerinde bulundular."¹⁰ anlatımı;

Sıraladığımız DDKO-Yılmaz ilişkisinin başka bir yakın tanıklığı, O günlerde Yılmaz'ın hem hemşerisi hem de ilişkilerinde onun gibi İktisat Fakülteli olmanın ayrıcalığını yaşayan genç bir DDKO'lu arkadaş, Mehmet Vural'ın,

"1970'lerde Yılmaz'ın DDKO ilişkileri oldukça yoğunlu. Bu yoğunluk

⁹ Mahmut Baksî, *Kürt Gözüyle Yılmaz Güney*, ZEL Yayınları, "Sazıcı Ömer" yazısı, sayfa 33-37.

¹⁰ Hikmet Bozçalı, bak. *BİR* derg. DDKO

parasal, düşünsel olduğu kadar dostluk-arkadaşlık boyutlarıyla da sürüyordu. Misal, Necmettin Büyükkaya ile Cemile'nin nişanından sonra davetli olan bizleri evine götürerek şampanya patlatacak kadar bize yakın ve dosttu. Kadırga Öğrenci Yurdu'nda DDKO yararına 'Umut' filminin gösteriminden sonra MHP'liler kendisini tehdit etmeye başladığında O'nu DDKO korudu. 12 Mart'tan sonra da O bizi... 1971'in Şubat'ından Nisan'ına kadar iki aylık bir süre Mehmet Tüysüz'le evinde misafir olduk. Aranmaya başladığımız bir dönemdi. Sonraki süreç onun ve diğer Kürt aydınlarının hapisli, sürgünlü, kaçarak, saklanarak geçirdiği zorlu yıllardı. Doğal olarak ilişkilerimizde kopukluklar oldu. Ama Necmettin'in ilişkilerinin sonraki yıllara hatta 12 Eylül'e kadar da devam ettiğini bili-yorum."¹¹ söz-leri,

Yılmaz Güney'in Yurt dışına çıktık-tan sonra, Enstitülü yıllarda, başta Kendal Nezan olmak üzere Cigerxwîn, Hejar, Tewfik Wehbî, Qanatê Kurdo, Nûredîn Zaza, Îsmet Şerîf Wanlî, Osman Sebrî, Ordîxanê Celîl, Remzî Bûcak'ın öncülük ettiği Paris Kürt Enstitüsü'nün kurucuları arasına katıl-ması, ölünceye kadar da yönetim kuru-lu üyesi kalma-sı, Paris'teki yabancı gazeteci, sanatçı ve temsilcilerle görüşmelerini özellikle Kürt Enstitüsü'nde yapması;

Yine enstitülü günlerde yapılan şen-lik ve Newroz kutlamalarında

¹¹ Mehmet Vural anlatımı.

Kürdistanlı bir devrimci olarak yaptığı konuşmalarından, örneğin;

"Kürt sorunu, bildiğiniz gibi, bir kültürel baskı sorunu değildir. Kürt sorunu, bir bütün olarak bağımsızlık ve özgürlük sorunudur."¹²

ya da

"Bir köle olarak yaşamaktansa bir özgürlük savaçısı olarak ölmek daha iyidir. Yaşasın bağımsız, Birleşik, Demokratik Kürdistan... Yaşasın Kürt-Türk, Acem ve Arap Halklarının Kardeşliği ve Dayanışması... Yaşasın Kürt Enstitüsü..."¹³ deyşi;

Hastalığının ilerlediği, hayatının sonlanacağını hissettiği anda cenaze-sinin "ebedi evim" dediği enstitüden kalkmasını istediği vasiyetinden ve bu vasiyet gereği, Kürt Enstitüsü'ndeki törenin ardından dünyanın çeşitli yer-lerinden gelmiş binlerce seveni ve özellikle Kürtlerin omuzlarında ebe-diyete uğurlanmasından;

O hayatı bir ders, bir öneri olsun diye yaşamadı ama hayatı kadar ölümünden de alınabilecek dene-yimdir dersek, sanırım eksik kalır ama fazla olmaz.

Sona dair:

Biz yazı boyunca Yılmaz Güney toplamı içinden projektörlerimizi onun insanlığı, sanatı ve siyaseti içindeki Kürt yanına çevirdik. Çünkü bu yanı görmezden gelinen, burun bükü-

¹² Mahmut Baksî, *Kürt Gözüyle Yılmaz Güney*, ZÊL Yayınları, "Kürt Sorunu Bir Bağımsızlık ve Özgürlük Sorunudur" yazısı, sayfa 80.

¹³ yage, s. 84.

lan yanıydı. Dünya çapındaki bir len, ihmal edilen ve en çok da korku-sanatçının en son olması gereken yanı onun Kürt yanıydı. Çünkü resmi söylemde Kürt yoktu. Yılmaz, kendi bilincine vardığı ilk andan itibaren kimliğini sahiplendiği gibi, onun sanatını ve siyasetini yaparak Kürtlerin görünür kılınmasında çok önemli katkılarda bulundu.

Bu vurgulamadan sonra O'nun sanatçı, siyasetçi kimliğinin yanı sıra daha başka yanlarını da sırtında kendine has özel bir zarafetle taşıyan, çelişkilerle dolu, karizmatik birisi olduğu söylenebilir.

"Bu yanlarıyla da çok tartışıldı, çok konuşuldu. Kimi kabadayı dedi, kimi entelektüel. Onun için en güzel sözleri bundan yıllar önce 1986 yılında, Murat Belge söyledi: "Hem savaşçı, hem derviş". Tartışılan yanları olma- dan, zaten kendisi de Yılmaz Güney olamazdı. Onu kusurlarından bağımsız düşünemezsiniz. Eğer o, bugün 116* filme oyuncu, yönetmen ve senarist olarak katkı sağladı ve 35'in üzerinde yerli ve yabancı ödül aldıysa, senaryolar, kitaplar yazdıysa, ancak böyle olabildiği için yapabildi. Kusurları, kocaman Yılmaz Güney adının altını çizen birer tat olarak kaldı. Yılmaz Güney'e kabadayı, Dostoyevski'ye kumarbaz, Nazım'a çapkın demek onları sanatlarından ne kadar uzaklaştırır ki? Kaldı ki, Yılmaz Güney ölür ne hayatı kalır ne de hayatının özel

oluşu. Kanan onun filmleri ve yarattıklarıdır."¹⁴

Mazlumların Kral'ı, "Çirkin Kral" Yılmaz Güney, şimdi 1871 Paris Komüncülerin kurşuna dizildiği yerden alan Kahramanlar Mezarlığı Pere Lachez'de arkasında bıraktıklarının onuruyla Oskar Wilde'lar, Yves Montand'lar, Simone Signoret'lerle beraber yatıyor. Ahmet Kaya'yı da yanına alarak.

Ocak, 2009

Yaralanılan Kaynaklar

- M. Şeyhmus Güzel, *Yılmaz Güney Hazinesi*, Pêrî Yayınları
- Mahmut Baksî, *Kürt Gözüyle Yılmaz Güney*, ZEL Yayınları
- *İnsan, Militan ve Sanatçı Yılmaz Güney*, *Yılmaz Güney*, Güney Film Yayınları, Belge Dizisi
- Ağâh Özgüç, *Bütün Filmleriyle Yılmaz Güney*, Agora Kitaplığı
- Müslüm Yücel, *Türk Sinemasında Kürtler*, Agora Kitaplığı
- Oral Çalışlar, *Deniz Gezmiş'ten Yaşar Kemal'e PORTRELER*, Çağdaş Yayınları
- *Esmir Popüler Kültür Dergisi*, Sinema Özel Sayısı, Yıl 2007, Sayı 31
- Ulus Baker, *Yılmaz Güney Sinemasının Bir Özelliği Üstüne*, Makale, www.korotonome-dya.net
- Ulus Baker, *Şok ve Beyin: Yılmaz Güney Sineması Üzerine*, Makale, www.korotonome-dya.net
- Kemal Yıldızhan, *En güzel gülen, en güzel ağlayan adam*, Radikal 2, 17.04.2005
- Ali İhsan Parlak anlatımı
- Mehmet Vural anlatımı

*Yılmaz Güney'in filmlerinin sayısı değişik kaynaklarda 111, 114, 116 olarak geçiyor.

¹⁴ Kemal Yıldızhan, *En güzel gülen, en güzel ağlayan adam*, Radikal 2, 17.04.2005.

XELÎL XEYALÎ

Doç. Dr. Mamsote Qedrî

1. Jiyana Xelîl Xeyalî

Xelîl Xeyalî (1876-1926 ji Modkê ye, ji qebîleya "Mûdan" e. Li cem Se'îdê Nûrsî (1876-1960) ders girtiye û gelek di bin bandora wî da maye. Di dawiya sedsala 19an de çûye Stenbolê û li wê derê li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî xebat kiriye. Di sala 1908an de li Stenbolê di damezirandina komeleyên bi navên Kurd Te'avun û Teraqî û Kurd Neşrê Me'arif de cih girtiye. Ji bo perwerdekirina zarokên kurdan bi zimanê kurdî, di sala 1910an de ji aliyê komeleya Kurd Neşrê Me'arif ve li Çemberlîtaşê yekemîn dibistana kurdî bi navê Kurd Nimûne 'Ybtidaîsi-Meşrutiyet hatiye vekirin. Xelîl Xeyalî di vekirina vê dibistanê de rolek mezin listiye. Di vê dibistanê de li gor elfabeya wî ya ku emê jê behs bikin perwerde bi zimanê kurdî hatiye kirin. Di sala 1912an de li Stenbolê ji aliyê hinek xwendevanên kurd ve Komeleya Hêvî hatiye damezirandin û heta Şerê Cîhanê yê Yekem dewam kiriye. Xelîl Xeyalî di damezirandina vê komeleyê de jî rolek girîng leyistiye.¹ Armanca herî girîng ya vê komeleyê ji bo hêsanîkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî amadekirina elfabeyek kurdî bû. Xelîl Xeyalî di kovara bi navê *Rojî Kurd* de li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî û sitandartkirina elfabeyek ku ji bo temamê zaravayên kurdî bi kar bê çend gotar nivîsandine. Bo nimûne di hejmara sisêyan de, di gotara xwe ya bi ser navê *Ziman* de pirsek wiha kiriye: "Kurd îro muhtacê çi ne? Em ewan bêjin". Paşê jî tiştên ku ihtiyaciya kurdan bi wan heye di 10 madeyan de rêz kiriye. Di madeyên duyemîn, sêyemîn û heştemîn de wiha gotiye²:

¹ Zinar Silopî, *Mes'eletu Kurdistan (Doza Kurdistan)*, Pêşkêşkiro: 'Yzedîn Mistefa Resûl, çapa duyemîn, Beyrut, 1997, r.33-35

² *Rojî Kurd*, 1913, hejmar:3, r. 21-22 (Amadekar: Cemal Xeznedar).

- 2) Ser terzek nû elîfbayek.
- 3) Ji bona temamê zimanê kurdîtiyê qamûsek (ferhengê mezin).
- 8) Ji bo zimanê kurdan serf û nehwek (rêzimanek).

Çawa ku ji madeya duyemîn jî tê fêmkirin jiber ku baweriya Xelîl Xeyalî bi diviyatiya amedekirina elfabeyek standart ya kurdî hebû, di sala 1909an de li Stenbolê yekemîn alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî çê kiriye û navê wê danîye *Elîfbeyê Kurmancî*.

Bi saya du şexsiyetên kurd der barê Xelîl Xeyalî de bi kurtasî be jî hinek agahî gihastine roja me. Yek ji van şexsiyetan Se'îdê Nûrsî ye, yê din Qedrî Cemîl Paşa ye.

Se'îdê Nûrsî (Kurdî) der barê Xelîl Xeyalî û elfabeya wî de wiha dibêje:

“Ez mîna kek neteweperwerî ji we re pêşkêş dikim ku ew jî Xelîl Xeyaliyê Motkî ye. Mîna her beşek mîletperweriyê di beşa ziman de jî xelata pêşbaziyê a wî ye. Wî alfabe û serf û nehv(rêziman)a ku bingehe zimanê me ye çêkiriye. Vî zatê han nimûneyek mîletperweriyê nîşan daye û ji bo zimanê me yê ku mihtacê temamkirinê ye bingehek daniye. Ez ji ehlê hemiyetê (ji mîletperweran) re tewsiye dikim ku, li pey rêça wî herin û zimanê me li ser wê bingehe ava bikin.”³

Ekrem Cemîl Paşa jî wiha dibêje:

Li gor Ekrem Cemîl Paşa, Xelîl Xeyalî û Ziya Efendi (Ziya Gokalp) bi hev re rêzimana kurdî amade kirine û dest pê kirine ku ferhengê jî binivîsînin. Lê Ziya Gokalp ji xwendingehê tê derxistin û gava tê Diyarbekir xebatên ku wî û Xelîl Xeyalî bi hev re kiribûn jî bi xwe re tîne û ji wê û pê ve têkiliyên wî û Xelîl Xeyalî tîne birîn. Piştî meşrûtiyetê dema ku Ziya Gokalp wekî delegeyê Diyarbekrê beşdarê "Komeleya Yttihad û Teraqî"yê ya li Selanîkê dibe û Xelîl Xeyalî li Stenbolê dibîne. Xelîl Xeyalî ew xebatên ku bi hev re kiribûn jê dixwaze, lê dibêje "min ew şewitandin" û naxwaze ku bide Xelîl Xeyalî.⁴

2. Alfabe ya Xelîl Xeyalî

Çawa ku ji gotinên Se'îdê Nûrsî tê fêmkirin wekî niha di wê demê de jî rewşenbîrên kurdan ji bo sitandartkirina zimanê kurdî li ser alfabekek sitandart nîqaş kirine. Di nîqaşên di vî warî de Se'îdê Nûrsî xwestiye ku alfabe ya Xelîl Xeyalî wekî bingehe bê qebûlîkirin. Nexwe di nîqaşên îro de jî divê ev alfabe neyê

³ Se'îdê Nûrsî, *Yki Mektebê Musibet (Di nav "Asarê Bedî'îye" de)*, r.334 -335.

⁴ Binêrin Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, wergerandina bo kurdî: Omer Dewran, Weşanên Bîr, Diyarbekir 2007, r. 24-25.

jibîrkirin, beranberiya wê bi alfabeyên din bê kirin, kêmahî û zêdehiyên wê bên dîtin û jê were îstîfadekirin. Loma di vê nivîsa xwe de me xwest ku em vê alfabeyê jî bi çend gotinan bidin naskirin:

1) Alfabe ya Xelîl Xeyalî yekemîn alfabe ya kurdî bi tîpên rrebî ye.

2) Ev alfabe bi hemançapî di pirtûka Mehmet BAYRAK ya bi navê *Açýk-Gizli, Resmi-Gyr-y Resmi Kürdoloji Belgeleri* de hatiye weşandin.⁵

3) Hogir Tahir Tewfîq di xebata xwe ya bi navê *el-Elîfbau'l-Kurdiyye Bi'l-Hurûfi'l-Erebiyye We'l-Hurûfi'l-Latiniyye (Elfabeyên Kurdî yên Bi Tîpên Erebi û Latîni)* de li gor çapa Mehmet Bayrak alfabe ya Xelîl Xeyalî jî qeyd kiriye.⁶

4) Alfabe ji aliyê weşanxana *Hîvda* jî bi tîpên erebî hatiye weşandin.⁷ Lê tê de hinek guhartin û şaşî hene.

5) Alfabe ji 34 tîpan pêk tê. Ev tîp digel Latîniya wan ev in:

? =Ab	? =Bb	? =Pp	? =Tt	? =Ss	? =Cc	? =Çç
? =Hh	? =Xx	? =Dd	? =Zz	? =Rr	? =Zz	? =Jj
? =Ss	? =Şş	? =Ss	? =Dd	? =Tt	? =Zz	? ='
? =Đđ	? =Ff	? =Vv	? =Qq	? =Kk	? =Gg	? =Ll
? =Mm	? =Nn	? =Ww	? =Hh	?? =La	? =Yy	

6) Alfabe digel mînak û agahiyên cûrbecûr ji 27 rûpelan pêk tê. Naveroka rûpelan wiha ye:

a) Rûpela yekemîn qapax e. Tê de navê xebatê (*Elîfbayê Kurdî*), navê nivîskar (Xelîl Xeyalî Motkî), navê çapkiro (Kurdîzade Ehmed Ramîz) û sala çapê (1325) cih digire.

b) Di rûpela duyemîn de 34 tîpên alfabe yê hatine nivîsandin ku me van tîpan digel Latîniya wan li jor da nîşan dan.

c) Di rûpelên sêyemîn, çaremîn û pêncemîn de navê van tîpan û rewşa nivîsandina wan di ser û nav û dawiya bêjeyê de hatiye nîşandan.

d) Di rûpela şeşemîn û heftemîn de li ser rewşa dirêjkirina tîpan, tîpên bênuqte, tîpên biyeknuqte, tîpên bidunuqte û tîpên bisênuqte hatiye sekandin.

e) Nivîskar di rûpela heştemîn de li ser bilêvkirina tîpan li gor ser û cer û ber yên erebî ku ji wan re "hereke" tê gotin sekiniye. Mînak: Be, bi, bu; te, ti, tu.

f) Di rûpela nehemîn de nivîskar behsa "tenwîn"a erebî kiriye û bal kişandiye ku di zimanê kurdî de tenwîn nîne. Çawa ku tê zanîn tenwîn di dawîya navdêrên erebî de cih digire û wekî du seran, du beran an jî du ceran ("..en", "..in", "..un") tê bilêvkirin. Ji bo nimûne tîpa "Byê" gava di dawîya navdêrek erebî de cih bigire wiha tê xwendin: Ben, bin, bun. Di rûpelên di pey re mînakên cûrbecûr cih girtine.

g) Di rûpelên 23 û 24an de di bin sernavê "Îbare" de nivîskar bi şiklê şêrê hinek nesîhet kirine. Mînak: Ders bixwune, zimanê Kurmancî hûbe.

h) Nivîskar di rûpelên 24, 25 û 26an de hinek du'ayên erebî nivîsandine.

i) Di rûpela dawîn de di bin sernavê "Rica" de wiha hatiye nivîsandin:

"Behayê vê (elfabeyê) ji bo tebi'kirina (çapkirina) kutubê (pirtûkên) Kurmacan e. Li pey vê, qiraet (xwendin) û serf (morfoloji=peyvسازی) û nehv (rêziman)a zimanê Kurmancî jî dê tebi' bibe (were çapkirin). Feqet em muhtacê arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştik nabe. Hêviya me xeyret û cuwamêriya Kurmacan e. Meqseda me jî zarokê Kurmacan ra nîşandana rêya 'îlm û hunerê ye".

7) Tiştêk balkêş jî ev e ku Xelîl Xeyalî bêjeya "Kurmanc" wekî "Kurmac" bi kar anî ye. Ango cih nedaye tîpa "n"yê. Berê me got qey viya kêmasiyeke çapî ye. Lê me dît ku Cemal Reşîd Ehmed di kitêba xwe ya bi navê "Zuhûru'l-Kurd Fî't-Tarîx" de dibêje ku di dema Mîrekiya Erdelan de Mîrê kurd yê bi navê Xusrev b. Muhemmed di destnivîsek xwe de bêjeya "Kurmanc" wekî "Kurmac" bi kar aniye û ev destnivîsa han di sala 1984an de li Moskovayê hatiye çapkirin. Wê demê me fêm kir ku di nav hinek nivîskarên kurd yên berê de navê "Kurmanc" wekî "Kurmac" jî hatiye xebitandin.

ELIFBAYÊ KURMANCÎ

Muherrir (Nivîskar)
Xelîl Xeyalî Motkî

Tabî' (Çapkirox)
Kurdîzade Ehmed Ramiz

Sal
1325

Birhoyê Heskê Têlî û Berxwedana Agirîyê

*"Rabe, de rabe Birho de rabe,
Bo çi Ararat te hîşt xerabe!
Îro dîsa hat Roma bê eman
Gund şewitandin nehişt xwedî can."*

Osman Sebrî

Wahdet ATEŞ

Birhoyê Heskê Têlî, yek ji serokê eşîreta Celalîyan ê ji milê Hesêsorîyan e. Birho niştecîyê der û dorên Agirîyê ye. Di parvekirina Şerrê Cîhan ê Yekem de, mîna hinek eşîretên kurdan Birho jî, bi Osmanîyan re li hemberê ermenîyan û rûsan şer kir. Wekî ku tê zanîn, Dewleta Osmanî dewletek ji pir netewan hatibû avakirin. Kurd jî di vê îqtidarê de yek ji wan netewan bû. Netewa kurd, di dema îqtidara Osmanîya de li hemberê neteweyên din her gav xwedî şexsiyetek taybet bûn. Bingehê vê taybetmendîyê, du sedemê balkêş bûn. A yekem, Musilmantîya û ji mezhebê ehlê sunetê bûna wan. A duyem jî, kurd di herêma Mezopotamyayê de, xwedî nifûseke xurt û şervantîya wan hebû. Osmanîyan, bona vê taybetmendîyê, li

kurda germ dinêrî. Osmanîya, di vê herêmê de li hemberê dujmin û neyarên xwe, ji kurdan diwarekî balkêş avakiribûn. "Diwarekî ji xûnê û bi ruh û can!" Dewleta Osmanî, di vê herêmê de serê wan çi demê bi kê re têteta belayekê, vî diwarî ji xwe re dikirin mortal û bê gûman piştî xwe didanê û bi wê parastina xwe dikirin.

Dewleta Osmanî, di destpêka de ji bona parvekirina qapîtalîstan, di Şerrê Cîhan ê Yekem de bûn muttefiqê Dewleta Almanî. Wexta di vî şerrî de Almanîya mexlûb bû, Dewleta Osmanî jî di vî şerrî de wenda kir. Dewleta Osmanî lawaz ket û neteweyên herêma Balqanan, daxwaza rizgarîya welatên xwe kirin û dewletên xwe avakirin. Êdî Dewleta Osmanî ber bi belabûnê diçû. Di herêma Kurdistanê de jî her diçû

qeweta wan lawaz dibû. Dewleta Osmanî, ji bona ku vê herêmê wenda neke, digotin; "wê Kurdistan bibe Ermenîstan." Osmanîyan bi vê sloganê kurda li hemberê ermenîyan sor kirin. Birho û eşîretên der û dora herêma Agirîyê jî, ji bo ku ne dixwestin Kurdistan têkeve nav Ermenîstanê, bi tevî leşkerên Dewleta Osmanî li hemberê rûs û ermenîyan şerrekî pir balkêş kirin. Wê demê di sînorê Kurdistanê de bûyerek balkêş çêbû. Li Rûsyayê, Bolşewîk hatin îqtîdarê û Leşkerên xwe ji herêma Kurdistanê vekişandin û birin şûna xwe ya berê. Feqet hîna Bolşewîk li Ermenîstanê nehatibûn îqtîdarê. Bona vê sedemê, fersendek mezin ket destê ermenîyan. Li ser vê fersendê, ermenîyan, hêriş kirin ser cîyên valakirî û hinek cîyan jî dagirtin. Li ser vê yekê, hetta Leşkerên Dewleta Osmanî hatin, Birhoyê Heskê Têlî û eşîretên kurdan ên din li hemberê ermenîya dîsa şer kirin. Wexta leşkerê Dewleta Osmanî hatin, Birho û eşîretên din bi kêfxweşîyek mezin pêşwazî li wan kirin.

Piştî şer, Birho çû Agirîyê û dest bi bezirganîyê kir û li karûbarê xwe mêze kir. Dewleta Osmanî yan jî bela bû. Tirka, di bin serokatîya Mustefa Kemal de, li ser erdê Anatolîyayê dewletek nû avakirin. Birho ji bona ku li hemberê rûs û ermenîyan şerr kiribû, xwe nêzîkî vê dewletê jî didît û ji bona menfeta xwe ya şexsî, têkilîyên xwe bi vê dewleta nû re jî xurt kirin. Ji bona ku têkilîyên wî bi dewleta nû re xera nebe, di Serhildana Şoreşgerî ya 1925an de, alîkarî neda Şêx Seîd û bêdeng ma. Hetta di dawîya serhildanê de, kurê

Şêx Seîd û hevalên xwe dixwestin derbasî Îranê bin, Birho ji van re bû asteng û bi dûv wan ket. Feqet Birho, li wan rast nehat û ew derbasê Îranê bûn.

Piştî têkçûna Serhildana Şoreşgerên 1925an, Dewleta Tirka qanûna sirgûnê derxistin. Li wan derûdorên di listeya sirgûnkirîyan de Birho ji navê dihate behskirin. Wan gotinan her çiqas wî tedirgîn dikir jî, Birho ji xwe pir bawer bû. Birho digot; "min pir alîkarî bi Tirka kirîye, îro jî ez hevalbendê dewletê me û ez li mala xwe rûniştîme û karê xwe dikim, zerara min nagihêje çi kesî. Van tiştên di derheqa min de têne gotin, hemî derewin." Feqet hetta hişê wî hate serê wî, keys û wext ji dest çûbû. Li ser vê babetê, Îhsan Nûrî dibêje, "Birho ne di fikirî ku li ber çavên tirka, dixwaze tu xizmetkar an jî asî be, qet ferq nake, dîsan jî tu kurd î".

Zivistana 1926an, serê şefaqê, pîrek û zarokên wî hazirîya pez û derxistina derve ji bona çêrê dikirin, dîtin serbazek û 20 leşkerên suwarî hatin gund û li Birho dipirsîyan. Wan jî gotin "Birho li vê derê nîne." Xizmetkarê wan got belkî vana wê hespê Birho bibin, wî jî di fersendekê de xwe avêt ser hespê û bi bez revîya. Çend leşkeran jî dan pê û qederek şûnda çend dengê teqînê hat. Di vê derheqê de em ana li Birho gohdarî bikin.

Birho digot, "ez li Bazîdê li mal rûniştîbûm, min çaya xwe vedixwar. Min dît kurê min î biçûk Îlhamî ji nişkê va kete hundirê malê. Ji min ra got; 'babo, serê şefeqê serbazek û 20 leşkerên siwarî hatin gund û li te dipirsîyan, me jî ji wan re got ew ne li vê derê ye. Xizmetkarê me jî got belkî

wê hespê te bigrin û wî jî xwe avêt ser hespê û hesp ajot. Çend leşkeran dan pê wî û şûnda çend dengê teqînê hat. Me fam nekir ew çi teqîn bûn'. Dawîyê min ji kurrê xwe re got, tû ana vegeirî gund, çek û rextên min bînin ber çem, ezê jî dawîyê werim. Piştî kurrê min çû, ez ji malê derketim û çûm hinda camîyê. Min berê xwe da Qiblê û min ji xwedê re dûa kir. Min got, Xwedê, ma tû zani! Hetta ana tû zerara min ne ghiştîye dewletê û ana dewlet ji bona sirgûnê li min digere. Daxwaza min ji te ev e, bi selameti tû min bigihîni çek û rextê min. Ji vîya zêdetir ez tişteki din ji te naxwazim. Dawîyê çi dibe bila bibe. Paşê di nav bajêr û di ber dikanan de derbas bûm, di rêka gundê Qotisê min xwe gihande ber çem. Min dît şivanê me li wê derê pez diçêrîne. Ez çûm cem şivan, min pirsra meselê kir, wî jî gote min 'serê şefaqê, efserek û 20 leşker hatin gund li te di pirsîyan. Wexta te li gund nedîtin, çend leşkera dan ser piştê hespê te û di ser rê de rastî çend firarên gundê Keskoyîyan tên. Di navbera wan de şer derdikeve. Di wî şerî de leşkerek birîn dibe. Leşkeran birîndarê xwe birin gund danîn mala we û çûn.' min çek û rextê xwe ji şivan girt û ez çûm malê, min birîndarê wan bi du heb gundiyan re şand Bazîdê û ez jî ji malê derketim çûm serê çîya.

Destpêka Şerê Agirîyê û Birhoyê Heskê Têlî

Wexta Birho çû serê çîya, restî Ferzende û Çavreş hat. Vana, ji bona ku di nav şerê Şoreşgerên Hereketa 1925an de cîh girtibûn, dewletê

sirgûnîya wan jî derxistibû. Ji bona vê yekê ew jî bûbûn firarê dewleta Tirka. Bi vî hawayî her diçû qeweta Birho zêde dibû. Dawîyê yên ji terefê dewletê ve hatibûn sirgûnkirin, ji cîyê xwe yê sirgûnê direvîyan dehatin cem Birho. Ji bona vê helwesta Birho, dewleta Tirkan xwe pirr aciz dikir. Her çiqas qeweta dewletê zêde ba jî, tirsra wan, "digotin heger îngilîz piştgirî bidin vana, wê demê serê me dê têkeve talûkeyek mezin." Ji bona vî hawayî tirkan dixwestin, wek cara berê bi hawakî xwe ji vî îşa xelas bikin. Ji bona wê sedemê, dewleta Tirka dixwestin dîsa wek berê bi Birho re li hev werin û wî bixapînin. Ji bona vê, li gundê Xelasê, kumandanê tirkan û Birho hatin cem hevûdû û civînekî çêkirin. Di civînê de gotinê kumandanê tirkan, tehl û şorkî bûn. Birho bi wan gotin û nîv tehdîtan re ne hate xapandin. Bi wî hawayî civîn qedîya û li ser çi tişteki li hev nekirin û bela bûn.

Leşkerên tirka xwe berdan ser deşt û çiyayên Agirîyê û li benda fersenda hêrîşê sekinîn. Leşkerên tirka şevêkê bi top û mîtraloyozan êrîş birin ser Birho û hevalên wî, gulle li wan reşandin. Her çiqas qeweta Birho hindik ba jî, dîsa jî Birho û hevalên xwe di vî şerrê sala 1926an de bi serketin, top û mîtraloyoz û cebîlxane û hinek leşker ketin destên wan. Birho dawîyê wan êsîran serbest berda. Leşkerên tirka di vî şerrê yekem de mexlûb bûn. Li ser vê bûyerê nav û dengê şoreşgerên Agirîyê li her derên Kurdistanê bela bû. Wê demê, Ebdulqadirê reîsê eşîreta Şemikan li Îzmîrê di sirgûnê de bû, ji cîyê xwe revîya û ji bona şer hatin gehîştin

Birho. Di Sala 1927an de Îhsan Nûrî jî, bi biryara Xoybûnê hate gehîşte Agirîyê û hêzên xwe kirin yek û bi hevûdû re dest bi şer kirin. Agirî kirin mîna kela şoreşgerîya Kurdistanê. Wekî Îhsan Nûrî digot, "Bi destpêka Birho, Agirî bû meşaleya serhildana Kurdistanê û vê meşalê şewqa xwe dabû her terefên Kurdistanê. Sedema mexlûbîyeta me ne ji bona ku kurd li me xwedî derneketibûn. Bîlakîs ji bê îmkaniyê me nikaribûn şervanên kurd hambêz bikira. Çimkî, derûdor li me hatibû girtin û tamamê têkilîyên me kut kirin, em fetisîn."

Damezirandina Hikumeta Agirîyê

Piştî Îhsan Nûrî û Birho qeweta xwe kirin yek, li Agirîyê gelek tiştên balkêş hatin qewimîn. Cara yekem Şoreşgerên Agirîyê cil û bergên leşkerî lixwekirin û bi nîzamek leşkerî dest bi şer kirin û kûmên fermî yên leşkerî danîn serên xwe. Li Pêşîya kûmê wan, wêneyên Agirîya mezin û biçûk bi armayên metal pêve kiribûn. Ê efseran jî, amblema Xoybûnê bû û ji bona ferqîyeta wan rutbe û qelem, simbilê genim, xençer û roj hatibû lêkirin. Ji ciwanan rêkxistina leşkerî ava kirin. Der û dorên ji dijmin hatibûn valakirin li wan dera ala Kurdistanê li darxistin. Di navbera salên 1926-1927an de, Birho û serokên şoreşger-ên Agirî yên din, di bin gelek zahmetîyên balkêş de moralê şoreşgerên Agirîyê bilind kirin. Di sala 1927an de serokên şoreşgerên Agirîyê civîna Netewa Kurdistanê li serê Agirîyê civandin. Ev civîn bû wek

mîna parlamentoya Kurdistanê. Vê civînê wezîfa rêvebirina serxwebûn û azadîyê dan rêxistina xwe, hevkarî û dostaniya gelê rrmênîya bi prensîb hate qebûlkirin û diyarkirinê. Parlamentoya Kurdistanê, Hikûmata xwe hilbijartin. Her çiqas wazîfa Hikûmetê, çareserîya pirsgirêkên daxilî û xaricî ba jî, wezîfa parlametoyê a esil, ji bona rênişana şerrê şoreşgerîya serxwebûn û azadîya Kurdistanê bû. Di vê civînê de parlamentoya Kurdistanê, Birhoyê Heskê Têlî û Îhsan Nûrî bi hilbijartinê kirin serokên herî girîng. Birho Heskê Têlî bû serokê rêvebirina siyaseta berxwedana Agirîyê, û Îhsan Nûrî jî bû serokê Femandeyê Giştî yê Leşkerîya Hereketa Agirîyê.

Destpêka Şerrê Herî Mezin

Dewleta Tirka, di meha Hezîrana sala 1930î de li hemberê şoreşgerên Agirîyê dest bi êrişa leşkerî kirin. Vê êrişa tirka ji şoreşgerên Agirîyê re ne suprîz bû. Feqet di herêmen din de, gelê kurd hîna ji bona şerr ne emade bûn. Mixabin di van şertan de şerrê herî mezin li Agirîyê destpêkir. Her çiqas merkeza şer çîyayê Agirîyê ba jî, naveroka şerr temamê herêmen Kurdistanê dabû ber xwe. Çimkî tirka dixwestin bi vî şerrî, di demek kin da bê deng xwe ji şoreşgerên Agirîyê û ji şoreşa gelê Kurdistanê xelas bikin. Bi vî hawayî tirka wek gurên har êrişê ser şoreşgerên Agirîyê kirin. Feqet di vî şerrî de Tekoservanên Agirîyê wek şêran li hemberê tirka berxwe da û Artêşa Tirka mexlûb kirin. Ji bona vê mexlûbîyetê, rêvebirên femandeya

artêşa tirkên bi hev ketin û prestîja Hikumeta Tirk şikîya. Medya tirkên di rojnameyên xwe de ji bona kurda tirsaxwe êdî aşkere kirin û şer ji veşartinê derket aşkere bû. Ji aliyê din ve di rojname û medya navnetewî de jî ev mesele bû pirsgerêka Rojhelata-Navîn.

Li ser vê mexlûbiyetê, ji nû ve tirkên dest bi planek hîn mezintir kirin û bi vê planê li hemberê kurda dîsa dest bi şer kirin. Gora ajansên Awrûpî, di vî şerrî de qeweta tirkên, 60.000 leşker û 100 heb teyare bû, li gora Amerîka jî, 100.000 leşkera dest bi şer kiribûn. Qeweta kurdan jî, li der û dorên Agirîyê ancax 10.000 şoreşgerên Kurdistanê hebûn. Di vî şerrî de jî talih li rûyê tirkên ne kenîya û dîsa tirkên mexlûb bûn. Di vê demê de li Îxdirê di navçeya Taşbûrnûyê de şoreşgerên kurdan hetta Ermenîstanê berra leşkerên tirkên da, leşker çûn xwe teslîmê Ermenîya kirin û li wê derê bûn niştecî. Şoreşgerên Agirîyê, bi vî hawayî hetta 25ê Êlûnê liberxwe dan.

Tengasîya Şoreşgerên Agirîyê û Astengîyên Wan

Tirka derûdor li şoreşgerên Agirîyê girt û çûn û hatina wan qut kir, tamamê têkilîyên wan û derve û hundir birrîn. Ji bona van astengîyan, şoreşgerên Agirîyê hatin li ser çiyayê Agirîyê lihev civîyan û li ser du astengîyên balkêş sekinîn. Gengeşîya wan a yekem, li ser xwarin û vexwarinê bû. Çimkî ji şoreşgeran bêhtir, xwedî kirina gelê sivil li serê wan bûbû belakî herî mezin. Gengeşîya duyem jî, çek û cebîlxane û tengasîya teçhizatên leşk-

erî bû. Ji bona van pirsgerêkan, şoreşgerên Agirîyê li ser du xalan sekinîn. 1- Îhsan Nûrî û hinek serleşkerên din digotin, "emê berê gelê sivil xelas bikin, dawîyê emê qeweta xwe derbasê cîyekî din bikin û li wê dera şer bidomînin." 2- Birhoyê Heskê Têlî li hemberê vê planê derket û digot; "Şoreşgerên tekoşer! Tamamê, pîrek, zarok û îxtiyarên bê qewet di bin şûr de derbas bikin, da ku ji bona paşvegerê tu pira(têkilîya) li du xwe nehêlin ku hetta nefesa xwe ya dawîyê li hemberê dijmin şer bikin." Piştî vê gotinê, Birho şûrê xwe kişand û wek Şêrekî ket nav malbata xwe û berî herkesî dest bi serjêkirinê kir. Hetta mirovên bi rûmet bi halekî xerab ketin navbeynê, ancax Birho dan sekinandin. Feqet hetta sekinandin Birho, deh mirovên bêguneh û masûm li serê çiyayê Agirîyê rih û canê xwe dan, bûn qurbana şoreşa Agirîyê. Li ser vê trajedîyê şoreşgeran dev ji vê planê berdane û serokê hêzên leşkerî, Îhsan Nûrî û hinek şoreşger, gelê sivil girtin çûn teslîmê Îranê bûn. Şoreşgerên din jî derbasî herêma Zîlan, Abaxa, û Bûlanixê bûn.

Aqubeta Birhoyê Heskê Têlî

Di 17yê Çirîya Pêşîn a 1930î de, Birho û şoreşgerên digel wî, çûn ketin Agirîyê, ketin şikeftên binê berfê. Di wan rojên teng de şikeftên binê berfê bi dostanî wan hambêz kir û li wan xwedî derketin. Birho li vî derê jî nû ve tifika şoreşgerîya Kurdistanê germ kir û şoreşgeran di her fersendê de, di serdeştên Agirîyê de, derbe li ser derbê li leşkerên tirkên dixistin.

Birhoyê Heskê Têlî hetta, di payîza 1932an de xwe teslîmê tu hêzên dewletan nekir û di çiyayên li ser sînorên Tirkîyê û Îranê de bi herdu dewletan re serrên balkêş û girîng kirin. Rojekê, ew qehremanê bê emsal û hevîna xwe Rebîa Xanim li ser piştê hespê di rê de dimeşîyan, ji terefên mirovên tarî de hate gullebarankirin û li wê derê Birho hate kuştin. Hevîna wî jî birindar bû. Di temamê taqîbatan de katilên wan aşkere nebûn û nehatin dîtin.

Piştî mirina wî, hêzên wî yên şoreşger di bin serokatîya birayê wî Eyub de, bi mecbûrî çû xwe teslîmê dewleta Îranê kirin.

Li Ser Dîroka Kurdistanê û Cihê Birhoyê Heskê Têlî

Dîroka Kurdistanê, bi rastî hîn nehatiye nivîsandin. Piranîya wan tiştên hatine nivîsandin jî, gelek kêmanî û xeletî tede hene. Ji bona wê yekê kurd hîna bi rastî di derheqa dîroka xwe de gelek tiştên nîzane û tiştên fehm kirîye jî, piranîya wan tiştan çewt in. Ji ber vêya, serê me kurda tevlihev e. Ên ku dîroka xwe nas nekin, mafê xwe jî nas nakin. Wexta însanek mafê xwe nas neke, ji bona xwe tişteki nas nake û çî bikin jî ne ê wî ye û xwe pê dixapîne. Çimkî tiştên bîn gotin û bîn kirin bê esil in, yanî derew in. Daxwaza min ev e; werin em bi hevûdu re dîroka xwe, siyaseta xwe û bingehe dewleta xwe ji nû ve danin û em dewleta xwe ava bikin û xwîn û keda şoreşger û qehremanên Kurdistanê berhewa nekin.

Ji bona ku em dîroka xwe nizanin, em qehremanên xwe jî nas nakin.

Mesele, min berê hereketa şoreşgerên Agirîyê bi dest pêka Îhsan Nûrî di zanibû, ama dawîyê min lê nêrî ku rastî ne ev e. Belê di vê berxwedanê de keda Îhsan Nûrî pirr e û nayê înkâr kirin, feqet destpêk ne a wî ye û ew bi devê xwe dibêje "Birho meşaleya şoreşgerîya Agirîyê ye." Li ba dilê min, nivîskarên ku li ser Hereketa Agirîyê nivîsandine mafê şoreşgerîya Birho xwarine. Çimkî ez ewqas di nava çavkanîyan de gerîyam, ancax wan tiştên jorê min jê derxist.

Hêvîya min ew e, di derheqa Birho de xwendevanên hêja wê kêmasîyê min bibînin û emê bi hevûdu re di nava rûpelên dîroka Kurdistanê de, cihekî bi rûmet bidin şoreşger û qehremanên Kurdistanê.

23.12.2008

ÇAV KANÎ

- 1- Ararat'taki Esir Generalden Kan Çiçekleri
- 2- Garo Sasuni, Kürd Ulusal Hareketleri ve 15.yy. dan Günümüze Ermeni Kurd İlişkileri
- 3- Mala Kürda. Ynternet sitesi.

Mustafa Remzî BUCAK:

**"Ger ji 60 Hezar Tirkên Kibrisê re
FEDERASYON Bibe, Çima Ji 8 Mîlyon
Kurdên Turkîyeyê re Nabe?"**

Mehmud M. E. XERZÎ

Her netewe xwedî kêmasî û xetayên xwe yên xas in. Belkî hin xwendevan an bîrewerên me vê gotinê qebûl nekin lê baweriya min ev e, ku dê gelek kes tevî vê gotinê bibin. Di nav me de jî kêmasiyekê pirr mezin heye. Çi ye ev kêmasî? Em dîrok û serpêhatîyên xwe zû jibîr dikin. Duyemîn jî, nav me de rêzgirtina ji keda însan re kême. Divê em di van herdu babetan de xwe temam bikin. Halbûkî di vî warî de em xwedî mîraseke zahf qewîn e: Feylezof Ahmedê XANÎ gotiye ku "her gîya li ser koka xwe hêşîn dibe." Ma ev ne bese!

Min ji bo çî evan tiştan got! Gelo wexta em dakevin nav xelkê û em pirsra hin navên pêşîvan û mezinên kurdan ji wan bikin dê çend kes bizanibin? Bi ya min, pirsgirêk ev e ku em tiştên derbas-bûyî zû jibîr dikin. Bi vê sedemê ez ê di



Mustafa Remzî BUCAK

vê nivîsê de behsa mezinê Kurd bikim da em wî bibîr bînin an jî kesên ku wî nasnakin bila wî nas bikin.

Mustafa Remzî BUCAK

Mustafa Remzî BUCAK, rewşenbîr, hûqûqnas û siyasetmedarekî kurd bû. Ew di sala 1912an de li qeza Sêweregê li gundê Anazûyê tê dinyayê. Navê bavê wî Mihemed Axa ye. Bavê wî piştî bizava azadî ya 1925an tê nefikirin. Ew xwendina xwe ya sere-tayî li Sêweregê, ya navendî û bilind jî li Stenbolê diqedîne. Berî ku xwendina xwe ya hûqûqê xelas bike, yanî di sala 1935an de diçe Parîsê û salekê li wir dimîne. Di sala 1940î de hem hûqûqê xelas dike hem jî bi ZEHRA qîza Osman Paşayê Kurd re dizewice.

Di salên 1940 û 1950yan de zarokên kurda yên halxweş û hin yên feqîr jî derfeta xwendina bilind dibûn. Lê li Kurdistanê unîwersîte tunebûn. Ewana mecbûrê Anqere û Stenbolê kiribûn. Lê ciyekî ku lê bimînin, razên, bixwin û vexwin tunebû. Mustafa Remzî Bucak û xanima wî Zehra Xan, DÎCLE TALEBE YURDU ava kirin. Ev herdu kes ji bo xwendevanên kurd bûbûn wek bav û dê an xwuşk û bira yên mezin. Li yurdê gelek kesên ku paşî wê di doza kurd de tevbigerin diman. Dicle bûbû xwendegeha kurda. Dr. Yusuf Azîzoglu, Mustafa Ekinci, Faik Bucak, Musa Anter, Dr. Tarik Ziya Ekîncî, Edip Karahan, Ali Karahan, Ziya Şerefhanoglu, Nejad Cemîloglu, Edip Altınakar, Enwer Aytêkîn.....û gelek kurdên din piştevanên vê yurdê bûn.



Zehra BUCAK

Di DÎCLE TALEBE YURDU de xebatên li ser zimanê kurdî, yên sîyasî û kulturî dihatin kirin. Li gora ku em ji Musa Anter û Dr. Tarik Zîya Ekîncî dixwînin; li yurdê her sal Newroz dihat pîrozkirin, folklor dihat hînkirin, kovara *HAWAR* a ku Mîr Celadet û hevalên wî derdixistin, di nav xwendevanan de dihat xwendin. Hetta behsa pêwendiyên mabeyna Mîr Celadet û Mustafa Remzî Bucak tên kirin.

Mustafa Remzî Bucak li Diyarbekirê parêzerî dikir. Di sala 1949an de serokê Partiya Demokrat a Tirkîyê Celal Bayar tê Diyarbekir û di civînekê de hev dibînin. Di mabeyna wan de hin axaftinên di derbarê sedemên netevlîbûna Mustafa Remzî BUCAK û hevalên wî ji bo Partiya Demokrat derbas dibin. M. R. BUCAK sedemê wek ku çima dewlet

ferqê dixê mabeyna kurd û tirk nîşan dide. Celal Bayar dibêje ku ewan van tiştan jibîr kirine. Belkî ev axaftina Celal Bayar ê serokê Partiya Demakrat a Tirkîyê, hêvîyekê dabe M. R. BUCAK û hevalên wî.

Di sala 1950î de Mustafa Remzî BUCAK, Dr.Yusuf AZÎZOGLU û Mustafa EKÎNCÎ di hilbijartina giştî de bi ser dikevin û li Parlemantoya Enqerayê dibin wekîlên xelkê Diyarbekir. Di Meclîsa Enqerayê de xebatên zahf baş dikin.

Di sala 1943yan de li qeza Ozalp a Wanê ku li ser sînorê Îranê ye, 33 kurd, bi fermana General Mustafa Muglali hatibûn kuştin. Sedemê vê bûyerê, çav tirsandina kurda bû. Ji bo ku tevgera kurdên rojhilat li kurdên rojava bandor neke. Lê dema Mustafa Remzî BUCAK û hevalên xwe çûn Parlemantoya Tirkîyê, pêşniyar kirin ku lêkolîn li ser vê bûyerê bê kirin. Dozê şopandin, heya ku General Mustafa Muglali xistin zîndanê û ku ez ne xelet bim ew di zîdanê de jî mir.

Mustafa Remzî BUCAK sala 1948an di rojnama Musa Anterî ku navê wê *Dicle Kaynagi* bû de, bi navê *Yki Cemaat* nivîs dinivîsîne.¹

Mustafa Remzi BUCAK û hevalên xwe di roja 21.11.1952yê de teklîfa betalkirina qanûna di derbarê damezrandina Mufettişîya Ûmûmî de didin meclîsa Anqerayê. Evan Mufettişên Ûmûmî ew kes bûn ku mala kurda xerab kiribûn. Ev pêşniyarî

di roja 24.11.1952 ade qebûl dibe û qanûn tê betal kirin.²

Di sala 1959an de 50 kurdên xwendevan, di dema desthilatdariya Partiya Demakrat de ku wê demê serokê wê Adnan Menderes bû, têne zîndanî kirin. Yek ji van zîdankirîyan bi navê Emin Batu di zîndanê de wefat dîke. Seîd Elçi bi nexweşîya jana zirav dikeve û Bînbaşî Şewket Turan jî bi nexweşîya şekir (diyabetê) radikin nexweşxanê. Çar meh tu kes agahdarî ji wan nastîne. Êdî Xwendegha Herbîyê bûye Zîdana Herbîyê. Ev bûyera hanê Mustafa Remzî BUCAK zêde diêşîne.

Ji bilî vê bûyerê, bûyereka din ya sereke heye ku dê Mustafa Remzî BUCAK ji welatê wî dûr bixîne. Di sala 1960î de Serokkomarê Tirkîyê Celal Bayar, rojekê M. R. BUCAK û gelek kesên din dawetî koşka xwe dike. Piştî xwarin û vexwarinan Celal Bayar dikeve millê rast ê M. R. BUCAK û wî ji civatê dûr dixê. Jêre weha dibêje, *"Remzî Beg, em dizanin tu kî yî û armanca te jî dizanin. Em te dişopînin. Jibîr neke ku mesela kurda, ji bo me ji ya Ermenîyan jî girîngtir e. Ger hun naxwazin aqûbeta Ermenîyan were serê we, ev muamele û xweşbînî (musamaha) ji bo we bes e."*³ Piştî ku serokê komarê vê gotina xwe dibêje, bi yek carekê ji millê wî dertê û xwe jê dûr dike.

Evan gef û gurrên han Mustafa Remzî BUCAK ji têkoşîna wî dûr nexistibû. Fikrên xwe di odeya serokê

² Yeşiltuna. Serap- Atatürk ve Kürtler- İleri Yayınları.

³ Bucak, Mustafa Remzî- *Ji rewşenbîrê kurd, nameyek ji bo İsmet Paşa- Weşanên Doz/Stenbol*

¹ Ji Yusuf Serhat Bucak

wezîran de eşkere ji Adnan MENDERES re jî dibêje.

Baweriya min û gelek kesan jî ew e, ku evan du sedemên ku me got, tesîrê li Mustafa Remzî BUCAK kir û di 2yê Gulana 1960î de terka welatê xwe kir û çû Amerîkayê. Nedixwest bê zîndanîkirin û tade lê bête kirin.

Demekê tê Parisê û dibe mêvanê Mîr Kamûran BEDÛRXAN. Mîr pîrsa Elî Fûad BUCAK jê dike û gelek agahdarîyan didê. Elî Fuad BUCAK wekîlê Meclîsa Mebûsan ya Osmaniyan bû. Dewlemend bû. Di Meclîsa 1921ê de jî hebû. Mustafa Remzî ji Kamuran Bedîrxan fêr dibe ku Elî Fuad Bucak welatperwerekî gelek baş bûye. Elî Fuad paşî tê nefîkirin ji bo Anqerayê. Di sala 1944 an 1946an de li wir wefat dike.⁴

"Mustafa Remzi BUCAK di serê sala 1984an de hate mala min a li Parisê. Mala min yek odekê bû. Çendekî li mala min ma. Lê mal biçûk bû. Min cixare dikêşa. Ji bo ku ew aciz nebe min mala xwe jê re hêla û ez çûm xaniyekî din. Halê wî yê aborî baş bû. Ji halê min gelek baştir bû. Maaşê xwe li ser dolar distend. Wê demê dolarek bi 12 Franka bû."⁵

"Mustafa Remzî BUCAK li dora du sal û nîv li Awrûpa ma. Li Parisê dijiya. Kêfa wî zahf zêde ji Enstîtûya Kurd re dihat. Diçû cem Kendal NEZAN. Li wir pirtûkan dixwend. Yilmaz GÛNEY li wir bû. Ahmed KARLI li wir bû. Wê demê gelek

ciwanên bakûrî koçberî Awrûpa bûbûn. Di her çar perçeyên Kurdistanê de şoriş qels bû. Ew jî aktîf nînbû.

Ji aliyê xweşbînî û bîhnfirehîyê ve xwedî exlaqekî xweş bû. Bi Dr. Tarîk Zîya EKÎNCÎ re gelek cara sohbet dikir. Tevî ku fikrên wan ne yek bûn jî, pêwendiyekî zahf germ di mabeyna wan de hebû. Bi xortan re diaxîfî. Kesên ku muhtacî pera bûn, pere dida wan û bi wan re alîkarî dikir. Carna dihate cem min li Almanyayê. Carna diçû mala Hemreş Reşo. Lê bêriya Parisê dikir û diçû. Ji xwe di sala 1935an de dema di hûqûqê de xwendevan bû, bi zanîn di wê salê de xwe negihandibû îmtîhanan ji bo di sinifê de bimîne da ku bikaribe here Parisê û salekê li wir bimîne. Wî weke bîranîneke xwe vê behsê ji min re dikir.

Ew gelek caran li ser Dicle Talebe Yurdu, li ser bavê min Faik BUCAK û kesên din diaxîfî. Dema li Parisê wefat kir, pîrr kesên ku min wan dinasî an jî nedinasî hatibûn sere-monîya cenazeya wî. Enstîtûya Kurd ya Parisê bi sedema wefata wî deftereke amade kiribû, da ku kesên dixwazin têde di derbarê wî de binivîsin. Ez dibêim ew defter li Enstîtuyê ye. Ez nîzanim çî pirtûkên wî hebûn lê hemûyan dane Enstîtuyê."⁶

"Rojekê Dr.Tarik Zîya Ekîncî li min gerîya. Go ku ew li telefona Mustafa Remzî BUCAK digere lê tu bersiv nîne. Texmîna min ew bû, ku belkî çûbû Elmanyayê li cem Zozan BUCAK. Ez li Zozan gerîyam û min

⁴ Ji axaftinên Av. Alî Fuad BUCAK.

⁵ Ji axaftinên Av. Alî Fuad BUCAK.

⁷ Ji axaftinên Zozan BUCAK.



**Ji milê cep ve (1944): M. R. Bucak, Zehra Xanim û Faîk Bucak
(Dîmenek ji şeva Dîjle Talebe Yurdu)**

jê pirs kir lê neçûbû wir. Em çûn mala wî. Mifta derê malê bi min re hebû. Min derî vekir. Mixabin Apo Remzî wefat kiribû. Me doktor û polis anî. Pêdiviyên fermî hatin bi cihanîn."⁷

Ez bi xwe ne layengirê gotinên bûyerê weha me. Lê gelek hevalên min ên hêja, ji min re behsa rastgotinên di bûyeran de kirin. Gotin ku ev rastiya xelkê me ye. Min ji li ser rû behsa wefata wî kir. Mixabin xelkê kurd ji ber hin sedemên ku ne di destê wan de ne, gelek caran penaber bûne. Li der û dertûnên bîyanîyan bi xwe heyîrî mane û bûne weke nokên li tahtê ketî. Di dema wefata wî de lazime mirov bêje ku ji sazîyên kurda ya ku li pîya bû Enstîtuya Kurd ya Parîsê bû. Di mesela rakirina cenazê de baregeh ew der bû.

"Dema Mustafa Remzî BUCAK wefat kir hemû karên ji bo cenaze li wir hatin kirin. Yek rojekê cenaze li katafalqê de ma. Kurd bi merasîm dihatin seredana wî. Amadekariya rakirina cenazê, tevî katafalq û şandina Sêweregê hemû 10 rojan ajot. Ji bilî serokê enstîtuyê Dr. Kendal Nezan gelek kes hebûn. Dr. Tarîk Zîya EKÎNCÎ, kurê mamê min ê Remzî Mihmed, keça wî Leyla, Sertac BUCAK jî li wir bûn. Leyla keça wî ji Anqerayê hatibû. Zozan ji Almanyayê hatibû. Weke ku li bîra min maye cenaze çû balafirgeha Batmanê. Ji Batmanê heta Sêweregê û li Sêweregê kî beşdarê rakirina cenaze bû, kî nîn bû ez nizanîm. Ji ber ku min nikaribûm bi cenazê re herim. Cenazê wî li kêleka gora Av. Faîk BUCAK hate definkirin."⁸

⁷ Ji axaftinên Av. Alî Fuad BUCAK

⁸ Ji axaftinên Av. Alî Fuad BUCAK



Ji milê çep ve yên pêşî(1956):
M. R. Bucak, qîza wî Leyla, kurê wî
Memo, jina wî Zehra Xanim
Yên paş: Bekir Bucak û jina wî Mîhrîban
Bucak

Jîyana hêja M. R. BUCAK ya li derveyî welat xweş nayê zanîn. Lê di sala 1965an de nameyekê ji bo serokwezîrê wê demê yê Turkîyê, ji Îsmet İnönü Paşa re dişiye. Di sala 1933yan de bi sedema 10emîn salvegera damezrandina Komara Turkîyê, Mîr Celadet BERIRX-AN jî namekê ji bo Mustafa Kemal ATATURK şandibû. Herdu name di dîroka me de bi nav û deng in. Name bi Turkîya kevn hatiye nivîsîn û zahf dirêj e. Ji ber vê sedemê min nameyê bi qedere ku mana wê negu- hûre kurt kir. Serê nameya wî wihaye.

“Nameyeke Aşkere ji bo
Serokwezîrê Komara Turkîyê,
Yan jî ji bo Çi Turkîyeyê
Federasyon Neyê Bi Cîhanîn

Newyork.N.Y.

1965

Birêz ÎNONÛ,

Min fikrên te yên di derbarê çareseriya mesela Kibris de ku te di 4ê Sibata 1964an de di rojnameya New York Times de dabû belawkirin xwend. Ez bi halê Kibrisê, wek însanî xemgîn bûm. Di meseleya Kibrisê de kî berpirsiyar e an kî nîne emê ji bo dîroknivîsan bihêlin.

Min gelek caran bawerîyên xwe yên ji bo pêşeroja Turkîyê ji bo milletê turk gotiye. Ez dîsa jî, ji wî aliyê oqyanûsan, ji dûr ve fikr û ramanên xwe ji we desthilatdarên ku bi salane bûne xwedî tecrube re dixwazim bibêjim.

Wî Celal Bayarê ku di sala 1949an de li Diyarbekir ji min re gotibû ku ew êdî tiştên berê jibîr kirine, di sala 1959an de car din diranên xwe yên dirinde nîşanî kurda da û xortên kurda xistin zîndana Herbiye ya Ýstenbolê. Bûn sedemên îşkence û kuştina wan.

Rojekê em li koşka serok komar bûn. Li koşkê wekîlmilletên kurd jî hebûn. Celal Bayar kete millê min ê rastê û em ji kesên din du gav pêşdetir çûn. Got: *“Remzî Beg, em dizanin tu kî yî û çî dikî. Em te ji nêz ve dişopînin. Jibîr neke ku mesela kurd ji bo me ji mesela ermenîyan girîng- tir e. Ger hun naxwazin aqûbeta ermenîyan were serê we, ev kiryar û xweşbînî ji bo we bes e.”* Belê vê axaftina ha ya serokkomarê Turkîyê bû.

.....

Birêz ÎNONÛ,

Ew fikra ku te ji bo Kibrisê pêş-nîyar kiribû gelo tu heman tiştî anga Otonomîya Hindirî, Hukumeta Federatîfî ji bo Turkîyê fikirî yî an

na? Bi rastî em hemû li ser vê fikrê bûn. Hetta hemû xebat û armanca me ji bo federasyonê bû.

Fikra otonomîyê ya ku Prens Sabahaddîn ji bo şiklê îdara dewletê pêşniyar kiribû, ger hatibûya bi cihanîn, dê dewleta Osmanî nebûna wekî nokên li tahtê ketî. Îttîhad-Terrakî û Jon Tirkên bi tundî û req tevgeriyan. Agir ji devên wan dirijîya. Lewra welat anîn vî halî.

Îro di nav sînorên Turkiyê de 8 mîlyon Kurd dijî. Tevî ku heqên wan yên însanî ku di Lozanê de hatiye qebûl-kirin, her tim tê binpêkirin. Mêjiyê dewleta îro, ew mêjî ye ku kî xwe bilebitîne dibêjin li pey wê lebatê hêzeke bîyanî heye.

Birêz Ýnönü, Em car din dibêjin. Em 8 mîlyon kurd in. Em ji aliyê siyasî, aborî û kulturî ve bi qasî turkên li Kibrisê jî xwedîyê tu heqî nîn in. Kurd nikarin bêjin ku em kurd in, nikarin bi zimanê xwe binivîsin û bi axifin. Kurd dema bi zimanê xwe di axifin, îşkence li wan tê kirin.

Divê tehlîla welat baş bê kirin. Weke tehlîla ku doktor li nexweşekî datîne. Teşxîs û rastgotin deynê namûsê ye. Deynê we mezinên dewletê ye. Divê tu jî weke doktorekî li mesela kurda binihêrî û çareser bikî.

Di 1925an de piştî bizava Şêx Seîd, çapemeniyê got "Me Kurdistan û kurd dayetiyê xiste nav gorrê." Lê di 1928an de kurd ji Agirîyê cewaba we dan. Paşayê we yê bi nav û deng Salih Omurtak bi hemû hêza komarê ve çûn ser Agirî. Lê têkçûn. We çi kir? We axa xwe da Ecemistanê û hêj nû ve Agirî dorpêç kir. Hun îro jî mesela axa Ozalp a Wanê bi dizî digrin.

Eskerên ku li Agirî mirin bûn şehîd û

yên ku xelas bûn, bûn xazî. We madalyayên Herekata Agirî da wan. We dîsa got ku we Kurdistanê li Agirî defin kir. Tevî evan kiryanan îca li Dêrsimê, li Zilanê, li Sasonê, li Qerekopriyê kurdan çawa bi esker û memûrên tirkan didan gotinê "bijî Kurdistan." Bi van kiryanan ne kurd ne jî kurdîni namire.

Dema Cemal Gursel Paşa çûbû Dêrsimê û li wir, bi xeddarî jin, zarok, pîrejin, pîremêran kuştibû. Îro jî serokê Komarê ye. Di seredana xwe ya Dîyarbekir de ku navenda manewîyet û kultura Kurdistanê ye, ji xelkê re dibêje "Di vî welatî de Kurd tune ye, yê ku bêje ez kurd im tif kin riyê wî." Ev jî doktorîya wî ye.

Birêz ÎNONÛ, eger li Turkiyê kurd tune bin, hemû dinya rabe pîya, nikare Kurd û kurdayetiyê çêbike. Eger li Turkiyê kurd nîn bin, dawa we çiyê!

Ew cîyê ku hun jê re dibêjin Herêma Rojtilat û Başûrê Rojhilat, di nexşeyan de navê wê Kurdistan e. Bi gotinên we kurd nabin tişteke din. Dema Îhsan Nûrî û çend hevalên xwe yên sûbay bi we re şerr kirin, hun bi wan re nederketin serî. Lê ku mesele bibe wek mesela Fransîz û Cezayîrê hunê çi bikin? Ku hêj mesele li ser we giran nebûye, divê hun heq û hebûna kurda qebûl bikin.

Di nava wekîlên kurd de gelek kes hene ku dê bêjin ew ne kurd in û ji were destên xwe didin ser hev. Li Cezayîrê jî hin wekîlmillet ji Fransîza re digotin ku Cezayîr yê Fransayê ye. Sala 1930 an jî 1932 bû. Mala me li Stenbolê bû. Mêvanên me yên firavînê hebûn. Piştî her kes çûn, sê mêvan man. Di baxçeyê me yê pişt

malê de rûniştibûn. Wezîfeya min xizmeta ji bo mêvanan bû. Ez gelek cara bi bavê xwe re diçûm mêvandarîyê. Ewlehî di van mêvandariyan de esas bû.

Piştî ku dîtî kes nemaye û bi min jî ewle bûn, meselê anîn ser Hereketa Agirîyê. Li Agirîyê bê çewa tade û zilm li jin û zarok û xelkê sîvil hatibû kirin! Yek ji wan sê kesan bi tinazî got ku "...Ma hukûmet çi bike? Hukûmet li hember ew kurdên wehşî yên ku goştê xav dixwun û ji îro ve daxwaza serxwebûna kurda dikin, wê çawa tevbîgere." Bavê min li ser vê gotinê pirr hêrs bû, rabû li ser çokên xwe rûnişt. Çirûsk ji ber çavê wî diçûn...Bi hêrs bersîva wî wiha da:

"Dema Rûs hatin Bedlîsê, Fransîz Eyntabê, Rihayê û Mereşê dagirkirin û Yûnanî jî li ber Polatliyê ketin mewzîyan, ew dem em ne wehşî bûn û me goştê xav nexwaribû. Dema ji Erzeromê, ji Sêwasê û ji Enqerayê daxwaza alîkarîyê ji me dikirin, dest û rihên extîyarên me û çav û dêmên xortên me radimûsan. Me xwîna xwe, ne ji bo ku em bibin dîl û esîrên Anqerayê li hember Fransîza rijand." Kurmamê min Xelîl Fexrî Beg bi kêf û henek, ji bavê min re got: "dê çi bibe. Ew şerrê ji bo xwedê bû. Apo ma tu nizanî heya di ser pirê re derbas bibin ji hirçê re dibêjin Xalo. Ew, we kirin hirç, li piştê we siwar bûn û bi wî awayî di ser pirê re derbas bûn." Bavê min got: *"Na, nîvê suncan yên wekîl û mebûsan e, ku çûn Lozanê û li ser navê kurda di heyeta Îsmet Paşa de cihê xwe girtin."* Dema bavê min vê gotina ha got, kesê hemşehrîyê me got "Ma em çi bikin Mihemed Axa! Me nezaniyê vê kerr(Îsmet Paşa) dê

ew qasî dijar be."

Zatê sisêyan jî heman hevokê dubare kir...

Dema ku mêvanên me rabûn, ji tîrsa xwe xwestin ku evan axaftinên han di mabeyna me de bimîne. Ez dixwazim navê van kesên ku mêvanên me bûn bibêjim.Yek ji wan, wextakî ku wezîrtiya Nafiê(kar û barên gunda) kiribû Pirinççizade Feyzî Beg bû.Yê din Zûlfî Begê Egilê bû ku di heyeta Lozanê de li ser navê Kurdistanê bi heyeta Yismet Paşa re çûbûn û herdu jî wekîlmilletê Diyarbekirê bûn. Yê dîtîr Osman Paşazade Xelîl Fexrî Beg bû ku di hilbijartinên 1925an de bûbû wekîlmilletê Sêweregê.

Birêz Îsmet Paşa!.. Her wekî ji axaftinên wan jî tê zanîn, wan kesan kurdîniya xwe înkâr nedikirin. Bes heyfa wan lê dihat ku çawa hatin bi karanîn. Di vir de qesda min jî kerr, Îsmet Paşa ye. Ew serokê heyeta Lozanê bû, bi salan serokwezîrî kir û bi sed hezaran kurd kuştîye.

Di sala 1948-1949an de ez çûbûm derdorê Urfayê. Mêrdinê, Diyarbekirê û Sêweregê. Min dozên xwe dişopandin. Bi gundî û bajarîyan re tîkiliyên min baş bûn. Rojekê ez mêvanê Bozan Axayê mezinê eşîra Îzolîya bûm. Me behsa Îsmet Paşa dikir. Min dizaniyê ku Bozan Axa bi Zilfîqar Axayê bavê xwe re di sala 1926an de bi malbatî hatibûn nefîkirin û gelek jî perîşanî dîtibûn. Hêj di sala 1919an de ku tu kes guhê xwe nedida Erzerom û Sêwasê, ewana li Urfayê, li Eyntabê, li Mereşê li hember Fransîzan bi cengawerî şerr kiribûn. Dewletê perrûya wan dabû wan: 1500 malbat hatin sirgûnkirin. Di rêya sirgûnê de li Edeneyê gelek

kurd rastî hevdu tên. Êvarekê Zilfîqar Axa tê û ji kurê xwe Bozan Axa re dibêje "Bozo Lawo! Ezê ji îro û pêde ji Îso re(Îsmet Paşa) dia bikim. Heya niha min nizanibû di dinê de ew qas kurd hene. Min wisa dizanibû ku ji bilî Riha û Dîyarbekir û Sêweregê li tu derê Kurd tune ne. Ji bajarê Colemêrgê, Wanê û Mûşê bigre heya Erzînganê, nizanim kîjan qezayên Edeneyê û Sêwasê giş kurd bûne, haya me pê tunebûye. Xwedê ji Îso razî be, em hişyar kirin. Ji îro û bi şûn de ji wî re dian bikin."

Zulfîqar Axa tevî ku kurd bû jî, bi bandora van kiryanan kurdîniya xwe baştir îdraq kiribû û xwe minetdarê Îsmet Paşa didît. Ne tenha Îsmet Paşa lê kesên wekî Celal Bayar, Kerîm Yncedayî, Îbrahim Talî, Abîdîn Özmen, Namîk Gedîk, Cemal Gûrsel û Hîfzî Oguz Bekata bi zilm û kurd-kujî û nefîkirinê kurda hişyar kiribûn. We hemû dibistanên Kurdistanê yên ku ji dewra Osmanîyan mabûn ji holê rakirin. Hun jî dizanin ku zankoyeka tenê li Stenbolê têra herkesî nake. Lê hunê li Anqarayê, li Îzmirê, li Trabzonê, li Samsunê, li Egeyê vekin lê li Kurdistanê na. Ji ber ku desthilatdar hemû dixwazin kurd nexwînin û di cehaletê de bimînin. Hun dixwazin zimanê kurda bihelînin û asîmîle bikin.

Pîştî sala 1950yî, we li Kurdistanê çend mektebên seretayî û nawendî vekirin. Lê we ne îmkanên fêrbûnê û ne jî mamosteyên wan temam kirin. Pîştî hîlbijartinên 1950yî teklîfa rakirina qanûna di derbarê qamçûra heywan de hat dayîn. Lê baca(qamçûra) mêşinan(miha) tenê nehat qebûl kirin. Min rojekê wezîrê darayî

Polatkan di korîdora meclîsê de zeft kir.Min jê re behsa rakirina qamçûra mîyan kir. Kurd ji destê wê bacê zêde perîşan bûn. Ji bo ku kurd heywanan xwedî dikirin. Polatkan got: "Remzî Beg, bihêle bila piçek jî dûva kurda di destê me de bimîne."

Birêz ÎNONÛ, ev ne ecêb e? Ew zarokên doya ku hê jî bêhna şîr ji devê wan tê, çi zû dersa xwe fêr bûne?

Dema Atatürk li Dîyarbekir bû, ji kurda tabûrekê ekser ava kiribû. Hermû bi şal û şapik bûn û xencera wan î ku temsîla kurda dikir jî di ber wan de bûn. Hetta daha pêşdetir jî çûbû û wana ji bo parastina xwe bi kar anîbû. Gelek ji wan kesan li heyatê ne. Weke mînak: Ethem Ulcay Beg. Ne tenha wî, gelek kesên ku çi alaqa wan bi serhildanan nînbûn we wan jî sirgûnê Anadolê kir.

Dadgeha Îstîqlala Dîyarbekir, sirf ji bo ku Dr. Fûad şal û şapikên kurdî li xwe kiribû, wî bi tewana ku bi wan cilan alemdariya netewaperestîya kurdîniyê kiriye we wî îdam kir. Lê wî, li ber sêpêya îdamê, ew beyta ku xwend, hêj di rihê her kurdî de ye

"Şevêkê tarî, ya heye hîv yan tune ye hîv,

Deşt di xewda, çiya digrî, ne hilat hîv!"

Ezê meseleyekê bi îbret ji we re bêjim. Du sal berê ez li Amerîkayê çûbûm Detroitê. Ez bûm şahidê bê ku turk çawa ji navê Dr. Fûad fêde dîtine. Dewleta Turkiyê di wê demê de, ji bo ku ji kurdên li Amerîkayê îstîfade bikin, serokê Kîzyîlaya Turkiyê Dr. Fûad Bulca dişînin Amerîkayê. Fûad Bulca xwe dixê

şûna Dr. Fûadê îdamkirî û dibêje ew nûçeya ku di rojnameyan de derket ku Dr. Fûad hatiye îdam kirin ne raste û ew, ez bi xwe me. Dr. Fûad Bulca bi derewên xwe bi ser dikeve û gelek jî alîkarî berhev dike.

Di 1925an de serokêwezîrê Turkîyê Fethî Okyar ji bo mesela eskerên Pîranê gotibû: "Pêwistî bi bizaveka leşkerî nîne, ez dikarim bi hêzên devêrê meselê halbikim." Ez dibêjim Fethî Okyar ne xayîn bû. We pê da îstîfa kirin û tu ketî cihê wî.

Dostê bavê min Heyder Kang Begê Dêrsimî, ji ekserîyê ji ritba yuzbaşî-tîyê teqawûd bûbû. Li Stenbolê zewicî bû û bi cîh bûbû. Herkes dizane ku li Dêrsim û Sason û Zîlanê çi qewimî. Dayîka wî ya 70 salî, bavê wî yê 80 salî û xwuşkên wî yên pîr, jin, zarok, extîyar tevan tînin dixin mala wan, benzînê li wan dikin û wan dişewitînin. Malbata wî tevî ku li devera dervayî serhildanê de dijiyan jî, di tevgera Dêrsimê de hatibûn kuştin. Heyder Beg, ne li Stenbolê û ne jî li Anqerayê kesekî nedîtibû ku derdê xwe ji wan re bibêje. Min di sala 1955an de li ser hin qanûnan lêkolînan dikir. Ez leqayî qanûna jimara 1850 hatim. Qanûn wiha bû: "Li herêma îsyanê sûbay, ekser, sîvîl, memûr, mistexdem û mîllîsên ku bi wan re hevkarî kiribin, li gora Qanûnên Ceza yên Turk sûcên wan çibe jî nayên ceza kirin."

Çi qanûneke tewş û berredayî ye ne wisa?

Pîştî ku Dadgeha Îstîqlalê ya Dîyarbekirê biryara di dardakirina Şêx Seîd da û bi cîh anî û defin kirin, di şevê de bi emrê serokêwezîr Îsmet Paşa, ji gorra wî hate derxistin

û eskeran cenazê wî neqlê cihekî ne dîyar kirin. Ji bo ku tirba wî nebe zîyaretgaha kurda.

Eger xelk bi te bawer be û tu Diyarbekir baş nizanibî, dê yek bi millê te bigre û te ji Derê Xarpûtê derxe ber bi rîya Erxenîyê ve bibe. Li ser vê riyê, li ser goristana kevin mala artêşê(orduevî) hatiye avakirin. Dema tu ji derê mala artêşê wek bikevî hundir û li destê rastê bizivirî û ber bi dara esrî ve herî, tê bibînî hevalê te fatîha dixwîne. Dê hevalê te ji te re bêje: "Li binê vê dara ha rehmetîyê Şêx Seîd hatibû defin kirin."

Di Kurdistanê de tu kesê ku li hember Şêx Seîd bi bê hurmetî tev bigere nîne. Lê hin kurdên desthilatdar ên hevkarên we hene. Weke çawîş, serokê beledîyan, serokên partîyan.....Yahûdîyên ku bi Hitler re hevkarî dikirin gelek bûn. Lê dadgehên dewleta Îsrailê hê jî hesabên wana safî nekiriye.

Birêz Îsmet Paşa.. Armanca min ne ew e ku ez dijminahîyê têxin mabeyna xelkê kurd û turk ku ev qas sale bi hev re jiyane. Ger armanca min ew bûya, minê vê nameyê ji te re nenivîsanda. Eger ev kiryarên we li dij kurda bidomin, dê rojekê rabin pîya û dê kes nikaribe wan bide sekandin. Roj hatiye ku tu tedbîran bigrî, xêrekê bi dewleta xwe bikî û xwe ji gunehên xwe paqij bikî. Mezinên Îngîlîzan, Fransîzan, Hollanda û Ewrûpîyan dibînin bê îro ew welatên ku di destê wan de bûn, çawa kite kit ji destê wan diçin. Êdî 8 mîlyon kurd kiryarên we qebûl nakin. Dema qralîçeya Îngîlîztanê salê yek carê diçe seredana xelkê Îskoçyayê,

kincên wan li xwe dike, ji orf û ade-tên wan re rêz digre. Parlementoya wan jî zîyaret dike. Hukumeta Îngîlîz ku zimanê wan di dinyayê de di rêza duwemîn de ye, zimanê xwe li ser eyaleta Gallerê ferz nake. Gallerî di dibistana seretayî de bi zimanê xwe dixwînin. Ez nizamim hun, hukumet û artêşa we li ser vê meselê lêkolîn kiriye yan na?

Herkes ê ku di mesela ziman de qet tiştêkê nizane, dibêji qey zimanê kurdî heye! Peyvên erebî, farisî, lêkerên wan û peyvên ku ji zimanê Ewrûpîyan hatine sitendin ji turkî derxin eceba di zimanê turkî de çi dimîne?

Kengî 3 an 5 gênc li Stenbolê werin ba hev û bixwazin ji xwe re kovarekê derbixin, dozger bi hêceta ku gênc dewletê xerab dikin û cudatîyê dixin mabeyna xelkê, dest bi taqîbatê dike û dadgeh bê pîrs û lêkolîn derhal wan dixê zîndanê. Dadgeh evan biryaran li ser navê milletê dide û ev jî di dîrokê de li ser turka dibe mal.

Pirr ecêb e, şexseke cilên dewletê li xwe dike, di welatekî fireh de li 9 an 10 wîlayetan bi dilê xwe tevdigere. Îbrahîm Tali, Abîdîn Ozmen, Abdullah Paşa, Salih Omurtak û kesên di emrê wan de, bê pîrs mal û can û namûsa milletê payîmal dikin, wan dikujin. Çawa malê xelkê yaxme dike, teşwîqa xerabîyê dike û dest datîne ser mal û milkê xelkê. Ev xirabîyên hanê ji bo ku ji we re nebe sûc, ji parlamentoya Turkîyê bi emrê te Îsmet Paşa qanûnên xas derdixîne. Ev kirinên han ne sûc in lê weşana bi kurdî li gora we sûc e?

Li Balqana, li Erebiştanê, li Sûriyê, li Lubnanê û li aliyê din li Anadolê li

hember Ermenîya sê, pênc, heşt an deh kesên çav bi xwîn ên ku desthilatdarên dewletê bûn, ew qas însana kuştin û dane kuştin. Di hizûra tarîxê de hemû kiryarên xwe kirin sitûwê rebenê milletê turk. Hestîyên evan çend kesên han di çalan de jî ne rihete.

Di pirtûkên dîrokê û erdnîgarîyan de navê Kurdistanê bi fermî hatiye nivîsandin. Evan herêmên ku hun ji wan re dibêjin herêma Rojhilat û Başûrê Rojhilat, yanî wîlayetên kurda, dev ji asîmîlekîrîna wan berdin. Hun dixwazin wana bikin turk. Dev ji van tiştan berdin û rastîyan bibînin. Kurda weke kurd qebûl bikin û wan hembêz bikin da pêşeroja we baş û rohnî be.

Cemal Paşayê wezîrê behrîyê ji Kastamonûyan re gotibû ku dê Yemenê bike Kastamonû. Dawîyê çi bû? Ew tenê xwîna xelkê Kastamonûyê li Yemenê rê û li Sûriyê felaketa çêkir. Dawîyê çi bû? Hemû ereb û Yemenî bûn dijminên Turka. Îro yek dostekî we jî nemaye. Çarmedorên we hemû ew millet in ku di dîrokê de, çend paşayên we li wana zilmê kirine û wana tarûmar kirine. Ew li hember we bi kîn û nefret in. Azerî bi xwe ku di eslê xwe de turk in, ji we re dibêjin ku hun seyên Osmaniyan e.

Di sala 1933yan de bi sedema dehemîn(10.) salvegera damezrandîna Komara Turkîyê, çapemenîya Stenbolê li seranserê welat lêkolînan çê dikir. Bê ka xelk ji komara nû çi fahm kiriye! Ger hun li rojnama Cumhuriyetê ya wê rojê binêrin hunê li rûpela yekem wêneya kurdekî bibînin. Di destê wî de şewqeyekê

perritî û wê nîşan dide. Dibêje *"Ez ji Cumhurîyetê vê şewqeya ha fahm dikim. Şewqeyê ji me re anî."* Çi bersivê ecêb e!

Li bajarê Dîyarbekir û Rihayê turkên ku wezîfedar bûn, digotin *"Di bazarên bajêr de kesên ku bi kurdî nizanibin, nikarin kurrîn û firotanê bikin."*

Pêwîste êdî dewlet rastiyan bibîne. Teşxîsê deyne û dest bi dermankirinê bike. Şertên teşxîs û tedawîyê çi ne? Bi kurtayî, ew modela ku hun ji bo 60.000 hezar turkên Kibrysê pêşniyar dikin, ango îdara federatîf, heman tiştî ji bo 8 mîlyon kurdên ku îro di nava sînoren Turkîyê de dijîn qebûl bikin û bi cîh binin. Dewletên ku pirs-girêkên xwe bi rêya federasyonê çareser dikin, roj bi roj zêde dibin. Yek mînakê bidim: Mereşal Tito li Yugoslawyayê federasyonê danî. Heft komar di nava yek dewletê de cîh digrin. Her komar bi çanda xwe, bi aboriya xwe, bi komalgehên xwe serbest in, lê di pêwendî û temsîlê de girêdayê hukumeta Belgradê ne. Her kes tetmînkare û çî kes şikayetê nake. Hetta ew Yugoslawên misilman û Boşnaq jî ku hun ji wan re dibêjin turk.

Ew Îsmet Paşayê ku ji Kibrisê re federasyonê dixwaze, gelo ji bo çî, ji wê dewleta ku serokwezîrtiya wê dike û di nav wan de 8 mîlyon kurd hene, rojekê zûtir wê hizra xwe nake?

* Kurd tîhnî û birçî hatine hiştin. Ev tîhnîbûn û birçîbûna kurda ya manewî, berîya hemû derdê kurda ye. Ango kurd dixwaze bi serbestî bi zimanê xwe bixwîne û binivîsîne. Dixwaze di Kurdistanê de xwendina xwe ya seretayî û nawendî, di xwendegên xwe de bi zimanê xwe

bixwîne. Divê ev perwerde mecbûrî be.

* Kurd dixwaze di şûna memûrên Anqerayê de, li Kurdistanê, memûrên kurd bîn wezîfedarkirin û ji aliyê memûrên kurd ve bîn îdare kirin.

* Divê kurd bi xwe biryarên jîngehên xwe yên komelayetî, aborî û çandî bidin. Kurd naxwaze bibe parsekê Anqerayê û li ber rehma wan bimîne.

* Kurd dixwaze li ser axa xwe di warê zîraî(keştûkalî) de, di warê senayîyê de her tiştên xwe bi dest bixîne û vana hemûyan di fabrîkeyên xwe de çêbike. Ji hemû aqarên xwe fêde bibîne. Warîdatên ku li Kurdistanê ji zîraet û senayîyê tên bi dest xistin, li Îzmîrê û Stenbolê û Anqerayê berredayî û kêfî têne xerc kirin. Kurdên perîşan li nexweşxaneyên weke axura, li dersxaneyên bê ser û ber bi awayekî leşkerî têne perwerdekirin. Divê kurd ji vana xelas bibin û li gora lîyaqata xwe nexweşxane, xwendegeh û karmend bêne danîn.

* Her kurd dixwaze di qezaya wî de lîsekê, dibistaneke sinetê û li her wîlayatekê(parêzgeh) xwendegeha (zanko, unîversîte) bilind hebe.

* Kurd dixwaze rê herin hemû deverên wan. Hemû gund û qeza û wîlayetên kurda bi rêyan bi hev re bîn girêdan.

* Kurd van hemû pêdiviyên xwe dikarin ji warîdatên xwe yên li Kurdistanê her wekî yên ku dê ji paxir û ji krom û ji rissas û ji petrola xwe bi dest bixînin, dikarin finanse bikin. Bi vê yeka ha jî bawer in.

Piştî şerrê te Îsmet Paşa û Şêx Seîd, kurekî hate dinyayê. Milletperwer e û îro ew 40 salî ye. Bi sihet e û mêrane

ye. Bi hêz e û heqqê wî heye ku di nava neteweyên dinyayê de bijî. Ew mêrxasê 40 salî, fêr bûye an jî hatiye fêrkirin ku kurd û kurdîtî bi qasî turk û Turkîfîyê ezîz û lezîz e. Lîyaqê rêz û jîyanêye.

Zan nekin ku hunê her carê yek an du kesan jî kurda bikin wekîlmillet û kurda bixapînin. Di vê babetê de wextakî ew kesê ku li meqamê herî jorê rûniştibû, wî we hişyar kiribû. Sal 1953ê bû. Wekîlê wîlayeta Yozgatê Avnî Dogan hate lokala meclîsê a li taxa Ulusê. Ji bo milletê turk hemû agahdar bibe, ezê gotinên wî hemûyan bibêjim.

"Serokê Komarê Îsmet Paşa, bi me walî û mufettişên ûmûmî re civînekê çêkir. Dixwest fikrên me bizanibe. Ez jî ji Diyarbakir hatim Anqerayê. Pirsê ji min kir. Min jî gote wî: Eman Paşa tu çi dikî! Kurdên îro ne yên duhî ne. Ji bo xatirê me, mal û milkê xwe li pey me û li paş me êdî nema fîda dike. Ya rast, me ew hestê têde nehişt."

Em dixwazin gelê turk jî bizanibe ku ew tiştên weke sîrrên dewletê tên zanîn, kurd jî dizanin. Ji bo fêda we, em dixwazin hun jî bizanibin. Kurd ev 4000 sal zêdetire li ser vê axê dijî. Li ser axa kurda çawa behsa temsîla kurda tê kirin.

* Hun çawa ji turkên Kibrisê re çareserîya FEDERATÎYF dixwazin bila ji kurda re jî bê kirin. Eger ev nebe di pêşerojê de, qewimandinên ku çê bibin, hun bi xwe ji wan berpîrsîyar in.

* Wekî hemwelatîyekî we fikir û ramanên min ev e ku hun di destûra bingehîn de guherandinê bikin, xwe ji nû ve birêbixin û federasyonekê ava bikin.

Bi hêvîya dîtina dewleteka kurd û turk ya federal. Silav û rêz.

03.01.1965

619 W 176 apt.5K

Mustafa Remzî BUCAK

Newyork 33 N.Y."⁹

Mustafa Remzi BUCAK, di 10ê Hezîrana 1960î de ji Dallas Tex. ê namekê ji wezîre darayî yê wê demê Ekrem ALÎCAN re dişîne. Di wê demê de esker hatiye ser hikim. Di namê de dibêje ku ew ji 11ê Gulanê û vir de li derneyî welat e. Her wiha di nameya xwe de, ji bo çareserîya pîrsgirêka kurd, behsa modêla Îsvîçrê dike. Pejirandina hatina leşkeran ji bo ser îdara Turkiyeyê jî ji dîrokê re dihêle.

Ji bilî van nameyan, nameya ku ji bo Dr.Yusuf Azîzoglu nivîsandîye heye. Doktor Yusuf Azîzoglu partî- yekê nû bi navê Yenî Turkiye Partîsî ava kiribû. Bi kurdî dibe Partîya Nû ya Turkiyê. Name ne pir dirêje. Lê ezê bi qederê ku naveroka nameyê ne guhûre kurt bikim û ji bo we xwendevanên heja pêşkêş bikim.

"Dr. YusufAzizoglu

30 tebax 1961

Serokê YTP ê.

Dallas Tex.U.S.A.

Diyarbakir/Turkey

Ezîzê min Yusuf,

Nameya te duhî kete destê min. Piştî ku ez li serê fikirîm, biryara min ev bû ku ez vê nameyê ji te re bişînim.

Sîpas ji bo daweta te ya nazîk û ji dil ya ji bo siyasê. Ez bawerim ku te hê

⁹ Bucak, Mustafa Remzî- *Ji rewşenbîrêkî kurd nameyek ji bo Îsmet Paşa*- Weşanên Doz/Stenbol-1991

jî ji min fahm nekiriye. Tu dizanî ku min di nav kîjan şert û mercan de, biryara çûyîna derva daye. Her daîma mumkun bû ku dewletê min bigirta û zîndanî bikira.

Di her demê de kesayetîya min li holê bû û aşkera bû. Ez her gav bi bav û dîya xwe ya kurd difexirîm. Vê rêya ku heya îro ez tê de çûme jê venagerim. Temenê min li dora 50î ye. Ez bawerim ku em dikarin bi turka re bijîn. Şiklê îdara ku di hiş û gumana min de ye her wekî federasyona Îsvîçrê ye, her wekî Belçîkayê, her wekî herêma Gallê ya li Îngilistanê û her wekî Yugoslawayê.

Berê, hêvîyên min hebûn. Lê piştî ku min, sala çûyî, di kovara *Manchester Guardian* a bi îngilîzî de xwend ku Cemal Gûrsel (serokê konseyê) gotiye: "Di Turkîyê de ne kurd û ne jî kurdîtî tune ye." Van gotinan hêvîyên min ên ji bo pêşerojê şikandin. Cemal Gûrsel çawa hebûna kurda înkâr dike. Ev 40 salên komarê ye ku her demên wê tijî serhildanên kurda ye û dewlet bi têkbirina van serhildanan meşxûl e. Dewletê Mekteba Herbîyê ya Stenbolê ku berê navenda îlm û îrfanê bû, çawa îro kiriye zîndan. Û xortên kurda, wan xortên munewer kiriye wê derê ku ji xeyrî kurd bûna wan tu sûc û gunehên wan tune ye. Bi mehan, wan xorta nederxistin huzura dadgehê di wan hucreyên ji tabûtan xerabtir de hiştin û wana yeke yek weke mûmên ku dohnê wan diqede, bi mirinê re rû bi rû hiştin.

Eger înkara 8 mîlyon kurd bê kirin, dê halê memleketê çawa bibe? Ratib Tahir di rojnama *Akşam* de dibêje: "Tevî ku Riha 400 sal e di bin îdara fermî de ye, Begên kurda bê minet li

Eynzelxayê dimeşin, li Dîyarbekir keseke ku bi kurdî nizanibe, li sûkê nikare tiştekî bikirre an bifroşe."

Hikmê dewletê li ser eyaleta Kurdistanê bi qederê hikmê dewleta Fransayê yê li ser wîlayeta Cezayîrê tune. Pêwîste mezinên dewleta me van tiştan bizanibin. Kurd, çi hişyar bûbin û çi jî hatibin hişyarkirin, kurdîtî ne tenê ji Hekkariyê heya Erzeromê, ji Dîyarbekir û Rihayê heya Wan û Bedlîsê, ji taxa Altindaga Anqerayê heya Cihanbeyliya Konyayê, ji taxa Zeyreka Stenbolê heya Haymanayê hemû kurd, bi axa û şivan û şêx û xwendevanên xwe ve hemû fama netewaperestîya xwe kirine.

Birayê min ê hêja! Ez ji te dipirsim! Wekîlên ku dê ji Kurdistanê bêne hilbijartin, bêje wê çi wezîfe bikin? Weke wekîlên berê dê înkara zimanê xwe bikin? Ev înkâr ne dijminahiya milletê turk e jî?

Di welat de azadiya çapemenîyê tune ye. Kesek nikare fikr û ramanên xwe bi serbestî aşkera bike. Eger ev ne raste, bi tenê vê nameya min bila di çapemenîya Turkîyê de bê belavkirin da ez bibînim rexneyên erînî an neyînî bêtî ku bikevin şîrk û kufrê lê bikin. Ew çax emê bizanibin ka çendî azadî heye. Wê çaxê ezê bizivirim welat û xebata xwe bidomînim.

Bi evîni û hesretekê zêde çavên te radimîsim.

Mustafa Remzî BUCAK"

Nameya ku Dr. Yusuf Azîzoglu ji Mustafa Remzî BUCAK re hinartîye di dest me de tune ye. Lê her wekî em ji

nameya M. R. BUCAK fahm dikan, doktor Yusuf, wî dawetî welat dike û dixwaze bi hev re xebatên xwe di Turkîyê de bimeşînin. Lê her wekî ji nameyê tê zanîn, hêviyên M. Remzî BUCAK ji desthilatdarên Turkîyê nemaye. Me her çiqas nameyê kurt kir jî, di dirêjahîya nameyê de behsa gelek desthilatdarên wekî Îsmet Paşa û Cemal Gûrsel Paşa hwd. bi awayekî neyînî dike ku çawa memleket dibin helakê.

Mustafa Remzî BUCAK, ji bilî van nameyan, nameyekê ji Îlhamî Erten re dişîne. Îlhamî Erten, wekîl milletê Partiya Adaletê ye. Ev name di 24ê Tebaxa 1964an de ji New Yorkê nivîsiye. Di serê nameya xwe de wiha dibêje: "Heyhat! Car din heyfa Gelê Turk e." Ev name li ser axaftina Îlhamî Erten e ku di 1ê Temmûza 1964an de di meclîsa Turkîyê de kirîye. Esas Mustafa Remzî BUCAK, Îlhamî Erten nas nake. Tenê axaftina wî ya di meclîsê de dizane.

Di nameya xwe de her weha behsa tiştên ku di nameya ji bo Îsmet Paşa re şandiye dike. Lê di nameyê de tiştekî herî balkêş ev e ku behsa qanûna hejmar 1850 dike. Ezê temamê qanûnê ji xwendevanan re binîvsînim:

"JIMARA QANÛN : 1850

Ev Qanûn di Derbarê Kiryarên ku di Herêmên Îsyane de Hatine Kirin, nabin Sûc

Tarîxa qebûlkirina qanûn :20
Temmûz 1931

Tarîxa weşanê :29
Temmûz 1931

Jimara rojname ya fermî: 1859

Xala 1ê: Ew tevgera(serhildana) ku li derdora Ercişê, Zilanê û li Agirîyê çêbûye û li pey wê jî herêma di bin berpirsiyariya Mufettişîya Ûmûmî de û şopandina di nav sînore qeza Pulûmûra ku li ser bajarê Erzîncanê ye, di tevgeriya hêzên dewletê de, ji 20ê Hezîrana 1930yî heta Kanûna Ewwel a 1930yî, hêzên leşkerî, memûrên dewletê û ew bekçî, cerdevan, mîlîs û xelkên ku bi dewletê re çî bi serê xwe çî jî bi hevkarî tevgeriya be, tu kiryarên wan nabe sûc.

Xala 2yê: Ev qanûn piştî hate weşandinê tê bi cihanîn.

Xala 3yê: Rêvebirên vê qanûnê wezaretê Dadê û ya karên hundirî ne."

Qanûnên wiha ji bilî welatên mustemleke (mêtingeh) li ku tîr derxistin û bi cihanîn?

Her weha Mustafa Remzî BUCAK nameyekê ji berpirsiyarê rojname *Cumhuriyetê* re di 28ê Êlûna 1964an de dişîne. Name li ser nivîsa Cemîl Saîd Barlas e ku di 6ê Temmûza 1964an de bi nêvê Mohra Kurdîtiyê (Kurdçûlûk Damgasî) nivîsiye. M. R. BUCAK ramanên di nivîsê de kêr dibîne û hinek babeta firehtir dike. Mirov dikare bêje name hem bi erdnîgarîya Kurdistanê re hem jî bi jimara kurda re weke îstatîstîkî têkildar e.

Li kîjan wîlayetên Komara Turkîyê çiqas kurd dijîn, nisbeta kurda li wan wîlayeta çend e û tevahîya kurda çend in di nameya M. R. BUCAK de wek agahîyeke belgeyî heye. Di nameyê de nufusa kurda bajar bi bajar hatîye dabeşkirin.

"1- Wîlayetên ku nufusa wan ji %100 û ji %85ê wan kurd in:

Hakkârî, Wan, Bedlîs, Sêrt, Mêrdîn,

Dîyarbekir, Urfa, Adiyaman, Dêrsim, Agirî.

2- Wîlayetên ku nufusa wan ji %65 û ji %85ê wan kurd in:

Elezîz, Meletî, Erzerom, Qers.

3- Wîlayetên ku nufusa wan ji %45 û ji %65 ê wan kurd in:

Gaziantep, Mereş, Erzincan, Kirşehîr, Newşehîr.

4- Wîlayetên ku kurd têde belawela dijîn:

a- Hinek gund û zozanên Adanayê.

b- Qeza Zara û Dîvrîgî ya Sêwasê û nehîye û gundên derdora wan.

c- Cihanbeylîya Konyayê û qeza û nahîyeyên ku li der û dorên wê tene avakirin.

d- Qeza û gundên li derdora Çiyayê Kurd ên girêdayîyê wîlayeta Hatayê.

e- Qezaya Haymana, Bala, Polatlî û gund û nahîyeyên derdora wan.

Piranîya gundên Keskînê. Kurdên li taxa Altındag û Yenîşehîra Anqerayê.

f- Ber bi rojava ve kurdên li derdora Adapazarîyê, Eskişehîrê.

g- Kurdên li taxên Stenbolê her weke Zeyrek û hwd.”

Piştî van agahîyên hêja, Mustafa Remzî BUCAK nufusa kurda wek 8 mîlyon datîne û nîsbeta Nifûsa kurda ji % di ser 25an de tesbît dike. Dibêje ku mesela kurda ne tenê mesela reforma erd e, di heman demê de mesele siyasî ye, aborî ye, kulturî û parevekirina îdara Turkiyê ye.

Divê em her dem mezinên xwe bi bîr bînin û di jiyana wan de qedrê wan bigrin. Qedirgirtina dema jiyana û piştî wefata wan jî pêwîste bibe weke prensîbeke bo hemû kurdan. Em jî car din evî mezinê kurd bi bîr tînin û dibêjin sipas bo kiryarên te yên ji bo xelkê.

Şehîdê Tetwanê: Parêzer Şewket Epozdemîr

Şakir EPÖZDEMİR

Ji Dayik Bûyîn

Şewket di sala 1943 yê da li gundê Minar hate dinyayê. Ez li gora ku 1938 im, bi temenê xwe zarokek 6 salî bûm. Jinmamên min bi destê min girtin anîne cem diya min. Dayka min di nava nivînan da bû. Zarokek por zer û xweşik li ber singê wê bû. Diya min kenîya û go: "- Ka were, ev birayê te ye. Têmaşê ke ka çîqa delal e."

Bi rastî ez hêja jî wê delaliya wî ya wê rojê bi bîr tînim û tê bîra min ku ew delaliya Şewket min kêfxweş kir, min jê hez kir. Gava diya min daxwaz kir ez nêzîk bibim herim ba 'hûro', min serê xwe giran kir. Jinmaman, min girtin henbêz kirin û şîretan li mi kirin. Şîretên wan wek ku digotan ev birayê te ye, wê mezin bibî, piştgiriya te bike. Divê tû jê hez bikî. Bira lazimin. Bê xwişk û bira û pismam çênabî û nameşê.



Şewket Epozdemîr

Şeş sal di navbera me da hebû. Şewket hevalbiçûkê ferîca xweha min bû, ez birayê mezin bûm. Min hîç hesûdî ji Şewket nedikir. Lê tê bîra min ku min ji Ferîce xuy dikira, ez bi alê diya xwe va nedîçûma, li ba Dadê Gulê ya pîrika xwe radizama..

Salên Dijwar

Li Kurdistanê salên zêrîn eva 200 salin hîç çênebûn e. Dibe ku di wextê mîrekan da salên azad û aram û bextewar borî bin. Belê piştî tesfîya mîran, mîletê kurd rojek tenê xêrê ji halê xwe nedîtîn û heya rizgar nebin nabînin jî. Salên zêrîn em jibîr bikin, ji salên 1830yê û vir va salên enfal û ferman û birînê, salên komkujî û qetîlxwînê dane ser hev.

Xelk hemî tenê bi derpê û kiras bûn di wan deman da. Niha hun Efganan çewa dibînin em wisa bûn. Sakoyek 50 kesan li xwe dikiran. Yek diçû dawetek ya êlekê yekî, an şalê yê din qerz dikiran. Çîreyêk don di mala kesî da tine bû. Kêm kesan lembeyên wan hebûn. Xelk pêxas digeriyan. Titûn hebî kaxiz tine bû. Kevirheste agirjen bûn. Niftik çîye, tine bû. Xelkê pizotên agir dixistin binê xwelîyê, agirên xwe pê didomandin. Xwelî û xwelîmork, ma hun dizanin ka çi ne?

Diya min di van salên dijwar da bi êşa zatûrîyeyê mir. Mamê Elî di van rojan da çû 4 salan eskerî kir. Şewket di nava van rojên dijwar da hate dinê. Xwedê xela û dijiwariyan îdî bi ser mîletê kurd ra neynê. Xweda hemî însanan û heywanan ji xelayê û êşên giran biparêzê.

Xwendina Şewket

Şewket li Minar dibistana sereta qedand û kete îmtîhana dibistana amosteyan ku bi navê "Erganî Dicle Öğretmen Okulu" dihate bi navkirin. Ewî vê dibistanê qedand û bi torpîl hat li navçeya Bayîkan salek mamosteyîti ya mekteba sereta kir. Di sala 1962yê Enstîtûya Perwerdeyî ya Amedê vebû, Şewketê bira li vir qeyda xwe çêkir û piştî mezûniyetê li Amedê bû mamosteyê Edebiyatê ya Lîseyê Ziya Gokalpê. Heya sala 1968ê li vir mamosteyî kir. Di serê vê salê da operasyona TKDP qewimî, li ser vê qewmandinê Şewket sirgûnê navçeya Sorgun ê ku bi Yozgatê va girêdayîye kirin û mamoste Şewket hewl da xwe û dest bi xwendina Hiqûqê kir heya ku sala 1976 ê wek mihamîyek hate Tetwan. Li Tetwan ofîsa xwe vekir û ji vir û pêda bû hiqûqnas..

Hinek Xusûsiyetên wî yê Civakî û Exlaqî yê Balkêş

* Şewket, pir zêde ji zarokan hez dikira, wana serbest dihişt, daxwazên wan dianî cî û hevaltiya wan dikira. Piştî zarokan bi gêncan va diyaloxa xwe xurt dikira, di warê xwendin û problemên wan da dibûya şîrkê derdê wan. Qedrê jinan pir digirta, xwe ji wan dûr nedixista û bi taybet divara ku keçên kurdan bixwînin.

* Şewket Xoce, berê ji heval û cînarê xwe ra divara, paşîyê ji xwe ra dixwesta. Gava di salên 1960an da li Erxênîyê di sinifa 5ê da dixwenda,

rêvebiriya mektebê, wî û 2 hevalên wî bijart bo herin li Anqerê Mekteba Bilind ya Mamosteyan bixwînin. Ji bo vê, Şewket hate Amedê ba min. Ez wê gavê di Postexana Diyarbekir de memur bûm. Em çûne cem Canîp Yildirim. Canîp abê nameyêk ji Velî Kasimoglu ra nivisand ku wê gavê kekê Velî, Miduramê Perwerda Nawendî ya seranserê Tirkîyê bû. Şewket ji Canîp Abê ra go navê me hersêkan binivsîne, lewra firqa min û wan hevalan tine, belkî me hersîyan jî bigrin vê mektebê, baştir dibî. Kek Canîpî vê helwesta Şewket yê xerîb teqdîr kir û nameyê nivisand, devê zerfê vekirî da yê. Em hatin Otêlê li ba rehmaîyê babê xwe, babo go : "- Ka mektuba Canîp Beg, bo min bixwînin ka çi nivisandiye. Şewket jê ra xwend, wî serê xwe hejand go: "- Lawo te navê xwe tenê bixista mektubê, lê niha hun bune 3 kes, eva te îşê xwe di serî da xira kir." Şewket go "- Babo firqa me tine, ew heval 2 kurdên baş in, ha min xwendîye ha wan hevalan.." Babê me ma heyîrî ka çi bêjê, Şewket û herdu hevalan nameyê birin çûn cem Velî Qasimoglu, herdu hevalan girtin û wî negirtin. Ji wan hevalan ez yek dizanim ku Mamoste Eskerî Baran ji Stewra navça Mêrdînê bû. Ew niha sax e û Profesore.

* Şewket Xoce, tucar dilê kesî ji xwe nehişt. Min carna dîgo "- Şewket tû carcaran daweyên Îcrayê distînî wê dilê xelkê ji te bimînê". Dîgo "- Abê ez dizanim, lê ez xwe carna ji dostan xilas nakim, dawa wan hiltînim belê dîsa wan Sulhen li hev tînim, herdu alî jî memnûn dibin û qîma xwe bi min tînin."

* Ewî di cejn û newroz û hemû xwepêşandanên da tû wextî xwe neda paş û nedihîşt ku nexweşîyên dijwar li Tetwan derkevin. Karbîdestên dewletê jî qîma xwe bi bêterafîya wî tanîyan û ew her yê çekirinê bû.

* Roj tinebû ku xortên şorişger problemêk dernexin û Şewket her di hewara wan da bû. Ewî bê ku bixine resmîyetê Sawcî û Hakimîyan îqna dikira û gencan ji nava lepê wan derdixistan. Reşîd Delî Rizgarîcî bû û roj tinebû ku teşqeleyêk dernexe. Carek di bêrîka Reşîd da berikekê demanceyê digrin. Reşîd davêne nezaretê, Şewket diçî ku Reşîd û hevalên wî bide berdan. Sawcî dibêjê "- Şewket Bey, ezê hemîya bedrim lê berika demanceyê bi Reşîd ra girtine û ev yek ketîye resmîyetê". Şewket dikenê dibê "- Sawcî Bey ev yek rihete. Bila Reşîd bêje min fêkîyên hişk (kuru yemiş) ji dikandar stand, dibe ku ev berik di nava fındîq û fıstîqan da ketibî berîka min. Hun jî ji kerema xwe qenaet bikin û wî berdin." Ev yek berîya 12 Êlûna Kenan Ewren bû.

* Mamoste Şewket, piştî 12yê Êlûnê zehmet û ezyeta mezin xwar. Ew li Tetwan, Bedlîs, Xelat, Hîzan û Norşên û Motkan tenê mabû. Ewî wezîfa xwe bê kêmanî heya niqta paşî, heya sanîya paşî anî cî. Şewket hê di salên 50yan da gava li Erxenê dixwenda dîgo : "- Meriv bivê xizmeta mîletê xwe bike, ne hewceye ku îlahî di dereceyek bilind da bî. Herkes dikarê li gor pozîsyona xwe bibe mum, xwe bişewitîne û dora xwe ronî bike.." Di wê demê da, li mintîqa Bedlîsê kî digirtan pîrsa Şewket jê dikiran û îsrar dikiran ku ew girtî

bibêjin 'Awaqat Şewket pere ji me nastînê.' Xortên kurdan her Şewket diparastan.

Rojek yek xwe dişehitînê dibê "-bê pere dikevê dawa min." Gazî Şewket û emnîyetê dikan, dipirsin ka raste an na, Şewket dikanê dibêje : "-Ez bê pere çend caran ketime daweyên we yên taybet. Ma meriv ji feqîrêk pere negrê, lazime meriv di tenzîmên wan da bin?

Niha em çend heb ji hevalê Şewket yên wan rojan bînin ziman. Li Mekteba Mieliman ya Erxenîyê Liftî Baqşî, Mehmûd Baqşî, Evdîlqadir Taş, Kazim Epozdemîr. Maşallah Oztürk û çendên din bînin bîra xwe û idealîzma wan nîşan tesbît bikin. Gava li Amedê mamosteyê Lîseya Ziya Gokalpê ye, Talat Înanc, Şerîf Çelîk, Malmîsanîj, Hisên Tayfûr û bi dehan yên wek wan şagirtên Şewket Xoce nin.

Biranja wî edebiyat bû. Hemî Klasîkên Tîrkan û gelêk Qlasîkên ecnebî xwendibû. Ji dîrok û felsefê zor hez dikira. Li meselan kûr dibûya û pêşiya xwe didîta. Miletê wî bindest bû, ew jî xwendevan bû, perwerdevan bû, dixwesta ku weke fîdekê xwe bişewitanda û xelqê xwe şîyar bikira. Xelqê wî di dilê wî da zor ezîz bûn. Ew jî weka Dr. Fuad bû. Can û jiyana xwe ji miletê kurd ra weqîf kiribû.

Şewket Xoce piştî salên 1984an kete rewşeke diwartir. Ji vî nîrî û pê da Şewket bû sirdaşê hevalan. Ew tû wextî nebû endamê rêxistinên, belê qîma hemî rêxistinên bi Şewket hat. Ew di herêmê da şexsiyeteke emîn bû. Herkes dikariya xwe bîsparta wî.

Ewî, xortan ji gelek şaşîyan diparasta. Li mintîqa Bedlîsê pêşî li

gelek tertîb û hereketên prekewatîf digirta. Di xwepêşandanên da, di cejnên Newrozên da, di cenazeyên şehîdan da û di dîlan û şahîyan da ew weke keleyekê qaîm bû bo Tetwan.. Bi gotîneke kurt, Şewket ji bo Tetwan ciyê "bawerî" bû. Hiç neditirsîya. Lewra ku bîr û bawerî û ramana wî li ser esasê rastîyê hatibû avakirin.

Wî, hê di salên 50yan de li Erxenê biryara xwe da bû. Lazim bû ku weke mum û fînd biheliya û bi ronahîya xwe dora xwe hebek şîyar bikira.

Ew Bawermendekê Bê Hîle Bû

Piştî ku Wedad Aydîn di sala 92 yê da ji terefê dewletê va hat revandin û qetilkirin, min gelek bi birayê xwe va girt. Min xwest ku ji Tetwan derkevê. Min xwest ku bê Anqerê. Şewket tû car min nedîşkênanda, dîgo: "- Keko ez jî di ferqê da me, lê ezê çewan xwe ji ber wan însanan bidim alî ? Ma sozê me bi miletê me ra ev yek nebû? Min çî dîgo pere nedikir. Li ber wê bawerîya wî ez mehcûb û şermezar dimam. Ho Rebîyo! Çî bawerîyeke xurt bi tera hebû Şewket Xoce.

Ez û Ew,

Em ne wek biran,

Lê weke heval û dost û hogiran bûn

Ez 5 sal jê meztir bûm, lê em di rojek da û bi hev ra çûn dibîstana sere-ta. Em hevalên hev û mektebê nin. Me Mekteba Erxenîyê jî hema hema bi hev ra xwend. Min tû car serîyan jê nebirî. Car hebû ez li yataqxaneyên mektebê li cem wî radizam. Enstîtuya Perwerseyî ya Amedê jî li ba min xwend. Li mal

dima. Ez jî li Amedê Memurê Postaxanê bûm. Min jî xwendinê hez dikira. Pirtûkên ku wî dixwenda û diecibanda tanî dida min.

Sîyaset û Tevgera Azadîyê Di Xeta Rêxistina PDKTê da

Min sala 1965ê daweta wî kir û di vê salê da teklîfa xebata Partîya demokrata Kurdistanê Tirkîyê lê kir. Şewket vê teklîfa min bê teredûd peji-rand.

Min wî da sondê xiste partiyê û anî ba Seîd Elçî. Kekê Seîd wî pîroz kir û go: "- Divê tû çend mamoste peyda bikî ji bo em herêma Amedê bidin te." Ewî sê mamosteyên mektebên naven-dî û seydayê Evdîrehman Üçeman kire Qomîta Koma Herêmî û ew bû berpirsyar.

Li gor dîtin û qenaeta min Şewket Xoce di warê tenzîmê (rêxistinkirinê) da kadireke bê qisûr bû. Hun dikarin ji Reşîd Hemo pîrsa şewket bikin. Ew sîyasetmedarê heja şikir ku hê sax e.. Ewî di tenzîmê da alîkariya me kiribû û bi taybet ji honandina tenzîma Koma Herêmî ya Amedê gelek memnûn mabû. Reşîd Hemo bi îsrar dîgo: "- Gereke em Şewket bişînin Ewropa."

Tenzîmên ku bi alîkarîya Reşîd Hemo me bi ser hev va anîn, xebata me ya hevbeş 40 rojan dom kir. Reşîd wek kadîrekê pîspor ji Suryeyê hatibû ku di warê tenzîmê da em ji tecrûbeyên wî feyde bibînin û tenzîma partiyê xwurt bikin. Piştî herêma Amed, Batman, Sasûn û Mêrdînê di ber çavên xwe da borand, me wî şande Tetwan ku li Tetwan bi berpirsîyarê Herêma Serhedê

Feqî Hisên ra di vî warê tenzîmê da xebat bike, wan perwerde bike û kêmasîyên wan hebin ji wana ra ders bike..

Feqî ji Tetwan hevalekê partî şande Amedê, me Reşîd pêra şande Tetwan û dora rojê bi şev MÛTê dest bi operasy-ona PDKTyê kir. Di vê operasyonê da Mala Şewket Xoce jî teftêş kirin, wî jî girtin birin emniyetê û Reşîd Hemo jê pîrs kirin. Yanê bi eşkerayî ew jî kete nava xeta sor. Lê wî hîç birwên xwe neqermiçand û ewî di Hepsa Diyarbekir da seriyan ji me nebirî. Piştî ku me ji Amedê rakirin şandine Antalyê, mektub ji min ra şand û xeberê da min ku wî sirgûnê Sorgûn a Yozgatê kirine.

Şewket di nama xwe da dîgo :"- Tû mereqa min meke. Ezê jî dest bi Universîtê bikim bixwînim. Divê ku em di warê aborîyê da azad bin. Ku em karmendên wan bin, heqê wan heye me sirgûn bikin û ji wezîfê bavêjin.. "

Ez ne xelet bim piştî 6 heyvan nemeyeka wî ya dî ji Sorgûnê hate Hepîsxana Antalya, Şewket Xoce di vê nameya xwe da dîgo : "- Keko, ez ketim sinawê min Hîqûq û Tîbb kar kir. Ez dixwazim herim Hîqûqê, lewra ez dikarim him aboriya xwe temîn bikim û him xwendina xwe di vê şaxê da bidomînim. Belê ku ez Tîbbê tercîh bikim, divê ez ji mamosteyîyê îstîfa bikim. Ew jî ne mimkin e." Ew bi halê xwe razî bû. Sirgûn derîyê Zankoyê lê vekir, ez jî xweşhal bûm ku birayê min feleka xayîn bê minet kir û serê xwe nexiste cuherê neyar û nevanan.

Salên Sirgûnê û Parêznama PDKTê ya Siyasî

Di Sibata 1969ê da me berdan. Di xelasîya heyva gulanê da Seîd Elçî daxaz kir ku ez biçim Antalya beşdarê mehkemê bibim. Her çend ne hewce bû ku em herin beşdar bibin, lê kekê Seîd go: "- Here bila bo celseyek yek ji me herê, 'tutenaqên mehkemê' bigorê da em bizanin ka rewş çî ye. "

Li ser daxaza kek Seîd min wan dokumentên ku bo parastina siyasi berhev kiribûn danî walêza xwe, çûm beşdarê celsê bûm, min ewraqên biryara wê celseyê girt ez hatim Anqerê û min da Ebûqatê vê daweyê ku Ebdilletîf Ayqût bû, ji Anqerê derbazî navça Sorgûnê bûm, çûme cem Şewketê bira.

Mekteb tehtîl bibûn. Şewket, xanima xwe û zarokên xwe Serdar û Serhed şandibû Amedê mala xezûrê xwe ku rihet dersên xwe yên Hiqûqê bişuxlê. Ew him mamoste bû û him şagirdê Zankoya Hiqûqê ya Anqerê bû. Me çend rojên xweş bi hev ra derbaz kir. Min dokumentên ku eva 2 sal in ber hev kiribûn û deftera ku min berevaniya programa parti lê nivisandiye danî ber.. Mamosteyê hêja, ne tenê Mamosteyê ziman û edebiyata tirkî lê ew ramanvan û rayîdar bû. Em herdû bira û herdû partîzan wek hev difikirîyan. Wî tû îtirazê li parêznama min nekir.

Şewket, parêznama PDKTyê wek ku ew diparêzê pejirand û bi zimanê edebî ediland. Tenê yek kêmasîya wê ma ku em daqîlî bikin lê mixabin me daqîlî peyda nekir. Ew parêzname

niha bûye kitêb û bi her wesîleyî min keda Şewket Xoce di vê pirtûkê da anîye ziman. Ew birayê biçûk e lê mamosteyê min yê herî mezin e.

Roja Birinê Ango Roja Mirinê

Roja 7ê heyva 11 yê sala 1993an yekşem bû. Ew roj li seranserê Tirkîyê nifûs dihatin hêjmartin. Bi vê sebebê her kes ew roj di mala xwe da hepis bûn. Ez li Anqerê di mal da me û Şewket Xoce li Tetwan di mal da ye. Ew roj, li dor nîvro Şewket telefon kir go: "- Şakir Abê, Nêmetilla yê bira yê me girtin birin." Dewleta dagirker Nêmet û bi 2 mêvanên wî va girtibûn biribûn. Mêvaneke Nêmet mamosteyeka tirk ya hevala xanima wî mamos-te Talîha Xanim bû, mêvanê din jî kurap û zavayê me Faîq bû ku ji Mêrsînê hatibû seyahet û sertêdanê. Şewket nizaniya ka ev operasyon teng e yan fire ye. Go " - Ezê siba di heqê operasyonê da melumatên berfireh bidim te."

Dora rojê, saet li dora 11an telefonê Şirketê kir. Ez û şîrikê xwe Kek Şerefeddîn Elçî rûniştî ne, vê hewadisa girtina birayê min diştexilin. Şewket go: "- Operasyon gelek fire ye. Bi qasî 30 kes ji Tetwan, çend kes jî ji bajarê Bedlîsê hatine girtin.." Min go: "- Şewket tû dizanî ka çi qas van rojan hewayê Anqerê xweş e, li vira wek bihar e, siwar bibe were em çend roj bi hev ra bimînin. Min pir bêriya te kirî ye."

Wî îtiraz li teklîfa min kir. Go: "- Keko ezê çewan di vî halî da Nêmet di nezaretê da bihêlim bême Anqerê."

Min go: "-Birayê min ev girtin û berdan îro dest pê nekirî ye û siba jî naqedê, ez ji bo te dibêim, tû gelek westiyayî. Were çend rojan bêna xwe bide, gava ku wan dane mehkemê, wê gavê tû dikarî biçî.." (di vê navê da kek Şerefeddîn îşaret kir telefonê xwest). Min go vaye Şerefeddîn Abê jî dixwaze dengê te bibihîze, Şerefeddînê camêr gelêk pê va ma, go "bi xeberê Şakir bike were çend rojan li Anqerê bimîn e." Lê Şewket kengê tê? Soza Şewket bi Tetwan ra hebû. Di vê rê da mirin hebû lê rev tine bû. Şewket ne mêrê revê bû...

Nêmet û grûba Tetwan û Bedlîsê heya 25ê heyvê, 17 rojan mane di binê eşkencê da. 20ê vê heyvê xortekê pismamê me Aqûb Epozdemîr li Bajarê Antalya bi destê failmechulan hatibû qetilkirin. Em malbata Epozdemîran bi piranî çûn hewara Yaqûb. Cenazeyê wî li Tetwan veşartin û taziye li mala Hacı Sebrî yê babê wî bû. Roja 23yê heyvê ez û Şewket Xoce bi hev ra çûn me taziye li dê û babê wî xortê ciwan da. Roja mehkemekirina Nêmet û wan hevalan kifş kiribûn ku wê di 25ê da derxine mehkemê. Şewket go: "- Baş e ku tû hatî. Mala me van rojan pir qelebalixe. Tû sebebî li mêvanan bike, ezê siba biçim Bedlîsê, dûsibê mehkema Nêmet e, emê di vê rojê da heya hêvarê li cem hev bin. Lewra em nikarin bikevin mehkemê.

Roja birin (25.11.1993) û qetilkirina vî birayê ezîz, vî hevalê min ê 50 salan, me saet di 8ê serê sibê da Ofisa wî bi hev ra vekir. Rojeke şilî bû. Befrê bajarê Tetwan sipî kiribû. Li dor û berê Ofisa Şewket mij û dûman bû. Vizzêna

Tîm û Jîtem, cehş û ajan û muxbîr û xwefiroşên adî bû, hawîr li dora ofîsê digeriyan.

Malbatên girtiyan bi sedan dihatin ba Şewket û piçek teselî dibûn û diçûn. Hem Şewket xilaskarê wan bû, û ji alek din va ew jî ditirsiya ku xwe zêde nêzikî Şewket dikan. Tîrsa dijmin hemî kesî ji qam û qidûmê xistibû. Tîrs... Neyarê mezin tîrs e ji bo însanan. De hema bila 20 mîlyon kurd tîrs û teredûdê ji ser xwe bavêjin, di yek rojek da dikarin rizgar bibin.

Car caran ez û ew diman bi tenê. Ezê çend tiştên ku ew roj di navbera me da borîn, bo we xwendevanan bêjim.

Min go: "- Faîqê zavayê me ji min ra go gava me birin kom kirin û amirê jîtemê derkete hafa me, hema pêra êrîşê Nêmetilla kir û bi wan karmendên xwe zêfan kir, digote wan 'hey bînamûsan qey ev xayînê koka vê dewletê, yê girtin û anînê bû ku we wî girtî ye, ev wetan xayînî, ne yê girtinê ye, ew yê kuştinê ye.."

Şewket weke her caran kenîya û go: "-Ezê di vê babetê da çend tiştên jî vê balkêştir bêjim te. Roja ku Nêmet girtin, 2 mêvanan jî pêra girtin. Ez dora rojê çûm ba Midûrê Emniyetê, ez hê teze ketibûme hindir, min dî ku qeymeqam da derî. Çewa hebî qeymeqam amirê vî bajarî ye, ez jî ji ber rabûm û min merheba da yê, lê wî berê xwe ne da min û bi serê poz xwe cewaba min da, rûnenişt û xatir ji min nexwest çû. Ez rûniştim, min gote Midûr ka lîsteyên tesbîta wan kesên girtî hene, yaxut hema rastgele hun merivan didin hev. Midûr got: Şewket

Beg ma emê çewan ji berê va merivan bigrin, lîsteyê girtinê tê tenzîm kirin, ji me ra dişînin, em li gorê wê dest bi girtinê dikin..

Min behsa Faîqê zava yê me kir. Min go ev kes êvarê ji Mêrsînê hatiye. Xweha min jî li gel xwe anîye. Belkî ku wî û Nêmetilla eva çend sal in hev nedîtine. We vî jî girtiye. We mêvan û hevaleka mamoste ya jinbira min Talîha jî girtiye ku ev mamosta xelkê Samsonê ye.

Midûr çekmeca xwe kişand, listeyê girtiyan teftêş kir, kenîya go: 'mêzeke Şewket Beg, navê te jî di listeyê da heye û te negirtin e. Min go xweziya we min girtibûya. Pirsî ka çira, min go: "-ma te helwesta qeymeqamê xwe nedî ku bi çavên dijminan li min dinê re? Ez girtî bûma niha di êşkencê da bûm lê ev eşkenca helwesta qeymeqam bêhtir li zora min tê. Ez hiquqnas im. Li gora meslegê xwe divê ez şolê xwe yê hiquqî bimeşînim. Lê gava ez tîm pîrsa rewşa girtiye dikim, çewa ku dijminê we bim. Ma hema yek aliyekê heq û hiquqê heye. Divê em parêzger mezluman biparêzin. Ku me jî xwe da aliyê we, wê kê bêcareyan biparêzê?"

"-Neyse.. Midûr navê Faîq û wê mamostaya Samsonî not kir û ez derketim. Van herdukan piştî nîvro berdan... Tû dizanî abê, ew mamoste li ser vê Ofisa ku em niha lê rûniştîne di xaniyê min da kirêdar e. Ji ber ku ev xanî pir biçûk e, em di kirê da nin, me vê derê daye vê jinika mamosta.

Piştî ku vê Mamostayê berdan hate mala Nêmet ku li ser mala min e, xwest min bibînê. Ez çûm ku li ba jinbira me ye. Go '- Şewket Beg, ji min

pîrsîn ka tû çewan diçî mala wan xwînxar û qatilan. Min go hemşeriya min li wê ye û min xirabîyeka vê malbatê nedîye. Gotin tû di xaniyê kê da dimînî, newêrîyam bêjim ez kirêciyê Şewket Xoce me. Min go ez navê xwediyê xanî nizanîm.'

Tû dizanî abê, yeka ji van girantir rojnamevaneka hevalan anî serê min. Pîrî ku xeşîm in. Ne dizanin xwe biparêzin û kesî ji belayan diparêzin. Hîç fêhmakin ka çi dikin.

Piştî operasyonê rojek malbatên girtiyan hemî hatin Ofîsa min û daxwaz kirin ku ez biçim ji Sawcî pîrsa rewşa girtiyan bikim. Rojnamevana xeşîm a rojnameya Yenî Ûlkeyê jî rûniştî ye.

Ez rabûm çûm ba Sawcî, Sawcî tiştek nego te min. Xwe li xeşîmiyê danî. Lê min têda deranî ku ev dawê giran e. Moralê min xira bû ez hatim ofîsê. Wan hevalan pîrsî ka çewan bû, min jî tewrê Sawcî ji wan ra qise kir û ji devê min filitî ku min go 'Sawcî jî Jîtem e.' Dora rojê rojnamevana me di rojnameya Yenî Ûlkeyê da manşet avêt go Ebûqat Şewket Epozdemîr vê xeberê daye, gotîye ku "sawcî yê Tetwan Jîtem e." Sawcî ji min ra telefon kir min tehdîd kir. Go: "-Şewket Beg tû min hedef nîşan didî. Min jî go bila wek te bî."

Ez di vê qonaxê da tûrre(hêrs) bûm. Min go: "-Baş e birayê min çewan tû şasiyek weha dikî? Go min ê çi bikira? Min go: "- Te tekzîb bikira, te delal cewaba sawcî bida." Şewket Xoce kenîya, serê xwe hejand, dû tewlan li nava yazîxanê çû û hat û li ser qoltoxê xwe rûnişt berê xwe da min go: "Abê,

min tekzîb bikira wê vana min bixis-tana devê topê. Ne xayîntî dima, ne şablonên wanên din yên hazir ku di yek rojek da meriv derdixin serê minareyê û roja din dixine binê heft tebeqên erdê.."

Şewket nedixwesta ku xwe bişkênê. Ji ber wê bi serbilind û wîj-danek paqij çû... Lê Şewket û bi sedan ronakbîrên Kurdistan valayîyek wisa kûr û dijar çêkirin ku ev valayî zerareke mezin daye doza Kurdistanê. Kurdistana bê xwendevan û rewşenbîr bi kêrî çî tê?

Me ji Hev Xatir ji Nexwest

Çi dinyayek bê edalet e. Min û birayê xwe yê kû 50 sal bûn me yek carek tenê minaqeşeyek nekiribû, me xatir jî ji hev nexwest. Em birayên hev, ramanvan, siyasethvan û şervanên welat bûn. Doza me yek, dawa me yek, çewa bê xatir xwestin me hev terk kir?

Min çewan ji we xwendevanan ra li jor qal kir, wan rojan li Tetwan taziya Yaqûb hebû. Eqrûbayên me ji her tere-fi va dihatana Tetwan.

Yekê bi navê Hacî Adil ku kurê kurapê babê min bû ji Stenbol hatibû Tetwan bo serxweşiya Yaqûb. Hacî Adil hate Ofisa Şewket, me li Ofisê bi hev ra çayêk vexwar û daxwaz kir ku babê min ziyaret bike. Hacî Adil çend sal ji min meztir bû. Saet li dora 5an bû. Ez rabûm pêra çûm mala Şewket Xoce. Em man li mal, şîv hat, me şîv xwar. Di mal da çend mêvanên din jî hebûn.

Ne Şewket hat û ne xeberêk hat, ka wan girtiyan berdan an hepis kirin. Min

telefonê Ofisê kir, Şewket cewab ne da, em ketin telaşê, me telofênên gelek kesan kir, lê sed mixabin ku me salixê wî negirt. Tam di nava wê telaşê da bûrayê Şewket, Neşet Xoce kete mal, ji me ra go teqsiya Şewket Abê li ber derî ye.

Şewket tam saet di 8an da tê ber derî. Peya dibî, deriyên teksiya xwe digrê, ya hinek kuçikbaban bi dostî wî ji mal dûr dikin, ya bi zor dijmîn wî digrin û dibin. Hîvîdarim ku ne bi dostî wî biribin. Ewî, ji xanî 300 metro dûr li ber Mekteba Sereta ya bi navê Mehmetçik berçavkên xwe avitibû. Li vir li ber xwe dide. Lê nafiye ye. Bi destê kî be bila be, dewlet birayê min bir. Qatilê wî Koremar e.

Çewa ku Yusuf Ekîncî, Meded Serhed birin, Şewket Xoce jî wisa birin. Ew ne yê girtinê bû, Şewket Xoce yê kuştinê bû. Ma me di Mîtingên sala 1967an da qîr nedikir nedigo "Bexên nêr, ji bo kêr!"

Ez bi telefonê li sawciyê Tetwanê, li Midûrê Esayîşê, li Anqerê li Şerefedîn Elçî, li Ebûqat Kenan Coşar, li Bedlîsê Serekê DEPê Mela Îshaq Tepe û berpirsyarek ji DEPê Mizafer Exlatlî geriyam. Ez rabûm li teqsiyek siwar bûm çûm Emnîyetê, çûm min li deriyên çend merivan xist. Min hewar û gaziya Şewket bire erşê bilind. Telefonên mobayîl hê derneketibûn.

Wey li me bê xwedî û bê kesan. Sed wey li halê me êsîran. Ne denge heye ne alternatîf. Qewet û qudret yek alî ye. Edalet yek alî ye. Erk û biryar di destê dijmînê te da ye. Tê ji kî ra bêjî tû birayê min bikujî ezê jî kurê te biku-jim? Tû bêjî kî bawer dik e. Ne neyaran

û ne xayînan kes nakujin. Kurd bi hev dikarin, siyasetên kurdan hev dikujin.

Ji min ra gotin ku navbera paşayê Tetwan, Korkmaz Taðma û Nûro Edebax xweş e. Ka telefonê ji Nûrî Begê ra bike, belkî xîret bê yê, an pozê wî bişewitê, ji Paşa ra bêje: "- Şewket nekujin."

Min bi telefonê ji Nûro ra go "vaye Şewket birin e. Nava te û Paşa xweş e, xwe bighînê, nehêle tiştek pê bikin, an tû newêribî vê bikî, ji Doqtor Serdar û diya wî ra rendawuyêk bigre, bila jinbira min xwe bavê tor û bextê Generalê Cîmhuriyeta bê şefqet." Nûro go "ez ancax sibê saet dora 10ê dikarim Paşa bibînim. Ez nikarim dîrek telefonê wî bikim."

Şerefeddîn Elçî geleke ji Mirad Karayalçîn ra bigota. Lewra ew kes cîgirê Serokwezîr bû. Kenan Coşar di merkeza SHPyê da bû. Walîyê Bedlîsê dostê wî bû, Kenan Beg, wek min ji Şewket hez dikira.

Sawcî hiç cewaba me neda heya sibê saet 9an. Di saet 9an da jinbira min û Dr. Serdar çûn wî dîtin, erzuhalek danê ka Şewket girtiye an li ku ye. Wî jî cewaba wan bi nivîsandin da ku Şewket nehatiye girtin. Kenan Coşar ji Anqerê li min geriya go "Walî saet di 9ê da li benda te ye."

Ez serê sibê saet li neha hê neçûme Bedlîsê, Nûro Edebax telefon kir go Paşa wê saet ai 2yê da Dr. serdar û diya wî qebûl bike. Gava ku saet di 9an da ez ketim oda Midûrê taybet yê Walî, min mêze kir ku Mela Îshaq Tepe û Mizafer Exlat li ba Midûr rûniştî nin. Ez û Doqtor Serdar in. Mela Îshaq ji min ra go "-Em jî ji bo vê pirsê li vir in.

Mêvanê Walî yawerê Paşayê Tetwan" e, ew derkevê wê me qebûl bike.

Gava em ketine meqamê Walî, telefon di destan da bi Mebûsê DEPê Remzî Kartal ra diştexilîya. Remzî Beg bo Şewket telefon vekiribû. Walî go ku "vaye bira û kurên Şewket Beg jî ketin hundir û ka ez telefonê bidim kurê wî bila bi te ra biştexilê."

Walî bi eslê xwe Diyarbekirî û zilamek demoqrat bû. Piştî tayîna wî ji Bedlîsê rakirin û ev Walîyê demoqrat pêra pêra mir. Ez dibêjim ka mirina wî Walîyî, ya Eşref Bîtlîslî û ya Turgut Ozal wek hev bûn.

Walî di beriya me da talîmat ji Yawerê Paşa girtibû. Ewî ji sedê sed dizaniya ku Şewket hatiye qetilkirin. Lê gelek bi me va ma û go "-Ez hîvîdarim ku bê qeza û bela wê hun û Şewket Beg bighên hev. Divê ku em bi hemî îmkanên xwe lê bixebitin ku xeletî çênebin."

Wextê ku Walîyekê vê Cîmhuriyeta bê şefqet û bê merhemet hevçend anormal eleqe nîşan bide, ev ne elametê qenciyê ye.

Gava em derketin derva, min ji mamoste Îshaq tepe re go "Ev karesata dijwar bi serê teva hatibû. Di karesata Ferhedê kurê te da jî Walîyên dewleta zalim waha pêşwaz dibûna?" Îshaqê Camêr go: "-Şakir, maalesef Şewket çûye. Ev eleqe şanî min jî dan."

Kurê mela Îshaq Ferhat Tepe Rojnamevan bû. Dewletê bir kuşt, avête dora xarpêtê, Ebûqat Şewket bi cesaret çû cenazeyê Ferhad ji dewletê teslîm stand anî Bedlîsê teslîmî babê wî kir. Niha jî Mela Îshaq wê cesareta Şewket li her derî qise dike. Her wisa

ez jî minetdarim ku Mela Îshaq xwe ji ber cenaze û taziya Şewket neda der.

Sawcî, Qeymeqam, Emniyet Midûrî û hemû hêzên tarî yên dewleta Mistefa Kemal wê şevê di binê direktîfa Korkmaz Tađma da bi ittifaq di nava komplo û tertîba kuştina Şewket Xoce de ciyên xwe girtibûn. Ajanên wan ên siwîl jî ketibûn e xizmetê. Paşa saet di 2yan da rendewu dida me û serê sibê beriya me Kurmay Başkanîyê xwe rê dike cem Walî. Walî tenê berdiliyan dide ber dilê me. Qeymeqam efendi hê 20 roj berê, dizane ka bo çi Şewket negirtin e. Emniyet Midûrî xeber dide Şewket ku vaye me qedrê te girtiye, me te berdest nekirîye.

Çewa ku me li jorê got, Şewket li benda netîceya girtina birayê Nêmet û hevalên wî bû. Şewket netîca Mehkemeyê saet di 8an da hîn bû, ji Ofîsa xwe derket, li ereba xwe siwar bû, hate ber derî, lê mixabin dernekete jor û xebera Nêmetilla yê birayê xwe û 23 kesên ku tewqîfa wan dabûn ji babê xwe ra nego. Bab gelek di întîzarê da bû ka rewşa mehkemê bû çî.

Şîn û girîn û tirs û telaşek welê ketibû mala birayê min ku rebî tû nîşanî gurên serê çîyan jî nedî. Dr. Serdar û birayê wî Psîkolog Serhed, herdû jî dawetkirî (zewicî) bûn û mala wan li Wanê bû. Me heya derengê şevê xeber neda wan. Jinbira min Sakîne Xanim kir ku ez li wan geriyam. Min xwest ku sibê li tavidanê ji Wanê derkevin û bi himet bîn Tetwan. Jinbira min Zaza ye ji Sorekê ye û şêrejinekê hêja ye.

Serdar û Serhed sibê zû hatine Tetwan. Şîlan diçû Mekteba Navendî,

di sefa yekê da bû. Xebera Şîlan ji babê wê tine bû. Di xewa şîrîn da bû. Ez naxwezim ku Şîlan şiyar bî. Ji hemî kesî bêhtir ew ji babê xwe hez dike. Ew gelek mihtacê babê xwe ye. Şîlan zaro ye. Bila zarok netirsîn. Bila dinya zarokan nepilîşê...

Min Babê xwe îqna kir ku xwe bixe binê lehêfê piçêk razê. Babê min tam saet di 3.30ê şevê da heya ku dengê wî derket qîr kir go: "Şewkeeeeeeeeeet!" Wisa dengê wî bilind bû ku cîranên me ji xew şiyar bûn û hatin ba me. Min go "- Babo sebir bike, wê niha Şîlan ji xew şiyar bî." Babê min go: "-Şakir!.. Ez çewan qarên nekim. Şewket kuştine, Şewket qetil kirin e."

Hun dizanin gelî xwendevanan? Li gor rapora otopsi ya Şewket, tam di vê saniyê da, yanê roja 26.11.1993ê saet di 3.30a da hatîye qetilkirin. Ev axêna babê min hêja jî di guhên min da ye.

Şewket li tanka jîtemê siwar kirin, di nava vê Zirhlîyê da eşkence û tehdîd kirin. Mamoste Şewket nepişkaftin û venekirin. Di nava vê tanqê da kuştin û dana nîvro bi vê tanqê birin ser rêka Mûşa şewitî, li xopana Textelû avêtine ser befrê. Cendekê Babê Şîlan, li Deşta Rehwa li ser rêya Mûşê Avêtine ser befrê. Bi qereqola cendirma ya nêzikî vê derê ra îlmuxeberekê tenzîm kirin ku şîfêrên kamyonek dîtîye û hatîye xeber daye qereqolê, li ser vê îxbarê qereqol melumat dide wîlayetê û cenazeyê Babê Şîlan dibine Bedlîsê dixine morga Nexweşxanê.

Ez û Dr. Serdar ji Bedlîsê dagerîyan hatin Tetwan, Ofîsa Şewket û dor û berê Ofîsê te ax biavêta li erdê nedike-ta ku hewçend Tetwanî lê kom bibûn.

Saet hate dora yekê min gote Serdar: "here diya xwe bibe ba Paşa, Paşayê Cîmhuriyetê rendawu daye we, ka çi ji we re dibêje." Serdar ji Ofîsê derket û Midûrê Emnîyeta Tetwan telefonê min kir go "Cenazeyeke xerîb li nexweşxana Bedlîsê ye, herin mêzekin."

Zivistan e, çokek befir li erdê ye. Rojekê sayî ye û sermayek hişk e. Ez li teksîyê siwar bûm min berê xwe da Bajarê Bedlîsê. Yek ferdek ne ji vir va ne ji wê va rastî me nehat. Tû nabêjî Jîtemê tedbîr standîye, ne kesek ji Bedlîsê dertê û ne ji Tetwanê.

Piştî ku ez çûm xestexanê, Midûrê Emnîyeta Bedlîsê û çend karbidestên esayîşê min birine ser cenazeyê birayê min. Cil û berg û plavê wî weke ku xwe xemlandibî lê bûn û bi rêkûpêk bûn. Egaleke Filistînî avêtibûne ser rûyê wî, Şewket dikenîya. Bi rastî dibisimîya. Gava demance ji alê çepê va di ber gurçika ruyê wî da lê xistine, li aqilê vê dewleta faşîst a nijatperest kenîyaye. Ewî baş dizanîya ku ev dewlet bi kuştina kurdan darê di bin xwe da dibirê.

Min berê xwe da Midûrê Emnîyetê û wan karbidestan û waha qîr kir: "- Hunê yekîtî û birayetiya Tirkîyê bi vî awayî biparêzin!. Hun dizanin ev mejîyê ku we gule berdaye, bi hemî qilasikên tirk û dinyayê dagirtî bû. Ev medenîyeta we eve? Ev wehşet e, wehşet. Hunê vî welatî bi vî aqilî perçe bikin." Midûrê Emnîyetê min teyîd kir û go: "- Tû rast dibêjî, Şewket Beg merivekê ronakbîr bû. Ewî firqa kurd û tirkan ango zengîn û feqîran nedikira, ew merivperwer bû."

Sawcîyê Bedlîsê li wê hazir bû. Xwe nêzikê min kir, xwest ku cenaze

otopsî bike, min jî daxwaz kir ku kurê rehmetîyê Şewket Dr Serdar ji Tetwan bê, paşî dest bi otopsîyê bikin. Sawcî daxaza min qebûl kir. Min telefonê Serdar kir, wê demê telefonên mobayîl hê derneketibûn. Serdar di nîv saetan da ji Tetwan hat û cenazeyê babê xwe yê ezîz otopsî kir.

Tenê ji Tetwan eqrabayên me ku pêşnavên wan Epozdemir in, yarmetî dan ku bêne telbeyê cenazeyê şehîdê Tetwan. Ji bajarê Bedlîsê jî tenê Serokê DEPê Îshak Tepe û Medenî Awcî karîbûn bên bigehên me. Ew herdu dost bi me ra hatin Tetwan û di tazîyeyê da cîyên xwe girtin.

Şewket, serokê DEPê, berpirsyarê YHDyê, temsîlcîyê Baroya Wanê, Azayê Meclîs û Mîşawirê Hîqûqê yê Beledîya Tetwan bû. Ewî Tetwan hem-bêz kiribû, axa Tetwan jî wî hembêz kir. Ji ber vê, ew şehîdê Tetwan e.

Heya me cenaze anî Tetwan tarîti kete erdê. Li doryana Xelatê Midûrê Emnîyetê me sekinand û hate cem min û Dr. Serdar, pir îsrar kir ku em cenaze nebin bajêr, em bibine mizgevtî Tetwan a kevin. Me teklîfa wan qebûl nekir û me go emê bibine Mizgevtî Mezin ku li nava çarşîyê da ye.

Gava em gihaştin mizgevtê, mela banga eşayê dida, qîz û bûkên malbata Babê Şîlan dengên xwe bi ser dengê miezin xistin. Dengên wan li çîya dike-ta û bi ser Behra Wanê va werdigerîya. Bêle sebeb ne gotine "Behra Wanê meskenê kul û derdan."

Heya ku cenaze hate şuştin û der-bazî camîyê bû tam 30 heb feqî û mela li ser cenazeyê Şewket berhev bûn û her yek cuzûyêk Qurana Kerîm

xwendin. Tam di vê navê da Wekîl Reîsê Beledîyê Îmdad Akbay û Midurê Emnîyetê hatin j ime ra gotin "emir ji kanbaxa Anqerê hatîye ku divê hun vê şevê cenazeyê Şewket veşêrin. Me îti-raz kir lê wan gelek bi tehdîdwarî îsrar kirin, Îmdad Aqbay hate ber guhê min go "- Şakir Abê, ku hun îşev nebin veneşêrin, wê ew bi darê zorê cenaze ji we bistînin û bibin veşêrin.

Îmdadê camêr rast digota, di wan rojan da dewleta dagirker cenazeyê Apê Mûsa û Memed Sincar jî bi darê zorê dabûne veşartin. Zordestî û zilma vê dewletê li ser mirî û zindî, li ser hemû kurdan bê hed û hesab e.

Bila ew qatil û neyarên mafên beşer baş bizanin ku malbata mamosta Şewket heya îro navê Şewket dane çar zarokên xwe. Niha çar Şewketên me henin. Çiqas diçî hêjmara navên şehîd û pêşkêşên daw û doza kurdan zêde dibin û wê bibin. Dayîkên kurdan bila nehêlin nav û dengên egîd û lehengan winda bibin. Wê bi hezaran Şewket û Medet û Wedad û Fuad û Faîq û Seîd û Riza û Xalid û wan ên din mezin bibin û heya qîyametê wê destê kurdan di pêşîra zalim û qatil û dagirkeran da bî.

Havêrkan Aşîret Konfederasyonu- VI

Nezîrê CIBO

Hoybun'nun Kurucu ve yöneticileri

Millî Kürt Kurultayı'nın aldığı en önemli karar kuşkusuz o günün şartlarında Kürt davasında var olan bütün örgütlerin, siyasi oluşumların birleştirilmesidir. Yukarda isimlerini zikrettiğimiz bütün örgütler kendilerini feshederek bir çatı altında birleştiklerini açıklarlar. Böylece Kurultay aynı zamanda Hoybun'un kuruluş kurultayı olmuştur. Diğer bir ifadeyle 5 Ekim 1927 tarihi Hoybun'un da kuruluş tarihi olmuştur. Doğal olarak kurulan yeni oluşumun ilk yöneticileri de aynı kurultayda seçilmiştir. Bu konuyla da ilgili bazı belirsizlikler olmakla birlikte, bu gün Hoybun'un ilk yöneticileriyle ilgili net bilgilere sahibiz diye biliyoruz.

Araştırmacı yazar Rohat Alakom; Hoybun'nun ilk kuruluş toplantısına katılan Ahmet Abdurahman Ağa'nın anılarına dayanarak Hoybun'nun merkez komitesine seçilenlerin bir listesini veriyor. Söz konusu listede şu isimler

vardır: Celadet Bedirxan, Memduh Selim Bey, Mehmet Şükrü Sekban, Haco Ağa, Ramanlı Emin, Şeyh Ali Rıza, Mustafa Şahin, Bozan Şahin, Kerim Bey, Tefik Bey, Kamil Bey, Bedrettin Ağa, Liceli Fehmi. Her ne kadar farklı kaynaklar bu listeyi kimi değişikliklerle veriyorlarsa da doğruya en yakın bir liste olduğu söylenebilir. Örgütün Merkez komitesine seçilen bu kişiler kendi aralarında Celadet Bedirxan Beyi de ilk başkan olarak seçerler.

Listede yer alan kişilerin sosyal, toplumsal, kültürel konum ve yapısının çok renkliliği hemen dikkati çekmektedir. Yüksek tahsilli, bir kaç dil bilen aydınlardan, okuryazar bile olmayan aşîret reisine, öğretmeninden toprak sahibi ağasına, tarikat kökenli şeyhine kadar her kesimden şahsiyetler yer almıştır. Adeta Kürt toplumunun küçültülmüş, daraltılmış bir numunesi gibidir. Oldukça namlı, karizmatik kişiliğin yanında entelektüel, bilge kişilik, oldukça nüfuzlu derebeyi veya tarikat mensubunun yanında, oldukça mütevazı bürokrat, öğretmen kişilik



yan yana olmuş, kafa ve gönül birliği yapmıştır. Sosyal, ekonomik, kültürel farklılıklarına rağmen hepsinin ortak bir özelliği de vardır; hepsi Kürt milliyetçisidir. Günahlarıyla sevaplarıyla, tarihe mal olmuş, Kürt davasına büyük katkıları olmuş, bu uğurda büyük çileler çekmiş, bedeller ödemiş şahsiyetlerin tanınması amacıyla yaşam öykülerinden kısa kesitler vermenin yararlı olacağını düşünüyorum.

Celalet Bedirxan(1893-1951);

Celadet Bedirxan, Kürt özgürlük hareketinin koca çınarı, namı Bedirxan hanedanının bir üyesidir. Mir Ali Bedirhan'nın oğlu ve son Botan Miri Bedirhan Beyin torunudur. Annesi Çerkez kökenli Senihe Hanımdır. 26.04 1893'te İstanbul'da doğdu.

Kürt özgürlük hareketine, Kürt kültürüne, diline, edebiyatına büyük katkıları olan, Hoybun'un "bilge" tabirini en çok hak eden üyelerinden ve ilk başkanıdır. Avrupa'da eğitim görmüş, batı kültürünü özümsemiş, bir kaç dil bilen siyaset, kültür ve edebiyat

adamıdır. Bir yandan özgürlük düşmanlarına karşı mücadele ederken diğer yandan Kürt dili ve edebiyatı üzerinde çalışmalar yapmış, Kurmanci lehçesinin gelişimine katkılar sağlamıştır. Şam'da Kürt yayıncılığında çok önemli bir yeri olan ve 'Kürt Ansiklopedisi' olarak nitelendirilen, *Hawar* dergisinin sahibi ve editörüdür. Denilebilir ki Kürt özgürlük mücadelesinin her alanında mücadele etmiştir. O büyük hanedanın varisi, bu uğurda çekmedik çile kalmamıştır desek yeridir. Son dönemlerinde içine düştüğü ekonomik sıkıntıları gidermek için çiftçiliğe başlar. Ancak ektiği tarlanın su ihtiyacını karşılamak için kazdığı kuyuya düşerek boğulmuştur. Mehmet Uzun'un *Kader Kuyusu* romanı, Celadet ve ailesinin yaşam öyküsünü konu almıştır.

Memduh Selim Bey (1880-1976);

Kürt coğrafyasının yetiştirdiği en büyük aydınlardan biridir. Aslen Vanlıdır. Birçok kaynakta Hoybun örgütünün kuruluş düşüncesini ortaya atan ve

öncülüğünü yapan kişi olarak kabul edilmektedir. Felsefe ve siyaset tahsili görmüş. Antakya'da felsefe öğretmenliği yapmış. Günümüz Türkiye'sinin önemli simalarından Cemil Meriç, Avukat Halit Çelenk, Sendikacı Kemal Sülker onun öğrencileridir.¹ Hoybun'dan önce birçok örgütsel faaliyette bulunmuştur. *Rojî Kurd*(1913) ve *Jîn* (1918) dergilerinin yayınlanmasında rol oynamış ve yazarlığını yapmıştır. Teşkilat-ı İştimaîye, Kürt Milli Fırkası adıyla kurulan cemiyetlerin kuruluş ve yönetimlerinde yer almıştır. Hoybun Merkez Komitesinde görev aldı, aynı zamanda Antakya şubesinin de kurcu ve yöneticiliğini yaptı. "Buradaki Türkler kendisini Türkiye karşıtı etkinliklerinden dolayı döverler"²

Naci Kutlay, modern ve gösterişten uzak bir Kürt aydını olarak nitelediği Memduh Selim Beyle ilgili şunları yazar: "Hoybun-Xoybûn-örgütü'nde, Bedirhani kardeşlerden Celadet ve Kamuran Bey'ler ile Cemil Paşazade'lerin isimleri çok geçer. Bu arada öğreniyoruz, sessiz ve gösterişten uzak bir kişiliği olan Memduh Selim'in büyük emekleri geçmiş."³ Oldukça zengin bir kitaplığa sahipmiş. Kürt devrimcisi Necmettin Büyükkaya anılarında "O'nun kitaplığını almak istedim. Ancak hanımı umduğum gibi çıkmadı. Dört bin Suriye lirası ödemek istedim. Kabul etmedi. Kitapların bir bölümünü alıkoyup diğerlerini ver

mek istedi. Kabul etmeyip geri döndüm."⁴ diye yazar.

Mehmet Uzun'un *Yitik Bir Aşkın Gölgesinde(Ber Siya Evinê)* adlı romanı, Memduh Beyin yaşamını konu etmiştir.

Dr. Mehmet Şükrü Sekban (1881-1960);

Ergani doğumludur. Hoybun'un aydın kadrolarındandır. İlk kuruluş kongresini o yönetti. Hoybun'dan önce kurulan Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti, Kürt Talebe Hêvî Cemiyetî (1912), Kürdistan Tealî Cemiyeti'nin (1918) kurucuları arasında yer almış, bu örgütlerde aktif çalışmıştır. Uluslar arası platformlarda, Milletler Cemiyeti nezdinde Kürt ulusal haklarını hararetle savunmuştur. Hoybun'un Bağdat Şubesi başkanlığını yapmıştır.

Daha sonraları arkadaşlarıyla fikir ayrılığına düştüğü ve onlardan ayrıldığı bilinmektedir. Yayınladığı (1933) *Kürt Sorunu* adlı eserindeki düşüncelerinden dolayı Hoybun'daki arkadaşlarına tamamen ters düşmüş ve yollarını ayırmıştır. Paris'te Fransızca olarak *La Question Kurde* yayınlanan bu eserde daha önce savunduğu düşüncelerinin aksine; Kürtlerin ana vatanın Orta Asya olduğunu, Turanî bir kavim olduğunu, "antropolojik bakımdan, saf Türk olan Türkmen ile Kürd'ü ayırt etmenin güç olduğunu.. Türkiye'den ayrı bir Kürdistan'ın yaşamasının mümkün olamayacağını" savunmuştur.⁵

¹ Alakom, Rohat -*Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*-1998/Avesta Yay.

² Alakom, Rohat -*Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*-1998/Avesta Yay.

³ yage

⁴ Akt. Naci Kutlay - 21. Yüz yıla Girenken Kürtler.

⁵ Sekban, Şükrü Mehmet -*Kürt Sorunu* - s. 21, 27 Kamer yay.

Ramanlı Emin (Eminê Perîxanê);

Ramanlı Emin, Batman yöresinde büyük bir aşîret olan Raman aşîretinin lideridir. Kürtlerde sık rastlanan güçlü kadın tiplerinden biri olan annesi Perihan Hanım'dan dolayı Eminê Perîxanê diye anılır. Perîxan Hanım, kocasının öldürülmesinden sonra Kürt geleneklerine uyularak kocasının kardeşiyle evlendirilir. Güçlü kişiliğiyle aşîrete liderlik eder. Bir ara tutuklanır ve Diyarbakır cezaevinde yatar. Beş erkek çocuğu vardı. Her beş çocuğu devlet tarafından öldürülmüştür.

Emînê Perîxanê, 1925 başkaldırısında *"devlet güçlerinin yanında yer alır."*⁶ Ancak devletle işbirliği yapan bir- çok Kürt gibi o da yaranamaz ve isyan sona erdikten sonra devletin yaptırımlarına hedef olur. Sürgüne gönderilmeye çalışılırken bir yolunu bulur ve Suriye'ye kaçır. Burada milliyetçi Kürt hareketine katılır, Hoybun'un kuruculuğunu yapar. 1928'de çıkartılan afla Türkiye'ye döner. Dönüşüyle ilgili ilginç, ilginç olduğu kadar ibret verici bir hikâyeye anlatılır.

Derler ki aftan yararlanmak için yurda dönüş kararı verince Suriye'deki dostlarıyla vedalaşmaya başlar. Bu arada Haco ile de vedalaşmak için konaklarına gelir. Haco, 'Emin duydum ki aftan yararlanmaya karar vermişsin, doğru mu?' Emin'in 'Evet, seninle vedalaşmaya geldim' demesi üzerine Haco, konakta bulunanlara dönerek 'haydin Emin'in ruhuna bir fatiha okuyalım.' der. Emin, 'Haco ben daha hayttayım, ölmedim, neden fatiha

okuyorsun?' diye sorar. Bunun üze-rine Haco, 'Emin sen Türklerin sözlerine güvenerek yurda dönüyorsun ve adım gibi biliyorum ki seni öldürecekler ama biz senin taziyene gelemeyeceğiz. Bunu için şimdiden fatihani okuyorum.' der.

Emin Haco'nun bu uyarılarına kulak asmaz ve aftan yararlanarak Türk yetkililerine teslim olur. Teslim olmakla kalmaz, bir kez daha devlete yaranmaya çalışır; Kuruculuğunu yaptığı Hoybun ve birlikte çalıştığı arkadaşlarının örgütsel sırlarını en ince detaylarına kadar devlete anlatır. Bununla da yetinmemiştir, öz kardeşi Evdila'yı ve arkadaşlarını ihbar ederek devlet güçlerine öldürtür. Artık devlette iyi hizmet ettiğine inanıyor ve oldukça rahat görünmektedir. Ancak yanıldığının farkına bile varmadan uğrunda halkına ihanet ettiği, kardeşini öldürttüğü devlet, tarafından öldürülür. Dramatik değil ama ibret verici ölüm şeklini Cegerxwin anlatıyor:

Bir çavuş ve birkaç jandarma (Emin'inin N.C) evine gelerek, 'komutanımız seni istiyor' diyerek yalnız ve silahsız olarak evden alırlar. Yolda üzerinde bir dereyi geçerken onu yakalayıp ısız bir harabe olan Erzen harabelerine götürürler ve orada öldürürler. Sonrada bir el silah sıkarak 'Emin'in oğlu Şükrü yolumuzu kesti ve babasını öldürdü.' Diyerek hem babayı öldürdüler hem de oğlunun fermanını çıkarttılar. Çaresiz kalan Şükrü Suriye Kürtlerinin yanına sığındı."⁷

⁶ Cegerxwin, *Folklor Kurdi*, s.174

⁷ Cegerxwin-*Folklor Kurdi*-Stockholm/1988, Roja Nû yay. S. 175

Ali Rıza;

Şeyh Sait'in oğludur. İsyan sonrası kardeşi Selahattin'le Irak'a geçer. Daha sonra Suriye'ye geçerek Hoybun'un kuruluş çalışmalarına katılır ve merkez yönetime seçilir. Ancak bir süre sonra örgüt içinde fikir ayrılığına düşer. Aşırı ümmetçi fikirlere sahip olduğu söylenir. Bu yelpazede örgüt içinde anlaşmazlığa düşer ve bir süre sonrada ayrılır. 1928 de çıkartılan aftan yararlanarak Türkiye ye geçer.

Liceli Fehmi (Fehmiyê Licî) ya da Fehmi Bilal (1887-1967);

Örgütün aydın kadrolarındandır. 1925 Hareketi liderlerindendir. Şeyh Sait'in en yakın arkadaşlarından ve sekreteriydi. Özel mektupları dâhil her türlü yazışma işlerini yapmıştır. Hareketin başarısızlığından sonrası Suriye ye göçmüştür. Bir müddet Fransa'da yaşamıştır.

İlginc ve renkli bir kişiliktir. Kendi tabiriyle 'halk arasında farmason, din-siz ve Allah tanımaz'(Naci Kutlay) olarak tanınır. Cegerxwin onunla ilgili bir anısında şöyle diyor: "Fehmi efendi ile Ali Rıza Efendi (Şeyh Sait'in oğlu N.C) sık sık tartışırlar... Fehmi Efendi (Ali Rıza'ya N.C) 'zaten baban ve babanın bu sofuluğu evimizi yıkmadı mı? Uçaklar üzerimize geldi- ğinde baban, kalkın birlikte namazı- mızı kılalım diyor ve Ömerê Faro'nun dediklerine inanıyordu."⁸

Liceli Fehmi Hoybun içinde Bedirxanilerle fikir ayrılığına düşer.

Bu ayrılığı en çok Hoybun'un Ermenilerle ilişkileri konusunda olmuştur. Fehmi örgütün Ermenilerle kurduğu ittifak ve yakınlığa karşı çıkmıştır. Bu nedenle Celadet Bedirxan Beyle çok sert tartışmalar yapmıştır. Bu tartışmaların birini Naci Kutlay Diyarbakır Umum Müfettişi İbrahim Tali'nin yerel bir gazeteye verdiği bir açıklamadan aktarır;

"Hoybun toplantısında da Lice'li Fehmi, Hoybun ve Taşnak örgütlerinin anlaştıkları haritaya karşı çıkarak Celadet Bey'e bağırdı: 'Beyim iki Ermenistan arasındaki Kürdistan, iki tırnak arasında kalan bit gibidir...'

Celadet Bey: Oğlum Fehmi, bana karşı konuşan sen değilsin...'

Liceli Fehmi: Beyim sana saygılıyım, ama Kürdistan söz konusu olduğunda, yalnız (sana N.C) karşı değil, Allaha da karşı çıkarım..."

Bunun üzerine toplantıda kavga olur, Fehmi Efendinin başı kırılır ve sonunda toplantı dağılır.

İngiliz kontrolünde bulunan Irak'ta Bahdınan'da bir okul açar ve bu okulda Kürtçe dersler verir. Öğrencileri için Kürtçe öyküler yazdı. Fransızcadan şiir ve öyküler çevirdi. (yage)

1928 Affi'ndan yararlanarak Türkiye'ye döndü. Burdur'a sürgün edildi. Son dönemlerini büyük maddi ve manevi sıkıntılar içinde geçirdi. Ölene kadar Kürt davasına hizmet etti. Kürtlüğe bağlılığını şu tabirle dile getiriyordu: "Fenafil Kurd" Anlamı; (yên kû xwe jî kurditiyê re kirîye nok, bo kurda gor bûye) Kürtlük için ölen, Kürtlük için yok olan kimsedir (yage)

⁸Akt. Kutlay, Naci- 21. Yüz yıla Girerken Kürtler. S.377

Bozan Şahin(1895-1968);

Barazi aşîretinin liderlerindendir. M. Kemal'in kurduğu I. TBMM de milletvekilidir. (1920) yine M. Kemal'in Başlattığı harekete katılmış ve Yunanlara karşı savaşmış. Savaştan sonra Kürtçülük eğilimleri nedeniyle baskılara maruz kaldı ve Suriye'ye geçmek zorunda kaldı.

Mustafa Şahin(?- 1953);

Barazi aşîretinin ileri gelenlerindendir. Suriye parlamentosunda milletvekilliği yaptı. Diplomat özelliğiyle tanınır. Hoybun'daki iç hizipleşmelerde uzlaştırıcı ve yapıcı özelliğiyle tanınır.

Hoybûn'un kurucu üyeleri ve ilk merkez komitesinde yer alan bu kişilerin bir kısmı daha sonra çeşitli nedenlerle ayrılırken, diğer yandan yeni katılımlarda olmuştur. Ancak burada bizi en çok ilgilendiren, araştırma konumuzun kahramanı olan Haco Ağadır.

Hoybun'nun Kurucularından Haco Ağa:

Yukarda Rohat Alakom'dan aldığımız listede görüldüğü gibi hikâyemizin asıl kahramanı olan Haco Ağa da Hoybun'un kurucularından ve ilk merkez komite üyesidir. Örgütün geleneksel aşîret güçlerinin en önemli temsilcilerindendir. "Bilinen yollardan (binicilik, kan davası gütmeye ve devletle iyi ilişkiler sürdürme) politik olarak güçlenmesinin yanı sıra, Haco'nun etkisini artırabileceği bir üçüncü yol daha vardı: Bu da Kürt milliyetçisi

olmasıdır. Hoybun Kürt cemaatinin önde gelen üyelerinden biri oldu."⁹

Kuruluş kurultayının toplanması için en çok çaba harcayanların başında gelir. Örgütün kuruluşunda ve daha sonraki süreçte bütün etkinliklerinde yer almıştır. Örgüte verdiği önemi ve beklentilerini kurultayda yaptığı konuşmada şöyle dile getiriyordu:

"Hoybun partisinin varlığı, varlığımızın, var olduğumuzun kanıtıdır. Bir çok hata yaptık. Düşmanda bu hatalarımızdan yararlandı. Galip devletler, özellikle İngiltere ile Fransa, Cihan Savaşı'nın sorumluları ülkemizi parçaladı, belimizi kırdı. Davamız büyük. Hoybun bu davanın gerçek takipçisi olmalı."¹⁰

Kurultay oturumları süresince üyelerinin ihtiyaçlarının giderilmesi için bütün imkânlarını seferber etmiştir. Kurultayın güvenliğini sağlayan yine ona bağlı Hvêrkanlı silahlı güçlerdi. Gücünü kaybettiği, dağılmaya yüz tuttuğu dönemde toparlanması ve yaşatılması için de en büyük çaba sarf edenlerin başında gelir. Hoybun'un oldukça uzun bir süre ayakta kalmasında Haco'nun ve Havêrkan güçlerinin bu çaba ve desteğinin büyük katkısı olduğu rahatlıkla söylenebilir. Denilebilir ki Haco, ailesinin bütün imkânlarını örgütün hizmetine sokmuştur. O dönemde yaşayan birçok şahsiyet anılarında bu duruma değinmiştir. Kendisiyle birlikte üç oğlu; Hasan, Cemil ve Çağan fiilen örgüt saflarında

⁹ M.V. Bruinessen, yage

¹⁰ Uzun, Mehmet - *Kader Kuyusu*

militanca çalışmıştır. Evlerini adeta örgüt'ün birer karargâhı olarak kullanmışlardır. Hevêrkan'da o günleri hatırlayan konuştuğumuz görüştüğü-müz, birçok şahsiyet; "Hacoların bütün evleri, hiçbir zaman konuksuz kalmazdı. Onlarca, yüzlerce konuk, yer içer, yatardı. Kazanlar 24 saat kaynar, onlarca yüzlerce kişi sürekli yemek taşır, koşuşturur, hizmet verirdi." Diye belirtiyordu. Bu kişilerden biri aynen şunları söyledi: "Binxet'e (Hevêrkan'da, TC'nin Suriye ile olan sınırının güneyine Binxet, kuzeyine Serxet denilmektedir.) geçip de Hacoların yemeğini yemeyen yok gibidir."

Haco'nun Hoybun içindeki en önemli hizmeti Cezire'de Kürt milliyetçiliğinin yayılması için yaptığı yoğun çalışmalar ve 1930'lardan itibaren ciddi bir etkinlik arz eden Kürt kültür hareketine yaptığı katkılardır diyebiliriz. Fransızlar Cezire'ye girdikleri yıllarda(1920), Kürtler arasında gözle görülür bir milli uyanış veya etkinlikten söz etmek oldukça zordur. Hatta yer yer gelişen Arap milliyetçiliğine entegre olduğu da söylenebilir. Kürtler arasında ümmetçi eğilimler oldukça güçlüydü ve kolayca Arapların, Türklerin yaydığı bu doğrultudaki propagandalara, "gâvura karşı İslam Kardeşliği" gibi pan-islamcı söylemlerin etkisinde kalıyorlardı. Birçok Kürt aşireti bu nedenle Arapların yanında Fransızlara karşı savaşmıştır. İşte Hoybun'un önündeki en önemli sorun, yaymaya çalıştığı modern milliyetçi fikirleri, irili ufaklı birçok aşirete bölünmüş, pan-islamcı fikirlerin etkisinde, aşiretsel-yerel sorunlarla boğuşan ve ötesini göremeyen Kürt

toplumuna ve liderlerine kavratmaktı. Ama bu fikirler "büyük ölçüde batının liberal düşüncesinden yoğun olarak etkilenen entelektüel çevrelerden geliyordu." Dolayısıyla "kendi aşiretleri, köyleri ve aşirete ilişkin konularla sınırlı bir ufuka sahip aşiret mensupları tarafından kolayca anlaşılamıyordu." Bu da, "Hoybun'un milliyetçi mesajlarını daha yerel konulara uygun hale getirilmesi gerekiyordu." Örgütün bu açmazı büyük çapta Haco Ağa ve diğer milliyetçi duygular taşıyan aşiret liderlerinin katkısıyla aşılmıştır. "1927'den itibaren örgütün aşiret propagandası, Hvêrkan Aşîret Konfederasyonu'ndan Haco Ağa ile Mustafa ve Bozan İbn Şahin Beg Berazi tarafından koordine edildi... Haco Ağa Hoybun'un Haseke şubesi- nin bir üyesiydi. Bunun dışında, Kuzey Suriye'deki Berazi aşiretinin reisi Şahin Bey Berazi'nin oğulları Mustafa ve Bozan'ın ise Hoybun'un Halep koluna üye" idiler. "Bu aşiret reisleri, aşiretleri ziyaret ederek veya aşiret reisleriyle görüşerek, kişisel propaganda faaliyetlerine girişmişlerdi. Örneğin, Haco Ağa Türkiye topraklarında yer alan Nusaybin, Mardin, Midyat çevresinde ve Irak Ceziresi'nde yaşayan Kürtler arasında etkin bir konumdaydı ve Bağdat'ta sürgünde bulunan çok sayıda Kürt milliyetçisiyle çok kereler görüşmüştü."¹¹

Görüldüğü gibi Haco, Mala Osman Hanedanı'nın yüz yıllardır devam eden ulusalcı geleneğini Hoybun'un batılı, modern anlayışıyla

¹¹ Surette d'Aleppo'ya ilişikte gönderilen 26. 8. 1928 tarihli belge, no.1,n.n. Bey 571. Haco Ağa'nın Irak ve Suriye'deki faaliyetlerine yönelik raporlar, Nelida Fuccaro.

sentezleyerek sürdürmüştür. Örgütün batı kültürünü almış aydın kadrolarının modern milliyetçi söylemlerini başta Havêrkan ve Cezîre Kürdistanı'nın en ücra birimlerine, Kürdistan'ın diğer parçalarına ulaşmasını sağlamıştır.

Haco Örgütün Aydın kadroları, özellikle Bedirxan Kardeşlerin *Hawar* etrafında başlattıkları kültürel etkinliklerine faal olarak katılmış, çok yönlü bir katkı sağlamıştır. Bazil Nikitin, Kürt milli mücadelesinde çok önemli bir yeri olan bu hareket ve Haco'nun harekete katkılarına dikkat çekerek şunları yazıyordu:

"Bu kültür hareketini başlatanlar, Türkiye'de Haco Ağa direnişine katıldıktan sonra Şam'a (Kürt Mahallesi) yerleşen Emir Celadet Bedirhan ile onun Beyrut'ta oturan kardeşi Kamuran Ali Bedirhan olmuştur. Hareketin başlıca organı da Kürtçe ve Fransızca olarak yayımlanan... *Hawar*(Çağrı) dergisiydi. Yalnız Suriye'den değil, Irak'tan, Ürdün'den de birçok Kürt aydını bu esere katkıda bulunmuştur. Hevîndê Sorî, Elî Seydo gibi profesörler, Doktor Ehmed nafîz gibi hekimler, Cegerxwîn Kurdî, Evdilhalik Esîrî, Qedrîcan, Ehmed Botî gibi şairler de bu arada sayılabilir. Daha dikkate değer bir olayda; çok sayıda aşîret ya da fraksiyon reisinin de harekete katılmış olmasıdır: Haco Ağa (Havêrkî'ye) ve oğlu Cemil Ağa; Mustafa Şahin (Alaeddin) ve oğlu Şahin, Evdirrehman Fafzî(Botan), Ehmed Melîk(Alaeddin),vb."¹²



Haco Ağa

Haco Ağa, hazırlanan gazete, bildiri, kitap vb. yayınları başta Havêrkan'da, Cezîre'deki diğer Kürt aşîretleri arasında, Kürdistan'ın diğer parçalarında dağıtımını üstlenmiş, Milliyetçi söylemin yayılmasını sağlamıştır. Hasekê'deki evine gelen her misafire Kürtçe kitap, gazete hediye etme bir gelenek haline gelmişti. Kürt Prensi Celadet Bedirxan tarafından çıkartılan aylık edebiyat ve fikir dergisi olan *Hawar*'ın basılması ve dağıtılmasında büyük hizmetleri olmuştur. *Hawar* Kitaplığı bünyesinde birçok Kürtçe kitap, broşür, dergi ve gazetenin basılıp yayınlanmasını sağlamış, bizzat yayıncılığını üstlenmiştir. Haco'nun yayıncılığı ve dağıtımını üstlendiği bu yayınlardan en önemlilerinden biri, ünlü Kürdolog ve tarihçi Bazil Nikitin'in "*Kürt Meselesi*" konulu makalesi ile mektubudur. Haco, sadece yayıncı kimliğiyle değil, yazar kimliğiyle de Kürt davasına hizmet vermeye çalıştığını görüyoruz. Aşağıda Kürtçe ve Türkçesini aktardığımız ve

¹² Nikitin, Bazil- *Kürtler* s. 479, 480

Hawar'ın 15. sayısında (1933) Ağa, Şeyh ve Entelektüeller başlıklı bir makalesinde Kürtlerin siyasal, sosyal sorunlarıyla ilgili belirlemelerde bulunuyor, çözümler öneriyor.

“Makale, bazı aşîret reislerini, Kürtçe eğitimin önemi ve yaygınlaşması gerektiği konusunda ikna edici olmuştur. Böylece, bölge ağalarının himayesinde bulunan ve din ilimleri ve Klasik Kürt edebiyatı konularının Kürt dilinde öğretildiği özel Kur'an kursları açılmıştı. Kendi kuşağının en etkili aşîret reisi olan Haco Ağa, Hasekê'deki karargahına kendini ziyarete gelen kişilere Kürtçe kitaplar hediye etmiş ve Kürtçenin öğrenimini sonuna kadar desteklemiştir.”¹³

Yine Haco'nun oğlu Cemil Haco, “*Kurmanc Qenc in lê Nezan in(Kürtler iyidir ancak bilinçsizdirler)*” başlıklı makalesi *Hawar*'ın 7. Sayısında yayınlandı. Kürtçenin dışında başka bir dil bilmeyen ve o günün Suriye şartlarında aldığı Kürtçe eğitimin sonucunda ana diliyle okuma ve yazmayı öğrenip makale yazması ve bu konudaki gayretkeşliği Celadet Bedirxan'ın övgüsüne mazhar olmuştur. Cemil Haco, Makalesinde bilgisizlik ve cahilliğin Kürtlere verdiği zararları dile getiriyor.

1928 de Suriye parlamentosuna giren Haco diğer Kürt milletvekilleriyle birlikte Kürt bölgesinde Kürtçenin resmi dil olarak tanınmasını ve Kürtçe eğitimin yaygınlaştırılması için önlemlerin alınmasını talep eder. Fransız manda yönetimi bu

Haco gerek Hoybun içinde gerekse de dışında Kürtlerin ulusal haklarına kavuşması için çaba sarf etmektedir. Ancak yukarda belirtildiği gibi gerek Kürtlerin içinde bulunduğu şartlar, gerekse de Ortadoğu ve Dünya şartları bu çabaların başarısı için pek elvermemektedir. Ama elvermeyen sadece bunlar değil; Sağlığı da elvermemektedir. Öteden beri rahatsızdır. Vücudunda bir türlü iyileşmeyen yaralar oluşmaktadır. Önceleri pek önemsemez. Geleneksel tedavi yöntemlerine başvurmaktadır. Ancak hastalık giderek yayılınca yöre doktorlarına başvurur. Doktorlar bulaşıcı bir hastalık olduğu kanısına varırlar. Bu nedenle Haco hastalığın başkalarına bulaşmasına engel olmak için sürekli beyaz bir eldiven takmaya başlar. Ancak bu, halk arasında "Haco kendini çok büyük görmeye başladı. Artık bizimle tokalaşmaya bile tenezzül etmiyor" şeklinde yorumlanmaya başlanır. Bu söylentiler Haco'yu üzmemektedir. Hastalık giderek ilerlemeye yüz tutunca Dr. Ahmet Nafiz'in da önerisiyle, Halep'teki Fransız doktorlarına gitmeye karar verir. Gitmeden önce Hevêrkanlıları ve yörenin birçok ileri gelenine bir ziyafet verme vesilesiyle toplar. Yemekler yendikten sonra, o güne kadar herkesten sakladığı

hastalığını ve dolayısıyla neden sürekli eldiven taktığını, açıklar. Açıklama Hevêrkanlılar arasında şok etkisi yaratır. Çok üzgündürler. Birçoğu gözyaşlarını tutamaz.

Bir nevi veda niteliği taşıyan bu ziyafet'ten sonra Halep daha sonrada Şam'daki Fransız doktorlarına gider. Bir süre Halep'te Fransız doktorlarının nezaretinde hastanede yatırılır. Oradan Şam'a götürülür. Başucunda çoğunlukla oğlu Mihemed Şerif vardır. Yapılan tetkiklerin sonucunda cilt kanseri olduğu ve çok ileri bir saf- hada olduğu tanısı konulur. Hastalık iç organlara yayılmıştır. İyileşemeyeceğini o da anlamıştır. Bunun üzerine oğullarını çağırır ve onlara vasiyetini bildirir. Hastalık günlerini çok iyi hatırladığını ve öldüğünde mezarının başında olduğunu söyleyen Aliyê Batê-II vasiyetiyle ilgili şunları söylüyordu:

"Amcam vasiyetinde üç noktayı özellikle vurguladı; Birincisi, oğullarımdan Hevêrkanlılar arasında adalet ve eşitlikten şaşmamalarını, Hıristiyan, Müslüman, Yezidi kim olursa olsun herkese aynı mesafede olmalarını, aşîret fertleri arsında ayırım gözetmemelerini, eşitlik ve adaletten ayrılma- malarını vasiyet ediyordu. İkincisi, Aşîret içinde sorunların çözü- münde çatışma ve öldürmeden sakınmalarını istiyordu ve şöyle söylüyordu; 'Vegera hestu şikandinê tune'(öldür- menin geri dönüşü olmaz) Birbirinize hakaret edebilir, birbirinize bağırıp, çağıra bilirsiniz. Bunlar zamanla unutulur, özür dilenir, sözlerinizi geri alabilirsiniz ama ölümün geri dönüşü olmaz. Sakın sorunlarınızın

çözümünde buna başvurmayın. Üçüncü noktayı da üç kelimeyle dile getirdi; Qewmiyet, qewmiyet, qewmiyet... (Milliyetçilik, milliyetçilik, milliyetçilik) diyerek şu beyitle devam etti:

*Ez Haco bûm sîltanê Havêrka bûm
Xelkê digo tu Haco yî sîltanê
Havêrka yî*

*Min navê axatî, bila bîmrê axatî
Bila hebê qewmîî, biratî û yekîî*

*(Ben Haco idim, Havêrkan sultanıydım
Halk sen Hacosun Havêrkan sultanısın diyordu
(Ama)ben ağalığı istemiyorum
Ben milliyetçiliği isterim, kardeşliği, birliği
isterim.)*

Sonrada şöyle devam etti; 'Kendi vatanımızda muhacir hayatı yaşamamızın nedeni budur. Vatanımızı ve milletimizi sevmemizdir. Sizlerin vatanınızı ve milletinizi unutma- manızı istiyorum' diye vasiyet ediyordu."

Yine ölmeden önce başucunda bulunan oğlu Mehmed Şerif'e şu vasiyette bulunduğu söylenmektedir:

"Oğlum, ben size mal mülk bıraktım. Becerikli olursanız bunlara yenilerini katabilirsiniz ancak sizden bir isteğim var; sakın ama sakın Türklerin vaat- lerine kanmayın."

Haco'nun hastalığı bilinen bir gerçektir. Ancak bazı aile bireyleri ve Kürt çevreleri ölümünün hastalıktan olmadığını iddia etmektedir. Onlara göre; "bir süre daha yaşama imkânı vardı, hatta Fransız hastanesine yatırıldıktan sonra iyileşmeye yüz tuttuğunu

ancak hastaneye sızan düşmanları tarafından zehirlendiğini." iddia etmektedirler.

Bu konuyla ilgili www.efrin.net sitesinde Ezdînê Zaxurani imzasıyla yayınlanan "*Welatparêziya Haco di Helbestên Cegerxwîn û Namî de*" başlıklı yazıda Haco'ya yakın bazı Hevêrkanlı ileri gelenlerin söylemlerine yer verilerek şunlar yazılıyordu:

"Mele Hasenê Kurd; 'yeminle söyleyebilirim ki, Haco Ağa eceliyle ölmedi. Ölümünde düşmanların, MIT'in parmağı vardı' diyordu. Melkê Gelo Şabo de şunları söylüyordu; çocukların(Haco'nun çocukları kastediliyor) bildiği çok şey var ama konuşmak istemiyorlar. Çünkü Mihemed Şerif Haco (hastanede Haco'nun başucunda bekleyen oğlu) onlara aynen şunları söylemişti:

'Evet, babam hastaydı ama hastanede hızla iyileşiyordu. Hatta tüm kardeşlerim eve döndüler. Babamın yanında ben yalnız kaldım. Gece bir doktor geldi ve babama bir iğne yaptı. İşte o iğneden sonra babam feryat etmeye başladı. Giderek fenalaşmaya başladı ve bir daha düzelmedi. Öylece de hakkın rahmetine kavuştu.'

Görüldüğü gibi Haco düşman tarafından zehirlenerek öldürüldü. Çünkü düşman onun faaliyetlerinden, özellikle Fransızlar nezdinde ki çabalarından çekiniyordu."³⁴

Aynı konuyu Aliyê Batê-II'ye sorduk. O daha temkinli konuşuyordu. "Doğru, amcamın zehirlendiğine dair söylentiler yayıldı ancak kesin bir kanıt yoktu. Düşmanı çoktu. Öyle bir şey de

olabilir, olmaya da bilir. Amcam çok ağır hastaydı. Kesin bir şey söylemek doğru değildir."

Haco'nun cenazesi çocukları tarafından hastaneden alınıp Hesîçe kentine getirilir. Burada binlerce Kürt tarafından karşılanır. Karşılayanlar arasında Fransız Ordu komutanı da vardır. Devletin taziyelerini bildiren komutan şu kısa konuşmayı yapar:

"Kürt halkı, devletim ve kendi adıma hepinize baş sağlığı diliyorum. Alman Askerinin Paris'e girdiği bu günlerde Haco gibi çok değerli bir dostumuzu kaybetmenin üzüntüsü içindeyiz. Tekrar Kürt halkının başı sağ olsun."

Cenaze oradan Kamışlıya götürüldü. Yolda Kürt, Süryani ve Ermeniler kitleler halinde cenazeye katıldı. Cenaze buradan büyük bir kalabalık eşliğinde Dugirê köyüne götürüldü. Bu köyde; Hemze begê Miksî, Hacı Mûsa Beg, Kor Hisên Paşa, Dr. Nafiz, Dr. Qasim, Cemîl Paşa, Ebdrehmanê Eliyê Ênis gibi birçok Kürt büyüğünün mezarı vardır. Asıl kalabalık burada birikmişti. Binlerce insan Haco'nun defnedileceği yerde birikmişti. Aile efradı ve aşîret mensupları ordaydı. Üzüntüleri tarifsizdi. Kürt coğrafyasının birçok önemli siması, ileri geleni, sanatçısı, şairi oradaydı. Hepside üzüntülüydü. Kimi üzüntüsünü ağlayarak, kimi yaşlarını içine akıtarak, kimi de Büyük şair Cigerxwîn ve Namî gibi şiirler okuyarak, ağıtlar yakarak dile getiriyordu. İşte Cigerxwîn'in mezarı başında okuduğu şiiri:

³⁵ Ezdînê Zaxurani

*De rabe ser xwe xweşmêrê hêja
Hacoyê Haco Rêberê kurda
Ne çaxa te bû tu çûyê gorê
Te em tev hiştin ber zilm û zorê
De rabe ser xwe xweşmêrê hêja
Hacoyê Haco rêberê kurda
Em kurê te ne tev bêxwedî ne
Dara te çandî gul daye şîn e
Em pey soza te ne va em bi dorê
Ta em herne nava vê gorê
Çaxa te serê xwe dakir
Me Hesênê dewsa te rakir.*

Yukarıdaki sayfalarda yaptığımız alıntılarda görüldüğü gibi zaman zaman Haco'ya hain diyen Cîgerxwîn bu şiirinde onu ala bildiğine yüceltmesi dikkat çekicidir. Bu şiirde dikkat çekici bir diğer nokta, Haco'nun yerine büyük oğlu Hasan'nın seçildiğini belirtmesidir (Çaxa te serê xwe dakir/ Me Hesênê dewsa te rakir) Hasan Haco'nun yaşam öyküsünü bu çalışmanın ikinci kitabında ele alacağız.

Bir diğer Kürt Şairi Namî de aşağıdaki uzun şiiri okumuştur:

*Der sala hezar û nehsed û çil
Bîst û diduwê nîsana têr gul
Axê me Haco ê dilo van
Xemxwarê feqîr û axan
Yezdanê mezin bi rehmeta xwe
Dilşad kirî bi cineta xwe
Bîst û şeşê meha gotî
Tîra felekê dilê me sofî
Tabût gîhabû ser mezarê
Rengê xwe dida riwê biharê
Ezmanê Cizîrê bû tarî
Wê gavê ji ewran xuîn dibarî
Ew dem te digo ewe qiyamet
Zahîr ku me dîn dûsed elamet
Em xerqeyê pêlê hesretê bûn*

*Sewda wê demê ji serê me çûn
Xortê me ketin deravê kalan
Bihêl û qiwet misala dalan
Ser ta bi qedem hemî birîn bûn
Têkda bi tebayî jî sernexuîn bûn
Rûdenê keça hemî wek ço
bê eqel û hewş ji derdê Haco
Şev ta bi seher melûl û gêjin
Xuînî ku ji çavê reş dirêjin
Çerxa felekê neyar û bêbext
Doza te çi ye bi min re her wext
Nahêlê bi dil xweş ku rûnî
Nesra xereza te em bixuîn
Serdarê ciwan û xort û kalan
Bê sûc û guneh te kir talan
Em mane di hesret û xemê da
Tarî ku li dil ketî lêda
Bes ku keder te em helandin
Can û cegerê me tev kewandin
Qehr û xezeba xwe bes birêje
Cewra te li me kirî ji mêj e
Cewla xezeba xwe dagerîne
Sûcek me tu nîne ev çi kîn e
Qêrîn û hewarên xort û bûkan
Lerzîn dikete dilê biçûkan
Fîxan ji me çûne bane banî
Hê jî hêja bi me re dikî neyarî
Ku rêçesinasê mîletê kurd
Xemgîr li ser wî mîletê kurd
Haco te bi navê kurd werî
Razayî li bend efwa barî banî
Emrê te meger gîhabû şêstî
Nazdarê welat tû zû nivistî
Wextê te nebû niha tû razî
Doza me bixwesî bidilxweşî bixwazî
Insaf bike ev ne edl e zulm e
Rojk te nekir kerem digel me
Bistanê bi hendesê te danî
Guhdarî hene bi dergevanî
Pêta li dilê te ê birîndar
Xortê me ji xewnê kirin hişyar*

*Der heqê te de nîzanim çî bêjim
Bê sebir û qîrar û dîn û gêjim
Fîryad dîkin jî bê mecalî
Hestîr diwerin jî her dû alî
Tîrba te li pêşberê me her dem
Pê sebir dîkin heta xweşîn em
Ger çendî qewlî li me nîhan bû
Navê te î xweşî jî nû eyan bû
Namî bese ey şîvanê derdan
Hêja bi xweşî dikî xeberdan
Wek mîrxê hezîn bi devê dilxweş
Rûne bi tenê li kunekî reş
Çend ku bibêjî hem binalê
Heta bîghîne dewrê salê
Dîsa tu nîzanî ev çî hale
Derdê di dila ye bê mecale
Lê hêvî dikim jî Xewedahê gewre
Vî ewrê reşî li me bigore
Daxwaz li me êdî zû xuya bê
Serîne welat niha qe nabê
Ey Xewedahê mezin tu çendî pakî
Haco tu bi rehmeta xwe şakî
Kêmayî hebin lê nebîne
Pîr cewr û cefa jî bo me dîne.*

Gotinên Bijare

Pîrê KAL

A

- * Aştiya xerab, ji şerê baş çêtir e.
- * Çima dikî ax û wax, paşê tê ji nebî ax?
- * Ger tu ne bêar î, bi tu kesî nikarî.

ALEM:

- * Alem yek e, yek alem e.
- * Alem ji hev û bi hev e.
- * Alem bin destê zorê ye.
- * Alem xulamê rodiyê ye.
- * Alem kûpik û kuzik û kasik û dîzik e.

AV:

- * Av û agir li hev nayin.
- * Av ji agir natirse.
- * Ava zêde di bîra genî da ye.
- * Av nagihîje tavê, tav tê ber avê.

AQIL:

- * Aqil gem e.
- * Aqil fêkiya payîzê ye.
- * Her kes qasî aqlê xwe ye.
- * Her şêwirek aqilek e.
- * Xemla pîra aqil e.
- * Pîva aqil bawerî ye.
- * Aqil nagihîje dil.
- * Aqilê kêr, bêrika vala.

AZADÎ:

- * Azadî ne ya kesî ye, ji bona her kesî ye.
- * Azadî ji jîyanê hêjatir e.
- * Diloka azadiyê bi devê girtî nayê gotin.
- * Şewqa azadiyê di serê vala hîlnayê.

B

- * Ger ku ez bibim bar, Xûdê min têxe axa sar.
- * Emrê beqê bi weqweqê, yê leglegê bi leq leqê dibûre.
- * Bi her bayî li ba bî, ger tu qasî çiya bî, bigorî ya giya bî.
- * Belê, belayê dûr dike.
- * Beg in, şêx in, mele ne, bi me ne, ne ji me ne.
- * Bîr ne kûr e, ben kin e.

BAŞ:

- * Başî bar e.
- * Bextê başa xirab e.
- * Başî tê kirin, nayê kîrrîn.
- * Başî xwestin, başî ye.
- * Başî fedekarî ye.
- * Başî hevalê roja xirab e.
- * Baş kar e, xirab bar e.
- * Baş başiyê, xirab xweşiyê dixwaze.
- * Baş li karê xwe ye, xirab li kara xwe ye.

- * Lingê başa ji serê xiraba çêtir e.
- * Çêrê başa ji pesnê xiraba çêtir e.
- * Pûrê başiya, ji bona bêjinê ye.
- * Ger başî bi te nabe, paşiya te xirab e.
- * Pûrê başiya, dendika dafikê ne.
- * Xwezî mezin baş bûna, baş mezin bûna.
- * Nebaşî bê paşî ye.
- * Baş tev mirî ne.
- * Ya baş be, ya wekî başa be.
- * Başiya zêde ji teresiyê ye.
- * Kesê başiyê dixwaze, divê baş be.

BAV:

- * Bavê hev da, lawê tev da.
- * Bavê xû kuşîye, bi tîrba wî sond dixwe.
- * Kesî bavê xu nebijartîye.

BAWERÎ:

- * Bêbawerî valayî ye,
- * Bawerî yê nezanan, xevrojê û xûrafê ne.
- * Bawerkirin çêtir ji hezkirinê.
- * Ku bawerî nemîne, tiştekî mirov namîne.
- * Bawerî, xirabiyê bi hezkirin dide kirin.

BELAŞ:

- * Belaşî bê paşî ye.
- * Bûhayê belâşiyê giran e.

BEXT:

- * Kesê ku bextiyar e, ya dîn e ya dîndar e.
- * Bextiyarî li me bûye neyarî.
- * Bextiyarî, aşî û azadî û nan û saxiya can e.
- * Kesê bextê wî yar e, başî pêda dibare.
- * Yê bextê wî neyar e, agir pêda dibare.

BIRÇÎ:

- * Kesê birçî, baweriya xwe dixo.
- * Kesê birçî zû dixape.
- * Tenûrek nan çavbirçiya têr nake.
- * Wer bixoy, da ku birçî nemînî.
- * Mirov hînê birçîtiyê nabe.
- * Çavbirçî ji zik birçiya pîrtir in.

BIRÎN:

- * Birîna kînê, kûr e.
- * Birîn, bi tevdanê xweş nabe.

BÛK:

- * Ku bûk çê ye, xwesî dê ye.
- * Bûk ji xwe ra nalirîne.

BÛLBÛL:

- * Bûlbûl neba, dê gulê gîlî û gazinê xwe li kî kira.
- * Bûlbûl ji bo dilekî bû girtiyê gulekî.
- * Ger nebe histiriyê gulê, bûlbûl nedibû girtiyê gulê.
- * Bûlbûl girtiyê gulê, gul girtiyê histirî ye.
- * Dema qjjik dixwîne, bûlbûl xwe ditelîne.

CIWAN:

- * Ciwanî, xewnek xweş bû, pîrîfî yê şîyar kir.
- * Ciwan kane nizane, yê pîr zane nikane.
- * Ciwan bi hirse, pîr bi tirs e.
- * Ciwan kane bajarekî ava ke, pîr nikane ta di derzî yê da ke.
- * Li ciwanî sal, li pîrî roj dirêj in.
- * Mirov li ciwanî hîn dike, li pîrîfî fam dike.
- * Cahîl bi cî bilind nabe.

ÇAV:

- * Hiş nebîne, çav kore.
- * Çav xû nabîne.
- * Çav, bi girtinê kor nabe.
- * Çavê şil, ji dilê kul e.
- * Carna dest ji çav çêtir dibîne.

ÇIRA:

- * Çira bê rûn ruhî nade.
- * Çima, çira ye.

D

- * Defîne, li xirba veşartine.
- * Ya dûr, hûr e.
- * Dîroka bin desta, xûnî ye.
- * Derza piçûk, gemî ya mezin noq dike.

- * Dehlek, bi dasek nikane.
- * Çi dibîne, wî hitlîne.
- * Ne bi dor be, dor nayê te.
- * Nîvê dinyayê tarî ye.
- * Dew tune, rûn difiroşe.
- * Dewara gir, kesê hogir.
- * Her tişt, di dendika xû da ye.
- * Nedî bû, dî, bi xwe da rî.

DAR:

- * Dara bê xêr zû gir dibe.
- * Dara fêkî nade, êzing e.
- * Dara azadîyê, bi xûnê xweyî dibe.
- * Dar bi fêkiyê xû tê hezkirin.
- * Dara pelê wî zêde, fêkiyê wê kême e.
- * Bayê gur, dara bilind hildişîne.
- * Dar, di dendika xû da ye.
- * Dar, bi terî ditewe.

DEM:

- * Dem derman e.
- * Dem xem e.
- * Ez û demê, hev xûr.
- * Dem li min bû gûrê har, xweşîyên min hemî xwar.
- * Dem dizekî di jwar e.
- * Diz diz e, çi zêr dizî çi derzî.
- * Yê kû bi dizî dike, dizîyê dike.

DEST:

- * Destê gula dide, gul bêhn dide.
- * Destê paqij vala ye.
- * Yê dest fire, dil teng e.
- * Zêr û zor, di destê qirêj da ne.
- * Ya dev xira ke, dest çênake.
- * Bi xû bin dest e, ji al ê serdesta ye.
- * Em bindest in, serdestî bi me nabe.

DERMAN:

- * Dermanê zêde zerar e.
- * Derman tehl e, tehlî derman e.
- * Derd pur e, pur zêde ye, têra her kesî heye.
- * Derdê piçûka mezin e.
- * Derdê min bêderman e, derd ji bo min derman e.

DERÎ:

- * Derê xirabîyê pûr in, kilîta vira li teva tê.
- * Derê kêma ketîye.
- * Derî neşkîne, kilît lê bîne.
- * Derê dila bi lêdanê venabe.
- * Derê namusê şerm e.

DEWLEMEND:

- * Dewlemend, bê rû ne.
- * Kû dewlemendî baş ba, Xûda nedida xiraba.

DEYN:

- * Deyn, bi deyn nayê dayin.
- * Deyndar, hustu xwar e.
- * Kû bu deyndar, dibe neyar.
- * Bila mirar bim, ne xezanê deyndar bim.

DÊ:

- * Dildara ji dil, dê ye.
- * Dendik dê ye, her tişt jê ye.
- * Kû dê bigirî, ken kerî ye.
- * Hinek dê ne, hinek mê ne, hinek jê belayê Xûdê ne.
- * Tevê ku mê ne, ne dê ne.
- * Dendik dê ye, mar jî jê ye, dar jî jê ye.
- * Kurd hemû biran e, dayika wan Kurdistan e.

DIL:

- * Kû dil har e, serî bar e.
- * Diltengî, carna ji dest tengî ye.
- * Yê dilekî dişkîne, sed qencî nacebrîne.
- * Ya ne ji dil, ne rast e.
- * Ya ji dil tê, ji dest naye.
- * Yê dilekî xirake, sed qencî ava nake.
- * Dilsivikî, yê dixwaze.
- * Dil bi hêvî yê dijî.
- * Dil ciwan e, serî pîr e.
- * Dil bi evînê ciwan e.
- * Dil xweşîyê, ser başîyê dixwaze.
- * Bi ya dilê xû kir, xwelî li ser xû kir.
- * Kû her du dil bûne yek, kadîn bû birca belek.

- * Dil dêşe, dev dibêje.
- * Dilê qirêj, bi şuştinê pak nebe.
- * Dilê bi evîn dîn e.

DÎN:

- * Dînê xwedê, rastî ye, ya ne rast, dînîtî ye.
- * Dîndarî ji tirsar mirinê ye.
- * Dîn bawerî ye, ne zordarî ye.
- * Dînxura, dîn kirine dînîtî.
- * Kesê jar e dîndar e, yê kû jîr e dînxwar e.
- * Bi xwe ga ye, lê dîn li xwe pêça ye.
- * Xwînxwar û kîndar nabin dîndar.
- * Zevîya dînxwara dîn e.
- * Tilisima dîn şûr e.

DÎNÎTÎ:

- * Herkes, bi hawakî dîn e, xwe nabîne.
- * Dîn dîna dibîne, darê xwe datîne xwe ditelîne.
- * Dîn e lê zincîra diqetîne.
- * Dîna nas dike lê xwe na.
- * Nezan ji hev fam dikin, hevalê dîna dîn e.
- * Dîn e, lê cilê xwe naqetîne.
- * Kesê ne ji alî xwe ye, ya dîn e ya xayîn e.

DOST:

- * Dostanî, wekhevîyê par kirine.
- * Dostê bin desta nabe, dostê ser dest xirab e.
- * Bihayê dostanîyê erzane.
- * Sed dost kêr in, neyarekî zêde ye.
- * Ger tune ye dostekî, tu bibe dostê yekî.
- * Dostanî, bi dayinê geş dibe.

DOZ:

- * Dozek me hebû hûr bû, em hatin kûştin, gir bû.
- * Kesê doza wî hêjayê mirin e, natirse ji mirinê.
- * Herkes qasî doz û daxwaza xwe ye.
- * Dozdarê ji bo dozê nemire, mirar e.
- * Dozdar, ne ji bo zêrê zer û ne li ber sîngê gewr natewe.

E

- * Kû bê esl e, na fêsl e.
- * Di ezbîn e, xû nabîne.

EVÎN:

- * Evîn, dil bijîne.
- * Evîn, şewtina dilê bi agirê şewetê.
- * Evîndar, navê textê hukumdar.
- * Evîndar birîndar e.
- * Evîna birçîya, qûrmîçî ye.
- * Agirê evînê heta livînê.
- * Ava çava, agirê evînê natefine.

ÊŞ:

- * Dema êşê dirêj e.
- * Êşa zana zêde ye.
- * Êş bi qasê famê ye.
- * Êş ne xoş e, lê nexosîyê şan dide.
- * Kû cîyek te ne êşe, li hebûna wî hay nabî.
- * Êş tirsoka ditewîne, mîrxasa dikewîne.
- * Hin şa ne, hin êşan e.
- * Kêfa hineka, êşa hinaka ye.
- * Xezanî tama tevê êşa ye.
- * Êş, gamêşê dike mêş.

FAM:

- * Kû fam kira ji çi ye, qe ne digo ji kî ye.
- * Kesê fam e, ji dîna jî fam dike.
- * Kû fam nebe, xwendin çîye.
- * Kesê fam ke, şanetîya Xudê nake.
- * Kesê bê fam, bi gûhê xû bawer e.
- * Kesê bê fam, hew heye.
- * Kesê bê fam, bê tam e.
- * Dibên fama pir nalîn, te îro jî kir êvar.
- * Ferqa ga û gavan fam e.
- * Gûhdar, wekî xû fam dike.
- * Yê ji yekî fam nake, ji sedî qe fam nake.

FÊKÎ:

- * Fêkîyê darê, kevira tîne darê.
- * Fêkîya gihiştî zû dikeve.
- * Fêkîya xwendinê hînbûne.
- * Kû fêkî kete erdê, mirov darê nabire.

* Fêkî li darê bare.

FIKIR:

- * Kesê kû difikire, bi tenê namîne.
- * Kesê kû nafikire ji kerê xirabtir e.
- * Kesê kû nafikire, nabîne.

G

- * Dayîna gûlekî, xweşkirina dilekî.
- * Lê gerîya, tê gerîya.
- * Ji bo geda xû xir feda.
- * Ji gundiya tirê kû, bajarî her ro helawê dixûn.
- * Her gotin ne rast e, her rast nayê gotin.
- * Dîtin, ji gotinê çêtir e.

GOTIN:

- * Gotina wî çêtire ji dîtina wî.
- * Gotina şekir dev şîrîn nake.
- * Gotina ji dil, heta dil e.
- * Gotina lewitî carna ji dilê şewitî ye.
- * Zik bi xwarinê, dil bi gotinê têr dibe.
- * Her kes di gotina xû da ye.
- * Kû kes e, gotin bes e.
- * Gotin heye hîn dike, gotin heye jî dîn dike.

GEL:

- * Gelê zana aza ne.
- * Gelê zarê xû nizane, wenda ne.
- * Xû ji bo gel jibîr ke, gel te jibîr nake.
- * Gelê razê ra nabe, lê nedî şîyar nabe.

GUR:

- * Xewa mîyê, li ba gur nayê.
- * Gur, gur a naxo.
- * Sed mî, bi gurekî nikane.
- * Mî bi berx e, xema gur e?

H

- * Hevalê baş, yê roja xirab e.
- * Yê hezir ke, ba xizir nake.
- * Histêrkê rûhnî, di şevê tarî da dibiriqin.
- * Çar lingê hepsê ne, lê dîsa dilikûme.
- * Hin kes behr in, hinek qehr in, hinek

jehr in.

- * Kesê bê hiş, hişyar nabe.
- * Himmet û nîmet a bi minnet, mihnet e.
- * Hukum bi kûştinê ye.
- * Hukumdarî bi zordarî ye.
- * Hurmeya çê, para hirçê.
- * Hevalê nêz, ji birayê dûr çêtir e.

HEQ:

- * Ya ne li cî ye, neheqî ye.
- * Heqxwarî, xûnxwarî ye.
- * Heq, bin destê zorê ye.
- * Heq revîye ezmana, navê wî ma di zimana.
- * Şoreşvanê heqîyê, qehreman e.

HEZ:

- * Hezkirin, parkirin e.
- * Rez bi hezê geş dibe.
- * Kesê ji xû hez ke, kes jê hez nake.
- * Kes ji tirsoka hez nake, ji hezkirîya dîtirse.

HEBÛN:

- * Hebûn ji bo mirinê, rabûn ji bo ketinê ye.
- * Yê kû hebe, dê tunebe.
- * Hebûn, bi hember e.
- * Hesret, ji hebûnê xweştir e.
- * Tu hebî, her tişt heye.
- * Heval yê hebûnê ye.

HÊVÎ:

- * Emrê kin û hêvîya dirêj, kêrî çî tê.
- * Kes bi hêvîyê dijî, ji birçîna dimire.

HUNGÛV:

- * Tevê mêşa, hunguv nadin.
- * Hungûvê rû, tirş û tehl e.
- * Hungûvê mêşê, hêlîna wê xira dike.
- * Mîn navê hungûvê te, da nebînim rûyê te.
- * Ezê hungûvê xweş, çima bidim mêşa reş.

HOZ:

- * Hoza bê doz, xira dike.
- * Hoz bi dozê nikane.

JÎYAN:

- * Jîyan jan e.
- * Jîyan xem e, ne dem e.
- * Jîyan li zana, zindan a.
- * Jîyan hirs û tirs e.
- * Jîyan leystikek paşî mirin e.
- * Çima diji wer bijî.
- * Jîyan şewatek û paşî xwelî ye.
- * Jîyan paşmayînê xweş nabîne.
- * Jîyan li min kir tarî, îxtiyarî, neyarî, deyndarî.
- * Jîyan bi derdê do, tirs a sibê dibûre.
- * Xweşîya jîyanê, ji tirs a mirinê ye.
- * Kirya jîyanê can e.
- * Em jîyanê nizanin, dê mirinê çi zanin.
- * Yê pir dixo, pir najî.
- * Yê kû jîyan kirine jan, kî bawere bi cenneta wan.
- * Êşa jîyanê nekêşe, jîyan bi xwe êş e.
- * Jîyan kû welê jan e, kî dizane kû mirin çi tofan e.

JÎR:

- * Jîrîtî çêtire ji mîrîtî.
- * Yê kû jar e bar e, yê kû jîr e har e.
- * Kesê jar divê rast be, kesê xwar divê jîr be.
- * Hinek bi kef û ken in, hinek jar û reben in.

JIN:

- * Jin ne kê m e, xwe kê m dibîne.
- * Jin xweşiyê dixwaze.
- * Jin ne yar be, neyar e.
- * Jin, ji bê dengiyê hez nakin.
- * Jina baş yar û war e, ya xirab gurê har e.
- * Jin mînanê zarok e, ew bikeve digirî, tu bikevî dikene.
- * Jina baş ji horîyan çêtir e, ya xirab ji şeytan xirabtir e.
- * Evîna jina, ji kina wan zêde ye.
- * Jin ji dûr ve gul e, ji nêz ve kûl e.
- * Mêr dibîne vedişêre, jin nedîtî diqîre.
- * Bila kul li te keve, li pê jinê nekeve.
- * Jin kû serî hilîne, tam di malê namîne.

- * Nêr û mê, du nîv in.
- * Mêr ji gunehê jinê xwe ditirsin.
- * Qîza faş nabe jina baş.
- * Purê jina bê hawa ne, bi sivîk ra sivik, giranî ra giran e.
- * Gelê kû jinê wan nezanin, mêrê wan bin dest û xezan in.
- * Mêrê malê li pê nane, derdê jinê, dîlok û def û dilan e.
- * Jina xweşik, dildare jina baş, yar û war e.
- * Jina baş bi gotina xirab sor dibe, ya xirab ji bo xirabî yê xwi sor dike.
- * Jehra mar ji dirane, ya jina ji zimane.
- * Jina baş bextîyar dike, ya xirab îxtiyar dike.

K

- * Kefçîya vala, zik têr nake.
- * Kesê nekewe, na tewe.
- * Kevir ji kûz natirse.
- * Kefîlê hûto, rûto ye.
- * Her karê min, li darê hûstuyê min, li ser te xwar e.
- * Kesê bê kêr, kêrê mirimê tê.
- * Ne kedî, bê fedî ne.
- * Kûto xwe bi kar dikuje, hûto ji pê dimêje.
- * Ê kû wekî yekî ye, ew kî ye.
- * Agirê kinê vemirîne yan na wê te bi şewitîne.

KOR:

- * Korî zor e.
- * Xeyala kora kûr e.
- * Korê, çi ke çirayê.
- * Kerr û kor, hev didin jor.
- * Bawerî û kîn û evîn kor in.
- * Nankorî karê kêma ye.
- * Rêberê kora kor be, rê çûna wanê zor be.
- * Kalê bê kesê, ketî xezanê bê gûman.

KER:

- * Bi kerî naçe serî.
- * Ezîtî kerîtî ye.

- * Ker kû fam ke, bar li xwe nake.
- * Kerê pîrî kor, hefsarî kesk û sor.
- * Salên zêde, kerîtîyê kê m nake.
- * Kurtan li kerê ne are.
- * Ker, ceh û cûhêr nade bi kûpê zêr.
- * Ku ne mêr e, kerê nêr e, berde bila biçêre.
- * Kerê gem bikî, dê bêje ez kihêlim.

KÊM:

- * Hevalê kêmahî ya kê m e.
- * Kes ji kêmahî yê xwe heznake.
- * Wer kê m û wer ketî ye, koletî li xweş hatîye.
- * Kesê xwe kê m dibîne, bi xemla xwe zêde ye.
- * Kesê xwe kê m dibîne, wek hevî yê dixwaze.
- * Kê mahî are, zêdehî bar e.
- * Kesê kê m, her tiştî kê m dibîne.
- * Kê mahî ya mezin, xêvitî ye.
- * Kê mahî yê mezina mezintire.
- * Kê mahî yê mêra, şûrê jina ye.
- * Kê mahî ya ki aşîkar, yarê li te bibin neyar.
- * Pîrîtî û nezanî û xezanî, kê manî ye.
- * Kesê xû kê m ke, zêde ye.
- * Kê m, bi kîn e.
- * Kê mahî li kê ma ne are.
- * Ger tû ne gêjî, kê mahî yê xwe nabêjî.
- * Kê mê zêde kê mtir e.
- * Purê bilindan kê min, hin ji ketiya kurr in.

KÊF:

- * Kêf kef e, zû ditefe.
- * Kêfa anekî, êşa danekî.
- * Hinek bi kêf û ken in, hin jî jar û reben in.
- * Her kêfekî, bi êşekî ye.

KETIN:

- * Ketîyê kû ah dike, gazin ji Ellah dike.
- * Ketî, ji ketinê natirse.
- * Ketin, ji derketinê hêsatiye.
- * Yê bi xwe ket jê bigere, hate tandan pê bigere.
- * Hevalê ketîyan kê m e.

KAR:

- * Kar ker e, bajo here.
- * Kesê karê xwe neke, karê wî tû neke.
- * Karê xwe bi roj bike neke şev; roja xwe bike roj, şeva xwe bike şev.
- * Ne karê min be, ne barê min e.
- * Tû karê xwe neqedînî, karê te biqedîne.

KANÎN:

- * Kanîn bi zanînê ye.
- * Kesê bi xwe kane, kes pê nikane.
- * Kesê bi xwe nikare, li dara xwe bar e.
- * Kes, nikane kevcala rast bimeşîne.
- * Ger tu ne bêarî, bi tu kesî nikarî.

M

- * Roja baranê, mirîşk nayê firotinê.
- * Mihvan zû genî dibe.
- * Mîranî, bi têranî ye.
- * Ya mêrxas be, ya bimire xelas be.
- * Mela ji bo nîmetê, sofî ji bo cennetê tevda diçin mîzgeftê.
- * Mirovatî bi mejî ye, yê mayî goşt û hestî ye.
- * Mêrê baş xwe nade paş.

MIROV:

- * Mirovî, bi peyv û tewr û tevger e.
- * Mirov kûvîya kedî dîkin, li xû na.
- * Mirov pur in, mirovatî kê m e.
- * Mirovê bi êşa mirova naêşe, mirov e gelo?
- * Mirov xwe zû dixapîne.
- * Hinek mirov qe najin, hinek jî qe namin.
- * Mirov wekî reqeman e, qîmeta wan bi cîyê wan e.
- * Nava mirova qirêj e.
- * Purê mirova meşka pufdayî ne, devê wan vekî diqedin.
- * Mirovê baş ji meleka çêtir e, yê xirab ji şeytan xirabtir e.
- * Mirovê mezin, ji neyrê piçûk ditirse.
- * Xwedê çêkirîye, mirov xira dîkin.
- * Kesê hov e, ne mirov e.

* Mirov xwe dibîne, lê xwe nas nake.

MAL:

- * Malê kêma zêde ye.
- * Mirov bê mal e, mal bê mirov e.
- * Dil nebiye malê wî, ka mêzeke halê wî.
- * Jê tirê xweyî mal e, hêj fam nake hemal e.
- * Malê bava, dafika lawa ye.
- * Ku tune ye malê te, kes pirs nake halê te.
- * Mal mîna şoravê ye, çiqas vexwî tîtir dibî.
- * Mal nîmet e, ne rûmet e.

MIRIN:

- * Tama mirinê tehl e.
- * Mirîyê bê doz mirar e.
- * Mirî pir in, mirin yek e.
- * Mirî bi şuştinê pak nabe.
- * Rûmeta mirî bi mîratê ye.
- * Hinek mirî her sax in, purê saxa mirî ne.
- * Mirin ji ketî ra kar e.
- * Tehlîya mirinê, bi hezkirîya tê tam kirin.
- * Mirin, xwelîyê li serê mî radike.
- * Jibo doza pîroz be, mirin îd û newroz e.
- * Yê mirinê dixwaze, ewê çike bi derman.
- * Mirin tehl e, tehlîya tune dike.
- * Tîrsa mirinê, ji mirinê girantir e.
- * Mirina li pîya, çêtire ji nava çîya.

N

- * Nav nîşan e.
- * Tiştê kû ne bi te ye, ne ê te ye.
- * Kesê ne ji alê xwe ye, neyarê xwe ye.

NAN:

- * Jiyan bi can e, xap û xebat ji bo nan e.
- * Nanê kêma, kêmahî ye.
- * Nanê xezan, bi xiç e.
- * Derdê nan giran e.
- * Yê nan nede, nav nade.
- * Nan ji dendikê, dol ji dadikê ye.
- * Hêsa dibe derdê te, kû peyda be nanê te.

NASKIRIN:

- * Kesê ku xwe nas nake, dê xudê bi çî nas ke.
- * Xwe nas ke, xuda nas ke, xu xelas ke.
- * Kesê xwe nas ke, li xeml û xorînê nager e.

NEKES:

- * Nekesî, rûmetî nade kesî.
- * Kesê ne kes, bê kes e.
- * Kes ji nekesa, heznake.
- * Nekes naxo dibe ax, zerê wî ji axê dertê.
- * Nêçîra sextekaran, temehkar in.

NEYAR:

- * Neyar nabe yar, yar dibe neyar.
- * Neyarê neyar yar e, yarê neyar neyar e.
- * Neyarê çê, çêtire ji yarê neçê.
- * Neyarê namûsê bê namûse.
- * Kî ne ji wî ye, neyarê wî ye.
- * Kesê heq xwar û zordar e, bavê te be, neyar e.

NEZAN:

- * Nezanî bar û neyar e.
- * Xu nizanî, tu çî zanî?
- * Nezan ji xwe razî ye.
- * Nezan nabîne.
- * Kesê xwe nizane, nezane.
- * Nezanî, kêma hî û xezanî ye.
- * Barê nezanî yê, girantire ji derdê xezanî yê.
- * Bi nezan ra gûlistan dibe zindan.
- * Nezan xudibîne, karê wî taan û kîn e.
- * Nezanî neyar e.
- * Min nezanî û kêmanîyê xwe da bin pîyê xwe, serê min çû ezmana.

P

- * Pisîka têr mişka nagire.
- * Pê jî nabe, jê jî nabe.
- * Yê li pêş e, bi êş e.
- * Parkirin, hêz û zanînê zêde dike.
- * Piranî, giranî ye.
- * Kû nizanî bipirse, netirse.

PARS:

- * Parsekî ru reşî ye, lê tûrik dagirtî ye.
- * Xiçê çolê bibin zêr, çavê parsek nabe têr.
- * Ji parsek a yar, yar nabe. Parsê neke têr nabe.
- * Hînbuna deyna parsekî ye.
- * Parsekê camêr, ji mirê nekes çêtir e.
- * Xiyar dane parsekî, gotîye xiyar xuware.

RAST:

- * Rast, tazî ye.
- * Rastî, bê paşî ye.
- * Rast û razî rehet in.
- * Rastî tehl e, tehlî derman e.
- * Rastî, di bîra kûr da ye.
- * Rastî, bin destê zorê ye.
- * Rast famkirin, ji gotinê zortir e.
- * Yê rast here, wenda nabe.
- * Rast gotin, bi qasî wêrinê ye, ne bi qasî zanînê ye.
- * Peyva rast ne xweş e, ya xweş ne rast e.
- * Ya bûyî rast e, gotin xap û xeyal e.
- * Yê rastîyê nizane, xwarîyê nas nake.
- * Kesê rast, rûşê nabe.
- * Ji deh xwara, rastekî der nayê.
- * Rastî veşartî ye.
- * Biratîya ne bi rastî ye, neyartî ye.
- * Yê rastîyê dixwaze, divê kû rast be.

PERE:

- * Tevê perda, ji bo par û pere ne.
- * Pere ne her tişt e, her tişt ji bo pera ye.
- * Yê go pere her tişt e, ew ne tişte.
- * Da pê pera xwe wenda kir.
- * Xweyê pera li pêş in.

PESIN:

- * Kî bûn, ne pesin e, tû çî yî.
- * Pesnê pîra kayîn e.
- * Kesê hêjayê pesna, pesnê xwe nade.
- * Kesê kêr, bi mirîya dipesinê.

PEYV:

- * Ku kes e, peyvek bes e.
- * Yê pirr bêje, vir dibêje.

- * Peyva vala, kefçîya vala ye.

RÊ:

- * Rêya xirabîyê kin e.
- * Rêya dirêj, bi gehfê kin dest pê dike.
- * Rêya hezkirîya kin e.
- * Di rêya xwar de, rast nayê meşîn.

PÎRÎTÎ:

- * Dêrdê bê derman e pîrîtî.
- * Dêrd û êş e, kûl û kêş e pîrîtî.
- * Perçe perçe mirin e, pîrîtî.
- * Bêhn û tama mirinê ye pîrîtî.
- * Sebra kêr, êşa zêde ye pîrîtî.
- * Dêrdê giran, dilê teng e pîrîtî.
- * Mirina jina ye, pîrîtî.
- * Pîrî, ken dike girî.
- * Ger tu mîr bî, ku tû pîr bî, tê jibîr bî.
- * Kes ji pîra hez nake.
- * Kalî kûl e.
- * Beza kalê, heta palê.
- * Pîrî payîz e.
- * Mirin hew carekî ye, yê pîr her roj mirî ye.

RONAHÎ:

- * Ronahîya xwendinê xar nabe.
- * Ronahî, di şewatê da ye.
- * Ronahî, qirêjê nagire.
- * Kesê jîyana xwe bi tarîyê ava kirine, ronahîyê naxwazin.

ROJ:

- * Tu roj heye, naçe ava?
- * Bi roj wenda kirî ye, bi şev lê digere.
- * Roj ne roja kesî ye, roj roja herkesî ye.
- * Welê reş û tarî ne, rojê şewat dibine jê bê wê bîtefine.

RÛ:

- * Yê ne li rû ye, du rû ye.
- * Rû reşî, bi şûştinê pak nabe.
- * Rî, rîya ye.

Q

- * Qirêj, li reşîyê naxuyê.
- * Ew bi qîmet nezane, divê kû bi rûmet bimirin.
- * Qanûn, gema kêma ye.
- * Qedera me, keder e.

QENCÎ:

- * Qencîya neyara, ar e.
- * Qencîya li xiraba, xirabî ye li qenca.
- * Qencîyê bavê avê, beq nizane heq zane.
- * Kesê qencî pê nabe, xirabîyê dike.
- * Pûrê qencîya, dendika dafikê ne.
- * Qencî ya ne li cî, xirabî ye.
- * Qîza çê, rû sipîtîya dê ye.

S

- * Siya tarîyê, tun e.
- * Solek, li lingê her kesî naye.
- * Sextekar, hurmetkar in.
- * Sergîn derên ezman, dişa rêx e.

SEH:

- * Sehê têr, zû har dibe.
- * Seh diewtin nenasan.
- * Seh ji kû bitirse, bi wir da diewite.
- * Sehê har, xweyîyê xû nas nake.
- * Kûçik li pê têr mane.
- * Xuşk ji bira, seh ji kevira ditirse.
- * Sehê li pê dêlê, har e.
- * Sehê reş, bi şuştinê sipî nabe.

SERÎ:

- * Serî, leyistika dil e.
- * Serê tijî, hûstu xwar e.
- * Serê gurî, şehê zerî.
- * Serê vala hişk e, pir deng jê tê.
- * Serê rehta rehet e.
- * Ser û dil li hev nakin, yek heft e yek heftê ye.
- * Serdarî, bi zordarî ye.
- * Serketin, bi xwestin û xebat e.
- * Sivik, li ser in.

- * Pûr serî ne bi mejî ne.
- * Kesê ser destê xû be, nabe bin destê kesî.
- * Hin li pê serê xû ne, hin li pê perê xû ne.
- * Çi tê serê te, ji dev û destê te ye.

SEBIR:

- * Sebir tehl e, tehlî derman e.
- * Sebra piçûk, derdê mezin dûr dike.
- * Debira bê sebran, kêma e.
- * Sebir tehl e, fêkîyê wî şêrîn e.

SERXOŞ:

- * Serxoşê bira, serxoşê pera ye.
- * Ji serxoşa tirê ku, dewran li dor wan digere.

Ş

- * Serwet û şuhret û şehwet, şerab in.
- * Şop li rêya namîne.
- * Şerm, şerefa jina ye.
- * Şeba miftî şêrîn e.
- * Şêrîna dixun, tehla davêjin.
- * Du şûr di kalanekî hil nayê.
- * Şerm, ji êşê girantir e.

ŞAŞ:

- * Yê şaş nake, tiştê nake.
- * Hin şaş dikin, hin kaş dikin.

ŞER:

- * Şer, şewat e.
- * Şerûd bimire, şer dibe şahî.
- * Kesê şerxwaz, xû bide pêş.

ŞEWAT:

- * Yê agir netefîne, dê şewatê derîne.
- * Yê ne şewite, napije.

ŞEYTAN:

- * Yê bi şeytan ra nan bixwe, divê kewçîyê wî dirêj be.
- * Kî ne ji wane, şeytane.

ŞÊR:

- * Şêrê têr, kedî nabe.
- * Şêr, avrîya rovî naxo.
- * Ku çend mûrî bibin yek, dikujin şêrê belek.
- * Şêrê pîr, li terma digere.
- * Zincîr, li şêra ne ar e.

ŞIVAN:

- * Şivanî, bi gur nabe.
- * Şivanê baş, wekî pezê xû dijî.
- * Şivanê xirab, hevalê gura ye.
- * Pez ne yê şivan e, şivan ê pez e.
- * Gundî pale û şivan in, bajarî huner-mend û bazirgan in.

ŞÎRET:

- * Kes bi şîret şîyar nabe.
- * Kes ji şîret a heznake.
- * Şîretê xu li xu ke, ji te zêde kî nezane.

T

- * Ax ji baranê, romî ji talanê têr nabe.
- * Kû teqdîr e, tedbîr çî ye?
- * Tovê qîjîk bibîne, hêşîn nabe.
- * Yê tam neke, fam nake.
- * Ji têra tirê, alem têr e.
- * Bila têrîya te, ji bêrî ya te be.
- * Ku yek li ber te tir ke, divê tu pêda birî.
- * Serê yekî bişikîne, hezara bitirsine.

TAV:

- * Yê pif ke tavê, tif dike xu.
- * Yê li tavê mêzeke, sîyê nabîne.

TÎR:

- * Tîra here, venagere.
- * Tîra xwar rast naçe.

TIRS:

- * Tirs dîya derewa ye.
- * Jê ne tirse, lê napirse.
- * Tîrsa şûr, rastîyê dixê tûr.

- * Tîrs, rastîyê vedişêre.
- * Hîrs û tîrs, ditewîne.
- * Li dîya xwe napirse, ji guneha ditirse.
- * Tîrsa mirinê, her kesî ditewîne.

TIŞT:

- * Ya ne tişt im, ya her tişt im.
- * Tiştê mezin, bi hindikî nayê kirîn.
- * Her tişt ji tenikî, mirov ji histûrî dişikên.
- * Pûrê kesa neştin, lê hinek jê her tiştin.
- * Her tişt, di dendika xuda ye.
- * Kesê netişt, dibe her tişt.

TÛR:

- * Tûrê vala li pîya nasekine.
- * Ku tûr hûr be, te divê ji benderê dagire.

VIR:

- * Ger ku virr be, divê pirr be.
- * Vîrekek şanî min bide, dizekî şanî te bidim.
- * Virrê veşêrî, pirr dibe.
- * Dinyayê virrek dixun.
- * Virrê nivîsandî zêde tèn bawerkirin.
- * Virrek bûne Suleyman, rastgo mane perîşan.
- * Heta rast rabû ser xwe, virê, dînya da ber xwe.

WELAT:

- * Welatê gel, ziman e.
- * Welat dê ye, herkes jê ye.
- * Welatê bê dehl û dêlî, bûka bê xeml û xêlî.
- * Ta bi ta dibe werîs.
- * Cîyê kû bê av û dar e, ne war e.

X

- * Xûna xûn mêja qirêj e.
- * Xwe naske, xwe xelas ke.
- * Tu min bixapînî, fedî ya te ye; ez bixapim kêmiya min e.

XUDA:

- * Xuda ji rojê xuyatir e.
- * Xudê kerra lal kirîye.
- * Xuda bes e, yê mayî tirs û hewes e.
- * Aşê Xudê giran e, lê baş dihere.
- * Kesê di xû da Xûdê nabîne, kor e.
- * Derba xudê bê deng e, birîna wî bê derman e.
- * Kî ji alî xû ye, Xûdê jî alî wî ye.
- * Ayetê Xudê pirr in, meztirê wan însan e.
- * Yên ku nikanin mêşek çêkin, bi seda Xûda çêkirine.
- * Kesê ku Xûda nas ke, hevî ji kesî nake.

XEM:

- * Ya xemê xû ji bîr ke, ya tirba xû bikole.
- * Xem xwarî, ji xorîyê çêtire.

XEMIL:

- * Xeyal ke, bi xwaze, bixebite, dê rojekî bibe ê te.
- * Xeyal, xemlandî ye.
- * Xemla pîra aqil e.
- * Xemla min, xeyala min e.
- * Xwendin, xeml û xelasî ye.
- * Xemil, xap e.

XEZAN:

- * Kesê pirrî dixwaze, xezan e.
- * Xezanî, tama tevê êşa ye.
- * Xezanî xela nan e, maldar xelayî nizane.
- * Wer bixwe, da ku birçî nemînî.

XEWN:

- * Xeyal, xewna hişyara ye.
- * Xewn ji xeyelê çêtir e.
- * Kesê bê dil raze, xewnê ne xweş dibîne.
- * Kesê piçûk, xewnê mezin dibîne.
- * Kesê tî razê, xewna avê dibîne.

XWENDIN:

- * Nivîsînê xêva, xêv dixwînin.
- * Kilîta serî, xwendine.

- * Ku fam nebe xwendin çî ye.
- * Xwendayê xirab bencê dide dîna.
- * Kesê ku naxuwîne, xezan u ser bi xuwîne.
- * Xêvê xwende, xêviktir e.
- * Kesê nexwendî, kor e.

XÊR:

- * Ya bi xêr, ya ku paşî bi xêr e.
- * Zarûyê bi xêr, çêtire ji kûpê zêr.

XIRAB:

- * Xirabê xwendî, xirabtire.
- * Xirab bi xirabîyê xurt in.
- * Xirab ji tirsê baş in.
- * Xirabî xemlandî ye.
- * Xirab, ji xêva çêtir in.
- * Xirab bi başa nabe.
- * Xêra xiraba, jî xirabîyê xirabtir e.
- * Hevalê xirab, jî mara xirabtir e.
- * Ji xiraba tirê ku herkes xirabe.
- * Xirabîyê bi xwe kî, kî yê qencî li te ke.
- * Kesê çêke çê ye, yê xirake xirab e.
- * Her xirab e, pê nabe.
- * Tu xirab bî, herkes baş e.
- * Ewtina hineka, jî devkirinê xirabtire.
- * Xirabî, li başa dibare.

XUDBÎN:

- * Xudbînî, karê kora ye.
- * Xudbînî, bêhna genî ye.
- * Xudbîn, kesê nabîne.
- * Xudbîn, xu nabîne.

XWESTIN

- * Xwestin hut e, têr nabe.
- * Kesê pirrî dixwaze, bi hindikî şa nabe.

XWEŞ:

- * Xweşî, nexweşî ye.
- * Xweşîya cîya, bi hebûna hezkirya ye.
- * Xweş û baş, hember in.
- * Xweşî ne di roja geş da ye, ne di şeva reş da ye.

- * Heçî xweş û şêrîn e, derd û êş û girîn e.
- * Êvara îdî, ji roja îdî xweştir e.
- * Emrê dirêj, ji yek in, ne xweştire.

XWEYÎ:

- * Alem bi hev xweyî dibe.
- * Lê xweyî be, pê xweyî be.

YAR:

- * Yara te, hemparê kara te ye.
- * Yara wefadar, xem e.
- * Ku yar e, ne bar e.
- * Ger ku yarê te yar e, neyar bi te nikare.
- * Kesê yarê wî yar e, evîn pê tama sar e.

Z

- * Yê bi zerar, neyar e.
- * Ya zar dike, zor nake.
- * Zortir, bi zorê kan e.

ZANÎN:

- * Zanîn, ronahî ye.
- * Zanîn hêz e.
- * Zana zexm e.
- * Zana xû zane, xû nizane nezan.
- * Zanîn bi serîya ye, ne bi sal û rîya ye.
- * Zanîn û huner, bi peyv û tevger e.
- * Zanîna nayê nivîsin, wenda ye.
- * Zane nezanî zane, nezan zaneyî çî zane.
- * Zana xû ditellîn e, nezan zincira di qetîne.
- * Nezanê me bê heş in, zanayê me serxweş in.
- * Bi zana ra, zindan dibe dibistan.
- * Jêtirê ku ferzan e, reben hêj xû nizane.
- * Yê pîrr bêje nezan e, yê zane bi ziman e.
- * Kesê zane giran e.
- * Nezanî, ji zanînê bûhatir e.
- * Kêmahî, li zane girane.
- * Her kes ji bo xû digirî, zane ji bo herkesî.

ZARO:

- * Zar û gul e, kula dil e.
- * Zarokê bê dê û bav, kulîlka bê av û tav.

ZÊR:

- * Kilîta zêrîn, li tevê derîya tê.
- * Tevê zêra ne zêr in, tevê nêra ne mêr in.
- * Zêr zengarî nabe, lê dila zengarî dike.
- * Zêr û zar û bela ne.
- * Kupê zêra, nabe zêr.
- * Zor bi zêrê nikane.
- * Bi gotinê zer, nabe zêr.

ZÊDEHÎ:

- * Zêdehî bare, kêmahî ar e.
- * Dayin zêdehî, girtin kêmahî ye.
- * Zêdehî, kêma kêma dike.
- * Zêde bar e.

ZIK:


- * Kû zik têr bû, ha nan û dew, ha goştê kew.
- * Zikê têr, deng jê nayê.
- * Ne ji zik be, kew nakeve dafikê.
- * Bi alastinê, zik têr nabe.
- * Kû zik têr e, rovî şêr e.

ZEWAC:

- * Zewac xapek xemlandî ye.
- * Zewaca bê dil, kûla dil e.
- * Xeyala zewacê, ji zewacê xweştir e.
- * Mêr ji bo livînê, jin ji bo hêlînê dizewice.
- * Zewac kû du alî ye, her yek jê ne razî ye.

Xadim

Ronî WAR



Berê, min tim ev peyva dibihîst. Erê, tim hinekan digotin, " law ez ji te re dibêjim, 'ez Xadim im' tu dibêjî, 'çend zarokên te hene?'" îro dîsa wê gotinê xwe li min girt û hat. Ne tenê wê gotinê xwe li min girt û hat. Rojên ku qêrînên mirovan di wî nîrê teng de ji guhê min nediket jî xwe li min girt û hat! Belê, vana bi Pirtûka Selahattin Bulut ku navê wê *Xadim* e ji nû ve hatin bûn mêvanê dil û mejiyê min. Xadim bîra min tevda!

Dixwazim çend tiştan li ser Xadim binivîsim. Nivîs jixwe zahmet e tew îcar li ser nivîsekê yan jî berhemekê be bêtir giranî û dijiwariya xwe rê dide. Çimkî wê çaxê tu xwe dixî bin barekî din. Barekî ku berpirsiyarîke din jî dide ser milê te. Divê tu ne zêde ne jî kêman qal bikî û bibêjî. Tu zêde û kêman qal bikî pêşî tuyê neheqiyê li xwe bikî. Dû re li xwendevên bikî. Çimkî tuyê berê wan bidî rêyek ne rast. Jê û pê ve tuyê neheqiyê li nivîskarê wê nivîsê yan jî wê berhemê bikî; tuyê ya wan jî zanîna wan têxî şikê û nehêlî li xurtbûna xwe hay bibin yan jî tuyê bikî ku li kêmaniyên xwe nevarqile. Ji hêla din jî tuyê neheqiyê li wêje, huner û zimanê ku pê hatiye afirandin bikî.

Belê, me got nivîs zehmet e û tew li ser nivîsekê ya jî berhemekê be zehmeta wê bêtir dibe. Bi vê baweriyê ez dixwazim têkevim bin barê çend gotinên ji bo pirtûka Selahattin Bulut ku bi navê Xadim hatiye nivîsîn.

Xadim çîrokek dirêj e. Çîrokek ji wan çîroka ye ku di wêjeya me ya nivîskî de hê zêde kesî dest neavêtîyê. Heta ku min neqedand min jî destê xwe danenî. Piştî ku min xwend û min

pirtûk danî hêlekê û ez hatim ketim nav nivînan îcar Xadim bela xwe ji min venekir.

Lehengê berhemê Jêhat yekî ji hefsê derketiye. Destpêk bi haziriya ku wê herin ji devê hefsê rahêjin wî dest pê dike. Serpêhatiya wî ya kevn û nuh di nav tevna çîrokê de tê hûnandin. Gava ku min xwend ez pê êşiyam. Pir caran dilê min bi halê diya wî şewitî. Dayikên vî welatî yê kezebşewat li pêş çavên min şikil girtin. Kenê min bi pevçûna dê û bavê wî hat. Gunehê min bi Biharê hat ku hêviya xwe bi yekî nasnake girêdaye. Hesreta dayika wî ya ku dixwaze wî bizewicîne. Dû re ji mal û welat barkirina wî. Hatina wî ya stembol û li dermanê derdê xwe yê bê derman pîrsîna wî, tevdek bi zimanekî xweş hatine hûnandin.

Destpêk wek destpêka romanekê ye. Xweş hatiye nivîsandin û destpêkirin lê li gor baweriyaya min ji çîrokekê re ev destpêk giran û zêdeye. Divê bihata kesixandin. Çîroka hemdem ji pênûsê dixwaze ku bi qitûfî tevbigere. Zimanê berhemê jî tevli ku kêfa min jê re hatiye ez dibêjim devokên herêmkî bi devê leheng be xweş e lê berhem bi giranî bi devokê be dibe ku xetereyên zimên di xwe de vehewîne. Di berhemê de kamilbûna pênûsê xwe dide der. Tu çîrokê, çîroka çîrokê û kamilbûna ku çîrokê bi xwediyê pênûsê re avakiriye di rêzikan de dibînin.

Berhemên wilo belge ne. Demek dîrokê zelal dike û nahêle bê ji bîr kirin. Mirov bi saya berhemên wilo bi psîkoloji û sosyolojiya kes û civakê ya wê demê dihesê. Mirov nîrxên ku

hatine parastin û afirandin û yê ku hatine wendakirin dibîne. Ji bona ku mirov karibe îro û sibeha xwe bibîne û diyar bike berhemên wilo yê ku do û pêr rê didin divê tim li cem mirov hebin. Ji bo nîfş û qirnê pêş teqez divê ev werin nivîsandin.

Gava ku min ev berhem xwend ez carek din gihastim wê qenaetê ku heta em têr li ser van mijar û lehengên xwe nesekinin û wan nenivîsînin ewê hêlek me kêmbê û emê nizanibin bê em ji kê derê hatine kê derê û bi çi berdêlan em gihastine heta van derana. Jixwe heta ku em wê kedê nebînin û xatirê ku divê em bidin wan nîrxafîrînerana em nedin wan emê negihêjin tu miradan.

Niha jî ez dixwazim ji pirtûkê çend paragrafên ku ji min re pir bi wate ye bi we re parve bikim.

"Texsî li ser asfalta kelekortî dihejiya û Jêhat di hundurê mirêka şifêr de kildibû. Serê wî li ser stuyê wî yê zihîfoçkî nediedilî. Porê wî fîrk bûbû û hema nêvî bi nêvî spî bûbû. Cênîkên wî spîtîr xuya dikirin. Birûyên wî bela wela bûbûn û şayîkbûna xwe wenda kiribûn. Kîsikên bin çavên wî daliqiyayî bûn û rûyê wî mabû hestî û çerm. Cênîkên wî kort çûbûn xwarê. Bi lêva wî ya jêrîn ve êşên deh salan daleqiyayî bûn. Jêhat di hundurê mirêka şofêr de kil dibû û li sî û pênc saliya xwe digeriya. Xwe bera kortîkên çavên xwe dan, wek du bîrên reş û tarî bûn. Canê xwe peland, pûç û cemidibû. Ruhê wî betilî û hêviyên wî vemirîbûn... Li xortaniya xwe fikirî û keserek ranişt, keserek veşartî..."

Gelo çend kes wek Jêhat li xortaniya xwe fikirîne û keserên kûr

kişandine? Gelo çiqas kes hê jî di binê zindanan de dirizin? Gelo çend kes niha bi hêviya ku ewê rojekê karibin pê li axê bikin dijîn? Gelo...

"... Berê xwe guherî. Bi guhertina berê xwe re li dîwarê kêleka xwe rismê xwe yê deh sal berê dît. Awirên wî zû bi zû li ser mirêkê û risim çû û hat. Mirêk... risim... mirêk... risim... Çavên wî fîreh bûbûn û di serê wî de dilîstin. Mirêk... risim... mirêk... risim... Xwe bi xwe : " Kîjan Jêhat e?" got û eniya xwe fîrkand. " Jêhat ew rismê dardekiriye, an ew zîlamê di mirê de ye? Niha ruh têkeve vî rismî û di mirêkê de li xwe binêre, wê xwe bibîne an min? Kesek çend kes e? Jiyanekê kesek dijî an gelek kes?"

Belê em di jiyaneke de pir jiyana û di emîreke de pir emîrî dijîn. Lê ne ew emîr ne jî ew jîyan wek ya alemê ye. Wek ku gotine li vî welatî: " mirov ne bi bîrxî têr şîr dixwin ne jî bi beranî têr giha."

Xadim çîrokek bi bandor e. Ji rastiya civakê û heyatê zaye, bi pênûsa nivîsakarê hêja li ser rûpelan ruh ketiyê û tevî rêwîtiya wêjeya kurdî bûye.

